.

•

# Li ser jenosîda kurd a ku di sedsale 21´min de ku hê didomê 1

•

*Abdusamet Yîgît*

*Weşanên soran*

.
.
.
. **Li ser jenosîda kurd a ku di sedsale 21´min de ku hê didomê 1**

*Abdusamet yigit*

*@ Abdusamet yigit*

*Çap 2*
*Berlin/21. Adar-2016*
*Berg Design: Gazin Han*
Weşanên HAN
.
email: han-grafik@hotmail.de
.
Çap û Grêdan :
Concept Medienhaus GmbH
Bülowstr. 56-57 10783 Berlîn
.ISBN 978-3-945956-01-7

**Li ser jenosîda kurd a ku di sedsale 21´min de ku hê didomê 1.**

**Pêşgotin**:

Jenosîd, dema ku hebûna civakekê û ankû gelekî were armanc girtin bo tûnakirinê dihêne ser ziman. Î ro, em dema ku li rewşa şerê rejimên herêmê ên weke rejima tirk û şerê wan ê li ser serê civate kurd ku mirov li wê dinerê, mirov dibînê hebûna civake kurd di çerçoveya tûnakirinê û ji dîrokê birinê de dihê armanc girtin. Zimanê kurdî ê civake kurd, hatîya qadaxa kirin. Ti kurd, nikarin bi zimanê xwe perwerde bibînin. Bi wê re jî kurd, ne xwediyê wê maf û azadîyê na ku ew werina nimînêr (´temsîl kirin´) kirin. Em divê ku vê yekê jî bi wê re werênina ser ziman ku hebûna civakek bi armaca tûnakirinê û dîrokê birinê ku were armanc girtin ji aliyê zimanî, çandî, sîyesî, rewşenbîrî û hwd ve, wê hingî ew bê jenosîd.

Di vê çerçoveyê de em divê ku bahse jenosîda civake kurd bikin. Bi teybetî, di vê xabatê de min giranî da rewşa domandina şerê jenosîdkirina civake kurd ê di çeyreka pêşî a sedsala 21´ê de ku hemû cihan li ber wê bêdeng e. Ji xwe, em dema ku li rewşa rejimên ku jenosîdê dikin nerin, her wusa jenosîdên ku hatina kirin, em dibînin ku pêşî di rojên ku ew jenosîd hatina kirin de herkesek dibê bêdeng, weke ker û lal. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku bi teybetî em divê ku di çerçoveya serdemên dawî de werênina ser ziman, ku sedsale 20´an weke sedsaleka ku bigiştî di wê de şerê jenosîdkirina civake kurd ku bi wê re hatina kirin a. Komkujiya Zilanê(´1926´), Komkujiya dersimê(´1937´), komkujiya Helebçê(´1988´), Komkujiya şengalê(´2014´), Komkujiya kobanê(´2014´) û hwd, çend ji wan komkujiyên bi tevkujî hatina serê civake kurd in. Her yekê ku di wan de bi deh hezaran kurd hatina qatil kirin in. Bi wê re jî, divê ku mirov bibêje ku wê bi sedan komkujiyên din ên ku hatina hanîn li serê civate kurd hana. Komkujiyên ku rejima Îranê li rojhilatê kurdistanê hatina serê kurdan, Komkujiyên ku rejima baasê a Sûrî li rojavayê kurdistanê hatina serê kurdan, komkujiyên ku rejima baasê a Îraqê li başûrê kurdistanê kirina û hanîna serê civate kurd, komkujiyên rejima tirk li bakûrê kurdistanê kirina û hanîna serê civate kurd, divê ku mirov bahse wan bike û wan werêne ser ziman. Her wusa, ev komkujîyên ku hatina hanîn li ser serê civake kurd, hê jî didom in. Ez, vê xabatê li ser ´jenosîda kurd´ di dawîya çeyreka pêşî a sedsale 21´ê de dikim. Ev jî, dide nîşandin ku, heta vê kêlîkê jî, wijdanê mirovatiyê, tenê temaşakirinê li kirina komkujiyên ku bi armanca jenosîdê ku dihênin hanîn serê civake kurd dike.

Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku heta roja me, di derbarê civake kurd de dada navnetewî, heta vê kêlîkê jî ti biryarên ku ew bi wan pêşîya komkujiyên ku dihên serê wê bigrê, negirtina. Her wusa, Netewên yekbûyî, hêzên cihanê ên mazin ku sîyesetê dikin ên weke Emerika, Rûsya, Ewropa, Çîn û hwd, bi pirranîya welatên din ên cihanê re li ber komkujiyên ku tên serê civake kurd bêdeng in. Ev xabat, wê karibê, wê bêdengîya wan xira bike? Ez, di vê de di serê xwe de dikevima gûmanê de. Lê min, pirr hêvî dikir ku ev xabet bûba temenê wê ku ew bêdengî wan xirakiriba.

Î ro, rewşa civake kurd, di wê de ya rewşek pirr xirab a. Her wusa, hêzên ku ´pirsgirêka kurd´ afirandin, î ro jî wê bi komkujiyên ku dihên serê civate kurd re û bi wê domandina bêdengiya xwe re wê didina domandin. Pirsgirêka kurd, ku rejima tirk, weke ´pirsgirêka terorê´ dixwezê ku bi ravakirin bi rayagiştî, pirsgirêka maf û azadîya civake kurd a. Piştî xûrîxîna ´yekîtîya sovyet´ bidest bikarhanîna gotina ´terorê´ hat kirin. Piştre jî, ev gotin, ji rejimên weke tirkiya re bû temenê ku komkujiyên xwe di bin wê de binûxûmênin û veşêrên. Bi vî rengî, gotina ´terorê´ ji îstîsmarkirinekê zêdetirî dibê weke rewşek û têgîneka sernûxûmandinê jî. Kîjan rejim, kê dikujê û ankû hêrîşî kîjan xalkê dike, di cih de gotina ku bibêje, wê ew bê ku ´ez li dijî terorê, tekoşînê dikim.´ Lê ev ne rast a. i kirinên xwe re gotina ´terorê´ weke ´maske´ û ´sernûxûmandinê´ bikardihên. Tirkiya wele welatekî ´andamê NATO´ bûna wê, bûya temen ji wê re ku gelek derfet ji NATO bidest bixe û wan di şerê xwe yê li hemberî civake kurd de bikarbêne. Andamtiya tirkiya NATO´, bûya temenê wê ku çapameniya rojava û ankû ´ewropa´, pirranîya komkujiyên ku rejima tirk dihêne serê civake kurd li ber wan **bêdeng bê**.

Şerê jenosîdê ê bi kurdan re şerekî nîjadkujî ya. Nîjadkujiya kurdan, piştî şerê cihanê ê yekemin û pê de, zêdetirî pêşket. Berî wê jî, hêrşên bi armanca tevkujiyê li kurdan û civate kurd bûbû bûn. Lê ji dema şerê cihanê ê yekem û pê de, zêdetir bû. Jenosîda kurdan, ji aliyê rejimên Îranê, Sûrî, Îraq û Trkiya ve tê kirin û meşandin. Kurd, ji ber ku kurd in û bi kurdî diaxivin tên kuştin. Dema ku ji milletekî bi navê wê mirovên wê werina kuştin, hingî ew dibe nîjadkujî û an jî kû dibê jenosîd. Rewşa kurdan jî, em dikarin bi vî rengî bênin ser ziman. Di jenosîdkirina kurdan de, du rêbaz tên bikarhanîn. Rêbaza pêşî, biqadaxakirina zimanê kurdî ra û bi bernemeyên bişavtin(asîmlasyon)ê kurd hatina tûna kirin bi nirx, çand, ziman û kevneşopîyên wan ên ku temenê civakîtîya wan diafirênin. Rêbaza duyemin a jenosîda kurdan jî, bi rengê tevkûkjiyan a. Weke ku bi tevkujiyên bi em bi navê ´Komkujiya Zîlanê´ bi nav dikin, bi tevkokujiyên ku bi navê ´

komkujiya dersimê´ bi nav dikin, bi tevkujiyên ku em bi navê ´Komkujiya Helebceyê´ bi nav dikin û hwd, jenosîda kurdan ji aliyê fizîkî ve hatîya kirin.

Heta roja me, yanî heta sale 2014´an jî, zimanê kurdî qadaxa ya. Kurd, nikarin bizimanê kurdî xwe perwerde bikin, biaxifin û binivîsênin. Ên ku dikin jî, rastî tûndûtûji û kuştinê tên. Ziman, stûna hebûna civatekê ya. Dema ku zimanê civatekê were qadaxakirin, hingî, derfet ji pêşketina çand, kevneşopî, zanîn û û hwd, ên civatî ên wê civate ku ew ziman zimanê wê ya tê standin. Bi vê rengî, jenosîda çandî li ser civatê tê meşandin. Kurd, bi qadaxaya li ser zimanê wan, jenosîda çandî li ser wan tê meşandin. Tê xwestin ku hemû mirovên kurd, zimanê kurdî bikarneyênin û tenê bi zimanê tirkî, farîs û arabî biaxivin. Bi wê re jî, bi temmenî zimanê kurdî ji jîyane û pêşketina wê ya di jîyane de dûr bikin. BI wê dûrkirinê re jî, hebûna civate ji holê ra bikin û tûna bikin. Ev rêbazaka jenosîda kurdan ku rejima tirk bi awayekî pirr zêde bikarhanî. Î ro jî, pirranîya kurdan, nikarin bi kurdî biaxivin. Heta ku ´nivîskarên kurd´ jî bi zimanê tirkî dinivîsênin û ji xwe re dibêjin ´em nivîskarê kurd in´. Rayadarên tirk ên weke bilent arinc û hwd jî, bo zimanê kurdî reşbikin û piçûk bidin nîşandin, li ber çapameniyê dibêjin ku "zimanê kurdî, ne zimanekî medenî ya, nabê ku bi wê perwerde bibe." Ev, weke rêbazekî jenosîda kurd hatîya bikarhanîn.

Rêbazê duyem ê jenosîda kurdan, bi kuştin, goçberkirin û hwd re bûya. Kurd, ji ber ku kurd in tên kuştin, tên avêtin li zindanan û rastî tûndûtûjiyê tên. Nîşanak û birana ku jenosîda kurd di sale 2014´an de jî didomê, komkujiyên ku di sale 2014´an de li şengalê û herêmên din ên başûrê kurdistanê û li kobanê û herêmên din ên rojavayê kurdistanê ya. Komkujiya êzidiyan, 2014, weke trejendîya civate kurd a sedsale 21´ê jî hat binavkirin ji aliyê rayagiştî a kurd û navnetewî ve jî. Bi heman rengî, hêrîşên bişitt ên bi armanca jenosîdê hatina birin li ser Kobanê û rojavayê kurdistanê. Ev jî, bi armanca jenosîdê û qirkirina civate kurd bû. Ev hêrîşên bi armanca jenosîdê û tevkujiyên weke ku li şengalê bûn jî, hêrîş û tevkujiyên jenosîda civate kurd ên ku di sale 2014´an de bûbûn bûn.

**Li ser jenosîda kurd a ku di sedsale 21´min de ku hê didomê**

Şoreşa rojava, ket sale xwe ya çaremin de. Di hundûrê wan hersê salên ku buhûrtin de jî, gelek pêşketin, tevî hemû hêrîşên li ser herêmê hatina çêkirin.

Pêkhateyên li herêmê, bi hevdû re jîyanek avakirina. Lê rejimên herêmê, hertimî ji wê acizîya xwe hanîna li ser ziman. Di destpêka ketina sale sêyemin a şoreşa rojava de bi alikarîya rejimên herêmê ên weke tirkiya çeteyên DAÎŞ´ê dana hêrîşkirin li ser rojava. Destpêka şoreşa rojavayê kurdistanê, ji Kobanê destpêkiri bû. Hêrîşên li ser rojava jî ji Kobanê dane destpêkirin.

Hê çend hefte mabûn ku bikevina sale sêyemin a şoreşa rojavayê kurdistanê de hêrîşên li rojava destpêkiri bûn. Armanc, ew bû ku berî ku şoreşa rojava bike sale xwe ya sêyemin de bê tafisandin. Bo vê yekê, herêma ku ji wê şoreşa rojava destpêkiri bû, ji wir destpêka hêrîşan li ser rojava û şoreşa dabûbûn destpêkirin.

Piştî ku hêrîşan destpêkir û pê de, şoreşa rojava di nava wan pêlên hêrîşan de ket sale xwe ya sêyemin de. Lê î ro, em ku çend roja mena, em xwe amede dikin ku bikevina sale wê ya çaremin de. Her saleka şoreşa rojava bi fêr û ezmûnên cûda tişî ya. Gelek ezmûnên nû li herêmê bi wê hatina bidest xistin. Her wusa destûra bingihîn a rêveberîya rojavayê kurdistanê jî hat pêşxistin û denezendin. Her wusa destûra şoreşa rojava, tevî hemû hêrîşên li ser wê, ji ya hemû rejimên herêmê dewlemendtir û pêşketîtira bi têgîn û zanîna xwe re.

Li herêmê, şoreşa rojava, weke cerbek, fêrek û ezmûnek xalkan pêşket û wusa jî xwe domand. Her wusa, ev fêr û ezmûna wê, êdî bûya malê xalkan. Di hundûrê van hersê salên ku şoreşa rojava bûhûrandin, bi fêr û ezmûna xwe ji hersê salên pêşî ên şoreşa sovyet jî û ji hersê salên pêşî ên şoreşa firansa jî zêdetirî fêr û ezmûn li şûn xwe hişt. Her wusa, ku mirov li vê sale dawî a sêyemin ku şoreşa rojava buhûrand ku mirov binerê, tenê bi berxwedana kobanê jî bê ku mirov wê ezmûna wê bipîvê, mirov wê vê rastiyê bi hesanî kifş bike.

Di sale sêyemin a şoreşa rojava de berxwedana kobanê a dîrokî hat pêşxiştin li hemberî hêrîşên ku rejimên herêmê ên weke tirkiya bi destê DAÎŞ´ê ku hanîna li ser wê. Her wusa, ev berxwedan, ne tenê bû malê dîroka kurdistanîyan û şoreşa rojava. Her wusa, bû malê hemû dîrokî. Di sedsale 21´ê de ´stalîngrada kurdan´ bû. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku berxwedana kobanê, rastîya dîrokî a şoreşa rojava radixe li berçavan.

Her demên vê şoreşê, rejimên herêmê kirina ku bi xwûn bikin. Di her salwegerên kurdistanîyan de rejimên herêmê, komkuji hanîna serê kurdistanîyan. Di newroza 2015´an de li Hesekê komkujiyeka mazin ya hovana hanîna serê xalkê kurdistanîyan. Di 25´ê hezîrene 2015´an de li kobanê bi alikarîya tirkiya komkujiyek mazin bi destê DAÎŞ´ê hanîna serê

kurdistanîyan. Her wusa salwegera vê şoreşa rojava 19´ê temûzê tê. Ya ku mirov dişêne tê serê mirov ku wê dîsa serî li komkujiyan bidin bo ku salwegera şoreşa rojava newê pîroz kirin.

Kurdistanîyan, hertimî şahî û êş bi hevdû re jînkirîya. Ev, bûya rastîyek kurdistanîyan. Li bakûrê kurdistanê jî wusa bûya. Li rojavayê kurdistanê jî wusa bûya. Li başûrê kurdistanê û rojhilatê kurdistanê jî wusa bûya.

Şoreşa rojava, tevî hemû hêrîşên ku hatina serê wê û êşên ku xalkên herêmê jîyan kirina jî, fêr û ezmûnaka wan ya dîrokî ya. Her wusa, şoreşa rojava, bawerîya xalkan bi wan hanî. Da nîşandin ku dema ku mirov bixwe bawer bê, mirov dikarê hertiştî bike. Zanebûn û bawerî, bi hevdû re çawa mirov dikarê bi wê nirxên mirovatiyê biparêzê, di ezmûna şoreşa rojava de hat dîtin. Şoreşa rojava, pirr zêde li ser wê hat axiftin û tê axiftin jî. Wê hê li ser wê gelekî jî werê axiftin. Rejimên herêmê ên weke tirkiya û hwd, ji her çar aliyên wê ve hêrîşî şoreşa rojava dikin. Ji ber ku artnatîfa wê metingerîya ku wan li ser pêşaroja xalkan çêkirîya ya.

Bêgûman, şoreşa rojava, tevî gelek hêrîşan pirr zêde pêşket. Rêxistinîya wê û sazûmankirina wê ya li herêmê bi jîyane xalkan û hwd, hat pêşxistin. Her wusa, zihniyeta vê şoreşê pêşket û hat dîtin. Bo ku hat dîtin, êdî herkesek lê xwedî derdikeve. Lê divê ku mirov bibêje ku lê xwedî derketina herî mazin, bi zanebûnê ya. Sazûman û pergale perwerdekirinê ya şoreşa rojava, divê ku mirov li ser wê bisekinê. Ya ku wê rastîya wê derxe li holê û pêş bixe jî û pêşaroja wê biafirênê jî wê ev bê.

Şoreşa rojava, bizanîn û têgihiştina wê, bûya malê hemû kurdistanîyan. Her wusa, berxwedana kobanê rastîya şoreşa rojava kir malê hemû kurdistanîyan û mirovatiyê. Divê ku mirov pêvajoya şoreşa rojava a bi berxwedana kobanê re giring binirxêne û werêne ser ziman. Her wusa, mirov dikarê vê destpêkê, weke wê destpêka şoreşa sovyet ku çawa hêrîş li wê dibûn werêne ser ziman.

Zanebûn, bawerî û hêsta têgîna şoreşa rojava, bû hêza herî mazin ya parastina şoreşa rojava jî. Di dema berxwedana kobanê de ev rastî pirr baş hat dîtin. Li hemberî hemû teknîka bi çekdarî ku hatibû dayîn çeteyên DAÎŞ´ê, şervanên kurd bi kilêşên xwe li berxwe didan û biserketin. Bi vîna mirov, her wusa, mirov dikarê bibe ji pola. Ev jî, weke ezmûnaka şoreşa rojava ku bi berxwedana kobanê re xwe da dîyarkirin. Hê jî, tevî hemû hêrîş û zorîyên ku dijîn xalkên rojava, li ser axa xwe li berxwe didin û dijîn. Ev tenê jî, rastîya dîrokî ya şoreşa rojava bi wateya wê re radixe li berçav.

Tevgera kurd, dema ku dest bi tekoşîna kurd û kurdistanê kir, pirr piçûk bû. Î ro, di wê astê de ya ku şoreşê dike. Di vê çerçoveyê de bo fahmkirina

van pêşketinên li kurdistanê, divê ku mirov wê destpêka wê jî fahm bike û werêne ser ziman.

. Tevgera kurd a azadiyê di 15´ê tabaxê a 1984´an ku bidest tekoşîna biçekdarî û pê de, rewşa kurd ji wê demê û pê de, ket rewşek din de. Ji wê demê û heta vê demê li kurdistanê zihniyetek nû afirî. Kurd, derketina dika dîrokî. Kurdan bi civatî, ew dorpêçkirina rejimên herêmê a weke tirkiya, îran, Sûrî û Îraqê a bi armanca ji dîrokê birina civate kurd şikand. Lê di berdêla wê de jî, gelek kurdistanî jî jîyane xwe ji dest dan. Komkujiyên weke komujiya helebçê, komkujiya başûr û şengalê, komkujiya rojava û kobanê û hwd, hatina hanîn li serê civate kurd. Hê jî, ew komkujiya komkujiyan a li ser serê civate kurd didomê. Lê tevî wê jî kurd derketina dika dîrokê. Şoreşa rojava, nîşanaka vê ya.

Şoreşa rojava, weke şoreşa vê dîrokê û despêkê jî mirov dikarê werêne ser ziman. Her wusa, î ro, kurd, bi wê gihiştina astaka giring li herêmê. Li herêmê li rojhilat kurd, gihiştina wê astê ku politikayên herêmê didina kifşkirin. Êdî kurd, li herêmê weke hêzekê na. Ew asta pêşketina kurdan, li herêmê, bi pêvajoyên hêrîşkirinê ên weke DAÎŞ´ê û hwd re dihên xistin bin hêrîşê de.

Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku çend ku weke zihniyetekê û astekê pêşketina wê bû jî, bi wê re jî çandek û wêjeyek nû ya civatî xwe da der. Her wusa, wêjeya berxwedana ê tekoşînê xwe da der. Bi wê re jî, rengê zihniyetê xwe da der. Jinên kurd, di vê pêvajoya tekoşînê de, weke hêzeka herî giring a jîyanî pêşket û serdest bû. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê bahse wê bike.

Kurd û Kurdistan, di vê pêvajoyê de gomlekê ku lê hatibûn kirin çirandin û qatandin û ji ser xwe avêtin. Î ro, em pêvajoyeka bi vî rengî dijîn. Çendî ku kurdan ew çirand û qatand û ji ser xwe avêt jî, her wusa pêşket û şoreş kir. Şoreşa rojava rastî û mînaqa vê rastiyê ya. Şoreşa rojava, divê ku mirov werêne ser ziman ku rastîyaka giring a dîrokî a vê pêvajoyê a kurdistanê ya. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku şoreşa rojava, ji sale temûza 2012´an û pê de ku bû, êdî bi pêşketinên xwe re li ser vê rastî û astê bû malê hemû kurdistanîyan.

Herî zêde, weke vê şoreşa rojava, ku mirov dikarê weke berhema 15´ê tabaxê werêne ser ziman ku kurd derketina dika dîrokê. Li rojhilat êdî weke hêzek sîyesî, civatî û hwd in. Her wusa, tekoşîna maf û azadiyê, demokrasî û gelan, di vê çerçoveyê de bi wê re dibê xwediyê destpêkekê. Li rojhilat, heta roja me, çend cerbên xalkan ên di çerçoveya tekoşîna maf û azadiyê de bûna, bi serneketina. Lê li kurdistanê, ev bi serket. Hin bi hin bandûra wê, li herêmê çendî ku dem têve diçê zêdetirî tê dîtin û hîskirin. Bêgûman, li

rojhilat, bi pêşketina civate kurd re, weke li wê jî şoreşek zihniyetê û civatî bibe lê tê. Her wusa, xalkên herêmê, hin bi hin weke ku bi xwe ve tên.

Ev destpêka şîyarbûnê a li kurdistanê, bi demê re bû weke destpêkekê li rojhilat jî. Ya ku di aslê xwe de di vê demê de zêdetirî tê hîskirin û dihê xistin bin hêrîşan de jî, ev rastî bixwe ya. Hemû hêrîşên di bin navê DAÎŞ´ê de ku li şoreşa rojava hatina kirin, mirov dikarê di vê çerçoveyê de weke hêrîşna zihniyetî ên bi armanca dengên gelên herêmê werêne ser ziman. Her wusa, bi van hêrîşan, ew armanc hatkirin ku pêşîya sîyarbûna gelan a li herêmê ku li gorî demê û rastiya demê were girtin. ..

Şoreşa rojava, di aslê xwe de, mirov dikarê di vê çerçoveyê de weke şoreşeka zihniyetê a şariştanî jî werêne ser ziman. Li herêmê, rastiya xalkan bi dîrok û mejûya wan re ku wê baştir were ditin û fahmkirin, di vê çerçoveyê de wateya wê heya. Di vê çerçoveyê de dikarê vê destpêkê weke destpêka dengê mesopotamya jî werêne ser ziman. Ya ku rejimên herêmê ên weke tirkiya û hwd, ku di aslê xwe de li hemberî wê tê şer dikin, ew rastîya mesopotamikî a dîrokî ya.

Gelek weke gelê kurd û civate kurd, ku di nava hêrîşan de û di bin hêrîşan de ku karibê berxwedana xwe ya dîrokî pêş bixe û bide, her wusa, ev destpêk dibê navê vê jî. Gelê kurd, hê jî, di bin wê hêrîşê de ya. Zimanê civate kurd qadaxa ya. Rastîya wê bi statûya wê re li herêmê nayê xwestin ku were herê kirin. LI hemberî statûya civate kurd, şerê tûnekirin dihê dayîn. Gelê kurd jî, bi dîroka xwe re, wê tekoşîna xwe ya civatî dide. Hemû hêrîş, li wê tekoşîna wê ya bi rûmet a.

Her wusa, pêvajoyên şer ku rejima tirk, li hemberî civate kurd pêş pêşxistina, hemû jî bi armanca tûnakirina civate kurd in. Şerê tûnakirina civate kurd bi civate kurd re dimeşênin. Hêrîşên jenosîdê li civate kurd dikin.

Î ro kurd, bi wê zihniyetê û têgihiştinê tekoşîna maf û azadiyê bi tekoşîna xwe ya bo aşîtîyê re didin. Gotina ´tekoşîna aşîtîyê´, li herêmê bi vê têgîn û destpêkê û pêvajoyên wê yên tekoşînê re ket nava jîyanê de û mirova pênasî bi wê re kir. Her wusa, bi zihniyetek demokratî ku xalkên herêmê ku wê çawa karibin bi hevdû re bijîn û pirsgirêkên xwe bi hevdû re bi rêyên aşîtîyana çareser bikin, di vê çerçoveyê de wateya wê heya. Minaqe vê jî, bi şoreşa rojava re li giştîya kurdistanê û rojhilat hat ditin. Her wusa, jîyane kurdistanîyên bakûrê kurdistanê jî, tevî ku di bin hêrîşên rejima tirk de jîya, xwe bi hevdû re û bi zihniyetek komelî birêxistin dike. Her wusa, li ser vê re gotina ´komin´ê dihê ser ziman. Lê gotina zimanê kurdî a ´komelê´ herî zêde xweşik vê rewşê bi rêxistinî û rastîya wê re baştirî dihêne ser ziman.

Ev destpêka tekoşînê, destpêka tekoşîna maf û azadiyê ya. Heta ku mirov

heya maf û azadîya wî wê hebe. Her timî jî, wê tekoşîna maf û azadiyê di wê çerçoveyê de wê hebe. Mirov, bi azadî xweşik û sipahî ya. Bo vê yekê, mirov dikarê, tekoşîna maf û azadiyê, weke tekoşîna xweşikbûn û sipahîbûnê jî werêne ser ziman. Di çerçoveyek serdemî de asil ji nûha û pê de, wê tekoşîna maf û azadiyê zêdetirî pêş bikeve. Ev, bi rewşenbîrî, civakî, sîyesî û hwd a. Şoreşa rojava, temenê vê yê dema demû ya.

Şoreşa rojava, temenê tekoşîna maf û azadiyê a ji kurdistanê li gihiştîya rojhilata navîn a. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov li rastîya felsefîkî a şoreşa rojava fahm bike û werêne ser ziman. Pêvajoya tekoşîna civatî a li kurdistanê ku ji sale 1984´an destpêkiribû, bi şoreşa rojava re gihişt astek û radeyek nû û giştî ji kurdistanê li giştîya rojhilata nvê. Ya ku em î ro, dibînin jî ev a.

Li rojhilat, di vê çerçoveyê de ku mirov bibêje ku şoreşa civatî û gelan pêk tê, wê rast û di cih de bê. Gelên herêmê, weke ku ji xewên hezar salan şîyar bibin li wan tê. Di vê çerçoveyê de li herêmê bi komelî, rewşenbîrî, civakî û her wusa zihniyetî û demokratikî şoreş pêk tê. Şoreşa rojava rastî û destpêka vê ya. Ji ber vê yekê ya ku hêrîşên li ser wê pirr zêde na. Herîşên zêde ên li ser wê, ji ast û radaya bandûra wê li wê dibin.

Di vê çerçoveyê de mirov vê rastiyê jî dibînê û fahm dike ku çareserîya pirsgirêka kurd û kurdistanê, wê weke temenê şoreşa demokratikî a li rojhilata navîn jî bê. Wateyeka pêşketina civate kurd û kurdistanê jî, di vê çerçoveyê de xwe dide dîyarkirin. Bi gotinaka din, mirov dikarê bibêje ku wateya azadîya kurd û kurdistanê, tê wateya pêşketina maf û azadiyê li rojhilata navîn û bi wê re pêşketina pergale demokratî a gelan li rojhilata navîn. Di vê çerçoveyê de weke ku azadîya civate kurd û kurdistanê û ya xalkên rojhilata navên ji navikê ve bi hevdû ve girêdayî ya. Ya ku vê şanî me dide jî, serkevtina şoreşa rojava û tekoşîna maf û azadiyê a civate kurd ya li kurdistanê ya.

**Rizgarkirina Kobanê, wateya wê û hêrîşên rejima tirk li Cizirê li kurdistanîyan**

Ji 15´ê êlûna 2014´an de hêrîşên DAÎŞ´ê bi alikarîya Îran û Tirkiya li kobanê li kurdistanîyan didoman. Hemû rê û rêbaz ceribandin bo ku kobanê bixin. Xistina kobanê bo xwe giring di ditin. Ji ber ku destpêka şoreşa rojava ji kobanê destpêkiribû. Ji wê dera ku destpêka şoreşa rojava bûbû bû, di xwestin ku derbeyê li kurdan bixin. Bo vê yekê jî, ji wir ve giranî dane hêrîşan. Bajarê kobanî kavil kirin. Kevir li ser kevir ne hiştin. Bi deh hezaran kurdistanîyên kobanî bûn pênebar.

Hêrîşên li kobanê 134 bênavber bi şitt domîyan. Kêlîk bi kêlîk, hêrîş dibûn. Lê çeteyên DAÎŞ´ê ku bi alikarîya tirkîya hêrîşî kobanê dikirin, çi kirin û çi nekirin, li wir bi serneketin. Ji roja ku hêrîş destpêkirin ya 15´ê êlûnê û bi vir ve 134 rojan hêrîşan li kobanê destpêkirin. Hemû hêrîş jî, hêrîşên giran ên xistinê bûn. Rizgarkirina Kobanê ji çeteyan, rastî salvegera komara kurd a Mihabadê û denezendina kantonê jî tê. Her wusa ev serkevtin, ji vê aliyê ve jî, wateyeka wê heya.

Gotinên T. Ardogan ên piştî rizgarkirina Kobanê ku hanîn ser ziman, rastîya zihniyeta rejima tirk a di temenê piştgirîya wê ya ji çeteyên DAÎŞ´ê re jî dide nîşandin. T. Ardogan digot "piştî bakûrê îraqê, nûha jî bakûrê Sûrî ...", rastîyê radixe li berçav. Di dewama gotinên xwe de dijberîya xwe li dijî

statûya kurdan a li rojavayê kurdistanê dihêne ser ziman. Ji xwe di temenê wan hêrîşan de şikandina kurdan û bêstatû hiştina wan heya. Rejimên herêmê ku Kurdistan û civate kurd di nava wan de hatîya qatkirin, hêvîyek mazin bi DAÎŞ´ê ve girêdabûbûn ku wê serketiba û wê derbeyek mazin li kurdan xistiba û wê li ser wê re êdî kurd bêtatû bihiştan. Ji destpêka hêrîşan û pê de jî, hemû gotinên xwe li ser wê digotin.

Gotinên T. Ardogan ên di destpêka hêrîşên li kobanê de ku hêvîya wan dihanî ser ziman û ku digot ku "kobanê ket, dikeve", weke gotinên wî yên ku di destpêka şoreşa rojava ku ji kobanê destpêkiribû û wî gotibû ku "emê ji rewşeka bûyî û bi dawîbûyî re nebêjin ´ey welleh´" bûn. Piştî ku kurdan care pêşî ji kobanê destpêkir û dest danî ser rêveberîya bajarê kobanê û rêveberîya xwe ya kurdistanî avakir û pê de, T. Ardogan gotibû "emê ji rewşeka bûyî û bidawîbûyî re nebêjin ´ey welleh´" û pê de, hêrîşên li ser rojava bi alikarî û piştgirîya tirkiya gav bi gav zêde bûn. Şerê ku li Sûrî ku di destê de tenê li herêmên Sûrî bû, bi alikarî û hewldanên tirkiya, Îran û rejima baasê a Sûrî û hwd re hat herikandin li rojavayê kurdistanê. Di herikandina wî şerê Sûrî li rojavayê kurdistanê de, herî zêde rol û weyna tirkiya zêde hebû. Pêşî, komên çete bi destê serleşkerên tirk bi rêxistin dikirin û didan hêrîşkirin li ser rojava. Armanc, pêşî ji holê rakirina aramiya rojava bû û piştre kirina nava şer de bû û piştre tûnakirina wê bû.

DAÎŞ, weke planaka kontrayî ku bi wê hatibû xwestin ku derbe li her deverên kurdistanê ku li kurdan bixin bû. Bi DAÎŞ´ê, wê li başûrê kurdistanê jî, derbeyek li kurdan bixistan. Wusa hasab kiribûn ku wê rêveberîya kurd a li başûrê kurdistanê derbeyek mazin bixwera. Ev jî, hatibû hasab kirin. Di destpêkê de li Musilê bêşer û bi hesanî bicihkirina DAÎŞ´ê, bo vê armancê bû. Di çerçoveya planakê de artişa Îraqê jî jê xwestin ku çekên xwe di cih de bihêle û vekişê. Berî wê vekişînê jî, belafirgeh û leşkergehên ku radestî DAÎŞ´ê kiribûn, tişî çek û cebilxane kiribûn. DAÎŞ´ê, dest danî ser hemûyan, û ev çek hemû li dijî kurdan bikarhanî. Di wî 134 rojên şer de ew çek li dijî kurdan bikarhanîn.

Şerê DAÎŞ´ê ê bi kurdan re şerekî ku di çerçoveya giştîya rojhilat de ku bi kurdan re dihat kirin bû. Rejimên herêmê ên ku Kurdistan di nava wan de hatîbû qatkirin hemû jî, alikarîya wan di wî şerî de ji DAÎŞ´ê re hebû. Tenê xwestek û armanca wan ew bû ku DAÎŞ derbeykê li kurdan bixe. Piştre jî, li ser wê re jî, wê rewşa bêstatûtîya kurdan li ser serê kurdan bidina domandin. BI kurdan re şerê ve dikirin.

Şerê ku DAÎŞ´ê li rojava û başûrê kurdistanê bi kurdan re dikir, li gorî wê rejima tirk jî li bakûrê kurdistanê di nava tevgerê de bû. Hal û tevgerên rejimê li gorî wê bûn. Di destpêka şerê DAÎŞ´ê de rejima tirk, di wê

bawerîyê de bû ku wê serketiban. Bo vê yekê, ew ´oparasyonên qirkirina sîyesî", weke ku navberek dabûbûnê de. Lê piştî ku ditin ku wê ancam ne li gorî ya dilê wan bê, piştre carek din rayadarên tirk giranî dane domandina oparasyonên qirkirina sîyesî li bakûrê kurdistanê. Ji aliyekî din ve jî, bi wan oparasyonên qirkirina sîyesî ên li bakûrê kurdistanê, weke ku dixwestin ku moralê kurdan jî bişikênin. Li bakûrê kurdistanê, serhildanên gel ên 7 û 8ê kewçerê jî, berxwedana kobanê ya rojavayê kurdistanê û bakûrê kurdistanê kiribû yek. Di vê çerçoveyê de jî, divê ku mirov li hêrîşên dewletê ên li Cizîrê jî binerê.

Hêrîşên li Cizîrê, çend ku weke "provakasyonekê" werina bi navkirin jî, ev bi plan ji aliyê dewletê ve hatina kirin. Ji aliyê kurdan û pêvajoyê ve em dikarin hêrîşên li Cizîrê weke provakasyonê bi nav bikin. Lê ji aliyê dewletê ve em nikarin bahsê bikin. Ji aliyê rayadarên dewletê ve bilêvkirina gotina ´provakasyonê´, tenê weke gotinaka îstismarkirin û sernûxûmandinê pê ve ne ti tiştekî din a. Derewek a. Ji ber ku rayadarên dewletê, fahmkiribûn ku wê li kobanê kurd bi serkevin û ev jî wê dilxweşiyekê di nava kurdan de bide çêkirin. Pêşî xwestin ku pêşîya vê bigrin. Di her dem û pêvajoyên bi vî rengî de rayadarên dewletê serî li rêbazên bi vî rengî dane. MInaq, di roja ku kurdan li bakûrê kurdistanê xweserîya demokratik denezendin de, rayadarên tirk 12 leşkerên xwe dan kuştin û li ser wan re şîn denezendin û bi wê re xwestin ku pêşîya pîrozbahiyên denezendina xweserîya demokratik bigrin. Yanî, di her rewşeka ku xweş ku kurd ji wê dilxweşîyê bigrin, bo ku kurd dilxweşîyê ji wê rewşê negrin, hewl dane ku rewşeka bi êş çêbikin bo ku kurd wê şahîyê nejîn. Ev, weke politikayekê, hertimî rayadarên tirk, li dijî kurdan meşandina.

Serkevtina li kobanê, bo kurdan giring û dîrokî ya. Her wusa, destanaka dîrokî ya. Berxwedana kobanê, têgihiştinek di nava kurdan de çêkir. Kurd, li xwe şîyar kir. Her wusa bi wê re jî, kurd bûn yek. Ew gîyane yekîtîyekê afirî. Bi wê re jî, ew sînorên ku di nava kurdistanîyan de hatibû danîn hat bêwate kirin. Bi serketina berxwedana kobanê re jî, temenê yekîtî û bi hev re bûna kurdistanîyan pêşket. Herîşên li kobanê, bi armanca ji hevxistina kurdan û têkbirina wan bû. Lê bi serkevtina berxwedana kobanê re bi hevrebûna kurdan temenê wê afirî. Kobanê, bo navê yekîtîya kurdistanî.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî kifş bike ku ´pêvajoya çareserîyê´ ku birêz Ocalan dabû bû destpêkirin, rayadarên tirk, bo pêvajoyek weke ya bi hêrîşên DAÎŞ´ê a li kurdan re xwestin ku bi karbênin. Yanî, li şûna ku pêvajoyê di temenê çareserkirina pirsgirêka kurd re bikarbênin û gavan biavêjin, bi vî rengî xwestin ku pêvajoyê weke firsandeka ku bi wê derbeyê li kurdan bixin bibînin. Hasabên xwe li ser wê kiribûn. Piştî ku DAÎŞ jî li

ber kurdan têkçû, êdî nûha jî, nûçeyên ku ji herêmê tên ew in ku artişên Îran û tirkiya hemwaxt li dijî herêmên parastina gel û herêmên din ên kurdistanê di nava tevgerê de na. Ev tevgerîyên hemwaxt ên artişên Îran û tirkiya, wê çawa dom bike wê di rojên pêş de dîyar bibe. Lê ku mirov ji kîjan aliyê ve lê binerê, mirov dibînê ku serkevtina berxwedana kobanê hasabên rejima tirk jî û ya îranê jî xirakirina. Bi serkevtina berxwedana kobanê re jî, kurd li herêmê weke hêzek herêmê ya kifşkar derketina li holê. Kurd, wê statûya xwe bidest bixin. Serkevtina berxwedana kobanê, serkvtina statûya kurdan a li herêmê jî ya.

.

**Piştî rizgarkirin kobanê û girê-sipî, hewldanên tirkiya ên bi rengê ku di fiîliyetê de ketina rojava.**

Gotinên weke ku tên gotin ku ´wê tirkiya bikeve rojava´ de, tenê weke gotinna ku di temenê wan de dijminatîya rejimê a li kurdan dihênin li ser ziman in. Nûçeyên weke, ´YPG, ket gundê tirkmenan´, `PYD, ji DAÎŞ´ê xatertira´, `PYD, girê sipî ji tirkmen û araban paqij dike´ û hwd, gotinên weke ku bi wan dixwezin ku temenê mudahaleyekê çê bikin in. Hemû dezenformasyona ku piştî paqijkirina girê sipî ji çeteyên DAÎŞ´ê û pê de ku dihê kirin, armanca wê ku karibin temenê hinek mudahaleyna li kurdan çê bikin.

Armanca tirkiya di her çerçoveyê de ku pêşîya statûya kurdan bigrê. Pêşî xwestin ku bi DAÎŞ û qatilên DAÎŞ´î rojava û statûya wê tûna bikin. Lê dema ku ditin ku bi DAÎŞ´ê nikarin wê bikin, nûha jî dixwezin ku bixwe bikevina rojava û wê xûrixandina sîyesî ku dixwestin ku bi DAÎŞ´ê bikin êdî ew bixwe bikin. Bo vê yekê, dixwezin ku bikevina rojava de.

Li vir, di serî de divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku kurd, êdî ne ew kurdên berê na. Dema ku tirkiya bikeve rojava de, divê ku bizanibê, ku wê her çar beşên kurdistanê li hemberê wê bisekin û wê êdî ev hem bo kurdan û hem bo tirkiya bê destpêka pêvajoyek nû. Di serî de ketina rejima tirk a li rojava de, wê di destpêkê de sînorê rojava û bakûrê kurdistanê ê ku hatîya danîn were ji holê rakirin. Lê li vir, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku piştî tirkiya ket rojava, wê derketina wê nebê. Weke ku çawa di dema oparasyona li Zap´ê de bi ravînê xwe xilaskirin û vegerîyan, wê di rojava de ev şansê wê jî nebê ku bi ravê jî. Piştî ku ket rojava, divê ku sînorê di nava bakûrê kurdistanê xwe kifş bike û piştre bikevîyê de. Wekî din jî, ku rejima tirk ket rojava de, heta ku kurd dawiyê li metingerîya rejima tirk a li rojava û bakûrê kurdistanê werênin wê li hemberê wê tekoşînê bikin. Divê ku bê zanîn ku ketina rojava heya lê derketina wê tûna ya.

Dibêt ku bikeve rojava de, lê divê kubi zanibê ku piştre jî, divê ku hem

rojavayê kurdistanê û hem jî bakûrê kurdistanê li şûn xwe bihêle û vekişihê. Di serî de divê ku mirov vê yekê bin xat bike û werêne ser ziman.

Ketina rojava, ti farqê wê ji ketina amedê, wanê, Cizîra botanê, Nisêbîn, Çolemergê û hwd tûna ya. Di serî de divê ku mirov vê yekê di serî de werêne ser ziman. Rejima tirk, bi xwe jî di dema berxwedana Kobanê de dît ku çawa pêşî bakûrê kurdistanê û piştre hemû beşên din ên kurdistanê rabûn serpîyan. Wê di wê demê de jî rewş ji wê ne cudatir bê. Di serî de divê ku mirov vê yekê jî binxat bike ku bi ketina rejima tirk li rojavayê kurdistanê re, wê bigiştî temenê bi hevdû re jîyandina kurd û tirkan bi tememî ji holê were rakirin. Di serî de divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman. Heta roja, tevî hemû haqaret û bêrûmetîyên rejima tirk jî, kurd li qadan bahse ´biratiyê´ û ´jîyanek hevpar a bi hevdû re´ dikin. Di serî de, wê ev were ji holê rakirin.

Politikayên ku di temenê dijminatîya civate kurd de ku heta roja me rejima tirk meşandina, hertimî bi wan komkuji hanîna serê kurdan. Komkujiya Dersimê, komkujiya Zilanê, Komkujiya agirî, Komkujiya botanê û hwd, hê jî, weke komkujiyna ku rejima tirk hanîna serê kurdan û birînên wan şîn in. Di van komkujiyan de her yekê di wê de bi deh hezaran kurd qatil kirina. Piştî van komkujiyan, heta roja me, komkuji bênavber hanîna serê kurdan. Hertimî, politikayên dijminane ên li dijberî kurdan meşandina. Înkare statûya kurd û civate kurd, qadaxaya li ser zimanê kurdî û hwd, di vê çerçoveyê de hatina pêşxistin û di vê çerçoveyê de hêrîşî kurdan û civate kurd kirina. Her wusa, î ro, rejima tirk, di çerçoveya van politikayên dijminane ên di çerçoveya înkare kurd de bahse ´ketina rojava´ dikin. Di serî de divê ku were zanîn ku ketina rejima tirk a li rojava, wê bendê dawî jî ê wê yê bi kurdan re biqatêne. Ji xwe ti bendên wan bi kurdan re nemana. Tenê bendek maya. Ew jî, bendê metingerîyê ya. Hebûna rejima tirk a li kurdistanê û li ser serê civate kurd bi metingerî, vê bendê û rastîya wê têne ser ziman. Ev bend jî, ne bendekî bi rûmet a. Bendekî rejima tirk ê bi kurdan re ku divê ku were şermazar kirin a.

Kurd, êdî weke hêzek in li rojhilat, Bi alikarîya Îranê rejima tirk, di dema gera T. Ardogan a li Îranê de ku qasre sadabadê de hevdîtin li wir kirin, hingî temenê DAÎŞ´ê li hemberî kurdan avêtin. Hêvî dikirin ku DAÎŞ kurdan bişikêne. Lê Ya ku şikeşt, ew û zihniyeta wan ya kujar û dijmirov bû. Kurd, tevî gelek zirer û ziyanê bi serkevtinek stretejikî a dîrokî serketin. Ya ku îro rejima tirk hazm nakê û dixwezê ku bikeve rojava û wê ji holê ra bike jî, ev a.

Kurd, wê bersivê bidina hemû hêrîşên ku werina ser serê wan. Rejima tirk, divê ku vê yekê baş bizanibê. Î ro, Ku rejima tirk û artişa wê bikeve rojavayê kurdistanê de wê hemû kurd ji 7 û heta 70 salî li hemberê wê

bikevina nava tekoşînê de. Divê ku bizanibin ku wê ti carî, ketina rojava, ne şibihê ketina artişa a li Kibris´ê de. Ku artişa tirk ket rojava, wê derfeta wê nebê ku weke ku ji zap´ê ravî, ew derfeta wê jî nebê. Ketina rojava heya, lê derketina wê tûna ya.

Ji aliyê sîyesî ve jî, divê ku mirov werêne ser ziman ku, rûsya´ya ne hiştîya heta roja ku emerika jî bikeve Sûrî de, wê ti carî bixweşî pêşwazî neke ku rejima tirk bikeve Sûrî de. Her wusa, Emerika bi xwe jî, hanîya ser ziman ku ew nexwezin ku artişa tirk bikeve Sûrî de. Heta roja me, rejima tirk, li ser DAÎŞ´ê, ´cebetil-nasr´ û hwd re, ew mudahale li rojava û Sûrî dikir. Ji ber wê yekê ya ku her cûre alikariyê rejima tirk dide DAÎŞ´ê. Ji ber ku bendewarîya wê ew bû ku DAÎŞ, derbeyeka dîrokî li kurdan bixê. Lê wan derbeyek dîrokî li kurdan nexist. Lê bi DAÎŞ´ê re, hêzên weke tirkiya ku li piştî DAÎŞ´ê na, şikeştinek dîrokî xwarin. Ku Artişa tirk bikeve sûrî de, wê ew şikeştin, bê şikeştin û derzek di nava kurd û tirkan de jî. Piştî wê re, êdî tenê ya ku li pêşîya rejima tirk û artişa wê dimênê ku hem ji rojavayê kurdistanê û hem jî ji bakûrê kurdistanê xwe û hêzên xwe vekişêne. .. Ketina artişa tirk li rojava, wê ne tenê sînor di nava rojavayê kurdistanê bikişêne, wê sînor di nava bakûrê kurdistanê û tirkiya de jî bikişêne. .. .

**Di dewama van nîqaşan de vegûheztina tirba ´şah suleyman´ li gundê eşmê û niyet û armancên di temenê wê de.**

Ji destpêka mudaheleya li Sûrî ve di rojava tirkiya de avakirina herêmek tampon heya. Armanca bi vê herêma tampon jî, ew a ku wê çawa pêşîya pêşketina kurdan û statûya wan li herêmê bigrê ya. Mantiqê ´herêma tampon´, ew a ku wê çawa pêşîya kurdan bigrin a. Weke ku çawa heta roja me li ser axa başûrê kurdistanê rejima tirk leşkerên bicihkirina, li rojavayê kurdistanê jî xwestin ku wê bikin. ´Vegûheztina tirba şah suleyman li eşmê´ û her wusa weke karakol avakirina wir, di çerçoveya zihniyetek bi vî rengî de ya. Em î ro, di çerçoveya nîqaşên avakirina herêmek tampon de baştir fahm dikin ku ji ber çi vegûheztina tirba şah suleyman li eşmê hatîya kirin. Piştî ku hêzên kurd li Kobanê û herêmên din, çeteyên DAÎŞ´ê têkbirin û pê de, rayadarên tirk weke bergir(´tedbîrek´)ek leşkerî projeya vegûheztina tirba şah suleyman pêşxistin. Madem kû armanc "parastin"bû, çima, ne gûheztina li nava tirkiyê, lê di nava sînorê rojavayê kurdistanê li eşmê hiştin? Dema ku karibin vegûhêzên li eşmê, wê çaxê wê karîbûn ku tirba şah suleyman vegûhêzên li tirkiya bixwe jî. Lê ev nekirin. Ji ber ku ev projeyaka leşkerî ya di çerçoveya politika û hewldana ´avakirina herêmek tampon´ de ev hatîya kirin.

Piştî ku li başûrê kurdistanê jî, kurdan statûyek bidest xist, rayadarên

tirk, hêzên xwe şandina li wir. Li herêmên weke ´kanîmasî´ û hwd, ji salên 1993´an ve li wan hinek leşkerên tirk li ser axa başûrê kurdistanê hena. Bi wan leşkeran rêveberîya tirk, dixwezê ku rêveberîya başûr jî ´kontrol´ bikin. Kî çi bêje bila bibêje, lê li başûrê kurdistanê hebûna leşkerên tirk, bi armanca çêkirina temenê hêrîşan li kurdan, çêkirina tehdîdê li ser serê rêveberîya kurd û hwd a. Nûha jî, dixwezin ku bi projeya şah suleyman û vegûheztina wî re heman rewşê li rojavayê kurdistanê jî pêş bixin. Dema ku ya ku rejima tirk bo kurdan dihizirê ku nemirovane bê, ya ku wê bibê jî wê ev bê. Nûha jî, dixwezin ku li rojavayê kurdistanê li herêmên weke Ezazê û cerablus´ê vê çê bikin. Bi teybetî, herêma ezazê, dixwezin ku di bin navê ´herêmek ewla´ de li wir ´herêmek tampon´ çê bikin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, bibêje ku hanîna ´tirba şah sûyleyman li eşmê´ jî, divê ku mirov di çerçoveya vê têgîn û politikaya rejima tirk a bi armanca avakirina herêmek tampon de fahm bike. Her wusa, li vir, divê ku mirov bibêje ku ev herêma ku qaso tirba şah suleyman hanînê de, weke herêmek ku di Keve nava sînorê rojavayê kurdistanê de ya û weke herêmek ´stretejikî´ ya. Di vê rewşê û demê de tirba şah suleyman´, di rewşa wê leşkergeha ku li başûrê kurdistanê ku ji sala 1993´an ve ku tirkiya avakirîya de ya. Dema ku destûr û fersend ne dîtin ku weke ku hin hêncet çêbikin ku weke ku bi wê leşker şandina li başûrê Kurdistan ku bi wê şênina li rojavayê kurdistanê, êdî weke îcateka leşkerî ´vegûhaztina tirba şah suleyman´ çêkirina û rojevê de. Ti kesek nikarê vê rewşa vegûhaztina tirba şah suleyman li eşmê, weke rewşek asayî û sivîl û "bo parastinê" bide nîşandin. Ankû ti kesek, nikarê weke rewşeka bi armanca parastina tirba şah suleyman jî bide nîşandin. ...

Li vir, ev rewşa bi vegûhaztina ´tirba şah suleyman´ re jî, di vê çerçoveyê de bi hewldan, nîqaş û hanîna li ser ziman a ´avakirina herêmek tampon li ser axa rojavayê kurdistanê de divê ku mirov li wê bihizirê û wê werêne ser ziman. Ji xwe, rewşek leşkerî a di vê çerçoveyê de ya. Di destpêka mudahaleya li Sûrî û rojavayê kurdistanê de, hizir kiribûn ku wê bi bergirên xwe yên leşkerî ên weke DAÎŞ´ê û hwd re ku wan girtibûn wê karibin bi serkevin. Ji destpêka mudahaleya li Sûrî û heta pêvajoya hêrîşên çeteyên DAÎŞ´ê ên li ser şengal û kobanê jî, ne di rojevê de bû ku tirba Sah suleyman vegûhêzên li gundê eşmê. Lê kengî ku DAÎŞ li kobanê û li gelek deverên rojava ji aliyê hêzên kurdan ve hat şikandin û têkbirin û pêde, weke "bergir(´tedbîr´)reke leşkerî" vegûheztina tirba şah suleyman pêşxistin. Piştre jî, bi teybetî, alikarî dana çeteyên DAÎŞ´ê ku ew karibê herêmên rojava ên weke girê-sipî û Sîrîn û hwd, cihên stretejikî ku di destê xwe de bigrê. Dema ku ev herdû herêm jî di dawîya dawî de hatina rizgarkirin ji

destê DAÎŞ´ê, êdî bi tememî dorpêça li kobanê jî hat şikandin. Piştre jî, tenê herêmek ma. Ew jî, herêma cerablus´ û ezazê ya. Rayaderên tirk, dema ku hêzên kurd YPG´ê û YPJ´ê gihiştin bersînorê cerablus û ezazê ku van herêman jî rizgar bikin ji destê DAÎŞ´ê, êdî di cih de wan jî li herêmên xwe yên sînor ku dikevine dehma van herêmên rojavayê kurdistanê ên weke ezazê, cerablus´ê û hwd de leşker li wan bicih kirin.

Armanca rayadarên tirk a vê leşker bicihkirina li vê herêma bersînorê ezaz û cerablus´ê çi bû? Armanc, ew bû ku bikin ku pêşîya rizgarkirina cerablus û ezazê ku ji destê DAÎŞ´ê bigrin. Di aslê xwe de, dema ku cerablus û ezaz jî werina rizgarkirin ji destê çeteyên DAÎŞ´ê û hwd, wê politikaya rejima tirk a bi navê ´herêma tampon´ ku bi wê ´vegûheztina tirba şah suleyman´ jî kir, wê têkherê. Bo vê yekê, di aslê xwe de mirov dikarê bombardimanên rejima tirk ên ku li qandilê û bakûrê kurdistanê jî, hinekî jî mirov dikarê bi armanca xilaskirina vê politikaya xwe ya li ser rojava jî, werêne ser ziman.

Li vir, divê ku mirov vê yekê baş fahm bike ku piştî şikandina DAÎŞ li kobanê û herêmên din ên rojava, êdî rayadarên tirk, bidest hizirkirina li bergir(´tedbîr´)ên leşkerên ên weke bi vegûheztina tirba şah suleyman li eşmê´ kirin. Her wusa armanc, ew a ku ew li herêmeka ku karin û wê biparêzên û ankû bandûrê lê bikin, nûqteyeka leşkerî li ser axa rojavayê kurdistanê çê bikin. Di vê çerçoveyê de ew herêma ku tirba şah suleyman vegûheztinê´ de, kirina herêmek leşkerî û li wê qarakola leşkerî a artişa tirk avakirina.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku tirkiya hemû hêza xwe dike dewrê de ku cerablus û ezazê di destê çeteyên DAÎŞ û cebetil-nasr´ de bihêle. Ji xwe, ev çete jî, weke ´kontrayên wê yên salên 1990´î ên ku rejima tirk li bakûrê kurdistanê bikardihanîn in.

**Li vir, divê ku mirov vê yekê jî baş fahm bike û werêne ser ziman ku tirkiya dixwezê ku herêmek tampon çê bike ku bi wê karibê pêşîya statûya kurd li rojavayê kurdistanê bigrê. Bergirên ku di çerçoveya vê têgîn û gotina ´herêma tampon´ de ku tên girtin, ew in. Yek; vegûheztina tirba şah suleyman bû. Du; hewldana biçekkirin û li hemberî kurdan bikarhanîna tirkmenên li rojavayê kurdistanê û li herêmên din ên Sûrî na. Her wusa weke ya bergira sêyem jî, hinek kurdên ku aligirên malbata Berzanî, Nêçîrwan berzanî, ENKS` û hwd jî hena ku rejima tirk di vê çerçoveyê de wan li hemberî kurdan û li dijî statûya rojavayê kurdistanê bikardihênê na**.

Rayadarên tirk, di hevdîtinên xwe yên bi rayadarên Amerikî re de jî mijara ku pirr zêde li ser wê diaxifin, miijara avakirina ´herêmek tampon´ a.

Di berdêla bikarhanîna balafirgeha ´incillik´ê a ji aliyê balafirên Amerika ve de jî, ji rayadarên tirk bi teybetî ji rayadarên Emerikî xwestina ku alikariyê bidina ku herêmek tampon li herêma ezaz û heta cerablus´ê ava bikin. Her wusa, di dema bakirina civîna NATO û civîna wê de jî, di wê de ya ku herî zêde rayadarên tirk li ser wê axiftina, avakirina herêmek tampon û alikarîya bo wê ya. Di vê çerçoveyê de jî, hêrîşî kurdan dikin. Rayaderên tirk, ew pêla bombardimanan a li ser Qandilê û li bakûrê kurdistanê ku piştî komkujiya li Pîrsûsê ku dan destpêkirin jî, bi armanca vê politikaya rejima tirk a bi navê ´avakirina herêmek tampon´ bû. Komkujiya li Pîrsûsê, weke komkujiya ku DAÎŞ´ê kirî lê ku rayadarên tirk kirîya hêncet ku bi wê hêrîşî kurdan bikin a. Kurd jî û hêzên kurdan jî, ev sê sal zêdetirin ku şer û tekoşînek giran bi DAÎŞ´a ku alikarîya tirkiya ji wê re heya re dikin.

**Piştî vegûhaztina tirba ´şah suleyman´ û rizgarkirina girê-sipî û pê de, gotinên weke ´Paqijkirina etnîkî´ hatina hanîn li ser ziman. Ev jî bi armanc bû.**

Gotina ´paqijkirina etnîkî´, piştî ku YPG´ê girê sipî ji destpê çeteyên DAÎŞ´ paqij kir û pê de, ji aliyê tirkiya ve hat gotin. Rayadarên tirk, digotin ku "YPG´ê li girê sipî, paqijîya etnîkî dike." Bêgûman ev gotin ne rast bûn. Ev gotin, gotinna ku rayadarên tirk, bi wan dixwest ku temenê mudahaleyna xwe yên ku bi artişa xwe bê û ankû bi alikarîya ku dide DAÎŞ´ê û hwd ku bi wê ser binûxûmêne, dihanî ser ziman. Ev gotina ´paqijkirina etnîkî´, weke gotineka ku divê ku mirov pirr baş li ser wê bisekinê. Rayadarên tirk, mirovên dawî na ku gotina ´paqijkirina etnîkî´ bilêv bikin in. Ji ber ku ji xwe, DAÎŞ´ê bi alikarîya wan, li rojavayê kurdistanê paqijîya etnîkî armanc kir. Li musilê û şengalê, komujiya ku hat hanîn li serê kurdên êzîdî, divê ku mirov weke ´paqijîya etnîkî´ werêne ser ziman. Her wusa, di destpêka salên 2014´an de, dema ku bi alikarîya tirkiya, çeteyên DAÎŞ´ê ketina girê sipî de, pirranîya kurdên li girê sipî, ji girê sipî hatina dersînor kirin. Ji malên wan hatina derxistin.

Şerê ku bi DAÎŞ´ê ku li rojavayê kurdistanê û li başûrê kurdistanê li hemberê civate kurd hatîya meşandin, şerê ´paqijîya etnîkî´ jî ya. Her wusa,, mirov dikarê, vê şerê DAÎŞ´ê, weke şerê paqijîya etînîkî´ jî werêne ser ziman. Komkujiya li şengalê ku hat hanîn li ser kurdên êzîdî û her wusa li rojavayê kurdistanê û bi teybetî li kobanê ku hat hanîn li serê civate kurd, mirov dikarê bi ´paqjiya etnîkî´ re werêne ser ziman. DAÎŞ´, bixwe jî, şerê paqijîya etînîkî bi kurdan re dimeşêne. Di destpêka ku çeteyên ´cebetil-nasr´ û piştre DAÎŞ´ê ku bi dest şerê bikurdan re kirin, digotin ku "qatle kurdan, ´helal´ a". "Dest avêtina mal, jin û canê kurdan, ´helal´ a". Ev gotin, bixwe jî, gotin ji devê çeteyên DAÎŞ´îyan dihat gotin û rayadarên tirk jî, heta

vê kêlîkê jî, alikariyê didina van çeteyên DAÎŞ´ê ku herina bi ser kurdan de.

Li kurdistanê, li her çar beşên kurdistanê, şerê ku bi kurdan û civate kurd re dihê dayîn û meşandin, mirov dikarê weke ´şerê paqijîya etnîkî´ jî werêne ser ziman. Ku mirov li ser wateya gotina ´paqijîya etnîkî´ re herê û werêne ser ziman, mirov dikarê bibêje ku rejima tirk, li bakûrê kurdistanê jî, bi rê û rêbazên cûda li ser serê civate kurd dihê meşandin. Ev şerê ku ev 40 sale ku rejima tirk bi kurdan re dimeşêne, li bakûrê kurdistanê û hê jî ku bi kurdan re dide meşandin, mirov dikarê weke şerê ´paqjiya etnîkî´ jî werêne ser ziman. ..

Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku dema ku zimanê civatekê were qadaxa kirin, hebûna wê were înkarkirin, û li hemberê wê "şerê tûna kirinê" ku li ser serê wê werê meşandin, mirov dikarê hingî bahse şaqijîya etnîkî bike. Rêbazên ku DAÎŞ´ê î ro li hemberê kurdan di komkujiyên kurdan de bikardihêne, rêbazên ku jenosîdê ku artişa Sirbistanê ku li hemberê ´Bosna-hersekî´yan bikardihanî bû. Ev rê û rêbazên jenosîdê, pirranîya wan, rejima tirk, li bakûrê kurdistanê bi rê û rêbazên cûda li hemberê kurdan bikarhanî ya. Dema ku li ser van rêbazên ku DAÎŞ bikardihêne, mirov dikarê, bibînê ku di hemû komkujiyên ku rejima tirk, weke ku li bakûrê kurdistanê kirina ên weke ´komkujiya dersimê´, ´komkujiya agirî´, ´komkujiya botanê´ hwd de bikarhanîya. Her wusa, rejima baasê a Saddam jî di komkujiya helebçê de, heman rê û rêbazên jenosîdê, di paqijîya etnîkî´ a ku li başûrê kurdistanê meşand de bikarhanî.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku hemû şerê ku rejima tirk li bakûrê kurdistanê bi kurdan re dide, rejima îranê li rojhilatê bi kurdan re didê û rejima baasa îraqê ku bi kurdan re dida û piştre jî, ku li rojavayê kurdistanê û li başûrê kurdistanê bi destê DAÎŞ´ê hatîya domandin, mirov dikarê di vê çerçoveyê de weke ´şerê paqjîya etnîkî´ ku li hemberê civate kurd û xalkên din ên li kurdistanê ku hatîya meşandin a. Yekî ku dîroka rejima tirk û şerê yê bi kurdan re lê bikolê, wê dîroka wê, weke dîroka paqjîya etînîkî a li bakûrê kurdistanê bibînê. Her wusa, bi wê re bi sînor nemaya û li rojavayê kurdistanê û beşên ên kurdistanê jî bikurdan re bi heman zihniyetê şer bi kurdan re hatîya dayîn, kirin û domandin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê, werêne ser ziman ku gelê kurd, li rojavayê kurdistanê tekoşîna maf û azadîya xwe û parastina hebûna xwe didin. Her wusa YPG´ê, weke hêza parastinê ya kurdistanî ya vê parastinê ya. Her wusa, li hemberî çi parastinê dike? YPG´ê, li hemberî paqijîya etnîkî a ku li hemberî civate kurd ku rojavayê kurdistanê dihê meşandin, weke hêza parastinê ya. Her wusa, hêzên ku vê paqijîya etnîkî, li hemberî kurdan û li ser serê kurdan ku dimeşênin, ku rabin û kurdan bi ´paqjîya etnîkî´

´tawanbar´ bikin, mirov dikarê tenê wê bi armancên wan paqijîya etnîkî re werêne ser ziman. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku şerê ku rejima tirk, li bakûrê kurdistanê bi artişa xwe dimeşêne, çêkirina wan qarakol û bendavên bi armanca leşkerî, talankirina çanda civatî a herêmê û her wusa bi qadaxaya li ser ziman re meşandina pêvajoyên bişavtinê li ser wê civatê, ´paqjiya etnîkî´ a ku rejima tirk dimeşêne, dihêne ser ziman.

Her wusa, yekî ku dema ku DAÎŞ´ê şengal û musilê bi paqijîya etnîkî de bûhûrand û bi hazaran kurd qatil kirin ku bêdeng man û dema ku kurdan (hêzên YPG û YPJ´) girê sipî ji destê DAÎŞ rizgarkkir ku bahse ´paqjîya etnîkî´ bikin, çendî dikarin, bahse mirovatiyê bi navê xwe re bikin?

Her wusa, rewşa şengalê jî, musilê jî û rewşa kobanê û herêmên din ên rojavayê kurdistanê jî li holê li berçav a. Li hemberî kurdan hê jî, şerê paqijiya etnîkî´ didomê. Hêrîşên li rojavayê kurdistanê ku bi alikarîya rejima tirk dihên domandin, divê ku mirov weke hêrîşên ku bi armanca paqjiya etnîkî werêne ser ziman. Civateka ku di bin hêrîş û şerê paqijîya etnîkî de bê, û hêzên ku wê diparêzên ku ew parastina wan, bi vê gotinê werê hanîn li ser ziman, mirov dikarê tenê armancekê di temenê wê de kifş bike. Her wusa, ew jî ev a ku dihê ji kurdan re dihê gotin ku ´şerê paqijîya etnîkî´ li hemberî wê dihê meşandin û win jî li hemberî wê serê xwe bitawênin. Ev ji kurdan re dihê gotin.

Yên ku piştî rizgarkirina girê sipî ku ji destê DAÎŞ´ê ku gotin ku "paqijîya etnîkî´ li hemberî kurdan dihê meşandin, her wusa, wê şerê paqijîya etnîkî ku heta wê demê li ser serê civate kurd meşandina, xwestina ku bi wê gotinê ku karibin biveşêrên. Oparasyonên ku artişa tirk li bakûrê kurdistanê meşandina û dimeşêne, mirov dikarê di çerçoveya ´şerê paqijîya etnîkî´ de şîrove bike, fahm bike û werêne ser ziman.

Li rojavayê kurdistanê, şerê ku bi kurdan re dihê meşandin, ji du aliyan ve mirov dikarê wê werêne ser ziman. Aliyekî vî şerî ew a ku dixwezin ku bi komkuji û tafisandinê bikina bidest de. Aliyekî din ê duyem jî, ew a ku dixwezin ku bi wî şerê ku bi kurdan û civate kurd re dimeşênin, rojavayê kurdistanê bêmirov bikin. JI xwe, di ancama wî şerê ku li rojavayê kurdistanê hatîya meşandin de, ser milyonan re kurdistanî ji cih û warên wan hatina goçberkirin. Tenê ku mirov li vê goçberkirinê û rengê wê binerê jî, mirov dikarê bibêje ku ev ´paqijîya etnîkî´ ya.

Rejima tirk a ku li hemberê kurdan û civate kurd şerê paqijîya etnîkî´ dimeşêne, piştî ku YPG`ê girê sipî ji destê DAÎŞ´îyan rizgar kir û pê de, got ku ´li wir paqijîya etnîkî´ dihê meşandin. Her wusa, gotin ku ´kurd, li hemberî kurdan û tirkmenan, paqijîya etnîkî dimeşênin. ´ Ev gotin, ne rast bûn. Lê vajî wê, ev gotin, dema ku dihêne bikarhanîn, ser paqijîya etnîkî´ ku

heta roja me jî rejima tirk li bakûrê kurdistanê dimeşêne, dinûxûmêne. Yan jî, bi armancaka di vê çerçoveyê de dihên bikarhanîn. Her wusa, heta roja me jî, ev paqijîya etnîkî, li hemberî kurdan dihê meşandin. Herî dawî, li rojavayê kurdistanê, yên ku vê gotinê bikardihênin, hê jî, ´paqijîya etnîkî´ dimeşênin. Bi sedhezaran kurd, ji rojavayê kurdistanê, ji ber ku kurd in hatina goçberkirin. Her wusa, mirov dikarê vê rewşê jî, weke rewşeka ´paqijîya etnîkî´ werêne ser ziman.
.

**Di dewama van herîşên li ser rojava û konsepta wê ya şer a li bakûrê kurdistanê de lîstika dûyemin a ´rehîne´ girtinê ´ bo çêkirina hênceta bo ku ne şerkirin û ne hêrîşkirina li DAÎŞ´ê hat pêşxistin.**

Nûçeya ku 2´ê êlûna 2015´anê de ku hat di wê de dihat gotin ku, "16 karkerên ku tirk, hatina revandin." Ev bûyar, bûyara rehîneyê ya balyozxaneya tirkiya a li Musilê dihêne berbîra me. Di wê demê de jî, hatibû ser ziman ku ´ew rehîne girtina 49 karkerên balyozxaneyê ji aliyê DAÎŞ´ê ve di çerçoveya levkirina DAÎŞ´ê û tirkiya de hatibû kirin.´ Tirkiya, di qada navnetewî de û di dîplomasîya ku kir de ev bûyar jî, pirr zêde bikarhanî bû. Hata ku di wan rojên ku wê ew bihatan berdan de di civîna NATO de jî dema ku ji wê hatibû xwestin ku tevlî koalisyonê bibê û li hemberê DAÎŞ´ê şer bike de tirkiya, ev karkerên balyozxaneyê ku weke ´rehîne´ ku digot ´ew dil hatina girtin, weke hêncet hanîbûbû ser ziman. Lê piştre hin bi hin derketibû li holê ku ev bûyar, di ancama levkirina DAÎŞ´ û tirkiya de a bi hevdû re de hatîya kirin. Dema ku weke andamekî NATO ji tirkiya dihat xwestin ku li hemberî DAÎŞ´ê şer bike jî, tirkiya ev bûyar weke hêncet dida nîşandin û digot ku ´ez nikkarim. ber ku jîyane wan karkerên balyozxaneyê di Keve xateriyê de´.

Piştre, bi awayekî vekirî hin bi hin derket li holê ku ev karkerên Balyozxaneyê, di ancama levkirina rayadarên tirk û DAÎŞ´ê de li Musilê hatina ragirtin. Piştre, di rojên piştre de ku hin bi hin rastîya vê leyistika di nava rayadarên tirk û DAÎŞ´ê de ku li ser wê ku hat nîqaşkirin û hin bi hin rastîya derdiket li holê, êdî tirkiya, di cih de hanî rojevê ku ´DAÎŞ´ê, karkerên wê berda na." Ev bûyara bigûman, weke politikayaka ´hêncet çêkirinê´ ku hatibû pêşxistin. Hênceta ne ketina nava koalisyonê de bû. Hênceta ku nekeve nava koalisyonê û bi wê pêşîya wê bigrê ku ji wê were xwestin ku ew hêrîşî DAÎŞ´ê bikê bû. Dema ku di wê demê de ji tirkya dihat xwestin ku ew bikeve nava koalisyona li dijî DAÎŞ´ê de tirkiya, ew karker weke hêncet dabûbûn nîşandin. Î ro jî, dema ku ji wê tê xwestin ku ´divê ku tevlî koalisyonê bidest bombardimana li çeperên DAÎŞ´ê bike de, wusa xûya dike ku wê hênceta 16 karkerên ku li Baxdadê weke ´rehîne´ hatina revandin

bide nîşandin. Lê dema ku navê kurdan weke ´hevkarê giring ê koalisyona li dijî DAÎŞ´ê´ hat rojevê, êdî rayadarên tirk jî herêkiribûn ku bikevina nava koalisyona li dijî DAÎŞ´ê de. Lê dîsa ti tişt li hemberî DAÎŞ´ê nekiribûn. Vajî wê, rayadarên tirk, bi DAÎŞ´ê re di nava hevkarîyekê de bûn û her cûre alikarî didana wê ku derbeyekê li kurdan bixe. DAÎŞ, ji xwe bo armancaka bi vî rengî û dîzaynkirinaka li herêmê weke rêxistina şer û kontra hatibû pêşxistin.

Piştre, Tirkiya û rayadarên wê, dîtin ku ew êdî nikarin zêde bi vî rengî politikaya xwe bi rêve bibin. Her wusa, êdî piştî wê re bahse ´şerê bi DAÎŞ´ê re´ kiribûn. Lê DAÎŞ jî, ji rêxistinekê zêdetirî, weke pêvajoyek û konseptek şer ya ku li giştîya rojhilat li hemberî civate kurdistanê hatibû pêşxistin bû. Bo vê yekê, rayadarên tirk, ne dixwestin ku DAÎŞ, were şikandin. Her derbeyên ku kurdan li DAÎŞ´ê xistin, tirkiya ti êşand. Piştî ku di demên dawî de ku li ser bikarhanîna balafirgeha ´incillikê´ ji aliyê Amerika ve ku peyman hatibû çêkirin û pê de, ji tirkiya dihat xwestin ku li hemberî DAÎŞ´ê şer bike. Lê tirkiya ev ne dixwest. Ji ber ku wê dixwest ku DAÎŞ bimêne bo ku li hemberî kurdan şer bike.Bo ku pêşîya xwe bixwe bigrê ku weke ku ji wê dihê xwestin ku ´çeperên DAÎŞ´ê bombabardiman bike´, diket nava çêkirina ´hêncetan´ de. Di rewş û demeka bi vî rengî de nûçeya ´rehîn girtina 16´ karkerên tirk li Îraqê´ tê û dikeve rojevê de.

Her wusa, ´rehîn grtina 16´ karkerên tirk´, mirov dikarê weke politikaya ku bi wê dixwezin ku kurdan bombardiman bikin û weke ku di nava gotinên xwe de dibêjin ku ´wê DAÎŞ´ê bombardiman bikin´ ku pêşîya wê ji aliyê xwe ve bigrin. Dakû, bibêjin ku ´meyizênin, em nikarin DAÎŞ´ê bombabardiman bikin, bo ku karkerên me weke ´rehîn´ di destê wê de na û ´jîyane wan di xaterîyê de ya.´ Her wusa, ew politikaya di destpêka ku bi alikarîya tirkiya DAÎŞ´ li musilê hat bicihkirin de dixwezin ku bi rengekî din di vê çerçoveyê de li ser ´politikaya rehîn girtina karkeran´ re bidina domandin. Lê li aliyekî din jî, bi awayekî ku bi hêrîşên DAÎŞ´ê ên li kurdan di ahengekê de ew kurdan bombabardin bikin û bi vî rengî ancamakê bidest bixin. Bi gotinaka din, ev politikaya ku tenê bi wê hêrîşî kurdan bikin û bombardiman bikin a.

Dibêt ku gelek ji wan karkerên ku hatina ´revandin´, heya wan ji ti tiştî tûna ya. Ew tenê, çend mirovên ku pey nakê xwe ketina. Bo ku dabara malbata xwe bikin çûna wir. Lê divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku ev devera ku tê gotin ku ji wir ev karker hatina revandin, ji gelek milletên din mirov kar dikin. Ji xwe, bi teybetî, ji bajarên bakûrê kurdistanê, weke karker, bi hezaran mirov hertimî diçina başûrê kurdistanê û herêmên din ên Îraqê. Çawa dibê ku diçin û van mirovên ku xwediyê pasaporta tirkiya

na, dinaqênin û wan bêastengî bi xwe re dibin. Ev pirsên bigûman, rewşa rewşa dilgirtina 49 karkerên balyozxaneya tirk a li Musilê dihênina bîra mirov.

Ji vê rewşê mirov çi dike ku fahm bike? Tişta ku mirov fahm bike, ew a ku rejima tirk, dixwezê ku konsepta xwe ya şer a li ser serê kurdan bi oparasyonên sîyesî, leşkerî ên bejehî û hewayî bidina domandin. Lê bi wê re jî, pêşîya xwe bixwe bigrê ku weke ku ji wê tê xwestin ku çeperên DAÎŞ´ê bombardiman bikê, ku bo ku wê nekê dike ku hêncetekê bo xwe bide çêkirin. Yanî bi gotinaka din, ew bixwe, di vê çerçoveyê de hênceta xwe dixwezê ku çêbikê bo ku dema ku ji wan hat xwestin ku çeperên DAÎŞ´ê bombardoman bikin, ku ew bibêjin, ´meyîzênin, di destê wan de karkerên me weke rehîn hena´ em nikarin vê bi hesanî bikin. Her wusa, hinekî li ser vê rewşa bi ´sîyeseta balafira incillikê´ re ku karibin, rewşa xwe êdî bidina derbas kirin. Dixwezin bidina gotin ku ´dema ku em wê bikin, wê wan(´rehîne´yan) bikujin´ û hwd. Di vê çerçoveyê de politikayekê dimeşênin. ..

Wusa tê dîtin, heta ku karibin ku bi mirovan bidina bawerkirin, ku wê vê politikayê bidina domandin. Wê 16 karkeran di destê wan de weke ´rehîna´ hinekî bidina hiştin. Lê weke leyistika wan ya pêşî a ´rehîneyên balyozxaneya li musilê´ ku li ser wê re ´propaganda´ xwe dikirin, ku dîtin ku wê nikaribin wê politikayê bidina domandin, yan wê karkerên xwe bidestê DAÎŞ´ê bidina kuştin û yan jî wê bidina berdan weke care pêşî. Li vir, pirr giring dibê ku bo parastina jîyane van mirovan ku bê parastin, divê ku saziyên sîvil, rastîyê bibînin û rastîya politikayên rejimê ên şer teşîr bikin û hertimî bi vî rengî jîyane van karkeran di rojevê de bihêlin. Lê ku ev nebê, rayadarên tirk ku ti carî giringîyê nadina jîyane mirov, dikarin siba, wan 16 karkeran bidina qatil kirin û li ser wê re sîyesetê bikin. ..

.

**Navê teorîya dema a şer ya rejima tirk a bi kurdan re; ´pirsgirêka kurd, tûna ya´ ya.**

Piştî newroza 2015´an û pê de, piştî ku nameya birêz Ocalan hat xwandin û pê de, rayadarên tirk ku di serî de T. Ardogan, bidesg hanîna li ser ziman a

´pirsgirêka kurd tûna ya´ kirin. Ev gotin, weke navê konsepteka nû ya şerê rejimê a bi kurdan re jî ku di warê sîyesî, leşkerî, dîpomatîkî û hwd ku li hemberê kurdan bikê jî dihêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de bidest hanîna ser ziman dikin ku "pirsgirêka kurd, hatîya çareser kirin.", "me trt-şeş, vekir", "´ zanîngehan de, me kursî vekirin" û hwd, bi gotinan dixwezin ku temenê vê konsepta şer ya bi civate kurd re ku di demên pêş de bi meşênin biafirênin. Heta roja me, di vê çerçoveyê de li ser înkare kurda, rejima tirk sîyeset kirîya û di wê çerçoveyê de şerê ji dîrokê birina civate kurd bi wê re daya. BI gotinaka din, şerê jenosîde, bi kurdan re kiriya. Em divê ku ji destpêka komarê, hemû şer, sefer û oparasyonên rejima tirk ku li kurdistanê li ser serê civate kurd kirina, di çerçoveya têgîna jenosîdkirina civate kurd werênina ser ziman.

Dema bi dem di vê şerê jenosîdkirina civate kurd de, sîyeset û ankû dîplomasî di çerçoveya "înkara kurd" de derxistina li pêş. Dem bi dem, li ser çapameniyê re şerê teybet meşandina. Dem bi dem jî, bi oparasyonên leşkerî û hwd, ev meşandina. Lê hertimî zihniyet heman zihniyeta bûya. Wê çawa kurdan, ji dîrokê bibe. Wan bike tirk, di wê çerçoveyê de tevgerîya ya. Her wusa, ji xwe, divê ku mirov qadaxaya li ser zimanê kurdî, di vê çerçoveyê de werênina ser ziman. Gotinên weke " "me trt-şeş, vekir", "´ zanîngehan de, me kursî vekirin" û hwd jî, gotinên ku li ser rastîya qadaxaya li ser zimanê kurdî binûxûmênin. Her wusa, tenê hinek nêzîkatiyên demkî ên xapandinê na. Bi wan, nêzîkatîyan, wê çawa demê qizinc bikin, pêşa tekoşîn û bertekên ji civate kurd bigrin û hwd, bi wê armancê hatina pêşxistin in.

Piştî, newroza 2015´an, T. Ardogan, derdikeve berçapameniyê û dibêje ´pirsgirêka kurd, tûna ya´. Ev gotin, rastîya wê, ew a ku dixwezin ku kurdan, wê çawa bêstatû bihêlin û wê bi demê re wan bikina tirk, di wê çerçoveyê de dihê gotin. Her wusa, bi wê re jî, wê pêvajoyaka din ya şer, bi tekoşîna azadîya gelê kurd re bidina destpêkirin ûû bibêjin "em şer li dijî terorê dikin." Di vê çerçoveyê de, weke ku temenê pêvajoyna din ên şer ên bi civate kurd re diafirênin. Gotinên rayadarên tirk, ên ku di çerçoveya hilbijartinan de bin û ankû li ser saziyên dewletê re bin, di vê çerçoveyê de na.

Ji xwe pêvajoya çareserîyê redkirina. Êdî, bi tememî ji bo xwe xilas kirina. Gotinên T. Ardogan, ên weke "masa tûna ya", "muzakare tûna ya", "pirsgirêka kurd tûna ya" û hwd, ku mirov li dûv hevdû rêz dike û li wan dihizirê, di vê çerçoveyê de mirov rastî, têgînekê tê. Her wusa, di vê çerçoveyê de şerê rejimê ê bi înkare kurdan û bêstatû kirina wan û her wusa jenosîdkirina wan, di vê çerçoveyê de bi konsepta wê ya şer a bi navê ´pirsigirêka kurd, tûna ya´ divê ku mirov werêne ser ziman. Bi gotinaka

din, navê teorîya şer a rejima tirk a di demê de bi kurdan re; ´pirsgirêka kurd, tûna ya´ ya.

. Pêvajoya çareserîyê, dema ku birêz ocalan da destpêkirin, ev rewş û bertekên rayadarên tirk ên weke T. Ardogan ku bi nîjadperestî ku bide nîşandin jî hasab kiribû. Di vê çerçoveyê de li wê hizirî bû. Di destpêka pêvajoya çarserîyê de, ´çêkirina destûreka nû´ di rojevê de bû. Wusa dihat ser ziman, ku wê li ser çêkirina ´destûra bingihîn a nû´ bi levkirinê re wê pêvajo bê domandin. Lê piştî ku pêvajo, destpêkir û pê de, nîqaşên çêkirina destûra bingihîn ji aliyê T. Ardogan û hikimeta wî ve ji rojevê derxist. Ew rewşa wê demê ku pêşî digotin ku wê li ser ´destûra binghîn levkirin bêkirin û wê pisgirêka kurd li wir were çareser kirin, dawî li nîqaş wê hanîn, dişibihê nîqaşên piştî newroza 2015´an de ku gotinên T. ardogan ên ku bi wan digot ku "pirsgirêka kurd, tûna ya", "masa tûna ya", "alî tûna ya" ya. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku di wê demê de jî, T. Ardogan, di vê çerçoveyê de pêvajo xirakiribû.

Gelek mirov dibêjin ku "ma birêz Ocalan, rejimê û zihniyeta wê nasnekê ku hertimî ew gavan diavêje lê rejim û hikimeta wê di çerçoveya pirsgirêka kurd de ti gav neavêje." Bêgûman, birêz Ocalan dizanî. Lê li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku pêvajo, tenê li ser milê kurd meşîya ya. Rayadarên tirk, pêvajo, di salên buhurî de jî, tenê bi tekoşîna çekdarî re bi sînor dîtina. Hizirîna ku dema ku tekoşîna çekdarî, dawî lê were, wê êdî ji pirsgirêka kurd xilas bibin. Li vir, di mejiyê ti rayadarên tirk û û hwd, radestkirina maf û azadîya civate kurd û nasîna statûya civate kurd tûna ya. Di vê çerçoveyê de nêzî pirsgirêkê dibin. Ev nêzîkatî, nêzîkatîya rejimê ya ji destpêka komarê ve ku heya ya.

Pirsgirêka kurd, di vê çerçoveyê de di çerçoveya şerê teybet ê li ser çapameniyê re û hwd re bi ´krimînalizekirinê´ bi bikarhanîna gotina ´terorê´ re hanîna ser ziman. Di vê çerçoveyê de jî, hertimî şer û pevçûn û alozî, weke rewşna ku li ser wan re dîzaynê bikin bikarhanîna. Bo vê yekê ya ku, çendî ku aliyê kurd, di rewşek agirbestê de jî ya, leşkerên tirk, oparasyonan li dardixin, bombabaranan dikin û her wusa konseptên nû ên şer amede dikin.

Ankara, li hemberî statûya kurdan ku li rojhilat pêş dikeve, dixwezê ku nîjadperestên sinnî ên weke berhemîyên rejima baasê hilde li cem xwe bide domandin. Ji xwe, DAÎŞ, ji va berhemîyan hatibû pêşxistin. Wê çawa bi wan li rojhilat, pêşîya kurdan bigrin li wê dihizirin. Di vê çerçoveyê de hem li bakûrê kurdistanê û hem jî li dervî bakûrê kurdistanê bi DAÎŞ´ê û hwd, bi Îranê re şerekî herêmî li dijî civate kurd dan destpêkirin. Di vê

çerçoveyê de didina bi ser kurdan a. Gotinên T. Ardogan ên weke ´pirsgirêka kurd, tûna ya´, mirov dikarê weke gotinên serkevtineka mihtemel ya bi DAÎŞ´ê li hemberê kurdan jî bûn. Wusa hizir kiribûn ku wê DAÎŞ li dijî kurdan serbikeve. Di vê çerçoveyê de, bi van gotinên ku bi vî rengî ku di roja me de bi kardihênin wê ´pêvajoya çareserîyê´ bidawî bikiriban. Lê li vir, ya ku ne kiribûn hasabê de hêza tevgera kurd û zanebûna wê û ya birêz Ocalan bû. ..

Rejima tirk jî, piştî ku Birêz Ocalan hat dilgirtin, Birêz ocalan di destê xwe de weke ´koz´ekê xwestin ku bikarbênin. LI ser wê re, hizir kiribûn ku tevgera kurd dawî li tekoşîna çekdarî werêne. Her wusa, li ser wê re jî, rejima xe xort bikin û bêstatûtiya civate kurd jî bidina domandin û bi pêl û pêvajoyên bişavtinê, di nava civate kurd de li gorî xwe ancamê bidest bixin. Ev, weke hasabna ku kiribûn bûn. Di vê çerçoveyê de, dema ku mirov dihizirê, ev 15 salên ku buhurtin ku birêz Ocalan di îmraliyê de girtin, hemû rastiyên wan ên di mejiyê wan de raxista li berçav.

Kurdan, di vê pêvajoyê de bi teybetî, piştî dilgirtina birêz Ocalan re, gelek pêvajoyên pêşketinê derbas kirin. Gelek êş jî kişandin û hêrîş jî li wan bûn. Lê têkneçûn. Hovên DAÎŞ´î ku rayadarên tirk ku bi zihniyeta xwe li dijî kurdan weke wê hov in, weke "koalîsyonaka" herîmî ku îran û tirkiya di serî de li pişt wê na, helebçêyên nû li şengalê û kobanê hanîn serê civate kurd. Lê van kurd têk nebir. Kurd, neşikand.

Di vê hilbijartinê de di aslê xwe de di vê çerçoveyê de, divê ku mirov werêne ser ziman ku wê ancamên wê hebin. Kurd, ku karibin, vîn û îredeya xwe bikina yek, wê li herêmê weke hêzekê derkevina li pêş. Wê pirsgirêka kurd, çareser bikin. Hêza herî çareserker, ew bixwe na. Di serî de divê ku kurd, bi xwe bi bawer bin. Divê ku li şûna ku ji Ankara û ankû ji Tahranê hêvî bikin, divê ku ew xwe bixwe wê qûdretê bidina nîşandin. Ji ber ku ew qûdreta wan heya. Ew pêvajoya çareserîyê ku rayarên tirk, pirr bawer dikirin ku wê bi DAÎŞ´ê ancamê bidest bixin û wê kurdan di bin wê de bihêlin. Nûha, ku kurd, di hilbijartinan de vîna xwe bikina yek û serkevtina xwe bidest bixin, wê rejimên herêmê bi wan zihniyeta wan ya ku DAÎŞ pêşxist û ajor bi ser kurdan de di bin de bihêle.

. Ji 15´ê êlûna 2014´an de hêrîşên DAÎŞ´ê bi alikarîya Îran û Tirkiya li kobanê li kurdistanîyan didoman. Hemû rê û rêbaz ceribandin bo ku kobanê bixin. Xistina kobanê bo xwe giring di ditin. Ji ber ku destpêka şoreşa rojava ji kobanê destpêkiribû. Ji wê dera ku destpêka şoreşa rojava bûbû bû, di xwestin ku derbeyê li kurdan bixin. Bo vê yekê jî, ji wir ve giranî dane hêrîşan. Bajarê kobanî kavil kirin. Kevir li ser kevir ne hiştin. Bi deh hezaran kurdistanîyên kobanî bûn pênebar.

Hêrîşên li kobanê 134 bênavber bi şitt domîyan. Kêlîk bi kêlîk, hêrîş dibûn. Lê çeteyên DAÎŞ´ê ku bi alikarîya tirkîya hêrîşî kobanê dikirin, çi kirin û çi nekirin, li wir bi serneketin. Ji roja ku hêrîş destpêkirin ya 15´ê êlûnê û bi vir ve 134 rojan hêrîşan li kobanê destpêkirin. Hemû hêrîş jî, hêrîşên giran ên xistinê bûn. Rizgarkirina Kobanê ji çeteyan, rastî salvegera komara kurd a Mihabadê û denezendina kantonê jî tê. Her wusa ev serkevtin, ji vê aliyê ve jî, wateyeka wê heya.

Gotinên T. Ardogan ên piştî rizgarkirina Kobanê ku hanîn ser ziman, rastîya zihniyeta rejima tirk a di temenê piştgirîya wê ya ji çeteyên DAÎŞ´ê re jî dide nîşandin. T. Ardogan digot "piştî bakûrê îraqê, nûha jî bakûrê Sûrî ...", rastîyê radixe li berçav. Di dewama gotinên xwe de dijberîya xwe li dijî statûya kurdan a li rojavayê kurdistanê dihêne ser ziman. Ji xwe di temenê wan hêrîşan de şikandina kurdan û bêstatû hiştina wan heya. Rejimên herêmê ku Kurdistan û civate kurd di nava wan de hatîya qatkirin, hêvîyek mazin bi DAÎŞ´ê ve girêdabûbûn ku wê serketiba û wê derbeyek mazin li kurdan xistiba û wê li ser wê re êdî kurd bêtatû bihiştan. Ji destpêka hêrîşan û pê de jî, hemû gotinên xwe li ser wê digotin.

Gotinên T. Ardogan ên di destpêka hêrîşên li kobanê de ku hêvîya wan dihanî ser ziman û ku digot ku "kobanê ket, dikeve", weke gotinên wî yên ku di destpêka şoreşa rojava ku ji kobanê destpêkiribû û wî gotibû ku "emê ji rewşeka bûyî û bi dawîbûyî re nebêjin ´ey welleh´" bûn. Piştî ku kurdan care pêşî ji kobanê destpêkir û dest danî ser rêveberîya bajarê kobanê û rêveberîya xwe ya kurdistanî avakir û pê de, T. Ardogan gotibû "emê ji rewşeka bûyî û bidawîbûyî re nebêjin ´ey welleh´" û pê de, hêrîşên li ser rojava bi alikarî û piştgirîya tirkiya gav bi gav zêde bûn. Şerê ku li Sûrî ku di destê de tenê li herêmên Sûrî bû, bi alikarî û hewldanên tirkiya, Îran û rejima baasê a Sûrî û hwd re hat herikandin li rojavayê kurdistanê. Di herikandina wî şerê Sûrî li rojavayê kurdistanê de, herî zêde rol û weyna tirkiya zêde hebû. Pêşî, komên çete bi destê serleşkerên tirk bi rêxistin dikirin û didan hêrîşkirin li ser rojava. Armanc, pêşî ji holê rakirina aramiya rojava bû û piştre kirina nava şer de bû û piştre tûnakirina wê bû.

DAÎŞ, weke planaka kontrayî ku bi wê hatibû xwestin ku derbe li her deverên kurdistanê ku li kurdan bixin bû. Bi DAÎŞ´ê, wê li başûrê kurdistanê jî, derbeyek li kurdan bixistan. Wusa hasab kiribûn ku wê rêveberîya kurd a li başûrê kurdistanê derbeyek mazin bixwera. Ev jî, hatibû hasab kirin. Di destpêkê de li Musilê bêşer û bi hesanî bicihkirina DAÎŞ´ê, bo vê armancê bû. Di çerçoveya planakê de artişa Îraqê jî jê xwestin ku çekên xwe di cih de bihêle û vekişê. Berî wê vekişînê jî, belafirgeh û leşkergehên ku radestî DAÎŞ´ê kiribûn, tişî çek û cebilxane kiribûn. DAÎŞ´ê, dest danî ser

hemûyan, û ev çek hemû li dijî kurdan bikarhanî. Di wî 134 rojên şer de ew çek li dijî kurdan bikarhanîn.

Şerê DAÎŞ´ê ê bi kurdan re şerekî ku di çerçoveya giştîya rojhilat de ku bi kurdan re dihat kirin bû. Rejimên herêmê ên ku Kurdistan di nava wan de hatîbû qatkirin hemû jî, alikarîya wan di wî şerî de ji DAÎŞ´ê re hebû. Tenê xwestek û armanca wan ew bû ku DAÎŞ derbeykê li kurdan bixe. Piştre jî, li ser wê re jî, wê rewşa bêstatûtîya kurdan li ser serê kurdan bidina domandin. BI kurdan re şerê ve dikirin.

Şerê ku DAÎŞ´ê li rojava û başûrê kurdistanê bi kurdan re dikir, li gorî wê rejima tirk jî li bakûrê kurdistanê di nava tevgerê de bû. Hal û tevgerên rejimê li gorî wê bûn. Di destpêka şerê DAÎŞ´ê de rejima tirk, di wê bawerîyê de bû ku wê serketiban. Bo vê yekê, ew ´oparasyonên qirkirina sîyesî", weke ku navberek dabûbûnê de. Lê piştî ku ditin ku wê ancam ne li gorî ya dilê wan bê, piştre carek din rayadarên tirk giranî dane domandina oparasyonên qirkirina sîyesî li bakûrê kurdistanê. Ji aliyekî din ve jî, bi wan oparasyonên qirkirina sîyesî ên li bakûrê kurdistanê, weke ku dixwestin ku moralê kurdan jî bişikênin. Li bakûrê kurdistanê, serhildanên gel ên 7 û 8ê kewçerê jî, berxwedana kobanê ya rojavayê kurdistanê û bakûrê kurdistanê kiribû yek. Di vê çerçoveyê de jî, divê ku mirov li hêrîşên dewletê ên li Cizîrê jî binerê.

Hêrîşên li Cizîrê, çend ku weke "provakasyonekê" werina bi navkirin jî, ev bi plan ji aliyê dewletê ve hatina kirin. Ji aliyê kurdan û pêvajoyê ve em dikarin hêrîşên li Cizîrê weke provakasyonê bi nav bikin. Lê ji aliyê dewletê ve em nikarin bahsê bikin. Ji aliyê rayadarên dewletê ve bilêvkirina gotina ´provakasyonê´, tenê weke gotinaka îstismarkirin û sernûxûmandinê pê ve ne ti tiştekî din a. Derewek a. Ji ber ku rayadarên dewletê, fahmkiribûn ku wê li kobanê kurd bi serkevin û ev jî wê dilxweşiyekê di nava kurdan de bide çêkirin. Pêşî xwestin ku pêşîya vê bigrin. Di her dem û pêvajoyên bi vî rengî de rayadarên dewletê serî li rêbazên bi vî rengî dane. MInaq, di roja ku kurdan li bakûrê kurdistanê xweserîya demokratik denezendin de, rayadarên tirk 12 leşkerên xwe dan kuştin û li ser wan re şîn denezendin û bi wê re xwestin ku pêşîya pîrozbahiyên denezendina xweserîya demokratik bigrin. Yanî, di her rewşeka ku xweş ku kurd ji wê dilxweşîyê bigrin, bo ku kurd dilxweşîyê ji wê rewşê negrin, hewl dane ku rewşeka bi êş çêbikin bo ku kurd wê şahîyê nejîn. Ev, weke politikayekê, hertimî rayadarên tirk, li dijî kurdan meşandina.

Serkevtina li kobanê, bo kurdan giring û dîrokî ya. Her wusa, destanaka dîrokî ya. Berxwedana kobanê, têgihiştinek di nava kurdan de çêkir. Kurd, li xwe şîyar kir. Her wusa bi wê re jî, kurd bûn yek. Ew gîyane yekîtîyekê

afirî. Bi wê re jî, ew sînorên ku di nava kurdistanîyan de hatibû danîn hat bêwate kirin. Bi serketina berxwedana kobanê re jî, temenê yekîtî û bi hev re bûna kurdistanîyan pêşket. Herîşên li kobanê, bi armanca ji hevxistina kurdan û têkbirina wan bû. Lê bi serkevtina berxwedana kobanê re bi hevrebûna kurdan temenê wê afirî. Kobanê, bo navê yekîtîya kurdistanî.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî kifş bike ku ´pêvajoya çareserîyê´ ku birêz Ocalan dabû bû destpêkirin, rayadarên tirk, bo pêvajoyek weke ya bi hêrîşên DAÎŞ´ê a li kurdan re xwestin ku bi karbênin. Yanî, li şûna ku pêvajoyê di temenê çareserkirina pirsgirêka kurd re bikarbênin û gavan biavêjin, bi vî rengî xwestin ku pêvajoyê weke firsandeka ku bi wê derbeyê li kurdan bixin bibînin. Hasabên xwe li ser wê kiribûn. Piştî ku DAÎŞ jî li ber kurdan têkçû, êdî nûha jî, nûçeyên ku ji herêmê tên ew in ku artişên Îran û tirkiya hemwaxt li dijî herêmên parastina gel û herêmên din ên kurdistanê di nava tevgerê de na. Ev tevgerîyên hemwaxt ên artişên Îran û tirkiya, wê çawa dom bike wê di rojên pêş de dîyar bibe. Lê ku mirov ji kîjan aliyê ve lê binerê, mirov dibînê ku serkevtina berxwedana kobanê hasabên rejima tirk jî û ya îranê jî xirakirina. Bi serkevtina berxwedana kobanê re jî, kurd li herêmê weke hêzek herêmê ya kifşkar derketina li holê. Kurd, wê statûya xwe bidest bixin. Serkevtina berxwedana kobanê, serkvtina statûya kurdan a li herêmê jî ya.

**. Her wusa, d**i êvara 30´ê temûza 2015´an de hêrîşên çeteyên DAÎŞ´ê ku ji cerablus´ê li Kobanê û ên cebetil-nasr li Afrînê, **dide nîşandin ku çeteyên DAÎŞ´ê û cebetil-nasr´ bi alikarîya rayadarên tirk dixwezin ku cerablus´ê weke navendek hêrîşkirinê li herêmên din ên rojava bikarbênê.** Herêm û bajarê cerablus´ê, ku dikeve dehma ´antebê de û ber Afrînê de, bûya weke navendeka nû ya şer. Rayadarên tirk, li vê herêmê, hem komên nû ên çeteyên DAÎŞ´ê dikin ku çê bikin û bicih bikin û hem jî li wê herêmê dixwezin ku cebetil-nasr´ pêş bixin ku hêrîşî kantona Afrînê bike. Piştre jî ji wir, bi destê van çeteyan ku karibin, hêrîşên nû li kobanê, herêmên din ên rojava û bi teybetî ku hêrîşî Afrînê bikin. Ji ber ku ji wir, pêlên nû ên hêrîşan li ser rojava bi rêxistin bikin, rayadarên tirk naxwezin ku cerablus were rizgarkirin ji destê çeteyên DAÎŞ´ê.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku nûçeyên ku ji herêmê tên, ew in ku ji aliyê tirkiya bi alikariya rayadarên tirk li ser antebê re çeteyên DAÎŞ´ê û cebetil-nasr´ herêm kirina weke leşkergehekê. Wusa xûya dike ku di rojên pêş de, emê pirr zêde li ser hêrîşên ku ev çeteyên DAÎŞ´ê û cebetil-nasr ku bi alikarîya tirkya ji vê herêmê li herêmên din ên rojava ên weke Afrînê û hwd, emê li ser wan biaxifin. Di serî de, divê ku mirov balê bikişêne li ser vê herêmê.

Herêma Cerablus´ê, herêmek stretejikî ya. Her wusa, rayadarên tirk, ji vê herêmê, çeteyan di bûhûrênina li rojava ku bi kurdan re şer bikin. Ev herêm, di serî de, divê ku mirov bibêje ku biqasî ku nûçeyên ku ji herêmê tên, rayadarên tirk, bi sedan çete ji van herêman dane derbaskirin û li herêmên cerablus´ê bicih kirina. Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku rayadarên tirk, dixwezin ku cerablus´ê bikina herêmeka ku ji wê bi hêrîşên ku li herêmên rojava û Afrînê ku bidina destpêkirina ku rojava û vîna wê bişikênin.

Di vê çerçoveyê de her wusa, bo parastina rojava bê û ankû tekoşîna azadîya li wir û hwd bê, divê ku hêzên kurd jî, li cerablusê bihizirin û heya bidina bi ser wir de. Rayadarên tirk, ji ber ku dixwezin ku vê herêmê di destê çeteyan de bidina hiştin bo ku ji wir karibin hêrîşên li rojava birêxistin bikin.

Bi teybetî, ji herêmên Reha, Serêkahniyê û heta ku digihijê antebê û hewd, weke herêmna ku li wan kontrayên tirk jî bi rêxistin bûna. Ji van herêman, hêrîşên li rojava birêxistin dikin. Dema ku cerablus jî ji destê çeteyên DAÎŞ´ê were rizgarkirin, wê çaxê, wê ev politikaya rayadarên tirk a li ser kontrayên wê re ku li vê xate ji Reha, serêkahniyê û heta antebê ku bi rêxistin kirîya, ew jî, wê têk herê. Ji ber ku naxwezê ku ew politikaya wê, têkherê, li dijî rizgarkirina xerablus´ê bertekê dide nîşandin. Her wusa, di serî de, divê ku mirov vê yekê di serî de fahm bike.

Rayadarên tirk, dixwezin ku vê herêma cerablus´ê, weke birînekê li rojava ku hertimî ji wê xwûn tê bidina hiştin. Li vir, em vê yekê jî, bibêjin ku heta ku cerablus´ê di destê çeteyên DAÎŞ´ê de bê, wê hêrîşên ji wir ên li ser rojava jî kêm nebin. Rayadarên tirk, bi van komên çete ên weke DAÎŞ, cebetil-nasr´ û hwd re li vê herêma cerablus´ê, weke ku navendek leşkerî weke ´leşkergehî pêşxistiya. Her wusa, nûçeyên ku ji herêmê tên jî, ew in ku dixwezin ku cardin van çeteyan bi rêxistin bikin û pêlna hêrîşê li ser Afrînê bidina destpêkirin. Dixwezin ku tişta ku hanîna serê kobanê werênina serê Afrînê.

Heta ku cerablus´ newê rizgarkirin, mirov nikarê bahse ewlahîyekê jî bi giştî bike. Her wusa, ev herêm, dibê weke ´çiban´ekê ku hertimî ji wê pîsîtî tê ya. Ev jî, bi alikarîya rayadarên tirk dibê. Bo vê yekê ya ku Cerablus, divê ku tavilî were rizgarkirin ji destê çeteyên DAÎŞ´ê.

Di êvara 30´ê temûza 2015´an de hêrîşên çeteyên DAÎŞ´ê ku ji cerablus´ê li Kobanê û ên cebetil-nasr li Afrînê, didina nîşandin ku çendî giringa ku cerablus divê ku were rizgarkirin. Her wusa, ev hêrîşên di êvara 30´ê temûza 2015´an de hêrîşên çeteyên DAÎŞ´ê ku ji cerablus´ê li Kobanê û ên cebetil-nasr´ li Afrînê, didina nîşandin ku ev herêm weke navendek

hêrîşên çeteyên DAÎŞ û cebetil-nasr li hemberî rojava û kurdan dihê bikarhanîn. Her wusa di vê çerçoveyê de jî divê ku mirov li wê bihizirê.

Her wusa, li van herêmên ku ji aliyê tirkiya û bakûrê kurdistanê ve ku dikevina sînorê cerablus´ de rayadarên tirk leşker vegûheztina li wan. Hinek ji wan herêman jî, weke "herêmên leşkerî" hatina denezendin. Astengkirina çûyîna li van herêman a mirovan ji aliyê rayadarên tirk ve, tenê û tenê bi armanca vê politikaya wê ya ku dixwezê ku bi wê cerablus´ê weke navendeka hêrîşên li kantona Afrînê û herêmên din ên rojava ku bikarbêne ve girêdayî ya. Di serî de divê ku mirov bin vê rastiyê xîz bike. Ji xwe, ya ku vê rastîyê piştrast dike jî, di êvara 30´ê temûza 2015´an de hêrîşên çeteyên DAÎŞ´ê ku ji cerablus´ê li Kobanê û ên cebetil-nasr ku li Afrînê, mirov dikarê weke minaq û birhan bide nîşandin.

Di vê dema ku bahse çêkirina "herêmek tampon" li herêma ezaz û cerablus´ê de bûna hêrîşên cebetil-nasr´ pirr manîdar a. Wusa tê dîtin û fahm ku têkiliyeka va hêrîşên dawî ên cebetil-nasr li kontona Afrînê, têkilîya wê bi van nîqaşên rayadarên tirk ên bi gotina ´herêma tampon´ û ankû ´herêma ewla´ ve girêdayî heya. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku ev nîqaşên bi armanca pêşxistina ´herêma tampon´, pirr kevn in. Hê di destpêka mudahaleya li Sûrî de rayadarên tirk ev hanîbû li rojevê. Armanca rayadarên tirk ên bi ´herêma tampon´ ê û ankû ya ´herêma ewla´ re, ew a ku bi wê pêşîya pêşketina statûya kurdan ku li herêmê bigrin a.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku weke ku çawa ku DAÎŞ´ê bi alikarîya tirkiya hêrîşî rojava dike her wusa cebetil-nasr jî bi alikarîya tirkiya hêrîşî rojava dike. Ti farqe DAÎŞ´ê û ankû ´cebetil-nasr´ ji hevdû tûna ya. Tenê, li gorî herêmê û hin politikayên şer, weke rêxistinna kontrayî ev rêxistin hatina pêşxistin û ev nav hatina pêşxistin. Demekê navê DAÎŞ´ê bi hêrîşên ku ew dike re dikina rojevê û demekê cebetil-nasr bi hêrîşên ku ew dike dikina rojevê.  Lê di rastiyê, weke hevdû na. Di çerçoveya armancakê de ew bi kurdan re dihên dayîn şerkirin.

Herêmên cerablus û ezaz´ê herêmna li herêmê weke herêmna stretejikî na. Her wusa, ji aliyê tirkiya û bakûrê kurdistanê û bi teybetî ji aliyê antebê ve sînor bo van çeteyên cebetil-nasr, dihê vekirin. Armanca rejima tirk a bi cebetil-nasr û bi teybetî li herêmê kantona Afrînê bi cihkirina wan, ew a ku weke ku çawa pêlên hêrîşê lo kobanê bi DAÎŞ´ê kirin, di xwezin ku heman bi pêvajoyê bi cebetil-nasr re li kontona Afrînê pêş bixin. Bo vê yekê ya ku li herêmên cerablus û ezaz´ê ên ku dikevina aliyê kantona Afrînê de bi teybetî di bin navê çeteyên cebetil-nasr´ de li herêmê kom bi kom, komên hêrîşkirinê hatina bi rêxistinkirin.

Di van rojên ku rayadarên tirk bi rayadarên amerikî de diaxifin û dixwezin ku herêmek tampon û ankû herêmek ewla ava bikin de bûyîna hêrîşên cebetil-nasr´, divê ku mirov bi wê ve girêdayî werêne ser ziman û fahm bike. Di her dema ku rayadarên tirk, hevdîtinan dikin, di vê çerçoveyê de rewşên ku weke hêncet bikarbênin diaxifirênin.

Lê li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku hemû hêrîşên li rojava û rojavayê kurdistanê, ku di bin navê DAÎŞ´ê de bin û ankû ku di bin navê cebetil-nasr de bin ku werina kirin, hemû jî ji deverekê tên ´koordîna´ kirin. Armanca wan, ew a ku li rojavayê kurdistanê pêşîya pêşketina statûya kurdan bigrin. Wusa xûya dike ku di çerçoveya van nîqaşên rayadarên tirk ên bi armanca çêkirina ´herêmek tampon´ û ankû ´herêmek ewla´ de, wê hêrîşên dawî ên ji cerablus û ezazê li kantona Afrînê û Kobanê, hatina kirin. Her wusa, di vê çerçoveyê de heya ku ev hêrîş werina zêdetir kirin. Li vir, armanca rayadarên tirk ên di çerçoveya astengkirina rizgarkirina cerablus û ezazê de jî baştir dihên fahmkirin. Wusa dihê fahmkirin ku dixwezin ku van herêmên ku bi alikariya rayaderên tirk çeteyên weke DAÎŞ û cebetil-nasr weke navend bikardihêne, di vê çerçoveyê de dixwezin ku weke di vê çerçoveyê de listikên xwe bileyizin. Ji ber ku dixwezin ku sîyeseta bi armanca ´çêkirina herêmek tampon´ û ankû ya ´herêmek ewla´ li ser wê bimeşênin, naxwezin ku cerablus û ezaz were rizgarkirin. ....

Dema ku YPG´ê û YPG´ê û hêzên din ên kurd ên rojava ku herêmên cerablus û ezaz´ê rizgar bikin ji destê çeteyan, wê çaxê, wê temenê sîyeseta rayadarên tirk a bi armanca çêkirina ´herêmek tampon´ û ankû ´herêmek ewla´ jî were dawî lê hanîn. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku rayadarên tirk sîyeseta rayadarên tirk a bi armanca têkbirina rojava ku bahse çêkirina ´herêmek tampon´ û ankû ´herêmek ewla´ dikin jî, wê bi rizgaririna van herêman re werê lê hanîn. Her wusa, bi vir ve girêdayî, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku heta ku ev herêm di estê van çeteyên hov de bê wê hêrîşên wan bi alikarîya tirkiya wê li rojava bidomê. ....

**Di pêvajoya hilbijartinan de ji aliyê rejima tirk, hikimeta wê û partîyên wê ve bikarhanîn û îstîsmarkirina ol û bawerîyê û pêvajoya şer ku wê rejima tirk piştî hilbijartînên 7´ê hezîrene 2015´an li dijî kurdan bide destpêkirin.**

LI hemberî civate kurd û pêşketina wê, bikarhanîn û îstîsmarkirina ol û bawerîyê ji aliyê rejima tirk ve ne nû ya. Ev ji demên berê ve heya. Heta ku di demên osmanîyan de jî hebûya. Hertimî, me bi du rengan dît ku çawa ol û bawerîyê li hemberî civate kurd bikardihênin. Aliyê pêşî ê yekemin ew bû ku digotin "em birayê hevdû ê misilman in" bû. Li ser gotinên bi vî rengî û hwd re, wê mirov bixapandan û bikişandan li cem xwe. Heta ku bi vî rengî, çavên mirovan digirtin. Mirovên ku ol û bawerîya xwe bi dilekî safî û zelal dijî jî, bi vî rengî dihat bikarhanîn û îstîsmarkirin. Berê du gotin ku ´ol, ji dest diçê´, li dora wê bighijina i hevdû. Di vê çerçoveyê de hertiştî li ser ol û bawerîyê pêş dixistin.

Ol û bwerî, dîroka wê, dema ku mirov li wê dihizirê, mirov dibînê ku çawa bo bişavtin(asîmlekirin)a civate kurd jî hatîya bikarhanîn a. Minaq, di roja me de ji kurdan re qadaxaya ku îbadetên xwe û bergên xwe bi zimanê kurdî bikin. Heta ku yekî ku bi zimanê kurdî berg û vaazên xwe bike, heya ku ji aliyê dîyeneta tirkî´ ve weke ´şaytan´ jî ku were denezendin. Ji xwe, di vê çerçoveyê de medreseyan kurdistanê ku di wan de perwerdeya olî û hemû cûreyên din ên perwerdekirinê bi kurdî bû, hatina qadaxakirin û li şûna wan, weke rengekî dewşîrmekirî ´îmam hatîp´ hatina pêşxistin. Di îmam hatîp´an de jî, wê tenê dîroka osmanîyan û hwd wê bidin. Her wusa, wê tenê bi zimanê tirkî perwerde were kirin. Mirovên ku kurd jî bûn, ku di wan îmam hatp´an de dixwandin, li ser navê rejima tirk, dibûna dijminna civate kurd û tekoşîna maf û azadiyê a civate kurd. Heta ku, dihatina wê astê ku bi civate

kurd re bikevina şer de jî. Di vê çerçoveyê de digihiştina derûnîyekê.

Li ser temenekî bi vî rengî DAÎŞ, `el-nûsra´ û hwd hatina pêşxistin û li hemberê civate kurd hatina dayîn şerkirin. Yanî, di vê çerçoveyê de ev mirovên ku bi vî rengî hatina perwerdekirin di wan îmam hatîp´an de, bi awayekî weke ku hatina ´dewşîrme kirin´ in û ev mirov dikarin, hebûna civate kurd bigiştî, qatla wê ´halal´ bikin jî. Ji xwe, van rêxistin kujar ên weke ´DAÎŞ´ê û el-nûsra´ û hwd, li gorî xwe qatla kurdan hemûyan ´halal´kirina. Li vir, di aslê xwe de, di vê çerçoveyê de mirov dibînê ku çawa ol li hemberê civate kurd hatîya bikarhanîn. Her wusa, andamên civate kurd, ku misilman bin û ne misilman bin, weke armanc hatina girtin û hatina qatil kirin. Gotinên T. Ardogan ên bi rengê "ew zerdeştî na" û "bergê ji Zerdeşt re dikin li çîyayan", di vê çerçoveyê de divê ku mirov bixwêne. Rayadarên rejimê ku rejimê bi rêve dibin, van gotinan didina gotin. Li ser van gotinan re dikin ku wê întîbaya ´ew ne misilman in´ û li ser wê re ji mejiyê mirovan re dibêjin ku ´madem kû, ew ne misilman in, nexwe qatla wan halal a´, di vê çerçoveyê de dihênina ser ziman.

Di vê hilbijartina 7´ hezîrene 2015´an de jî, dîsa heman tişt hatîya bikarhanîn. Bo ku pêşîya kurdan bigrin û ne hêlin ku kurd bigihijina maf û azadîya, li hemberê wan dîsa serî li bikarhanîn û îstîsmarkirina ol û bawerîyê dana. Dema ku T. Ardogan, tevî ku qaşo bûya ´serokkomar´ jî, li bajarên kurdistanê dema ku diçê nûmeyîs(miting)an ´kûranê´ dike destê xwe de û bi wê re rêyan ji kurdistanîyan bo partîyan xwe dixwezê. Her wusa, gotinên weke "ew dixwezin ku dîyenetê ji holê ra bikin" jî, di vê çerçoveyê de, di çerçoveya bikarhanîn û îstîsmarkirina ol û bawerîyê de dihênina ser ziman. Bi van gotinan, ji mejiyê mirovên ku bawerîya wan heya re dibêjin ku ´piştgirîyê nedina partîya kurd, wê dîyenetê ji holê ra bike.´ Lê dîyenet, weke wezereteka hikimetê jî, kar dike û ol û bawerîyê li hemberê kurdan bikardihênin. Zimanê kurdan qadaxa dike û nahêle ku ti kesek bi zimanê kurdî berg û vaazan bike. Dîsa heman dîyenetê ku bi deh hezaran qadro´yên xwe çêkirina û şandina nava kurdan bo ku wan li ser olê re bixapênin. Di vê çerçoveyê de hertimî, ol û bawerî, weke rêbazeka bikarhanînê li hemberê kurdan û civate kurd.

Hewldana wê întîbaya ´bêol´îtîyê ku li ser kurdan biafirênin, hertimî dîyenet bo wê afirîya. Tevî ku dîyenet, ji zanîna xwe ya olî ti carî mirov nikarê wê ji kurdan maztir bihasibêne jî, nerîna wê ya li kurdan ew a ku weke ku ew oldar û civate kurd ´bêol´a ku ew herê wan bikişêne nava olê ya. Ev bêhûrmetîya dîyeneta tirk a li hemberî kurdan, di vê hilbijartinê de zêdetirî derket li holê. Heta roja me, di derbarê komkujiyên ku rejimê hanîna serê kurdan de ti tiştekî li hemberê rejimê ne hanîya ser ziman. Dîyenet,

dikarê, hertimî bahse komkujiyên li misrê, Bosna-hersekê û li welatên din ên eafrîqa û rojhilat bike. Lê ti carî, wê bahse komkujiyên weke komkujiya zilanê, komkujiya dersimê, komkujiya helebçê, komkujiya roboskî û hwd nekê. Vajî wê, di nêzîkatîyaka wusa tevdigerihê ku wan komkujiyên ku hatina hanîn li ser serê civate kurd rast bin. Di nava ti belge û nivîsên wê de, navê kurd û kurdistanê derbas nebê. Zimanê kurdî, qadaxa ya bo wê. ..

Weke van rastîyan, mirov dikarê bi hezaran rastîyan werêne ser ziman. Dîyeneteka ku bahse komkujiyên ku hatina serê kurdan nakê, bi çi ahlaq û felsefeyê dikarê herê nava civate kurd û bahse ol û bawerîyê bike? Ti carî cihê nêzîkatîyaka bi vî rengî, di ti ahlaq û felsefeya mirovatiyê de tûna ya.

Hertimî ol, bi destê wê dîyenetê û camaatên ku di çerçoveya wê de ku hatina avakirin, li hemberê kurdan hatîya bikarhanîn û îstîsmarkirin. Wê çawa bi olê kurdan û kontrol bikin û pêşîya wan bigrin, di vê çerçoveyê de li ser olê re nêzîkatî li kurdan kirina. Sazî û malên ku weke malên camaatan ku hatina avakirin jî, wê çawa bi wan pêşîya kurdan bigrin, li ser wê hizirîna. Bo ku li ser olê re ti tevgerên ên weke di dema Sêd Riza û Şêx Seîd de ku bo kurdistanê derketibûn ku newin û dernekevin, rêxistinên kujar ên ên weke hizbil-kontra û huda-par û hwd pêşxistin. Di vê çerçoveyê de van rêxistinan, dîsa bi heman rengî û mantiqê, li hemberê kurdan bikardihênin. Rêxistinên weke DAÎŞ, el-nûsra, hizbil-kontra, hûda-par û hwd li hemberî civate kurd û pêşketina wê pêşxistina. Î ro jî, di vê çerçoveyê de hertimî çûna bi ser kurdan a.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku kêmesîyên kurdan jî hena. Ji ber ku wan jî, rêxistiiniyên xwe yên olî ên rast ava nekirina. MInaq, rejimê ser 300 tv´yên ku bi wan li ser ol û bawerîyê re propagandayên xwe dikin avakirina. Lê kurdan, tenê yek jî, bi zimanê xwe ne vekirina. Kurd jî, di vê demê de divê ku herî kêm tv´yeka wan ya olî hebe ku karibê rastîya wan ya olî werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de ku karibê bersivê bide wan û derewên wan ku li ser navê olê dikin. Her wusa, di serî de divê ku tv´yek ol û bawerîyê ku tenê bi zimanê kurdî weşanê bike, û tenê bi mijarên olî re eleqeder bibe, divê ku kurd wê ava bikin. Ev, wê weke bergir(´tedbîr´)eka kurdan bê li hemberê bikarhanîn ol û bawerîyê li hemberê civate kurd û îstîsmarkirina olê jî ji aliyê van rejimên ku civate kurd û Kurdistan ku di nava wan de hatîya qatkirin.

Di serî de di vê hilbijartina 7´ê hezîrena 2015´an de hat ditin ku çendî ol dihê bikarhanîn li hemberê kurdan. Her wusa, di rewşa DAÎŞ û el-nûsra de jî ev dihê ditin. Her wusa, rêxistinên kujar li ser olê re li hemberê kurdan ava dikin û diajona ser kurdan. Dema ku rewş ev bê û ku kurd ti rêxistinên wan ên rast ku li ser navê wan û tenê bi wan weşanekê bi olê bide kirin ku hemû

rastîyan raxê li berçav ku nebê, weke kêmesîyekê jî divê ku mirov werêne ser ziman. Îran bi bawerîya şîî ya. Tirkiya bi dîyeneta xwe ya ku dijminatîya kurdan dike re li ser sûnnîtîyê re xwe dike ku bi rêxistin bike. Kurd, bi bawerîya olî ya îslamî jî, ´şafîî´ na. Di vê çerçoveyê de divê ku bergirên xwe bigrin bo ku karibin, xwe rast werênina ser ziman. Dema ku kurd, xwe bi zimanê xwe neyênina ser ziman, wê çaxê meydan ji wan re dimênê ku ew li gorî xwe werênina ser ziman û li ser ol û bawerîyê re bi nivîsandinên xwe re ku temenê komkujiyên mazin biafirênin. Weke ku çawa ku di hemû komkujiyan de ol bikarhanîna, di roja me de jî bi rêxistinên kujar ên weke DAÎŞ´ê û hw dîsa olê bikardihênin. LI hemberê pêşketina kurdan jî, weke ku li hemberê HDP´ê dihê ditin û dibêjin ku "wê dîyenetê ji holê ra bike", ol bikardihênin. Her wusa, zimanê kurdî jî, di nava olê de qadaxa kirina. Kurd, di serî de divê ku li van aliyan hemûyan bihizirin û herî kêm divê ku hin tv´yna xwe yên ku tenê bi ziimanê kurdî û li gorî rastî, dîrok û civate wan û bawerîyan ku weşanê bike, divê ku ve bikin. .. . Pêvajoya çareserîyê, di çerçoveya ´çareserkirina pirsgirêka kurd´ de hatibû destpêkirin. Lê rayadarên rejima tirk, li şûna pêşxistina çareserîyeka aşîtîyane, DAÎŞ pêşxistin. Piştre jî, oparasyonên leşkerî, sîyesî û hwd li kurdistanê ji aliyê rejimê ve li civate kurd hatina kirin. Heta roja me, herêmên botanê, çolemergê, serhedê û çolemergê, ji aliyê rejima tirk ve tişî leşker kirina. Weke ku xwe ji şerekî mazin ê bi kurdan re amede bikin, herêm tişî leşkerkirina. Di vê çerçoveyê de jî, naxwezin ku HDP´ê bi serkeve. Ji ber ku plan û konseptên şer amede kirina.

Gelê kurd, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman di pêvajoyek xirab de di buhûrê. Rejima tirk, bo ku kurd nebina xwediyê ti statûyê her cûre herîşê hem li bakûrê kurdistanê û hem jî li rojavayê kurdistanê bi rêxistin dike. Pêşî DAÎŞ, bi rêxistin kirin û ajotina bi ser kurdan de. Dema ku ditin ku DAÎŞ li hemberê kurdan bi serneket, êdî li herêmên rojavayê kurdistanê, li şûna wê, bidest birêxistinkirina "El-nûsra" dikin. Di van rojên Dawîyê de nûçeyên ku ji herêmê tên, di wê çerçoveyê de ku nûha jî, dikin ku ´el-nûsra´ bi rêxistin bikin û pêvajoyeka din weke ya bi DAÎŞ´ê ku pêşxistin, pêş bixin li ser serê kurdan bi hinek rêxistin din ên tûndrew ên weke ´el-nûsra´ birêxistin dikin û diajona bi ser kurdan. Wusa xûya dike û dihê fahm dike ku, piştî hil bilbijartinan, wê li bakûrê kurdistanê artişa tirk bi kurdan re şerê xwe rejimê dîsa bi kurdan re bide destpê kirin û bi wê re jî li rojavayê kurdistanê jî weke ku kirin bi DAÎŞ´ê re ´el-nûsra´ jî pêş bixin û biajona bi ser kurdan de.

Rejim, bo ku van planên xwe biser bixe, wê hewl bide ku HDP´ê li bin bende bajarê de bihêle. Li ser wê dixabitin. Di vê çerçoveyê de divê ku

mirov vê yekê bibêje ku divê ku kurd, vê hilbijartinê bikina wesîle û vîna xwe bikina yek. Êdî, di nava xwe de têkiliyên xwe bi zimanê xwe yê civatî pêş bixin. Divê êdî tekoşîna maf û azadiya xwe biserbixin. Ji vê demê û pê de, ji serkevtinê û pê de, ti rê li pêşîya kurdan nemana. Ya ku di serî de, ku divê ku kurd jî wê fahm bikin ev a.

Bo vê yekê, divê ku kurd êdî hemû pirsgirêkên xwe yên navxweyî dênina alîyekî. Divê ku tekoşîna maf û azadiya civatî ya kurdistanî, nekina korbanê çend berjewendîyên xwe yên partîyî û polîtîkî. Ev dem, bo kurdan dîrokî ya. Kurd, ku yek bin, û pirsgirêkên di nava xwe de çareser bikin û wan pirsgirêkan ne dênina li pêşîya pêşketina xwe ya civatî, wê karibin serkevtinên dîrokî bidest bixin. Her wusa, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku di sale 2013´an de li darnexistina wê, hinekî jî, di vê çerçoveyê de bi hin berjewendîyên partîyî ên tang bû. Kurd, bo ku gavekê bi pêş de herin, divê ku di nava xwe de xwe birêxistin bikin û xwe bi hevdû re safî û zelal bikin. Li vir, divê ku mirov vê yekê bibêje ku bûya weke kevneşopîyeka sîyeseta kurd, dema ku du partîyên kurd, li hemberî hevdû bisekin in, yek ji wan partîyan muhaqaq li rex rejima metinger a ku metingeriyê li ser ser civate kurd disekinê. Êdî divê ku di nava sîyeseta kurd de, rejim û partîyên wê û ankû hebûna wê, nebê weke artartnatifekê bo kurdan ku li berhevdû disekin in. Di vê vê rewşa bêrûmet ji nava xwe bidina avêtin. Heta roja me, partîyên rejimê ên weke AKP´ê û hwd, ji vê rewşa xirab a navxweyî ya kurdan ku hinekî jî ancama rast û bi zanebûnî ne dîtiin û ne fahmkirina wan a, sûd wergertina û hebûnên xwe li kurdistanê parastina. Hinekî jî, bi hêlebaziyê jî ev kirina.

Kurd, di nava xwe de dibê ku hizrên cûda di wan de hebin. Ku bi rastî, tevbigerihin, wê karibin, wê di nava civate kurd de wergerênina rengînîyeka sîyesî ya demokratikî jî di nava civate kurd de. Lê di pêvajoyên ku di wan de maf û azadî û hebûna civate kurd mijara, divê ku yek bin û wê maf û azadîya civate kurd bi hevdû re biserbixin. Di vê demê de, di bin banê HDP´ê de divê ku kurd hêza xwe bikina yek. Ya ku wê bo wan bê rêz û hûrmet û rastîya tekoşîna maf û azadîya civatî jî, wê ev bê.

Her wusa, êdî pergale civatî ya xwe bixwe rêvebirinî a civate kurd, divê ku were birêxistin kirin. Ji perwerdeya bi zimanê dayikê û bi zimanê civatê birêvebirina wê û pêşxistina wê bigra û heta ku bigihijê gelek aliyên din ên weke çêkirina tifaqa civatîya kurdistanî, divê ku di vê çerçoveyê de, êdî mijarên sîyeseta kurd bin ku li ser wan bisekinê û politikaya wan pêş bixe û biserbixe. Em di sale 2015´an de jî, lê hê zimanê kurdî qadaxa ya. Kurd, nikarin bi zimanê xwe yê dayikê perwerdeya xwe bibînin. Ev, êdî bo sîyeseta kurd jî, eybeka. Divê ku êdî van mijaran biserbixin. Plan û projeyên

civatî, bi stretejikî di vê çerçoveyê de divê ku pêş bixin û biserbixin. Vê pêvajoya çareserîyê da nîşandin ku ji rejimê hêvî kirin jî, xelatî û şaşîya dîrokî ya. Herkesekî dît ku pêşî gotin pirsgirêka kurd heya û piştre hêrîşî kurdan kirin. Piştre, ku hinekî din jî, ji pêvajoya çareserîyê sûd girtin û xwe kirina desthilatdar û pê de, piştre bi nemerdî wegerîyan û gotin ´pirsgirêka kurd, tûna ya.´ Ev, divê ku bi awayekî vekirî werê ditin.

Projeyên civatî û ên perwerdekirinê, karên sîyesî na jî. Divê ku mirov ji van aliyan ve jî lê binerê. Her wusa, rejima tirk, wusa tê ditin ku piştî hilbijartinan, bo şikandina kurdan, pêvajoyaka din ya şer weke ya ku bi DAÎŞ´ê re li dijî kurdan bi hêrîşkarî destpêkirin, dîsa bidina destpêkirin. Kurd, divê ku ji vê jî amede bin. Lê berî hertîştî divê ku divê ku mirov werêne er ziman ku kurd yekbin, wê karibin hemû planên rejimê ên bi armanca şerkirina bi civate kurd re wê têk bibin. Di pêvajoyên hêrîşên DAÎŞ´ê ku îran û tirkiya bi hinek hêzên din re li pişt wê bûn, hat ditin ku dema ku kurd yekbin, wê çawa karibin, serkevtinên dîrokî bidest bixin. Di vê hilbijartinên 7´ê hezîrenê de, divê ku bi heman rengî, dîsa kurd deng û rengê xwe bikina yek bo parastina civatîtîya kurd û kurdistanê û bo maf û azadî kurd û kurdistanê û statûya kurdistanê.

.

**Li ser roja 24´ê temûzê ku destpêka şer û 1´ê mijdarê ku roja hilbijartinên pêşwaxt hat bijartin.**

Hikimeta tirk a AKP´ê di roja salwegera peymane Lozanê de dest bi bombabara li çîyayê kurdistanê kir. Ev roja ku di wê de 92 salî berî î sal ku Kurdistan di wê de hatibû qatkirin, rejima tirk dest bi bombabaranê kir. Bi heman rengî, divê ku mirov balê bikişêne li ser dîroka roja ku bo wê weke roja hilbijartinên pêşwaxt ku hatîya bijartin jî binerê. Roja **1´ê mijdarê, weke "roja kobanê**" jî hatîya bijartin. Her wusa, di cihanê de ev berxwedana kobanê ku deng vedaya ku weke roja wê hatîya bijartin roja kobanê, di wê rojê de dikin ku hilbijartinê bikin. Armanca di vê rojê de kirina hilbijartinan û her wusa hewldanên di bin benda ji sadî 10 de hiştina HDP´ê, divê ku mirov weke hewldanaka ku di vê roja kobanê´ de ku dixwezin têkçûnekê bi kurdan bidina jînkirin jî werênina ser ziman.

Ti farqe wê zihniyetê tûnaya ku di roja roja 24´ê temûzê ku roja salwegera peymane lozanê ya ku di wê de bidest bombabaranê li ser serê kurdistanê dike, ji ya hewldana kirina hilbijartinan di roja 1´ê mijdarê de tûna ya.

Rejima tirk û hikimeta AKP´ê, weke ku dixwezê ku wê roja ku weke ´roja kobanê´ tê bi navkirin, di wê rojê de derbeyekê li kurdan bixe. Yanî, ew derbeye ku wê dixwest ku DAÎŞ bo wê li kurdan bixe û ku nekarî ku li

kurdan bixe, nûha ew bi vî rengî li ser hin dîzaynkirinên li ser sîyesetê re dike û dixwezê ku bike. Roja kobanê, kirina weke roja hilbijartinên pêşwaxt, divê ku mirov bi vê zihniyetê ve girêdayî werêne ser ziman. Her wusa, wê roja berxwedana kobanê ku karibê di wê de şikeştinekê bi kurdan bide jîyankirin. Di vê çerçoveyê de diçê bi ser kurdan de.

Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku mantiq û zihniyeta di temenê vê kifşkirina rojên giring de bi vî rengî, bi armanca domandina şerekî bi kurdan re ya. Her wusa, armanca wê, ew a ku di mejiyê kurdan de, rojeke ku di wê de hîs û hêsta serkevtinê di mejiyê kurdan de ku bi wan re çê bike ku nebê. Mantiq û zihniyet ev a.

Li vir, divê ku mirov kifşkirina 1´ê mijdarê bo hilbijartinên pêşwaxt, weke kifşkirina roja 24´ê temûzê ku weke roja destpêka bombabarandina li çîyayên kurdistanê jî werêne ser ziman. Yanî, bi gotinaka din, di vê çerçoveyê de li ser roja ku tê xwestin ku di wê de hilbijartinên pêşwaxt werina kirin 1´ê mijdarê, weke rojeka ´şikeştinê´ ku di dimejiyan de bicih bikin. Armanca sereka a di temenê vê kifşkirina vê rojê a weke ya roja hilbijartinên pêşwaxt, divê ku mirov di vê çerçoveyê de weerêne ser ziman. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî di dewama wê de werêne ser ziman ku çawa ku kurdan weke ´roja berxwedanê´ û ankû ´roja kobanê´ 1´ê mijdarê kifşkir û ev roj bi vî rengî bû malê dûnyê, her wusa rejima tirk û hikimeta AKP´ê dixwezê ku vê rojê, weke roja hilbijartinan kifş bike û di wê de hilbijartinan bike û di wê rojê de partîya kurd HDP´ê di bin benda ji sadî 10 de bihêle û li ser wê re ne weke roja kobanê û ankû ya berxwedanê, her wusa weke rojeka ´şikeştinê´ ku di mejiyê mirovê kurd de bicih bike.

Bo vê yekê ya ku giraniyê dide şer û di ber re jî, amedekarîya hilbijartinan dike. Herêmên kurdan ku partîyên weke ên AKP´ê ku ji wan hêvî nakin ku wê deng bigrin, her wusa bi şer û kevilkirinê û hwd, ku pêşîya dengê kurdan ê ji wan re bigrê. Her wusa, bi wê re jî, dixwezê ku herêmên kurdan, bi wê konsepta şer bike wê rewşê de ku nikaribin dengê xwe bikarbênin. Lê li aliyê din jî, ku karibê xwe biser bixe, li ser wê dihizirê. Yanî, bo vê yekê jî, serî li her rê û rêbazê dide. Her rêyê ji xwe re ´mubah´ dibînê.

Li vir, ya ku tê ditin û fahmkirin, ew a ku rayadarên tirk û ên AKP´yî, ji hilbijartinekê zêdetirî, di vê çerçoveyê de hin hasabna ku li ser derûnîya mirov kirina di wê çerçoveyê de nêzîkî hilbijartinan dibin. Dixwezin ku kî qizinc bike bila bike, lê çawa bê bila bibe, ku partîya kurd di bin benda ji sadî 10 de bimêne. Dii vê çerçoveyê de nêzîk dibê. Li vir, armanc, di serî de ew a ku ´roja 1´ê mijdarê´ ku weke ´roja kobanê´ û ankû ´roja berxwedana kobanê´ jî tê binavkirin û hatîya herêkirin, weke rojeka şikeştinê jî

dimejîyan de bicih bike. Yanî, bi gotinaka din, ku mirov bibêje ya ku mirov dibînê ew a ku di vê çerçoveyê de hin armancên derûnî jî rejima tirk û hikimeta AKP´ê li van hilbijartinên pêşwaxt kirina.

Peyame ku bi destpêkirina bombabaranê di 24´ê temûzê de çûbû, her wusa, bi heman rengî di kirina roja 1´ê mijdarê de hilbijartinan de jî, peymanek bi vî rengî rayadarên tirk li gorî xwe bi hilbijartinên pêşwaxt ve kirina. Bijartina roja 1´ê mijdarê weke roja hilbijartinên pêşwaxt, mirov dikarê di çerçoveya kifşkirina roja 24´ê temûzê de ku weke roja salwegera peymane lozanê ya ku rayadarên tirk di wê de bombabaran li kurdan dana destpêkirin werêne ser ziman. Li vir, ku karibin, roja 1´ê mijarê ya weke roja hilbijartinên pêşwaxt ku hatîya bijartin jî bi vî rengî di mejiyan de bicih bikin. Yanî, bi gotinaka din, bijartina roja 1´ê mijdarê jî, weke konseptekê ya. Mirov dikarê bijartina roja 1´ê mijdarê weke roja hilbijartinên pêşwaxt, di vê çerçoveyê de di çerçoveya konsepta şerê rejima tirk ê bi kurdan re de werêne ser ziman. Dema ku em li ser kifşkirina 1´ê mijdarê weke roja hilbijartinê ku dibijêrên ku dihizirê, mirov dibînê û fahm dike ku di çerçoveya konsepta şerê rejimê ê bi kurdan re de ev kifşkirn bûya.

Di roja bidarvekirina şêx Seîd de di 29´ê hezîrenê de dayîna cezayê bi dervekirinê li birêz Ocalan, di roja salwegera peymane Lozanê de destpêkirina bombabardiman û konsepta şer a rejima tirk, di ´roja kobanê´ a 1´ê mijdarê de hewldana kirina hilbijartinên pêşwaxt û hwd, divê ku mirov di vê çerçoveyê de di çerçoveya konsepta şerê rejimê ê şikandin û ji dîrokê birina civate kurd de werêne ser ziman. Her wusa, newroz çend ku cejnek kurd û kurdistanî ya, hewldanên pêşî lêgirtina ku ´newroz´ bixwe jî bi navê civate kurd re werê ser ziman, mirov dikarê bi vê zihniyeta kujar re werêne ser ziman.

. **Hilbijartinên 7´ê hezîrenê û piştre ..**

Hilbijartinên 7´ê hezîrenê bûn. Di hilbijartinan de kurdan, serkevtineka mazin bidest xist. Tevî ku rejimê û rayadarên wê, gelek astengî jî derxistin li pêşîya kurdan. Lê kurdan serkevtinek, pirr mazin bidest xist. Rojekê, du rojan berî roja hilbijartinan di 5´ê hezîrenê de komkujiyeka mazin bi destê rayadarên rejimê di mitinga HDP`ê de hat kirin. Tevî wê jî, kurdan, sekna xwe parast. Bi heman rengî, du roj piştî hilbijartinan, ´provakasyona li Amedê´ rû da. Ev jî, li pişt wê rayaderên tirk hebûn. Dîsa, kontrayên dewletê daketin qadan bidest qatil kirina kurdan kirin.

Ji Provakasyona li Amedê ku tê gotin bi destê ´hizbil-kontra´ hat kirin ji aliyê rejima tirk ve, bi wê tê ditin ku rejima tirk, serkevtina kurdan hazm nakê. Her wusa, hasabên rejimê, hemû bi serkevtina kurdan re têkçûn. Ji hêrîşên li piştî hilbijartinê ku di bin çavdêrîya rayadarên dewletê û polîsên

de ku dibin li Amedê û hwd, dihê ditin û fahm kirin ku rejimê hasab wusa kirîya ku wê HDP dibin bendê de bimêne. Piştre jî, wê AKP xwe weke nimînêrê hemû kesî werêne li holê. Li ser wê re jî, wê zor li Birêz Ocalan bikiran ku banga çek berdanê bikiran.

Lê ji wê zêdetir jî, hasabê rejimê ew bû ku di hilbijartinan de biserketiba, wê şerekî mazin bi kurdan re daba ba destpêkirin. Nûha, piştî ku bi serneket û pê de, weke ku di salên 1990´î û pê de, dewletê dîsa kontrayên xwe yên ku li nava sûkê ku mirov bi bêwijdanî û bêahlaqî qatil dikirin daxistina li qadan. Her hilbijartina HDP, ku rayadarên dewletê û polisên wê di cih de bidest hêrîşê dikin, li ber wan komên kontra ên biçek ku nava sûkê mirovan qatil dikin, bêdeng in. Deng, ji wan dernekeve.

Piştî, hilbijartinan bi rojekê ku çeteyên rejima tirk dadikevina qadan bidest qatilkirina mirovan dikin, mirov dikarê weke nîşanaka konsepteke wê ya şer ya bi kurdan re jî bixwêne. Her wusa, herkesek jî dizanê ku pêvajoyeka çareserîyê ku birêz Ocalan dabûbû destpêkirin hebû. Hikimeta AKP´ê, di wê de ti gav neavêt. Her wusa, hemû mafên civate kurd, hatina ji dest girtin û pêvajoyên asîmlasyonê û ankû jenosîdê, bişitt li ser serê kurdan didomê. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku hê jî zimanê kurdî qadaxa ya. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî, bibêje ku ji ber ku ti rayadarên dewleta tirk, di serê wan de tûna bû ku di çerçoveya radestkirina maf û azadîya civate kurd de ku pirsgirêka kurd çareser bikin. Ji xwe, ji ber vê yekê bû ku T. Ardogan, der diket li qadan di got ´pirsgirêka kurd, tûna ya´. Î ro jî, wê zihniyetê, diparêzên. Sîyeseta înkara hebûna civate kurd, di roja me de jî bi rengên cûda didomê. Di serî de divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman.

Mirov nikarê, bibêje ku hê di serê rayadarên tirk de ku proje û planaka bo çareserkirna pirssgirêka kurd heya. Aliyê kurd, çend, proje û plan danîna li masê jî, wê çawa wan proje û planên aliyê kurd vala derxin, li ser wê re sîyeset kirina. Hê jî, li ser wê re sîyesetê dikin. Piştî hilbijartinên 7´ê hezirenê ku partîya kurd HDP´ê ji sadî 13 zêdetir deng girt û ser 83 parlamanan re şand meclisê jî, lê wê çawa wê rewş û hawaya piştî hilbijartinan kriminalize bikin, di wê çerçoveyê de provakasyonên weke ên li Amedê û hwd pêşxistin. Divê ku mirov, vê provakasyona li Amedê a di 9´ hezirenê de ku rayadarên tirk pêşxist, divê ku mirov bişibihêne wê komkujiya li Hesekê ku di roja newroza 2015´an de ku di wê nameya birêz Ocalan hatî xwandin. Bi wê komkujiyê re, xwestibûn ku rewş û hewa û kelecana newrozê ya gelê kurd bişikênin û ji holê rabikin. Nûha jî, heman rewş, dîsa bi komkujiyê, piştî hilbijartinên 7´ê hezîrene 2015´an kirin. Ew rewş û kelecana ku bi kurdan re di piştî hilbijartinên 7´ê hezîrenê ku afirî,

wê çawa wê bişikênin, di wê çerçoveyê de ew komkujiya li Amedê kirin.

Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku divê ku mirov di rojekê piştî hilbijartinên 7´ê hezîrenê de serî li komkujiyan dayîn a rayadarên rejima tirk, bi hasabên di serê wan de ên di derbarê kurdan de ku hena re fahm bike. Ji vê rewş û hewldana rayadarên tirk a bi armanca şikandina rewşa aramiya di nava kurdan de, mirov fahm dike ku hin hasabên wan ên bi şer kirina bi kurdan re hena. Di vê çerçoveyê de, divê ku mirov werêne ser ziman ku wê di demên pêş de, pêvajoyna giring ên şer heya ku pêş bixin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku piştî serkevtina kurdan a di hilbijartinên 7´ê hezîrenê de ku hasabên rayadarên tirk bi wê şikeştin û pê de, heya ku pêvajoyna nû yên komkujiyê werênina serê kurdan. Li vir, bi vê serkevtina kurdan re êdî derketîya li holê ku çendî giringa ku kurd bi civatî di nava xwe de bi helwesteka netewî û civatî ku tevbigerihin. Her wusa, weke ku çawa ku hemû hêrîşên çeteyên DAÎŞ´ê ku ku bi alikarîya rejima tirk li kurdan dibin, çawa ku bi hevgirtineka di fîliyetê ya kurdan re de hat şikandin, wê bi heman rengî, dîsa yekîtîyeka navxweyî a li bakûrê kurdistanê jî, wê dîsa hasabên şer û şikandina vîna kurdan ên ji vir û pê de jî, bişikêne. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, bibêje ku ji vê demê û pê de, bo kurdan û civate kurd, yekîtî û tifaq, wene nan û avê ji wan re giring û pêwîsta. Di aslê xwe de ew provakasyonên li Amedê, hinekî jî, armancaka bi vî rengî jî di temenê wê de heya. Yanî, bi gotinaka din, di serî de, bi wê întîbaya ku ´kurdan bi kurdan re bide şerkirin´ re bike ku wê temenê yekîtî û tifaqa civate kurd Xira bike. Her wusa, pêşîya wê bigrê ku kurd bi hevdû re tevbigerihin. Di serî de, weke ders û fêra pêşî a ku mirov ji wê provakasyona li amedê ku bi kontrayên dewletê hatî kirin, ev armanc jî di temenê wê de heya.

Li vir, di serî de, ya ku kurd, êdî fahm bikin, ew a ku tenê li ser partîtîyan re wê netewa civate kurd newê parastin. Ji xwe, berî hêrîşên DAÎŞ´ê ku ew amedekerîyên bo li darxistina kongira netewî a kurd ku hatiban bi dawî kirin û kongira netewî a kurd ku hatiba li darxistin, wê di dema hêrîşên DAÎŞ´ê de, ewqas zirerek mazin hem li rojavayê kurdistanê û hem jî li başûrê kurdistanê û beşên din ên kurdistanê ne gihiştiba kurdan. ..

Nûha, êdî piştî hilbijartinên 7´ê hezîrenê û pê de, pêvajoyek nû destpêkirîya. Rayadarên tirk, dema ku pêvajoya çareserîyê herê kiribûn, bi hevdîtinên bi birêz Ocalan re, wusa hasab kiribûn ku wê bi hêrîşên DAÎŞ´ê û her wusa, hilbijartinên weke ên 7´ê hezîrenê û hwd re, derbeyê li vîna kurdan bixin. Wusa hasab kiribûn ku wê, kurdan di bin wê pêvajoyê de bihiştan. Lê ew di bin de man. Nûha jî, hemû hêrîşên ku hem di

pêvajoya hilbijartinan de ku li kurdan bûn jî û ên piştre ku dibin jî, divê ku mirov di vê çerçoveyê de fahm bike û werêne ser ziman. Dema ku mirov di vê çerçoveyê de dinerê jî, ya ku mirov dibînê, ew a ku dema ku di vê pêvajoya çareserîyê de ku birêz Ocalan yê ku dabûbû destpêkirin bû, ku di wê de proje û planên rejimê ên çareserîyê tûna bin, wê bi xwezayî, planên şikandina kurdan wê hebin. Ya ku nûha jî, mirov dibînê ev a. Wusa dihê ditin ku rejima tirk, weke pêvajoyên hêrîşên DAÎŞ´ê, weke ku dixwezê ku pêvajoyaka din li hemberê kurdan birêxistin bike. Ya ku wê vê xira bike jî, yekbûna kurdan û bi hevdû re bûna wan bê. Vê yekê jî, dixwezê ku bi wê întîbaya ku weke ku ´kurd bi kurdan re şer dikin´ re û hwd re dixwezê ku xira bike.

kurd, di vê çerçoveyê de, divê ku biaqilî selim tevbigerihin. Divê ku yekbin. Di vê çerçoveyê de, yekbûn û tifaq, wê ji her demê zêdetirî ji wan re bide qizinc kirin. LI ser hasabên piçûk ên partîyan û hwd re, divê ku ne hizirin. Divê ku bizanibin, ku yek, ji wan winda bike, wê hemû winda bikin. Weke kevirê domîno, baxtê hemû kurdan, di vê pêvajoyê de, bi hevdû ve girêdayî ya.

**. Komkujîya Pîrsûsê, di ancama polîtîkayên hikimetên tirk ên li ser esasê ku dixwezê kurdan bişikênê de tê kirin.**

Di serî de divê ku mirov bi şermazarkirina komkujiya ku DAÎŞ´ê bi alikarîya hikimeta AKP´ê li Pîrsûsê kir re dest pê bike. Bêgûman, komkujîya li Pîrsûsê, her mirovê ku piçekî wijdan û ahlaq bi wî re hebe dihêşêne. Ciwanên sosyalîst ku bo ji nûve avakirina Kobanê ku hatina Pîrsûsê, di nava wan de bomba tê taqandin û ji 33 ciwan dihên qatil kirin. Ev komkujiyeka namerdene ya. Tenê, yên ku bi zihniyeta xwe re dijmirov in, dikarin vê komkujiyê bikin û wê xoş bibînin.

Komkujiya Pîrsûsê, rastî dema ku salwegera şoreşa rojava tê. Her wusa, li vir, divê ku mirov vê gotinê jî bibêje ku her salwegerên kurdan û kurdistanîyan, bêgûman, rayadarên rejima tirk, komkujiyek hanîna serê kurdan. Weke ku di newroza 2015´an de li Hesekê ku kirin, weke komkujiya li Kobanê ku di 25´ê hezîrenê de ku li deriyê Mirşîtpinarê kir û hwd. Her wusa, mirov dikarê di vê çerçoveyê de bi dehan komkujiyên ku rayadarên rejima tirk hanîna serê kurdan mirov dikarê li dûv hevdû rêz bike.

Lê li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku ev komkujiya ku di 20´ê temûzê de ku li Pîrsûsê hat kirin de hinek teybetîyên ku bi wê re xwe didina dîyarkirin hena. Piştî ku DAÎŞ li Kobanê, Girê sipî û hwd têkçû û pê de, herî zêde raydarên tirk ji wê têkçûna DAÎŞ´ê aciz bûn. Di van rojan de jî, agahiyên ku ji rojavayê kurdistanê tên, ew in ku hêzên YPG´ê ´û YPJ´ê ku li Hesekê DAÎŞ dorpêç kirîya ya. Mirov, dikarê, vê hêrîşê di vê çerçoveyê de

jî bixwêne. Lê vê komkujiya li Pîrsûsê, weke hewldanaka rayadarên tirk a bi destê DAÎŞ´ê ku karibin pêşîya ji nû ve avakirina Kobanê bikin a. ..

Rayadarên tirk, naxwezin ku Kobanê ji nû ve were avakirin. Dixwezin ku pêşîya ji nû ve avakirina kobanê bigrin. Vê jî, bi komkujiyên ku bikin û bi wan komkujiyan ku karibin çavtirsandinê çê bikin, bi wê dixwezin ku pêşîyê bigrin. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov, vê komujiyê bi hasabên ku rayadarên tirk kirina re jî werêne ser ziman. Bi komkujiya Pîrsûsê re hasabê pêşî ê ku rayadarên tirk kirina ku bi wê pêşîya hewldanên ji nû ve avakirina kobanê asteng bikin a. Hasabê dûyemin jî, mirov dikarê bi dorpêçkirina DAÎŞ´ê a li Hesekê ve girêdayî werêne ser ziman. Rayadarên tirk, naxwezin ku DAÎŞ ji Hesekê û raqqa´yê werê derxistin. Hertimî, di van herdû herêman de DAÎŞ´ê weke pirsûsekeka ku ji wê xwûn tê, dixwezin ku li rojava bigrin.

Di vê çerçoveyê de hewldanên pêşîya YPG´ê û YPJ´ê bigrin ku Hesekê û Raqqa´yê ji destê DAÎŞ´ê rizgar bike. Dixwezin ku bi van hêrîşên bi vî rengî pêşîya hewldanên ji nû ve avakirina kobanê û herêmên din ên rojava bigrin. Di vê çerçoveyê de van hêrîşan diikin. Yanî, ev hêrîş, weke hêrîşna bi plan û hasab in. Ev hêrîş, bi program û plan hatina kirin. Weke ku çawa ku ew hêrîşa ku du roj berê hiilbijartinê ku Amedê hatibû kirin ku bi wê dixwezin ku provakasyonê çê bikin û pêşîya HDP´ê bigrin, bi vê hêrîşa li Pîrsûsê ku DAÎŞ´ê bi aliikarîya Rayadarên tirk kir re, xwestina ku moralê bidina çeteyên DAÎŞ´ê li Hesekê û Raqqa´yê. Û her wusa, bi wê re jî, xwestina ku pêşîya ji nû ve avakirina KObanê bigrin. Armanca sereka, di vê çerçoveyê de dihê ditin ku ew a ku dixwezin ku pêşîya ji nû ve avakirina KObanê bigrin.

Komkujiya ku bi hovana li Pîrsûsê hatî kirin, wê bi wê zihniyeta ku ew daya kirin re wê di wijdanê hemû mirov û mirovatîyê de were mahkûm kirin. Ên ku ew komkuji kirina û ´teşwîk´ kirina, wê di wijdanê mirovatiyê de werina mahkûm kirin. Xalkên Mesebotamya, weke ku çawa Hemû nemrûd di dîrokê de têkbirin û şikandin, wê nemrûd û firewûnên roja me jî, mahkûm bike û têk bibe.

Her wusa, di van rojan de, ne tenê ciwanên kurdistanî û civate kurd di bin hêrîşên mazin ên bi armanca komkujiyê de de na. Her wusa, xwezaya kurdistanê jî, dihê tahrîbkirin. Şawata li daristana li çîyayê Cûdî, Bêşababê û li çîyayên li dora Amedê li Licê û hwd, di vê çerçoveyê de divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Zihniyeta ku ew daristan şawitandina û dişawitêne, ev komkujiya hovane a li Pîrsûsê jî bi zihniyeta xwe daya kirin.

Piştî ku Pêvajoya Çareserîyê ji aliyê Birêz Ocalan ve hat dayîn destpêkirin û pê de, rayadarên tirk, bi dest pêşxistina DAÎŞ´ê kirin ku

biajona bi ser kurdan de. Hêvî dikirin ku DAÎŞ, derbeyek mazin û dîrokî li kurdan bixe. Planaka weke ya ´modela Srî-lanka` çêkiribûn li ser DAÎŞ´ê re li hemberî civate kurd. DAÎŞ´ê, di vê çerçoveyê de şerê jenosîdê bi kurdan re kir. Her wusa, wê çawa rewşa civate kurd, bêxistin bin wê asta ku kurd karibin statûya xwe bixwezin, di wê çerçoveyê de hêrîşên mazin li civate kurd kirin. T. Ardogan, di wê de çêbûbû, Antebê û bo kobanê gotibû ku "kobanê ket jî ket, dikeve." Ev gotinên T. Ardogan, hêvîya wî û ya rayadarên tirk bû ku DAÎŞ bike. Her wusa, bi heman rengî, di destpêka şoreşa rojava de jî, ku kurdan care pêşî dest danî li ser rêveberîya bajarê rojavayê kurdistanê ê KObanê, dîsa T. Ardogan derdikeve berçapameniyê û dibêje ku "emê ji rewşek bûyî û bi dawîbûyî re nebêjin ey-welleh". Piştî van gotinên T. Ardogan re, kom bi kom çete hatina bi rêxiistin kirin û ajotina bi ser kurdan de. Ji ´cebetil-nasr´ bigra û heta DAÎŞ´ê û hemû hêrîşên ku li rojava li kurdistanîyan hatina kiirin, divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Xwestibûn ku bi hêrîşên van çeteyên hov re şoreşa rojava bi tafisênin.

Lê dema ku DAÎŞ´ê armanca wan, pêk nehanî, piştre ew bii xwe ketina dewrê de. Hemû hêrîşên li rojava, di vê çerçoveyê de bi plan hatina kirin. Hemû hêrîşên ku dikin, divê ku mirov di çerçoveya hewldana tafisandina şoreşa rojava de hilde li dest. Di vê çerçoveyê de rayadarên tirk ên hikimetên AKP´ê û hwd, li ser esasê dijminatîya kurdan, bi hemû hêzên herêmê ên paşvarû re peyman çêkirin û bi hevdû re çûna bi ser kurdan de.

Ev hêrîşên ku weke ku DAÎŞ dike, divê ku mirov weke hêrîşên ku di çerçoveya şiikandina kurdan de fahm bike. Wê çawa, kurdan bêstatû bihêlin, di wê çerçoveyê de van hêrîşan dikin. Her wusa, ´nîqaşên çekberdanê´ jî divê ku mirov di vê çerçoveyê de hilde li dest. Dixwezin ku kurdan bêparastin bihêlin û êdî çi dixwezin ku bi kurdan bikin, ku êdî bikin. Nîqaşên çekberdanê, di çerçoveya bêparastin hiiştina kurdan de diikin. Di temenê wan de ti zihniyeteka mirovane ku mirov bibêje ku dixwezin ku pirsgirêka kurd çareser bikin tûna ya. Dixwezin ku kurdan bêparastin bihêlin û piştre politikayên xwe yên bêstatû hiştina kurdan bibina sêrî.

Her wusa, bi vê komkujiya li Pîrûsê re girêdayî, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku dixwezin ku tifaqa, di nava hêzên demokratik û gelan de jî têk bibin. Her wusa, mirov dikarê, komkujiya li Pîrsûsê, weke acizîya hikimeta AKP´ê û rayadarên tirk û DAÎŞ´ê a li hemberî nîqaşên jinûve avakirina kobanê jî bixwêne.

Di hilbijartinên 7´ê hezîrenê de kurdistanîyan, vîna xwe kir yek. AKP´ê di nava kurdan de û li hemberî kurdan têkçû. Her wusa, partîya kurd HDP´ê

bend derbas kir û ket meclisê de. Ev serkevtina kurdan, hertimî, ji bo rayadarên tirk jî bûya sedema hêrîşên nû ên li kurdan. Ji ber ku naxwezin ku vîna kurdan nas bikin, pêşî nîqaşê ´nemeşrûtîyê´ li ser serkevtina HDP`ê re meşandin. Piştre jî, lez dana oparasyonên qirkirina sîyesî. Bi wê re jî, komkujiya li deriyê mirşîtpinarê kirin. Î ro jî, komkujiya li Pîrsûsê kirin. Ev komkujiya li Pîrsûsê jî,, divê ku mirov weke ancama acizîya rayadarên tirk a li hemberî serkevtina kurdan a di 7´ê hezîrenê de jî bixwêne. Her wusa, di vê çerçoveyê de jî, ancamek giring bi vê komkujiya li Pîrsûsê derdikeve li holê.

Bi vê re divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku wusa xûya dike ku wê hêrîşên bi vî rengî ên ku bi destê rayadarên tirk bin û bi alikarîya rayadarên tirk ku DAÎŞ û hwd bike bê, wê di demên pêş de jî bikin. Ji ber ku politikayaka wan ya bo çareserkirina pirsgirêka kurd tûna ya. Rejima tirk, şer li hemberî pêşketina statûya kurd dide. Bo vê yekê, her hewldanên ji nava civate kurd û pêşketinên ji nava civate kurd û bi destê kurdan, rejima tirk bo xwe weke sedema hêrîşan dibînê. Ev komkujiya li Pîrsûsê jî, û komkujiyên weke li deriyê mûrşîtpnarê ku di 25´ê hezîrenê de hatkirin de û hwd, mirov dikarê weke ancama vê sîyeseta rayadarên tirk di çerçoveya dijminatîya kurdan de bibînê û werêne ser ziman.

Sîyeseta rayadarên tirk a di çerçoveya dijminatîya li kurdan de, piştî serkevtina kurdan a di 7´ê hezîrenê û pê de zêdetir bû. Hê zêdetirî hat ditin. Her wusa, piştî serkevtina kurdan a li rojava ku girê sipî ji destê çeteyên DAÎŞ´ê hat xilas kirin û pê de, ev sîyeseta rayadarên tirk a li ser esasê dijminatîya li kurdan, zêdetirî rengê wê hat ditin. Gotinên weke ´mudahaleya li rojava", kolandina hendekan di nava rojava û bakûrê kurdistanê de û hwd, divê ku mirov di vê çerçoveyê de weke ancama sîyeseta dijminane a li kurdan werêne ser ziman.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku bi vê Komkujiya li Pîrsûsê, hewldana ku pêşîya hewldanên kurdistanîyan û demokratan a ji nû ve avakirina kobanê bigrin. Di serî de, divê ku hemû kurdistanî, weke bersiveka dîrokî, divê ku bi herikina li kobanê û di ji nûve avakirina wê de cih bigrin. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku bi vê hêrîaşa li Pîrsûsê re, weke ku hersê salên salwegera şoreşa rojava ku xwestina ku bixwûn bikin. Divê ku weke bersiveka vê, her kurdistanî û mirovên ku ji xwe re dibêjin ku ez mirov im, zêdetirî li wê şoreşa rojava xwedî derkevin. JI ber ku ev hêrîş û komkuji, armanca wê, ew a ku pêşîya lê xwedî derketina li kobanê û li kobanê jî bigrin a. Di vê çerçoveyê de ev hêrîşa li Pîrsûsê ku DAÎŞ bi alikarîya rayadarên tirk kir, weke piştgirîyekê ya jî, ji çeteyên DAÎŞ´ê ên ku di hesekê deYPG´ê û YPJ´ê dorpêç kirina ya.

Ev hêrîşa li Pîrsûsê di vê çerçoveyê de weke hêrîşeka li rojava, li salwegera şoreşa rojava û her wusa li hewldanên jinûve avakirina kobanê ya.

**. Piştî komkujiya Pîrsûsê, destpêkirina pêlên oparasyonên qirkirina sîyesî tên zêdetir kirin û di dewama wê de jî bombardima li ser çiyayên kurdistanê û qandil, zap û zagrosan destpê dike.**

Piştî komkujiya li Pîrûsê ku bi aliikarîya hikimeta AKP´ ku DAÎŞ´ê li Pîrsûsê kir û pê de, rayadarên tirk, giranî dana oparasyonên qirkirina sîyesî. Di vê demê de ku hê mirov li ser komkujiyê diaxifin û hê êşa komkujiya Pîrsûsê zindîya, oparasyonên qirkirina sîyesî tên çi wate yê? Î ro, di 24´ê temûzê de hemwaxt hêzên polisîya li bi sedan deveran oparasyonan li mal, kargeh û navendên kurdistanîyan dikin. ..

Her wusa, li bajerê tirkiya ên weke Sitembûlê jî hemwaxt bi ser navendên kurdan û HDP´ de digrin û bi dehan kurdistanîyan û mirovên demokrat digirin. Wusa xûya dike ku wê ev ev pêlên oparasyonên qirkirina sîyesî ku rayadarên tirk, dana destpêkirin li hemberî kurdan, wê hê jî bidom in. Rayaderên tirk, bi van oparayonên li saziyên sîvîl ên kurdan ku dikin re hinek armancên wan hena. Yek, piştî komkujiya li Pîrsûsê ku rêyê hikimetên AKPê bi alikarîya wê a ji komkujiyên kurdan re ku derket li holê û hat dîtin, dixwezin ku ji bal û heya mirovan bidina dûrkirin. Yanî, ji vê aliyê ve, mirov dikarê van oparasyonên ku li qada sîyeseta demokratik a kurdistanîyan dihê kirin, mirov dikarê weke oparasyonên têgihê jî werêne ser ziman. Lê aliyê din ê duyemin jî, mirov dikarê bi zihniyeta rayaderên tiirk a li dijî kurdan a bi dijminatîya wan re mirov dikarê werêne ser ziman. Ew jî, ew a ku wê çawa kurdan ji xwestekên wan ên civatî bixin di vê çerçoveyê de ev oparasyonên dihên kirin. Di çerçoveya van oparasyonên qirkirina sîyesî de mirov dikarê qadaxaya li ser zimanê kurdî bibîr bike û werêne ser ziman.

Dîroka oparasyonên qirkirina sîyesî, pirr kevn a. Her wusa, mirov dikarê, di çerçoveya konsepta rejima tirk a li dijî kurdan re heta sale 2009´an herê. Di wê demê de jî, oparasyonên qirkirina sîyesî, dabûbûn destpêkirin. Pêşî, serî li tevgera azadîya kurdistanê dabûbûn ku agirbestê bike. Piştî ku Tevgera kurd agirbest kir û pê de, oparasyonên qirkirina sîyesî li hemberî kurdan li qada sîyeseta kurdan dihê kirin. Pirr balkêş a ku, di wê demê de, ku xalet newê bîra min di sale 2009´an de piştî xwestina denezendina agirbestê ku tevgera kurd di 13´ê nîşanê de agirbest denezendibû û pê de, rayadarên tirk jî di 14´ê nîşanê de dest bi oparasyonên qirkirina sîyesî kiribûn.

Piştî wê re, parazerên birêz Ocalan jî di nav de bi sedan rêveberên partîya kurd BDP´ê jî hatibûbûna girtin û avêtibûna zindanan. Ev

oparasyonên qirkirina sîyesî ku kurdistanîyan hatina kirin, wê di bin navê "oparasyonên KCK´ê" de werina kirin. Piştre jî, wê bi sedan "dozên KCK´ê" wê li bajar û bajarokên kurdistanê û tirkiya werina destpêkirin. Ev çi bû? Ev, ew bû ku li şûna oparasyonên leşkerî ku rejima tirk, dad û dadgeh kiribû, li şûna wê de û bi wê oparasyon li kurdistanîyan dikir bû. Oparasyonên qirkirina sîyesî, bi armanca pêşîya pêşketina civate kurd bi sîyesî bigrin bû. Ji ber ku rejima tirk, li dijî statûya kurd û civate kurd bû. Zimanê kurdî, qadaxa kiribû. Sazîyên zimanê kurdî ên weke ´kurdî-der´, ´TZP-kurdî` û hwd, wê bi navê `oparasyonên KCk´ê wê oparasyon li wan werina kirin. Hemû sazîyên sîvil û şariştanî ên civate kurd, wê pêşî bi oparasyonên bi vî rengî werina ´krimînalîze´ kirin. Piştre jî, wê herina bi ser wan de. Her wusa, sîyesetmederên kurd, mamosteyên ku bi zimanê kurdî perwerde didin, xwepêşandêrên ku bi kurdî diaxifin, tevgerên civatî ên kurdî ku bi zimanê kurdî dijîn û dixwezin ku tiştekî ji civate kurd re bikin bi rewşenbîrî û hwd, wê di armanca van oparasyonên dewletê ên ´qirkirina sîyesî´ ên di bin navê ´oparasyonên KCK´ê" de bin.

Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku hertimî, bi krimînalîze kirinê re rayadarên tirk, bi vî rengî bi oparasyonên qirkirina sîyesî çûna bi ser kurdan de. Î ro, bi deh hezaran kurdistanî, ji ber ku kurd in û doza maf û azadîya xwe dikin, di zindanên rejima tirk de na.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku piştî komkujiya Pîrsûsê, lezdane oparasyonên qirkirina sîyesî, hinekî jî bi armanca kirina oparasyonê li mejiyê mirovan a. Mirov dikarê, van oparasyonên dawî ên qirkirina sîyesî, weke oparasyonên têgihê jî binav bike. Bo ku kurdistanî û dordorên ku li ser komkujiyê dinivîsênin ku li ser komkujiyê nenivîsênin ku mejiyê wan herê li ser tiştekî din û wê binivîsênin. Ji ber ku dema ku ew komkujiya Pîrsûsê, ku rastîya wê were lêkolînkirin û li ser wê were nivîsandin, wê rastîya rejima tirk a 90 salî jî wê were dîtin.

Di aslê xwe de, mirov dikarê nêzîkatîya rayadarên tirk û b giştî jî ya rejima tirk ku bi destûrî dihênin ser ziman jî a li kurdan jî fahm bike. Hertimî li ser essê înkare kurdan, sîyeset kirina. Rêveberîyên awarta avakirina û li ser wan re alozî derxistina û li ser wê re jî dîzaynkirin dana civatê. Di roja me de jî, di vê çerçoveyê de dikin. Dema ku mirov bi komkujiya Pîrsûsê re li ser oparasyonên qirkirina sîyesî li dûv hevdû bihizirê, ya ku mirov kifş dike ew a ku pêşî komkujiyê dikin û bi zihniyeta wê komkujiyê êdî bidest oparasyonên qirkirina sîyesî dikin. Mirov, li vir, vê yekê jî kifş dike ku weke destpêka van oparasyonên qirkirina sîyesî mirov komkujiya Pîrsûsê dibînê. Her wusa, di vê çerçoveyê de didewama hevdû de weke ku ev oparasyonên qirkirina sîyesî ên piştî komkujiya Pîrsûsê ku

hatina kirin, bi komkujiya Pîrsûsê re hevdû temem dikin do xatekê de.

Mirov dikarê komkujiya Pîrsûsê, weke şîdeta rejima tirk a di hundurê oparasyonên qirkirina sîyesî de jî werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî,, werêne ser ziman ku bi komkujiya Pîrsûsê re weke ku xwestina ku tirsê di mejiyê mirovan de çê bikin. Piştre jî, li ser wê re bi oparasyonên qirkirina sîyesî êdî ancamên wê komkujiyê ji aliyê xwe ve bidest dixin. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê bibêje ku oparasyonên qirkirina sîyesî ên piştî komkujiya Pîrsûsê, mirov dikarê weke oparasyonên ku bi wan dixwezin ku komkujiya Pîrsûsê bibina sêrî û ancamê bidest bixin. Di vê çerçoveyê de di serî de ancamak derdikeve li holê.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku Piştî komkujiya Pîrsûsê, oparasyonên qirkirina sîyesî, hem di çerçoveya amedekerîyeka oparasyonal a leşkerî de dihê kirin û hem jî di çerçoveya li gorî pêvajoyek şer ku derûnîyê biafirênin. Wusa xûya dike ku rayadarên tirk, pêvajoyek nû ya şer di mejiyê xwe de konsepta wê çêkirina. Di vê çerçoveyê de sevkiyetên leşkerî ku bajarên kurdistanê û herêmên wê hatina kirin, weke ku her bajar û herêmên kurdistanê ji nû ve hatibina dagirkirin a. Her roj, sevkiyetên nû, li bajar û herêmên kurdistanê dikin. Di vê roja ku weke pêleka din ya nû a oparasyonên qirkirina sîyesî ku di wê de dane destpêkirin, wê nûçe ji herêmên kurdistanê werin ku sevkiyetên tankan li herêmên kurdistanê ên weke Geverê werina kirin. Ji aliyekî ve li civatê û mejiyê civatê oparasyonên qirkirina sîyesî dikin. Lê ji aliyê din ve jî, sevkiyetên mazin ên leşkerî li bajar û herêmên kurdistanê dikin. Î ro, yanî roja 24´ê temûzê ku weke pêleka nû ya oparasyonên qirkirina sîyesî ku hikimeta AKP´ê dabûbû destpêkirin, wê di heman rojê de jî li bajarên kurdistanê ên weke Geverê, wê sevkiyeta tankan bikin. Di vê çerçoveyê de oparasyonên qirkirina sîyesî, oparasyonên leşkerî û sevkiyetên leşkerî ên artişa tirk bi hevdû re di ahengekê de dihên kirin.

Pêla nû ya oparasyonên qirkirina sîyesî ku di 24´ê temûzê de rayadarên tirk li hemberî kurdan dane destpêkirin, weke oparasyona dawi ya hikimeta AKP´ê a di dewama komkujiya Pîrsûsê de ya. Her wusa di vê çerçoveyê de wusa dihê ditin ku bi vê pêla oparasyonên qirkirina sîyesî re ji armancakê zêdetirî gelek armanc hena. Pêşî, dixwezin ku rojevê ji ser komkujiya Pîrsûsê bidina gûharandin. Ji aliyê din ve jî, li ser wê re oparasyona têgiihê li mejiyê mirovan bikin. Di dewama wê de jî, asta pêşketina sîyeseta kurd kêm bikin. BI oparasyonên qirkirina sîyesî re, dixwezin ku hertimî ´bendekî tirsandinê´ li pêşîya xwe hanîna ser ziman a sîyeseta kurd, sîyesetmederên kurd û her wusa pêşketina sîyeseta kurd dênin. Aliyekî van oparasyonên qirkirina sîyesî ku rejima tirk û rayadarên wê li qada sîyeseta kurd dikin jî,

ev a. Oparasyonên qirkirina sîyesî a rayadarên tirk, di çerçoveya projeya jenosîdkirina civate kurd ya rejim tirk de dihên kirin.

Bêgûman, mirov divê ku ji gelek aliyan ve bahse oparasyonên qirkirina sîyesî ên ku rayadarên tirk li ser pergale dadê re ku li ser serê civate kurd û mirovên wê dimeşênin, mirov dikarê ji gelek aliyan ve werêne ser ziman. Her wusa, pêşîya pêşketina sîyeseta kurd û demokratizekirina wê jî, dixwezin ku bigrin. Hertimî, dixwezin ku rewşê, di rewşek awarta de bihêlin. Ji ber ku li ser wê kiriminalize kirinê û her wusa pêşîlêgertinê dikin.

**Şîroveya Machiavelli ´hikimdar´ û derûnîya T. Ardogan a ku xwe weke ´padîşah dibînê û herkesekî ji xwe re weke ´xûlam´ dibînê. ..**

Nicollo Machiavelli, di pirtûka xwe ya bi navê "hikimdar" de bi desthilatdarîya hikimdar re gotina "bo gihiştina armancê, her rê û tişt mubah a" dihêne ser ziman. Her wusa, şîroveya Machiavelli ku di pirtûka xwe ya hikimdar de dike, bi wê dibêje ku "bo gihiştina armancê, her rê û tişt mubah a." Ya ku em î ro, bêgûman li tirkiya bi T. Ardogan û rayadarên tirkiya re dibînin ev a. Dema ku mirov pirtûka Machiavelli a bi navê ´hikimdar´ dixwêne, mirov dibînê ku weke ku rengê sîyeseta ku desthilatdarîyê roja me ku rejimên weke tirkiya ku dimşênin dihêne ser ziman.

Mijara desthilatdarîyê, Machiavelli, bi du rengan dihêne ser ziman. Rengek, weke desthilatdarîya xalkê ya. Rengê din jî, ê serdest, dewlemend û hwd a ku bo desthilatdarîya dikarin hertiştî bikin nin. Her wusa, ya ku mirov

dibînê jî ev a. Li ser derûnîya T. Ardogan û rêveberîya tirk û ya rêveberîya wê jî, Machiavelli van gotinan dibêje rêveberîyên weke "rêveberîya tirk, carna zora ku bêxistin. Ber ku di nava vê rengê desthilatdarîyê de xalk tûna ya. Herkes xûlamê padîşah a. Hertimî, di gotina padîşah de ya." Bi gotinaka din Machiavelli dixwezê ku bibêje ku "xalk, di nava vê rengê rêveberîyê de tûna ya. Tenê yên girêdayî ên weke ´xûlam´, berdest û bindest hena." Mirovên ku bi vî rengî jî, ti carî serî ranakin. Hertimî ku herina kûderê jî, rêya wan tê û li xulamîya wan ya ji padîşah re diqalibê.

Bo vê yekê ya ku Machiavelli dibêje ku "kî, hêrîşî osmanîya bike, wê di rengê yekîtîyekê de wê li hemberî xwe bibînê." Ber ku herkes xulam a û li gorî gotina padîşah tevdigerihin. Ti kesek, dernakeve dervî gotina Padîşah. Her wusa, yên ku derkevin jî, mafê jîyanê ji xwe re nabînin.

Ev rengê rêveberîyê ku Machiavelli şîrove dike, gîyane wê bi nêzîkatîya kirina herkesî ji xwe re weke ´xulam´ re mirov bi T. Ardogan re li Tirkiya´yê dibînê. Herkesek, divê ku li gorî wî bê. Divê ku li gorî desthilatdarîya wî û pergale wî, kar bike û hebê. Nêzîkatîya rêveberîya tirk, hertimî li gelên di nava sînorê tirkiya de re bi vî rengî bûya. Gotina ´girêdayîna bi dewletê ve´ a ku rayadarên tirk bikardihênin, di vê çerçoveyê de xwedîyê gîyan û zanebûnekê ya. Çendî ku girêdayî bin, wê ewçendî li gorî gotina rayadarên dewletê û serokwezir û serokkomar bin. Di vê çerçoveyê de hertimî dixwezin ku herkesek bo wan xûlam bê. Hertimî, ew xûlam, wê bo wan herina mirinê. Xûlam, bo wan, ew mirovên ku bo wan herina mirinê ku ew jî li ser wan re ku ew karibin desthilatdarîya xwe bidina domandin a.

Gotinên weke ´nîjadperestîtîyê´, ´welatperwerîyê´ û hwd, çendî gotinên bi vî rengî hebin, weke gotinên bi zihniyeta xûlamîyê ku ser wan re mirovan bi xwe ve bidina girêdan a. Ma ne ji ber vê yekê ya ku tirkiya bûya ´dewlet´ lê nebûya xalk û ew pêvajoyên xalkîtîyê nejîna. Her wusa, bûyîna xalk, wê ahlaqekî xalkê jî bi xwe re biafirêne. Ev ahlaqê xalkîtîyê, wê hertimî temenê li hemberî destpotên weke T. Ardogan temenê serîhildanê bê. Bo vê yekê, pêvajoyên xalkbûnê, nahêlin ku bê jîyîn. Ankû, ne hiştina ku bijîn. Xalkên weke kurdan ku hinekî ew pêvajoyên xalkitiyê jîya na, rêveberîya tirk, hertimî hêrîşî wê xalkîtîya wan dike ku bo ku tûne bike. Pêvajoyên dewletbûnê, weke pêvajoyên xalkbûnê dihênina ser ziman. Lê di aslê xwe de xapandina mazin di vir de ya. Mirov nikarê, pêvajoyên dewletbûnê, ti her rewşî de bi têgîna xalkbûnê û ankû pêşketina xalkbûnê re werêne ser ziman. ..

Gelê kurd, çendî ku î ro welatê wê ji destê wê hatîya girtin jî ya, xalkeka. Lê çendî ku tirkiya avabûya bi ser ve bi dehan sal bûhûrtina, mirov

nikarê, bi wê re bahse têgîna xalkbûnê bike. Têgîna xalkbûnê bi wê re tûna ya. Hertimî, destpotên weke T. Ardogan ku hatina xwe kirina desthilatdar, ne hiştina ku gelê tirk jî, pêvajoyên xwe yên xalkbûnê bijî û pêşbixe.

Ji destpotên weke T. Ardogan re hertimî, mirovên ku bi wî bawer dikin û bi wî ve girêdayî ên weke ´xûlam´ lazim in, ku tenê li gorî rastî û ´ahlaqê wî´ bijîn. Bo vê yekê ya, ku T. Ardogan, xwe weke padîşahekî ku herkesekî weke xûlamê xwe dibînê û ku herkesek bo wî ku divê ku herê mirinê dibînê. Di vê çerçoveyê de nêzîkî wî dibê. Bi vê mantiqê û têgînê, hebûna xalkan û navê wan bo xwe xatera dibînê. Bi karhanîna nav û zimanê xalkan, weke telûke dibînê bo xwe û desthilatdarîya xwe. Her wusa, navê û zimanê xalkan, bo xwe weke temenê ´bêîtaatîyê´ dibînê. Bo vê yekê, li şûna gotinên xalkîtîyê re gotina ´ûmmetîyê´ û temenê wê bawerîyê, weke îcateka vê sadsalê ji xwe re weke temenê desthilatdarîyê dibînê. Gotina ´ûmmetîyê´ jî, di vê çerçoveyê de kirina rol û weyneka xirab de. Gotina ´ûmmetîyê´ ku hebûna xalkan û navê wan red û înkar nakê, wusa şîrovekirina ku weke ku vajî hevdû na. Xafk û xalatîya bi zanebûn ku li ser şîrove û salixkirina gotinê re kirina jî, di vir de vêşarî ya. Ma ne ev zihniyet bû ku di sedsale 15´min de pêşîya ronasanse herêmê bi pergale xûlamîyê girt?

Î ro, bi vê zihniyetê T. Ardogan, her rê û tiştê ji xwe re bo desthilatdarîya mubah dibînê. Komkujiyê li ser serê civate kurd dike. Wê tûna dike. Her wusa, dixwezê ku ji dîrokê bibê. Herkesek, bo desthilatdarîya wî û domandina wê, divê ku zimanê wan tirkî bê û weke tirk bijîn, dakû weke xûlam bijîn ji vê rêveberîya li ser serê wan ku xwe weke ´padîşah´ dibînê. Ev zihniyeta dijmirov, bi sedsalan, li herêmê temenê hemû alozî û komkujiyan a. Ev zihniyeta kujar a ku her rê û tiştê ji xwe re ´mubah´ dibînê, li hemberî hebûna civate kurd şerê jenosîdê daya destpêkirin.

Şîroveya Machiavelli ´hikimdar´ û derûnîya T. Ardogan a ku xwe weke ´padîşah dibînê û herkesekî ji xwe re weke ´xûlam´ dibînê, rewş û derûnîya T. Ardogan û rayadarên tirk pirr xweşik dihêne ser ziman. Şîroveya Machiavelli, rastîya şerê rejima tirk, Hikimeta AKP´ê û T. Ardogan ê li hemberî civate kurd jî, xweşik dihêne ser ziman.

Li zihniyetekê bihizirin û tefkîr bikin bo ku ew xwe bide domandin, her rê û rêbazê ji xwe re mûbah dibînê. Her wusa, hebûna xalkan ji xwe re telûke dibînê û hewldide ku wan ji dîrokê bibe. Her wusa, bo ku di çerçoveya pergale ´xûlamîyê´ de ku karibê herkesekî ji xwe re bikarbêne, dixwezê ku zimanê herkesekî yek bê û zimanê wê yê fermî ku ew bikardihêne bê. Dixwezê ku xalk xwe navê xwe biterikênin, zimanê xwe biterikênin û hebûna xwe fedeyî ya wê bikin. Rayadarên tirk, berê li dibistanan dirişmek bi zarokan didan xwandin, Bi wan didan xwandin û

gotin ku "hebûna min, korbana ya tirk bê." Î ro jî, sîyeseta vê gotinê di çerçoveya desthilatdarîyê de dihê meşandin.

Dema ku ji gelan bê xwestin ku divê ku ziman, çand û rastîya xwe înkar bikin û weke ziman, çand û rastîya wê bijîn, wê çaxê, ev tê wê wateyê ku ji xalkan tê xwestin ku ´hebûna xwe, korbanî ya tirk bikin´ a. Ya ku ji xalkan tê xwestin ev a. Her wusa, î ro, ji hemû xalkên li anatolîa û mesepotamîya tê xwestin ku rastî, ziman û çanda xwe înkar bikin û bi zimanê tirkî, çanda tirkî û her wusa bi rastîya wê bijî. Ya ku î ro, şerê wê bi konseptên şerên giştî bi kurdan re li kurdistanê re tê kirin jî ev a. Kurd, li hemberî zihniyeteka bi vî rengî hem hebûna xwe dikin ku biparêzên û hem jî tekeoşîna xwe ya azadîya didin.

Ev zihniyeta Machiavelli ku bahse wê dike ku osmanîyan herkesek ji xwe re dikir xûlam, bi rengekî din lê bi heman Awa û zihniyetê li ser sîyesetê û gotinên weke ´hebûna min, korbanî ya tirk bê´ re hatîya dayîn meşandin. Î ro jî, şerê vê zihhniyeta kujar bi civate kurd re heya. Wê çawa civate, bi navê wê, bi zimanê wê û her wusa bi rastîya wê ji dîrokê bibin, şerê wê bi civate kurd re didin. Zihniyeta ku dixwezê ku herkesekî bike tirk jî, ev zihniyeta. Li ber deriyê padîşahekî çend xûlam hena, zimanê wan, zimanê padîşah a. Li gorî zimanê padîşah dijîn. Bo vê yekê, zimanên cûda û ankû rengên axiftinên cûda, divê ku werina tûna kirin. Dema ku wê herkesekî bikina xûlam û ankû bi gotinaka hemdem wê bikina ´kole´, divê ku ew kole û ankû xûlam, bi zimanê efendîyê xwe bê. Bo vê yekê, cûdahîyên xalkan, çand û zimanê wan, dîrok û rengê pêşketina wan, bi pêvajoyên şer û tûnakirina bi şer bin û ankû bi pêvajoyên bişavtinê û hwd bin, dihên tûna kirin. Dihên ji holê rakirin. Ya ku î ro, şerê wê li kurdistanê bi kurdan re dihê dayîn jî ev a.

Zihniyeta ku bi têgîna ´xûlamîyê´ nêzîkî civatê dibê, xwe ji civatê maztir dibînê. Xwe ji civatê û andamên civatê bizanetir dibînê û dihasibînê. Ew wusa hasab dike û dide nîşandin ku ya rast tenê ew dizanê û tenê ya ku ew dike ya. Di vê çerçoveyê de bi felsefeya xwe jê maztir ditinê re dihêne ser ziman. Gotina ´dewleta bav´, her wusa, mirov dikarê di çerçoveya zihniyetek bi vî rengî re de bi gotina ´hebûna min, korbanî ya tirk bê´ re fahm bike. Wê herkesek, xûlamê dewletê bê. Ankû, bi gotinaka din ku rayadarên tirk dihênina ser ziman, ´herkesek wê, îteatê ji dewletê re bike. Bi wê re jî, yên li ser serê dewletê û desthilatdarin jî, wê ji wan re jî ew îteat were kirin. Zihniyeta dewleta tirk, di vê çerçoveyê de mirov dikarê werêne ser ziman.

Bo vê yekê jî, hebûna xalkan, bi rengê wan re ji wan re weke ´xaterîyekê´ ya. Zimanê xalkan û çanda xalkan, ´telûke´ya. Ber ku çand û

ziman, temenê cûdahîyê ya ku ne weke dewletê û zihniyeta wê dihizirê ya û dikarê li hemberî kirinên wê ên qirêt û zilmê, temenê serîhildanê jî bê. Gotinên T. Ardogan ku rêveberîyên berê ên tirk jî bilêv dikirin ên weke ´yek ziman, yek dewlet, yek millet, yek al´ û hwd, di vê çerçoveyê de vê zihniyeta machiavelist dihênin ser ziman.

.

**.. Pêvajoya çareserîyê, ku di dewama wê de konsepta şer ku T. Ardogan û AKP´ li dijî kudan da destpêkirin û israre kurdan a di aşîtîyê de. ..**

Piştî ku di newroza 2013´an de bi xwandina nameya birêz Ocalan re ku pêvajoya çareserîyê destpêkir û pê de, bi ser ve sê-sal bûhûrtin. Di hundûrê vê pêvajoyê de jî, hema bêja her roj, ceneze dihatina berderiyên kurdan. Şerê ku di filliyetê de li bakûrê kurdistanê dawî lê hatibû hanîn, Hikimeta AKP´ê li ser çeteyên DAÎŞ´ û cebetil-nasr´ re barî rojavayê kurdistanê kiribû.

Di hundûrê van hersê salên ku bûhûrtin de, hikimetên AKP´ê, tenê politikayên mijulkirinê kirin dewrê de. Li ser sîyesetê re hêrîşî kurdan kirin. Wusa hizirkiribûn ku kurdan, çawa di çerçoveyek bêstatû hatî hiştin de ku bêparastin jî bihêlin û bi wê re jî êdî politikayên xwe yên li dijî kurd bibîna sêrî.

Pêvajoya, hevdîtinan a bi tevgera kurd a li Oslo jî, T. Ardogan bi dana destpêkirina nîqaşên bi dervekirina birêz Ocalan re dawî lê hanîbû. Piştre, li hemû deveran xwepêşandin, destpêkirin. Di Zindanan de girêvên birçîbûnê destpêkiribûn. Di ancama wê de pêvajoya çareserîyê destpêkiribû. Çend ku hikimeta AKP´ê, weke ku hatibê pêvajoyê û hevdîtin dikirin jî, lê di nava xwe de ne jidil bû. Ji ber vê yekê, hertimî politikayên xapandin û mijulkirinê destpêkirin. Ji destpêka pêvajoya çareserîyê ve, hikimeta tirk bidest çêkirina karakolên nû li kurdistanê û bendavên bi amanca leşkerî kir.

Plana bi gotina ´pêvajoya çareserîyê´ re di serê rayadarên tirk û AKP´yîyan de, ew bû ku bi hêrîşên çeteyên DAÎŞ´ê û hwd re derbeyê li kurdan bixin. Bi bergirên leşkerî ku li bakûrê kurdistanê girtina re xwestibûn ku derbeyekê li tevgera kurd bixin. Li ser esasê çareserkirina pirsgirêka kurd, ti carî di mejiyê T. Ardogan û hikimetên AKP´ê de çareserî nebûna. Ya ku di temenê pêvajoya şer ku T. Ardogan û hikimeta AKP´ê di vê pêvajoyê de bi kurdan re dayî destpêkirin ev a.

Lê di serê kurdan de, hertimî jidil xweestekeka bo çareserkirina pirsgirêka kurd û dawîlêhanîna vê şerê bi kurdan re hebû. Rejima tirk, dema ku mirov li dîroka wê binerê, mirov divê ku bibêje ku dîroka şerê bi kurdan re ya. Berî şerê cihanê ê yekem û piştre jî, pêvajoyên şer ên kurdan re na. Teybetîya şerên rejima tirk ên piştî şerê cihanê ê bi kurdan re ew bû ku teknîka nû bi

têgîna ´netewîya tirkitiyê´ re ku li hemberî kurdan bikardihanîn. Li agirê, Zilanê, Dersimê, Botanê û hwd, komkujiyên mazin ku di wan de bi sed hezaran kurd ji ber ku kurd in ku hatina serê wan bûna.

Ji şerê cihanê ê yekem û pê de, li rojhilata navîn, dîzaynek nû di pêşengîya sovyet, Ingilistan û Firansa de hat kirin. Kurd, tevî ku li herêmê ser 40 milyonî re jî bûn, bêstatû hatina hiştin. Piştî ku kurd bêstatû hatina hiştin û pê de, êdî şerê wê bi kurdan re hat kirin. Şerê ji dîrokê birina kurdan, bi kurdan re kirin. Di qada navnetewî de jî, ti deng li hemberî komkujiyên ku hatina hanîn li serê kurdan derneket. Hemû, hêzên cihanê, li ber wan komkujiyên ku hatina hanîn li serê kurdan bêdeng man. Di komkujiya geliyê zila de ser sed-hezarî kurd hatina qatilkirin. Di komkujiya dersimê de nêzî wê û dibêt ku zêdetir jî bê kurd hatina qatilkirin. Di komkujiyên agirî, botanê û hwd de jî, bi gelek komkujiiyên din ku hatina serê kurdan, bi heman rengî bi girseyî kurdistanî hatina qatilkirin. Lê ti ji wan komkujiyan ne hatina rojevê. Wijdanê cihanê û mirovatiyê li hemberî komkujiyên ku hatina serê kurdan bêdeng maya.

Di dewama wê de, divê ku mirov vê yekê bibêje ku piştî ku tevgera kurd PKK´ê dest bi tekoşîna azadîya kurd û kurdistanê kir û pê de, pêvajoyek nû destpê kir. Di vê pêvajoya tekoşîna azadîya kurd de jî, bi deh hezaran kurd hatina qatilkirin. Xweza kurdistanê û civate kurd armanc hatîya girtin bo ku were tûnakirin.

Kurd, ne xwediyê çekên giran in. Di destê wan de tank û balefirên şer û hwd tûna na. Lê rejimên herêmê ên weke tirkiya ku civate kurd û Kurdistan di nava wan de hatî qatkirin, ev çek di destê wan de hebûn û hertimî bi bêwijdanî li hemberî kurdan bikarhanîn. Hertimî, balefirên rejimên herêmê ên weke îranê, tirkiya, Sûrî û Îraqê, civate kurd û Kurdistan bombabaran kirina. Tenê, di vê bombabaran dawî a ku hikimeta AKP´ê a tirk ku di 24´ê temûzê de li hemberî kurd da destpêkirin de, ser 100 balefirên şer car bi car û roj bi roj rakirina û li hemberî kurdan bikarhanîna. Bi wê re jî, bi sînor nemana, oparasyonên leşkerî ên bejehî û sîyesî û hwd, li hemberî kurdan kirina.

Î ro, ku mirov li zindanên rejima tirk binerê, mirov wê bi deh hezaran ciwanên kurd û kurdistanîyan bibiînê ku hatina girtin û hatina avêtin li zindanan. Ev pêvajoya şer a ku rejima tirk bi kurdan re da destpêkirin, li ser esasê tûnakirina xwezaya civate kurd û kurdistanê dimeşê.

Pêvajoya şer a ku di vê dîroka 24´ê temûza 2015´an de hat dayîn destpêkirin, weke pêvajoyeka ku divê ku mirov ji gelek aliyan ve lê binerê. Her wusa, hikimeta tirk a AKP´ê ku bi DAÎŞ´ê re di hevkariyê de û bi hevdû re hêrîşî kurdan dikin, komkujiya pîrsûsê kir û ev komkuji, li kirina

dîplomasîya wê re bangî NATO kir ku bicivê. Li vir, ez dixwezim ku li ser wan întibayên ku bi wê komkujiya Pîrsûsê re di mejiyan de çêbûna re jî hinekî bisekinim. Her wusa, di nava kurdan de jî, pirranîya kurdan, piştî komkujiya Pîrsûsê di nava xwe de hanîna ser ziman ku Ev komkujiya Pîrsûsê, hikimeta AKP´ê kir bo ku hin hêncetna çê bike ku bangê li NATO jî bike. Her wusa, gelek hasabên ku bi komkujiya Pîrsûsê re ku rayadarên tirk kirina hena. Pêşî, hasabkirina ku bi wê komkujiyê pêşîya tevgerên civatî ên sivîl bi wê bigrê ku bo ji nûve avakirina kobanê nekevina nava tevgerê de. Hasaba din, ew a ku weke ku moralekî bide DAÎŞ´ê ku di wê demê de YPG´ê li Hesekê û Şîrînê ew dorpêçkiribûn. Hasaba sêyemin jî, ew bû ku dordorên demokrat ên tirk ku nêzî kurdan û tevgera kurd nebin.

Her wusa di nava kurdan de, dema ku bahse komkujiya Pîrsûsê tê kirin, pêşî ew gotinên Hakan Fidan tên bibîr xistin ku gotibû ku ´ez dikarim çend mirovan bişênim aliyê din ê sûrî û bikim ku çend fûzeyan biavêjina tirkiya û şerekî bidina destpêkirin" û piştî wê re tê gotin ku "ev komkujiya Pîrsûsê, rejima tirk bo ku bangê li civîna NATO bike jî kir." Yanî, bi vê gotinê tê xwestin ku bê gotin ku "rayadarên tirk, bo ku vê konsepta şer a ku bi kurdan re dana destpêkirin bo ku bertekeka NATO di çerçoveya wê de li aliyê xwe ku hatî dayîn nîşandin bidina gotin." Yanî, bi gotinaka din, NATO jî, weke ku li vir, di çerçoveya politikaya şer a rejima tirk de hatîya xistin, vê leyistikê de.

Mijara vekirina incillikê ji balefirên Amerika re û her wusa kirina komkujiya Pîrsûsê, ku di heman demê de kirina wê, mirov çendî dikarê weke rasthatinekê binirxêne? Di vê pêvajoyê de kirina komkujiyeka bi vî rengî ji aliyê rayadarên tirk ve, wê temenê çend gotinên weke sernûxûmandinê jî li ser levkirina rayadarên emerikî û ên tirk re biafirêne. Wê li ser wê levkirinê re bibêjin ku "meyizênin, me bi we re levkir û piştre ev komkuji hat hanîn li serê me." Yanî, di vê çerçoveyê de wê hem wê îstîsmarkirinê li hemberî Amerika bikin û hem jî, li hemberî rayagiştî bikin. Ji xwe, komkuji, bo rayadarên tirk, bo weke destpêka şerê konsepta hikimeta AKP´ê a şer a bikurdan re jî. Bi wê re jî, di cih de li ser wê re dîplomasî di nava welatên andamên NATO de kirin û bangî wan kirin ku bo wê bicivin.

Weke ku rayadarên ev komkuji dan kirin ku temenê wê banga civîna NATO bikin jî. Bi vê întibayê jî kurd, komkujiya Pîrsûsê tênin ser ziman. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku komkujiya Pîrsûsê, di vê çerçoveyê de dema ku li ser politikayên şer ên rejima tirk re ku mirov li wê binerê, mirov dikarê, weke komkujiyeka ku wê kirî jî werêne ser ziman.

Ez bixwe, dema ku ez li vê komkujiya li Pîrsûsê dihizirim, ew agirbesta

care pêşî ku PKK´ê di sale 1993´an de ku kirî têne bîra min. Di wê demê de jî, bi awayekî bigûman, weke ku di nava kurdan de jî tê gotin hinek leşkerên xwe dan kuştin û dawî li wê Agirbestê hanî, konseptek şer ya giştî piştre kirina dewrê de û her wusa Ozal jî di wê demê de di cih de piştre bi awayekî bigûman mir.

Di vê pêvajoyê de jî, Komkujiya li Pîrsûsê, tê kirin. Rayadarên hikimeta tirk a AKP´ê, konseptek şer ku berî hilbijartinan jî bahse wê dihatkirin û dihat gotin ku wê bike meriyetê de, piştî komkujiyê hat xistin meriyetê de û şer bi kurdan re dane destpêkirin. BI sadan balefirên şer çîyayên kurdistanê bombabaran dike. Di cih de jî, piştî komkujiya Pîrsûsê, rayadarên tirk bangî NATO dikin ku bicivê.

Ev konsepta şer a T. Ardogan û hikimeta AKP´ê, şerê ku bi wê hat dayin destpêkirin hem li bakûrê kurdistanê bi kurdan re dike û hem jî li rojavayê kurdistanê. Şer, bi kurdan re dike. Ji ber ku rayadarên tirk, li dijî statûya kurdan in.

Rayadarên tirk, di mejiiyê xwe de dihizirin ku ew karibin, tevgera kurd bişikênin û derbeyekê li wê bixin, wê piştre bi politikayên tafisandin û asimlasyonê, wê civate kurd li bakûrê kurdistanê tûna bikin. Derdê rayadarên tirk, ew a ku bi jenosîdî li bakûrê kurdistanê kurdan ji dîrokê bibin. Di vê çerçoveyê de ku mirov bibêje ku Konseptên şer ên rejima tirk ku bi kurdan re dike, mirov divê ku di çerçoveya ´şerê jenosîdê ê rejima tirk ku bi kurdan re dike´ re de werêne ser ziman. Rejima tirk, şerê jenosîdkirina kurdan bi kurdan re dike.

Pêvajoya çareserîyê ku birêz Ocalan dabûbû destpêkirin, pêvajoyek bû ku wê di wê de dawî li vî şerê rejimê ê bi armanca jenosîdkirina kurdan bihanîya û wê di wê de kurd jî bigihiştan maf û azadîya xwe. Wê, di vê çerçoveyê de pêvajoyeke aşîîtîyê bihata dayîn destpêkirin. Bo vê yekê kurdan, bi hemû hêza tevî ku bi rayadarên rejima tirk û hikimeta AKP´ê ne bi bawer jî bûn, dixwestin ku pêvajoya çareserîyê bigihijê sêrî. Xwestibûn ku dawî li rijandan xwûnê werê. Xwestibûn ku rejima tirk, T. Ardogan û hikimeta AKP´ê, vî şerê bi armanca jenosîdkirina kurdan ku dawî li wê werêne.

Kurdan, di ti demê de şer nexwestina. Heta ku hêrîş li maf û azadî û male wan nebûya, şer nekirina. Hertimî jî, tevî ku rejima tirk, bi dehan komkujiyên weke komkujiy geliyê zila, komkujiya dersimê, komkujiya roboskî û hwd ku hanîna serê wan jî, lê dîsa tevî hemû êşên xwe xwestina ku danûstandin were kirin û bi danûstandinan pirsgirêka kurd were çareserkirin. Tevgera kurd, tekoşîna ku daya jî, mirov divê ku di çerçoveya ´şerê xwe-parastina cewherî a civate kurd´ de werêne ser ziman. Kurd, Ti

carî şer naxwezin. Bo vê yekê ya ku kurd dixwezin ku pêvajoya çareserîyê cardin were dayîn destpêkirin. Xwestina aşîtîyê, ne ji zayifîyekê ya. Yên ku weke zayifî dibînin, ew tenê, bi mejiyê xwe re ne xwediyê mejiyekî bi jîyane civatî re na. Ew, tenê, mirovna ku li gorî ajo û ´ego´ya xwe dihizirin in.

Kurdan, di vê pêvajoya çareserîyê de bo ku pêvajoya çareserîyê dengê xwe di bin sêwane HDP´ê de kirin yek. Her wusa, di vê pêvajoyê de bo kurdan û hemû hêzên demokrat jî giringa ku li dora HDP´ê bibin yek û bicivin. HDP´ê, hebûna wê, tenê artarnatifa ji wê konsepta şer a rejima tirk re. Di vê pêvajoya ku hikimeta AKP´ê pêvajoyek şer bi kurdan re daya destpêkirin de parastina HDP´ê û li dora wê bûna xelek, wê weke yekane artarnatif bê ji wê konsepta şer a rejima tirk re. Ji xwe, ji ber vê yekê ya ku rayadarên tirk û AKP´yî û T. Ardogan, wilqasî hêrîşî HDP´ê dike. Heçiyê ku devê xwe divekê, hêrîşî HDP´ê dike.

Li kurdistanê, li hemberî pêvajoya şer ku hikimeta AKP´ê dayî destpêkirin, pirr giring a ku bi girseyî xwepêşandinên şermazarkirina şerê hikimeta AKP´ê û T. Ardogan were kirin. Bo vê yekê, divê ku di vê pêvajoyê de kurd, dengê xwe bikina yek û dakevina qadan. Bi dirişma ku "em şer bi te nedina kirin", hemû kurd li dora HDP´ê yekbin û dengê xwe bikina yek. Di vê demê de her xwepêşandina girseyî ku were kirin, wê bersivek û çalakiyek xalkê û civatê bê. Wê dîrokî bê.

. Di 24´ê temûzê de hêzên dewleta tirk ên polisîya li pirranîya bajarên kurdistanê û tirkiya bi hemwaxt oparasyonên qirkirina sîyesî kirin. Bi sedan ciwanên kurd, hatina girtin li binçav û êşkence li wan tê kirin.. Rayadarên tirk ên weke T. Ardogan derdikeve berçapameniyê û dibêje ku ´ev destpêk a´. Her wusa, pêvajoyeka şer, rayadarên tirk li hemberî kurdan dana destpêkirin. Konseptek şer, kirina dewrê de. Roja ku ev konsepta şer a rejima tirk ku bi awayekî pirr bişîtt ku ket merîyetê de roja 24´ê temûzê bû. Di vê rojê de, di dema ku polîsên tirk, oparasyonên qirkirina sîyesî dikir, nûçeyên ku ji bajar û herêmên kurdistanê dihatin, ew bûn ku artişa tirk, sevkiyeta leşkerî a tankan, li bajarên kurdistanê ên weke Geverê û hwd dikir. Her wusa li herêmên din ên weke Cizîrê, Şirnaxê û hwd jî, ev dikir.

Ev nîşanaka çi bû? Ev nîşanaka destpêka şerekî giştî ê ku rejima tirk bi artişa ku bi kurdan re ji nû ve ku dabû bû destpêkirin. Her wusa, dema ku ev nûçe dihatin ku polîsên tirk, nof bi nof mirovên kurd digirin li binçav, di demên ber êvarî de nûçeyên ku bilezginî ketin diketin ajansên nûçeyan de ew bûn ku balefirên leşkerî bidest bombabarana li ´qadên parastina mediya´ kir. Piştî 4 salên bi pêvajoya çareserîyê re, ev rewşeka nû bû ku rayadarên tirk afirandibûn.

Rayadarên tirk, pêvajoyeka din ya şer li hemberê kurdan dabûbûn

destpêkirin. Gotinên rayadarên tirk, wusa didina nîşandin ku konseptek nû ya şer li hemberî kurdan dane destpêkirin. Bi hevdû re hemwaxt, qadên gerîîla bombabaran dikin, oparasyonên qirkirina sîyesî û oparasyonên bejehî ên artişa tirk bi hevdû re dihên kirin.

Rayadarên tirk, ji ber ku ti çareserîyên mirovane ên bo aşîtiyê di serê wan de nebûn. Bo vê yekê, di pêvajoya çareserîyê de ti gavên li berçav neavêtin. Ji ber ku konsepte wan ya şikandina kurdan hebû, hertimî di wê çerçoveyê de gotinên xwe gotin û gavavêtin. Gave dawî ya mazin jî, î ro di 24´ê temûzê de bi oparasyonên qirkirinên sîyesî û bombabarankirina balefirên artişa tirk li herêmên parastina gel bûn.

Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku ji vê nûqtê û pê de, divê ku weke ku çawa bo berxwedana kobanê hemû kurdistanî rabûna serpîyan, divê ku di vê pêvajoyê de bi heman giyanê. Gelê kurd, divê ku êdî hemû rabina serpîyan. Weke ku çawa ku bo kobanê serhildan kirin, divê ku bo vê demê jî rabina serpîyan û berxwedanê bikin. Ya ku wê vê pêvajoyê ji kurdan re weke ku çawa li rojava hat qizinckirin, wê ev bê. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî di dewama wê de vê yekê jî bibêjin ku çawa di dema hêrîşên li ser rojava de kurdan, weke hêrîşên li xwe dîtin û serkevtina wê weke serkevtina hemû kurdistanê ditin, divê ku bi heman mantiq û nêzîkatîyê, nêzî vê demê û pêvajoya li bakûrê kurdistanê jî bibin.

Ev pêvajo, weke pêvajoyeka dîrokî ya. Rayadarên tirk, dixwezin ku li bakûrê kurdistanê bi konsepta şer ku çêkirina derbeyekê li kurdan bixin. Li ser wê re hem tekoşîna azadîyê ya bakûr bitafisênin û hem jî ya li rojava bitafisênin. Bi vê mantiqê rayadarên tirk, nêzî bakûrê kurdistanê dibin. Kurd jî, divê vê pêvajoyê wusa bixwênin ku hemû bi vîna xwe rabina serpîyan. Î ro, dem dema serhildan û berxwedanê ya.

Di hinek nnûçeyên ku dikevina ajansên nûçeyan ên cihanê de di wan de tê gotin ku "tirkiya, oparasyon li hemberî DAÎŞ´ê da destpêkirin, piştî ku leşkerekî wê ji aliyê DAÎŞ´ê ve hat kuştin." Ev nûçe, her wusa, wusa xûya dike ku di çerçoveyeka sernûxûmandina vî şerê rejima tirk ê bi kurdan re dihên kirin. Rejima tirk, di rastiyê de ti carî şer bi DAÎŞ´ê re nekirîya û wê nekê jî. Ji ber ku DAÎŞ bixwe jî, pirraniya wê, kontrayên rejima tirk û artişa wê na. Bi zanebûnî bê û ne bi zanebûnî bê, ev nûçeyên derewînî tên weşandin.

Ev sê çar sal bûn, ji destpêka pêvajoya çareserîyê ve artişa tirk, amedekarîya xwe ji vî şerê re dikir. Î ro jî, di wê çerçoveyê de jî şerê xwe bi kurdan re dane destpêkirin. Rejima tirk, hewl dide ku navê DAÎŞ´ê li wî şerê xwe yê bi kurdan re bike. Ji ber vê yekê, hevokên ku navê tevgera kurd PKK û DAÎŞ´ê ku bi hevdû re di bûhûrûn, dihênin ser ziman. Her wusa, gotinên

Bilent Arinc, ên weke ´çima HDP´yî di nava komkujiya Pîrsûsê de nebûn" jî, divê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku fahm bike.

. **Di** roja 24´ê temûzê de ku balefirên artişa tirk çîyayên kurdistanê bombabaran kir de hin çapameniyên cihanê nivîsandin ku ´tirkiya, oparasyona xwe ya pêşî li dijî DAÎŞ´ê li dar xist." Di dewama nûçeyê de nivîsandin ku balefirên artişa tirk, hin çeperên DAÎŞ´ê bombabaran kir." Lê piştre, di roja 25 û 26´ê temûzê de derket li holê ku ev nûçe derew in. Hemû oparasyona ku di bin navê DAÎŞ´ê de li kurdan kirina. Ev hêrîş jî, rastî roja ´peymana Lozanê´ ku di wê de Kurdistan hatibû kirin çar-qat de bû.

Ev rewşa tirkiya ku di bin navê tekoşîna bi DAÎŞ´ê re ku hêrîşî kurdan dike, divê ku mirov hinekî li ser wê bisekinê. Di destpêka mudahaleya li Sûrî de, ku DAÎŞ derket li holê de, tirkiya, ne ketibû nav de. Lê piştre ku hin nûçe di çapameniya cihanê de derketibûn û di wan de hatibû gotin ku "kurd, hevkarên xweza ên koalîsyona li dijî DAÎŞ´ê na." jî, hingî rejima tirk, bo ku di şerê li dijî DAÎŞ´ê de alikarî ji kurdan re neçê, gotibû, ezê tevlî koalisyona li dijî DAÎŞ´ê bin. Lê Tirkiya, ev tevlîbûn jî, bi armanca ku pêşîya kurdan bigrê kiribû.

Piştî ku Hêrîşên DAÎŞ´ê li Kobanê destpêkirin û pê de, tirkiya vajî wê, tenê, alikarî da DAÎŞ´ê ku li hemberî kurdan serkevtinê bidest bixe li ser navê wê. Lê DAÎŞ´ê ew serkevtin bidest nexist. Piştî ku kurdan, li kobanê serkevtin bidest xistin û ji gelek herêmên din DAÎŞ paqij kirin, êdî rayadarên tirk jî, di fiîliyetê de bidest alikarîyeka vekirî ji DAÎŞ´ê re kirin. Her wusa, gelek nûçe dihatin ku leşkerên teybet ên tirk, cilên DAÎŞ´ê li xwe dikirin û sînor derbas dikirin û bi kurdan re şer dikirin.

Piştî ku kurdan li rojavayê kurdistanê DAÎŞ têkbir û li bakûrê kurdistanê jî, kurdan pêvajoya çareserîyê da destpêkirin û di hilbijartinan de serkevtin bidest xist, êdî rayadarên tirk, pêvajoya çareserîyê bidawîkirin û pêvajoyaka şer a nû bi kurdan re dana destpêkirin. Rejima tirk, di berdêla vekirina belafirgeha ´incillikê´ ji amerika re alikarîya ku hilda, hemû di çerçoveya vê konsepta şer ya nû de rejima tirk li hemberî kurdan bikardihêne. Her wusa, gotinên rayadarên tirk ên weke mewlutoglu ên weke ´em bi amerika re di hevkariyê de na´ jî, li ser vê temenê tên gotin.

Lê li vir, divê ku mirov vê yekê bibêje ku tirkiya pêvajoyaka nû ya giştî a şer di 24´ê temûzê de bi kurdan re daya destpêkirin. Hilbijartina dîroka ´24´ê temûzê´, divê ku mirov bi teybetî li ser wê bisekinê. Weke ku ji kurdan re bibêjin ku ´emê lozaneka din, werênina li serê weê´, di vê rojê de bidest hêrîşa li kurdan kirina.

Ji vê astê û rojê û pê de, wê rejima tirk bi hêrîşan li hemberî kurdan serbikeve? Bêgûman, kurd, ne ew kurdên ku di wê demê de peymane

Lozanê hatibû mohrkirin a. Kurdan, ji wê demê û heta vê demê, gelek pêvajo bûûhûrandina û fêr, zanîn û cerbek mazin bi xwe re çêkirina. Wê, destûrê nedin, peymanaka din, ya lozanê. Ji xwe, tekoşîna azadîya kurdan a 40´ salê dawî, peymana Lozanê avêtiya çopê. Êdî ti hikme wê, bo kurdan tûna ya.

Lê li vir, divê ku mirov vê yekê jî, bibêje ku ev konsepta şer ya rejima tirk, ku T. Ardogan û hikimeta AKP´ê bi kurdan re daye destpêkirin, çerçoveya wê, ew a ku li bakûrê kurdistanê derbeyekê li tekoşîna azadiya kurdan bixin û derbeya ku DAÎŞ´ê nekerî ku li şoreşa rojava û rojavayê kurdistanê bixe ku ew lê bixe. Di vê çerçoveyê de, Şerê ku bi navê DAÎŞ´ê ku bi kurdan re dihat dayîn, î ro jî rejima tirk û artişa wê, dewr girtîya û ew bi kurdan re dide domandin. Ji devera ku DAÎŞ´ê hiştîya, rejima tirk dixwezê ku bide domandin. Lê li vir, divê ku em vê yekê jî bibêjin ku hêrîş û konseptên şer ên ku li beşeka kurdistanê li hemberî kurdan werina pêşxistin, wê êdî li hemberî xwe giştîya kurdistanê bibînê.

Pêvajoya şer ku rejima tirk, bi komkujiya li Pîrsûsê ku kir re piştre bi oparasyonên qirkirina sîyesî re da domandin. Piştre jî, bi bombardimana bi balefirên leşkerî re da domandin. Di roja salwegera peymane Lozanê de hemwaxt hikimeta tirk, hem pêla oparasyonên qirkirina sîyesî da destpêkirin û hem jî pêla bombardimana bi balefiran li çîyayên kurdistanê da destpêkirin.

Konsepta şer a rejima tirk, armanca wê, ew a ku li bakûûrê kurdistanê derbeyê li tekoşîna azadiya kurdistanê bixe û bi wê re êdî şoreşa rojava bitafisêne. Rayadarên tirk jî, dizanîn ku heta ku derbeyê li tekoşîna azadîyê a li bakûrê kurdistanê nexin, wê nikaribin, pêşketina şoreşa rojava jî bisekinênin. Bo vê yekê, pêla hêrîşan ji bakûrê kurdistanê dane destpêkirin. Stretejîya hikimeta tirk û T. Ardogan, ew a ku bibêje ku ´ezê tekoşînê li hemberî DAÎŞ´ê bikim. Lê di bin navê wê de jî, bi hemû hêza xwe şerê xwe yê bi kurdan re bike. Yanî, bi propagandayan, bibêje ku ew oparasyonê li hemberî DAÎŞ´ê dikin û bi wê re di piretîkê de bi kurdan û tevgera kurd re şer bikin. Ya ku tê ditin jî ev a.

Wusa tê dîtin û xûyakirin rayadarên tirk, bi rayadarên Amerika re ketina têkiliyê û ji wan re gotina ku ´emê li ser serê DAÎŞ´ê oparasyonan bikin û êdî wê alikarîya ku bi sîyesî bistênin bi wê şerê xwe yê bi kurdan re bikin. Ji xwe, nûçeyên ji amerika û tirkiya ku tên jî, vê yekê piştrast dikin. Li ser levkirina balefirgeha ´incilikê´ re weke çi alikarî standina, bi wê şerekî bi kurdan re didina destpêkirin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku ev konsepta şer ya rejima tirk, esasê wê bi derbe li tekoşîna kurdan a li bakûrê kurdistanê xistinê re

pêvajoyaka ku bi wê şoreşa rojava bin bixe ku pêş bixe. Her wusa, di vê çerçoveyê vê konsepta şer ya rejima tirk a ku destpêka wê di salwegera peymana Lozanê de di 24´ê temûza 2015´an de ku dane destpêkirin, di vê çerçoveyê de şikandina teşîna azadîya kurd a bakûrê kurdistanê û ku karibê tafisandina şoreşa rojava ya. Divê çerçoveyê de, weke konsepteka şer ya giştî ya. Di vê çerçoveyê de, divê ku mirov rastîya wê baş fahm bike.

Di hiilbijartinên 7´ê hezirenê de kurdan, li bakûrê kurdistanê, serkevtinek dîrokî bidest xistin. Di aslê xwe de mirov dikarê wê serkevtina di 7´ê hezîrenê de, weke barkirina şoreşa rojava li bakûrê kurdistanê jî binirxêne. Her wusa, mirov dikarê serkevtina 7´ê hezîrenê, bi têgîneka şoreşî ya li bakûrê kurdistanê jî werêne ser ziman. Li hemberî vê serkevtina kurdan a giştî ku li bakûrê kurdistanê û rojavayê kurdistanê, konsepta şer bigiştî hatîya pêşxistin. Bo vê yekê, mirov divê ku van bombardimanên artişa tirk, tenê bi hilbijartinek zû ku rejima tirk, dihizirê re tenê fahm neke. Ji wê zêdetirî jî, bi konseptekê re divê ku mirov fahm bike. Tenê ku mirov li roja ku ev konsepta şer hatîya kirin a 24´ê temûzê jî ku mirov binerê jî, mirov wê vê rastiyê baştir fahm bike.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku vê konsepta şer a rejima tirk ku destpêka wê di salwegera peymane Lozanê de di 24´ê temûzê de hatîya kirin, weke pêvajoya dûyemin a şerê DAÎŞ´ê bi kurdan re jî bibînê û werêne ser ziman. Her wusa, konsepta şer a T. Ardogan û hikimeta AKP´ê, dûyemin pêvajoya şer a DAÎŞ´ê jî ya. Di vê çerçoveyê de jî, divê ku mirov li wê binerê.

Di pêvajoya pêşî a şerê ku bi DAÎŞ bi kurdan re kirin, xwestin ku derbeyekê li şoreşa rojava û rojavayê kurdistanê bixin. Her wusa, Weke ku çawa ku di peymana Lozanê de Kurdistan hat qatkirin li çar-qatan, bi DAÎŞ´ê re xwestin ku di sale 2014´an de ji nû ve kurdistanê qat bikin. ..

Ji xwe, bi teybetî, ku ji Musilê û li ser Şengalê û heta ku digihişt Hesekê, Kobanê û Afirênê, di xatekê de hizirîbûn ku di bin navê ´dewleta îslamî" de qadekê bi nav bikin û ku DAÎŞ û çeteyên wê şerê wê bi kurdan re bikin. Ev planaka ji nû ve qatkirina kurdistanê bû. Bi gotinaka din, mirov dikarê, vê weke dûyemina parvakirina kurdistanê a piştî LOzanê jî werêne ser ziman. Lê kurdan ev plan, şikand. Ne ne hiştin ku serkeve. DAÎŞ´, têkbirin. Piştî wê têkbirina DAÎŞ´ê a ji aliyê kurdan ve, êdî weke pêvajoya dûyemin a vê projeya qatkirina kurdistanê, di salwegera peymane Lozanê a 2015´an de bi heman zihniyetê rejima tirk konsepta xwe ya şer bi kurdan re pêşxist û kir dewrê de.

Wusa tê dîtin ku konsepta şer a ku rejima tirk di 24´ê temêza 2015´an de pêşxist, weke konseptek giştî û çerçoveya wê berfireh a. Oparasyonên

qirkirina sîyesî ku di vê rojê de destpêka wan bi pêlek mazin hat destpêkirin, bi armanca kriminalizekirina sîyeseta kurd a. Her wusa, li ser wê re jî, ji aliyê leşkerî ve şer bi oparasyonên bejehî û hewayî bi kurdan re dana destpêkirin. Lê li vir, ya ku mirov dihêşênê jî, ku hertimî di pêvajoyên bi vî ên weke ku rejima tirk konseptên şer ên giştî pêşxistina, ji nava kurdan bo ku pişta xwe bidina wan, xîyanet pêşxistina. Di vê dema dîrokî de PDK´yî, di çerçoveya konsepta şer a rejima tirk a bi kurdan re de wê alikarîyê didina şerê rejima tirk ê bi kurdan re.

Ev bêbaxtîya PDK´ê a li kurdan, di demê n bûhûrî de jî, bi hin aşîrên kurd re me dîtîya. Di dema berxwedana bedirxaniyan a li herêma botanê de me bi Yazdan şêr re dîtîya. Her wusa, van dordoran, weke ku î ro xwe bi PDK´ê re dide nîşandin, hertimî bûya sedema ku derbeyek dîrokî li civate kurd bikeve. Bi wê re jî, bûya sedema ku di her demê de bo ku kurd statûya xwe li herêmê bidest bixin, firsendên dîrokî ku derketina li ber wan ku nikaribin ji wan sûd bigrin. Di vê demê de jî, firsendek dîrokî derketîya ber kurdan. Ku kurd, ev bêbaxtî ji nava xwe derbaskiriba û derxistiba, di vê demê de wê bi serkevtinek dîrokî re wê hem statûya xwe bidest bixin û hem jî bi wê re hemû maf û azadîya xwe jî bidest bixin. Ya ku hertimî pişta kurdan şikandiya, ev bêbaxtîya ku ji nava kurdan li kurdan hatîya kirin a. .

**Di dewama kirina piretîka konsepte şer de wê hêzên rejima tirk di destpêkê de li bajarên kurdistanê ên weke Cizîra bota, Gever, Farqîn, Sûra ku navçeya Amedê, Silwan, Warto, Şirnax, Çolemergê û hwd, bi wan re li gelek deverên bidest komkujiyên li ser serê gel bikin.**

Herêma Silopîyê, weke herêmeka bakûrê kurdistanê ku dikeve bersînor de. Her wusa, hertimî, li wir, rayadarên tirk, xwestîya ku kontrayên xwe bicih bike. Ev herêm, weke herêmeka ku rayadarên tirk, li wir ji salên 1990´n ve gelek kontrayên xwe ku li wê bich kirina. Di salên 1990´î de dema ku rayadarên tirk, ên weke ´Cemal Temizoz" li Şirnaxê komkuji dikirin, ev herêm, bo kontryên xwe weke ´anîya li şûn qada şer´ bikardihanî. Lê piştre jî, heya rejimê herêmî çû ser vê herêmê.

LI herêmên weke Silopîya, gelek kontrayên ´hizbil-kontra´ bi destê dewletê hatina bicihkirin. Van kontrayên dewletê, bi sedan kurd qatil kirina. Bi gotinaka din, em dikarin bibêjin ku rayadarên dewleta tirk ên li Silopî, yek jî ji wan destê wan ne paqij a. Bi heman rengî, rayadarên dewletê, ên ku li Silopî, Cizîr, Şirnax, Nisêbîn û hwd, ev herêm giştî weke herêmna ku hertimî dewletê, weke herêmna ´pîlot´ dîtina û çûya bi ser wan de.

Di salên 1990 û piştre de, dema ku mirovek ji van herêmên botanê diçû, herêmên din ên rojavayê tirkiya, dema ku li nasnemaya wan dinerîn, digotin

ku "win, terorîst in." Bi vî rengî, mejiyê civatê di derbarê van herêman de hatibû şiştin. Li vir, divê ku ev vê yekê jî bibêjim ku bûya ku di 7´ê tabaxê de ku li Silopîyê bû û di wê de polisên tirk gûle raşandina li ser xalkê silopîya, divê ku mirov ji bûyarên ku çend roj berê bi hêrîşên polisên tirk re ku li Cizîrê destpêkiribûn, divê ku mirov ji wan cûda û dûr şîrove neke û neyêne ser ziman. Her wusa, ev bûyar, bi hevdû ve girêdayî na. BI plan di çerçoveya konseptek şer de li herêmê tên kirin. Ji vê yekê, divê ku mirov bi teybetî, bibêje ku pirranîya herêmên botanê ên weke Silopî, Cizîr, Nisêbin, Şirnax û hwd, bi pirranîya herêmên din re hertimî telûkeyek mazin heya. Telûkeya ku polîs û leşkerên tirk hêrîşî gel bikin û komkujiyên mazin bikin heya.

Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku bi konsepta şer a hikimeta AKP´ê û T. Ardogan re ku li bakûrê kurdistanê kirina dewrê de, mirov dikarê weke wê konsepta şer a ku hiikimeta tirk bi DAÎŞ´ê li rojavayê kurdistanê ku di meşand, weke barî bakûrê kurdistanê kirîya. Her wusa, Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman. Li vir, em gotinaka din, binxat bikin û werênina ser ziman ku DAÎŞ´, ne rêxistineka. DAÎŞ, pêvajoyeka şer a ku rejimên herêmê ên ku Kurdistan di nava wan de hatîya qatkirin a. Heta ku pirsgirêka kurd, newê çareserkirin jî, wê ev pêvajoya şer li hemberê kurdan bê dayîn domandin. Carna, şer li rojava kêm bikin, weke ku î ro dikin li bakûrê kurdistanê bikin. Carna li bakûr û rojava kêm bikin û bi giranî hêrîşên DAÎŞ´ê i başûrê kurdistanê bidina zêde kirin. Carna, wê bihevdû re li van hersê herêman bidina pêşxistin. Lê divê ku mirov bibêje ku ti herêmên kurdan, êdî ne bin ewlakariyê de ya.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku Hêrîşên Polîsên tirk ên bi alikariya kontrayên hizbil-kontra ên li Silopî û Cizîrê jî, divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Her wusa, bi teybetî, rayadarên tirk, herêmên botanê ji xwe re kirina, weke armanc. Ji ber ku dihizirin ku dema ku di herêma bota botanê ku karibin derbeyan li kurdan bixin û vîna kurdan bi dengê wan re bitafisênin, wê ev weke bêdengkirin û tafisandinaka giştî a li bakûrê kurdistanê bê.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku Heya îranê jî, ji van hêrîşên tirkiya ên li bakûrê kurdistanê heya. Di van rojên ku wê hêrîşên bi komkuji ên li Cizîrê, Silopî û hwd bibin de, rayadarên îranî biryara qadaxaya derbaskirina ji sînor digirin. Ev jî, dide nîşandin ku heya wan ji hevdû heya, mirov dikarê vê jî, weke nîşanaka kirina hêrîşên mazin jî bixwêne û werêne ser ziman.

Komkujiya ku polîsên tirk 7´ê tabaxa 2015´an de li Silopîyê kirin,

aliyekî wê yê din jî heya. Piştî bûyîna bombardimana li qandilê a balafirên şer ên tirk û piştre kirina komkujiya gundê Zergelê ji aliyê balafirên şer ên tirk ve, heyetên HDP´ê û hwd, çûna başûrê kurdistanê qandilê gundê Zergelê. Her wusa, li vir, balafirên şer ên tirk komkujiyek sivîl kirin. Komkujiya li Silopîyê, rastî destpêkirina kirinên nîqaşên di derbarê vê komujiya sivîl ku balafirên şer ên tirk kirin tê. .. Her wusa, di vê çerçoveyê de aliyekî vê komkujiyê ê bi armanca gûharandina rojevê jî heya. Yanî, bi komkujiyan, nîqaşên li ser komkujiyan di di tafisênin. Rayadarên tirk, di vê pêvajoyê de wê çawa şerekî giştî bi kurdan re bikin û bi wê ku karibin derbeyekê li kurdan bixin, li ser wê dihizirin. Her wusa pêvajoya çareserîyê jî, di çerçoveya hêvîyên rayadarên tirk ên ku bi wê dixwestin ku wê DAÎŞ li rojava derbeyekê li kurdan bixe, herê kiribûn.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku çendî ku mirov nikarê hêrîşên li Cizîrê û silopîyê ji hevdû cûda werêne ser ziman, bi heman rengî ewçendî jî mirov nikarê hêrîşên li Cizîrê û Silopîya ji pêvajoya hêrîşên li rojava ku rayadarên tirk organîze dikirin, cûda werêne ser ziman. Her wusa, di vê pêvajoyê de wê çawa çavtirsandinê bi kurdan re çê bikin, ev armanca rayadarên tirk jî heya. Mirov, ji hêrîşên polisên tirk ên li Silopî, Cizîr û Nisêbînê fahm dike ku wê di pêşengîya kirina komkujiyan de van hêrîşên xwe li herêmê belav bikin. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê hêrîşên din ên maztir bikin. Weke ku bi van temenê hêrîşên maztir li herêmê tên amede kirin.

Li vir, ya ku em divê ku binxat bikin û bêjin, ew a ku gel bixwe, weke ku çawa li afrîqaya başûr ku gel li hemberî hêrîşên rejima Apartheid´ê parastina cewherî pêşxist, divê ku kurdistanî jî, vê di nava xwe de pêş bixin. Divê ku bixwe bi bawer bin. Ji xwe, ev hêrîş, armancaka wan jî, ew a ku bawerîya kurdistanîyan a li wan bişikênin. Dixwezin ku wan li xwe bêbawer bikin. Yanî, bi gotinaka din, ku nikaribin bi xwe bi bawer bin. Di vê çerçoveyê de jî ev hêrîşên hovana tên kirin. Ev hêrîş, bi plan tên kirin.

Ya ku rejima tirk, bihêrs dike jî, êdî weke berê ji hêrîşên xwe yên li kurdan, weke berê piştgirîyê ji qada navnetewî nikarê bistêne. Her wusa, hêrîşên wê ên li kurdistanîyan, di vê demê de rastî nerazîbûnên derve jî tên. Rayaderên tirk, hizir dikin ku wê di bin navê hêrîşkirina li DAÎŞ´ê de wê hêrîşî kurdan bikin û wê dûnya jî di vê çerçoveyê de deng li hemberî hêrîşên wê ên li kurdan bêdeng bimêne. Ya ku rayaderên tirk, hizirkirina ev a. **DAÎŞ, ne rêxistineka. DAÎŞ, pêvajoyaka şer, ku rejimên herêmê ên weke tirkiya ku li hemberî kurdistanîya pêşxistîya ya. Heta ku pirsgirêka kurd newê çareserkirin jî, wê ev pêvajoya şer bidomê. Di serî de divê ku mirov vê yekê jî, fahm bike û werêne ser ziman. Di vê**

**pêvajoya şer a bi navê DAÎŞ´ê de desthilatdarîyên li herêmê ku Kurdistan di nava wan de hatîya qatkirin, hizir dikirin ku wê ji nû ve bi vê pêvajoya şer a bi navê DAÎŞ´ê re wê herêmê dîzayn bikin. Hêrîşên ku li bakûrê kurdistanê ku weke ku li Cizîrê, Nisîbînê û Silopîyê ku li kurdistanîyan dibin, di dewama pêvajoya konsepta şer a ku li hemberî rojavayê kurdistanê de hatî pêşxistin de dihên kirin**.

Her wusa, konsepta şer a ku rejima tirk li bakûrê kurdistanê pêşxist, du lingên wê û armancên wê hena. Yek, ew a ku karibê bi wê derbeyê li kurdan bixe. Armanca wê ya duyemin jî, ew a ku bi hêrîşên ku bike ku hêzên kurdan li hemberî DAÎŞ´ê kêm bike ku hêzên kurd li hemberî hêrîşên DAÎŞ´îyan ku derbeyna leşkerî bixwûn. Di vê çerçoveyê de hêrîşên rayadarên tirk ên bi konsepta wan ya şer re divê ku mirov fahm bike û werêne ser ziman. Her wusa lingê vê konsepta şer a rejima tirk ku bi wê leşker divegûhezê sînorê rojavayê kurdistanê li herêma weke Antebê û hwd, û bi wê re jî ku hêrîşên DAÎŞ´ê û cebetil-nasr ku ji cerabus´ê li Afrîn û kobanê dihên kirin, bi lingê din ê duyemin ê hêrîşên leşkerî û hwd, ên rayadarên tirk ên li bakûrê kurdistanê re girêdayî divê ku mirov werêne ser ziman. Her wusa, di vê çerçoveyê de, ev konsepta şer a ku hikimeta AKP û T. Ardogan çêkirîya, çend ku em weke ku bi hêrîşên li bakûrê kurdistanê re dihê şîrovekirin jî, lê bi teybetî divê ku mirov çerçoveya vê konsepta şer bi hêrîşên li ser rojavayê kurdistanê ên li herêmên başûrê kurdistanê ên weke maxmûr, qandil û Şengalê re jî werêne ser ziman. ... T. Ardogan bûya bûya Saddamê roja me, li ser serê kurdan. Tişta ku Saddam dikir, nûha jî, ew dike.

Piştî ku balafirên şer ên tirk, bombabarana li qandilê dikin, di cih de piştî wê di cih de çeteyên DAÎŞ´ê jî, care pêşî bidest topbarana li herêmên Maxmûrê dikin. Mirov dikarê van ji hevdû cuda werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de dihê dîtin û fahmkirin ku konsepta şer a hikimeta AKPê û T. Ardogan, di çerçoveya wê de hêrîşên artişa tirk û bombabaranên wê, hêrîşên çeteyên DAÎŞ´ê û ên çeteyên cebetil-nasr´ û hwd, bi hevdû re di çerçoveyekê de divê ku mirov hilde li dest. Hemû hêrîş, bi hevdû re di ahengekê de dihên kirin. Hêrîşên artişa tirk û bombabaranên wê bi hêrîşên DAÎŞ´ê re bi ahengekê re dihên kirin. Her wusa vajî wê jî, çeteyên DAÎŞ´ê jî bi hêrîşên artişa tirk û bombabaranên wê re hêrîşî kurdan dikin.

Di van rojên dawî de li bakûrê kurdistanê, hêrîşên artişa tirk, oparasyonên wê ên leşkerî, bombabaranên bi balafirên wê ên şer, hêrîşên polîsên wê ên li gel, şawitandina daristanên li kurdistanê û hwd, hemû bi hevdû re di çerçoveya şerê rejima tirk ê bi kurdan re de dihên kirin. Komkujiya li Silopî jî, mirov divê ku bi komkujiyêa li Cizîrê ku dîsa polîsên tirk sê çar roj berê kirin re di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Her wusa,

şerekî giştî bi kurdan re dana destpêkirin. Şerê tafisandin û şikandina vîna civate kurd bi kurdan re dikin.

Hêzên navnetewî jî dibînin ku rayadarên tirk, di gotinên xwe yên weke "emê bi DAÎŞ´ê re şer bikin" de ne jidil in. Bo vê yekê, herkesek, ji wê re dibêje ku "tirkiya, divê ku heya xwe nedê li şerkirina bi kurdan re, divê ku heya xwe bide li şerkirina bi DAÎŞ´ê re." Gotinên wezirê karê derve ê tirkiya Mewlutoglu ku digot ´wê herkesek, bibînê ku emê şer bi DAÎŞ´ê re bikin" jî, ne rast a in. Ji kûderê mirov fahm dikê ku ne rast in? Ne jidilîya wê, ji hêrîşên wê ên li Qandilê, PYD´ê, YPG´ê HPG´ê û hwd, dihê dîtin û fahm kirin. Di bin navê şerê bi DAÎŞ´ê re de rayadarên tirk û artişa wê, hêrîşî hêzên kurd ku bi DAÎŞ´ê re şer dikin. Ev jî, weke alikarîyaka mazin a ji DAÎŞ´ê re ya ku tirkiya dike.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku bi van hêrîşên ku bi konsepta şer hikimeta AKP´ê û T. Ardogan li kurdistanîyan dike, dixwezê ku pêvajoyaka nû weke ya salên 1990´î li ser serê kurdan pêş bixe. Hêrîşên ku rayadar û polisên tirk dikin, ji yên wê demê ne cûdatir in. Her wusa, di nava sûkê de weke ku di 7´ê tabaxa 2015´an de hat ditin, înfazkiriina mirovan tê kirin. Di nava sûkê de, hêzên dewletê, mirovan bi keyfî êşkence dikin û dikujin. Her wusa Kurdistan, wergerandina zindanaka servekirî. Weke ku di vê rojê de di nava sûkê de polîsan li gel gûla raşand û gelek kurd kuştin û birindar kirin, biheman rengî sê çar roj berê, li Cizirê jî, ev kiribûn. Di nava Sûkê de ciwanên kurd sax digirin û destê wan bi şûn ve girêdidin û piştre gûla diberdina serê wan.

.

.. **Hemû bajar û deverên bakûrê kurdistanê ku bi carekê ketina bin hêrîşên hêzên rejima tirk de liwan rêveberîya xweser û ankû xwerêveberîn hatibû denezendin**

Pirsgirêka kurd, ku ji şerê cihanê ê yekemin ve gav bi gav hatîya afirandin û bi xwêne hatîya heta roja me, pirsgirêka maf û azadîya civate kurd a. Dema ku em bahse pirsgirêka kurd dikin, em bahse pirsgirêka maf û azadîya civatekê dikin. Her wusa, hertimî, ev gotina ´pirsgirêka kurd´ jî di çerçoveya kriminalize kirina wê de weke ´pirsgirêka terorê´ hatîya dayîn nîşandin. Di aslê xwe de weke pirsgirêka terorê nîşandin, bûya weke maskeyekê jî ku li ser rastîya civate kurd û û xwestekên wê yên maf û azadîyê were nûxûmandin, di wê çerçoveyê de hatîya bikarhanîn. Bi wayekî nehaq, dema ku tevgerên kurd di çerçoveya hinek berjewendiyên dewletan de weke ´terorê´ hat dayîn nîşandin, hingî, ew tekoşîna maf û azadîyê a civate kurd jî, hat kiriminalize kirin. Xwestekên civate kurd ên weke maf û azadîya wê, perwerdeya bi zimanê dayikê û hwd, bi gotina ´terorê´ hatina

salixkirin. Bi vê yekê, li hemberî vê tekoşîna maf û azadîyê a meşrû, piştre di bin navê gotina terorê de şerê tafisandin û bêdengkirinê hatîya dayîn. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku Kurd, hê jî, wê tekoşîna maf û azadîyê didin.

Gelek dordor, dema ku van xwerêveberîyên kurdan ku piştî konsepta şerê dewletê ê bi kurdan re ku hatina denezendin, weke bertekekê bi vî rengî dihênina ser ziman. Li vir, di gotinê û şîroveyê de şaşîyek mazin û dîrokî heya. Divê ku em di serî de vê yekê werênina ser ziman. Ji xwe, di fiîliyetê de li kurdistanê, pergala KCK´ê hatîya avakirin. Hikimetên tirk ên AKPê jî, oparasyonên qirkirina sîyesî, li wê pergale KCK´ê kirina. Bi armanca kiriminalize kirina wê, ew oparasyon li qada sîyeseta kurdan hat kirin û heta roja me jî didina domandin.

Kurd û ankû civate kurd, weke civatekê xwediyê teybetî û xosletên xwe yên yên dîrokî ya. Cûdahîyên wê ên zimanî, çandî, dîrokî û hwd hena. Her wusa, di vê çerçoveyê de xate pêşketina civate kurd, dema ku mirov li ser wê dihizirê, mirov dibînê ku heta serdemên sûmerîyan diçêt. Serdemên hemdem ên civate kurd, wê ji serdemên Gûtî, hûrî û mîtannîyan û Medîya û hwd destpê dikin. Ev serdem, weke pêvajoyna hemdemîya civate kurd in jî. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku heta roja me, civate kurd, tenê di çerçoveya parastina van xoslet û teybetîyên xwe de tekoşîna xwe daya. Ew jî, heta deverekê çûya û kêm maya. Minaq, aliyê wê yê kêm, ew a ku andamên civate kurd ku di bikarhanîna zimanê civate xwe de kêm mana ya.

Her wusa, civate kurd, pêvajoyên wê ên pêşketinê, wê di sedsala 20´an û çeyreka sedsale 21´ê de ji aliyê rejimên herêmê ên weke tirkiya wê bê xistin bin pêvajoyên bişavtinê û hêrîşan de. Derfet ji ziman, çand û aliyên din ê civate kurd re ne hatîya hiştin ku xwe pêş bixe. Bo vê yekê, tekoşîna wê, bi ya ku pêşketî û hewldana parastina wê re bi sînor maya. Parastin ku di nava xwe de pêşxistinê û afirandinê ne hawênê û neparêzê, wê nikaribê xwe zêdetirî bide domandin. Ji xwe, weke ancamaka vê rastiyê jî, piştî salên 1990´î û pê de zêdebi karhanîna zimanê tirkî dinava kurdan de û her wusa mirovên nivîskar ku dibêjin ´em nivîskarên kurd´ in ku zimanê civate xwe di çerçoveya hin berjewendiyna de diterikênin, mirov dikarê weke minaq werêne ser ziman. Ev rastî jî, bûya weke aliyekî din ê ku di fiîliyetê de hêrîşî civate kurd û nirxên wê dike dibê. Her wusa, ancama wê, bişavtina civate kurd û nirxên wê ya. Ev jî, tê wê wateyê ku êdî hewldana parastinê a nirxên civate kurd, bi bi alikarîya van dordoran li leyha dewletê û bişavtinê tê şikandin.

Her wusa, di roja me de, civate kurd, bo parastina hebûna xwe hertimî

ketîya di nava tekoşîna xwe de. Her wusa, di van rojên dawiyê de ketina rojevê a ´xwerêveberîn´a li kurdistanê, li bajarên kurdan ji aliyê kurdistanîyan ve ku hatîya denezendin, mirov dikarê weke hewldan û bergireke civate kurd a. Her wusa, ev bergirên civate kurd bo parastina hebûna xwe, di bin hêrîşa rejima tirk de na. Nûha li ser vê temenê şer û pevçûn hena. Çapameniya tirk jî, wê çawa kriminalize kirinê û reşkirinê bide pêşxistin, li ser wê kar û xabatê dike.

Lê kurd jî, bi derfetên xwe yên kêm li hemberî teknika mazin a rejima tirk li berxwe didin. Dikin ku hebûna xwe biparêzên. Hêrîşên rayadarên tirk bi polîs û leşkerên wê, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman. Her wusa, hewldana kriminalize kirina ´xwerêveberîyên kurdistanîyan´, di çerçoveya hêrîşkirna li wan de dibin. ..

Polîs û leşkerên tirk, ne ji bo parastina kurdistanîyan hena. Hemû hêzên dewletê ên weke polîs, leşker û hwd, li kurdistanê bo ku pêşîya pêşketina kurdan bigrin û hêrîşî kurdan bikin hena. Heta roja me, bi destê polîsan bi sedan ciwanên kurd û kurdistanî hatina qatilkirin û yek jî ji van sûcên polîsan ne hatîya ceza kirin. Li kurdistanê, çend polîs û hwd hena, ji bajarên tirk hatina şandin li bajarên kurdan li ser serê kurdan. Kurd jî, dibêjin ku em vê hêza ku her roj me dikujê û hêrîşî me dike û rêz û hûrmetê nadê jîyane me, nexwezin. Bo vê yekê, dibêjin ku em dixwezin xwe bixwe biparêzên. Bi dirişma ´emê parastina xwe bikin´ kurdistanî, rêveberîya xwe ya cewherî a xwerêvebirinê li bajarên kurdistanê denezendina. Lê dîsa dewletê, ev hêzên weke polîsîya û leşker, di bin navê ´parastinê´ de şandina kurdistanê, da hêrîşkirin li kurdan.

Her wusa li kurdistanê, piranîya polîs û hêzên dewletê ên li kurdistanê ku li ser navê dewletê zilm û zordariyê li kurdistanîyan, sûcên li dijî mirovatiyê li kurdistanê kirina. Her wusa, ´înfazkirina mirovan´, girtin û ´di bin çavan de êşkence kirin, ´destavêtin´ û hwd jî di nav gelek şûcên ku van hêzên dewletê li dijî civate kurd kirina hena. Rêz û hûrmeta wan ji jîyane kurdistanîyan re tûna ya. Li vir, divê ku mirov vê yekê bibêje ku gelê kurd, ev hêzên dewletê ku li hemberî wan şûcên li dijî mirovahiyê kirina, naxwezê ku di nava wan de bimêne û parastinê ji wan naxwezê. Ji xwe, hêzekî bi vî rengî ku di nava kurdan de bê û bi dijminatiya li kurdan hatibê perwerdekirin, wê niikaribê, ti parastinê jî bo wî gelî bike.

Her wusa bi vir ve girêdayî divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku dema ku kurdan bahse xwerêvebirinê û ankû rêveberîya xweser a kurdistanî kirin, bi wê gotin ku herêm bi herêm xwe bi rêxistin bike li gorî jîyane xwe û parastina xwe jî bike. Yanî, li şûna ku ji bajarên tirkan wê polîsan werênina ser serê kurdan, ji nava kurdan ku kurd karibin polîsên xwe

yên xwe-parastinê jî ji nava xwe derxin. Her wusa, herêm bi herêm, dema ku bi vî rengî ji nava xalkê ew hêzên parastinê li wê herêmê werina afirandin, wê nikaribê li dijî wê gelê herêmê jî zilmê û hêrîşê jî bike. Ber ku ew jî ji wê herêmê ya. Wê tenê, weke ku tê gotin wê karê wî parastin bê. Wê rêz û hûrmeta wî ji nirxên wê herêmê re hebe. Ji xwe, dema ku mirov bahse ´parastinê´ bike, divê ku mirov bi vî rengî werêne ser ziman ku rêz û hûrmetê ji jîyane wê herêmê re bigrê û ku mudahale û ankû hêrîşî li jîyane wê herêmê bûn, ku ew karibê wê jîyane gel ji wan hêrîş û mudahaleyan biparêzê. Parastin ev a.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku têgîna parastinê jî, divê ku mirov wê bike berlêpirsînê de. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku hêzên dewlet tirk ên weke polîs û leşkerên tirk û hwd, ne bo parastinê, lê bo mudahaleyê li jîyane mirovan bike û wê bike bin ´kontrolê´ de kar dike. Di vê çerçoveyê de weke hêzekî desthilatdarî ya. Lê li vir, divê ku mirov, vê yekê, werêne ser ziman ku di bin navê têgîna parastinê de kontrolkirin û mudahale ya ku li jîyane mirovan dihê kirin, divê ku mirov bike berlêpirsînê de. Di nava civatekê de ku ji wê civatê de bê, armanca civatê ne kontrolkirina civatê ya. Armanca wê, parastina. Li vir, divê ku mirov bi têgînî ´parastinê´ û ´kontrolkirinê´ ji hevdû cûda şîrove bike û werêne ser ziman. Herdû gotin jî, dema ku mirov li ser hêzekê re werêne ser ziman, wê xwediyê xoslet û teybetîyên cuda bê.

Ya ku mirov li vir, dibînê jî ew a ku hêzên di bin navê ´parastinê´ de ku li kurdistanê rejima tirk bicihkirina, li şûna parastinê li gorî mantiqê dewletê û zihniyeta wê dike ku bike bin kontrolê de ya. Bo vê yekê jî, ew jîyane mirovên herêmê ku divîyabû ku wê hêzê biparasta, dibê armanca wê ku ew êdî hêrîşî wê dike. ..Ya ku li kurdistanê bûya û dibê jî ev a. Bo vê yekê, gelê kurd, dibêjin ku ev hêza ku ne ji bo parastina me lê ji bo kontrolkirina me ya li gorî zihniyeta dewletê ku li vir a, em parastina wê naxwezin. Dibêjin ku emê xwe bixwe biparêzên. Di vê çerçoveyê de kurdan li herêmên xwe pêvajoyek nû ya xwe-parastina cewherî a civatî dana destpêkirin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku civate kurd û andamên wê bi tememî ji pergale parastinê hatina dûrkirin û hatina xistin bin pêvajoya kontrolkirinê de. Bo vê yekê ya ku di nava ti hêzên di bin navê ´parastinê´ de ku di nava kurdan de hatina bicihkirin û pêşxistin, mirov bi wan re tenê yeke tenê jî kurd û ji kurdan nabînê. Car bi car, hin gotin tên bi lêvkirin û tê gotin ku ´çûyina leşkerîya mecbûrî parastinek hevbeş a.´ Lê ev gotin jî ne rast a. Her wusa, ew çûyina leşkerîyê jî bi mantiqê kontrolkirina civate kurd dihê bikarhanîn. Di aslê xwe de çûyina leşkerîya mecbûrî a ciwanên kurd, bûya temenê wê ku parastina cewherî a civate kurd

bi wê were şikandin û giştîya civate kurd bi andamên wê re were xistin bin wê mantiq û kontrolkirina ku rayadarên dewletê tefkîr dikin li ser serê civate kurd. Bi vê re, mirov dikarê vê jî bibêje ku leşkerîya mecbûrî, bûya lingekî ku bi wê civatê ji navikê ve kontrol bikin û her wusa civate kurd bêparastin bihêlin a.

Heman tiştî mirov dikarê bo ´rêxistina polîsan´ û xolsetên wê a li kurdistanê jî werêne ser ziman. Ji ber ku polîs, di nava gel de ya, rayadarên tirk, ber ku bi mantiqê ´kontrolkirinê´ nêzîkî mijarê dibin, wê îtînayê didina nîşandin ku ji nava kurdan û ji herêmên kurdan û ku bi aslê xwe kurd tû polîs nebin. Dema ku tenê di çerçoveya têgîna "parastinê" de ku nêzîkatî bûba, bi teybetî, li herêmên kurdan wê ji kurdan ew rêxistina polîsan bihata pêşxistin û bi rêxistinkirin. Hiingî, wê parastin bûba. Mirov, dikarê ji wê yekê jî fahm bike ku polîsên tirk li kurdistanê ne bi armanca parastinê lê bi armanca kontrolkirina hena, ku pirranîya polîsên li herêmên kurdan tirk û ji herêmên tirkan hatina şandin in. Tenê, ev rastî jî, radixe li berçav ku ne bi têgîna ´parastinê´ lê bi têgîna ´kontrolkirinê´ nêzîk dibin. Bikarhanîna di çerçoveya têgîna ´parastinê´ û hwd de jî, tenê hem bo ser vê rastîya têgîna ´kontrolkirinê´ nûxûmandina û hem jî bo manipûlekirinê ya. Di serî de divê ku mirov vê rastiyê fahm bike.

Li kurdistanê, wê nêzî 20 milyon kurd bijîn, wê hemû dervî pergale parastinê bin. Li ser vê re, kî dikarê bibêje ku polîs û ankû rêxistinên din ên bi vî rengî û hwd bo parastinê li kurdistanê hena? Her wusa, di vê çerçoveyê de weke ´bindestên xwe´ nêzîkî kurdan dibin. Ne weke xwe nêzîkî kurdan dibin. Dema ku wekhevîyek heba, di hemû beşên jîyanê de jî, wê heman wekhevî heba. Lê mirov nikarê bahse vê yekê bike.

Dema ku em bahse pirsgirêka kurd bikin, ji vê aliyê ve jî divê ku mirov bahse wê bike. Ji hemû beşên jîyane dûrkirina kurdan, temenê vê rastîya gotina ´pirsgirêka kurd´ a. Her wusa, li pêşîya navê kurd, danîna gotina ´pirsgirêkê´ bixwe jî, nîşanaka vê zihniyeta înkare kurd a.

Li vir, gotina ´parastinê´, divê ku mirov werêne ser ziman ku gotinaka kûr û pirr-alî ya. Di çerçoveya jîyane civatê de, aliyên wê yên têgînî, felsefîkî, perwerdeyî, çandî, sîyesî, çapameniyî, û hwd hena. Ji van aliyan ve jî, divê ku mirov bi teybetî li ser wê bisekinê. Ev aliyên wê yên din jî, bi teybetî, di çerçoveya parastina jîyane civatî de digihijina li hevdû. Ji xwe, ev lingên gotina parastinê, wê di çerçoveya parastina jîyane civatî de hevdû temem bikin û bi hevdû re di ahengekê de bin. Li vir, di vê çerçoveyê de divê ku mirov bibêje ku bi jîyane civatê re gotina ´parastinê´ divê ku li ser wê ji gelek aliyan ve werê hizirîn û fahmkirin. Giringîya wê, di vê çerçoveyê de divê ku mirov li ser wê bisekinê. ...

Li vir, bi hemû kêmesî û hwd ve, denezendina ´xwerêveberîyên li kurdistanê´, divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Her wusa, li vir, divê ku miirov vê yekê jî bi wê re werêne ser ziman ku di hilbiartinên 7´ê hezirene 2015´an de kurdan bende ji sadî 10 bûhûrand û li ser navê xwe û weke vîna xwe 80 andam şandina meclisê. Ji ber ku rejima tirk li dijî statûya kurd a, her wusa, li hemberî wê vîna kurd a. Wê çawa wê ancamê û hebûna wê ji holê rabike, di wê çerçoveyê de di nava hewldanê de ya. Tê gotin ku ´wê di 1´ê mijdarê de, wê hilbijartin werina nûkirin.´ Ev jî, di ancama wê ne pejirendin û herêkirina statû û vîna kurd de dibêt. Ku çendî hêncetên din jî bikin ku werênina ser ziman jî, hênceta sereka ev a. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku mirov dikarê nûkirina hilbijartinan di 1´ê mijdara 2015´an de di çerçoveya şerê dewletê û rejimê ê li hemberî vîn û statûya kurdan de jî werêne ser ziman. Her wusa, mirov dikarê di çerçoveya wê konsepta şer a ku rejima tirk piştî hilbijartinên 7´ê hezirenê ku bi kurdan re da destpêkirin de jî werêne ser ziman.

Weke ku me di serî de got, pirsgirêka kurd, pirsgirêka maf û azadîyê ya. Divê ku mirov di çerçoveya maf û azadîya kurd de bahse pirsgirêka kurd bike. Rengên din ên hanîna wê ya li ser ziman, tenê weke gotinna sernûxûmandinê jî mirov dikarê werêne ser ziman.

Pirsgirêka kurd, piştî şoreşa rojava û pêşketina kurdan û sehêta wan ya li ser rojavayê kurdistanê giştî jî li hemberîê bigiştî ket pêvajoyek nû de. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku êdî pirsgirêka kurd, di çerçoveya tekoşîna bo statûya civate kurd de bû ya avakirina pergale civate kurd jî. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman. Rejima tirk ku hertimî bi pêvajoyên şer, dîzayn daya civatê û pirsgirêk di bin wê şerê ku kirina de daya tafisandin de, her wusa piştî ku kurdan xwerêveberîtên xwe denezend, bidest hêrîşa li wan xwerêveberîyên xweser kir. Ciwanên kurd ku hendek bo parastina xwe kolan, her wusa bûya armanca hêrîşên dewletê. Gelek dordor, dihênin ser ziman ku bo ku hendek hatina vekirin hêzên dewletê hêrîşê dikin. Lê ev dordor nayênin ser ziman ku ew hendek bo ku pêşîya hêrîşên dewletê ên li civate kurd ku bên rawastindin hatina vekirin.

Êdî civat, dixwezê ku xwe bixwe birêve bibê. Dixwezê ku bi vîna xwe li ser pêşaroja xwe xwediyê gotinê bê. Bo vê yekê, tekoşînê dide. Têgihiştina vê yekê di nava kurdan de pêşketîya. Civatekeka ku ev têgihiştin di nava wê de pêşketîya, pêşîya tekoşîna wê jî girtin jî ne biderfet a.

Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê, werêne ser ziman ku denezendina xwe xwerêveberîyan li bajarên kurdistanê, bertekek civatî

ya meşrû ya. Ji xwe ji ber ku bi vî rengî ya hêrîşên kriminalize kirinê li wê dikin. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî di dewama wê de werêne ser ziman ku gelek bajarên kurdistanê, dibin hêrîşên xadar de na. Minaq, bajarokên weke Farqîn û Sîlwanê, rejima tirk bi tank û topan hêrîşî wan kirîya û kirina kevil. Ev hêrîşên bi armanca kavilkirinê û her wusa çavtirsandinê dikin. Yanî, dixwezin ku ji kurdan re bibêjin dengê xwe dernexin û ku win li kûderên din bi vî rengî denezênin emê jî bi vî rengî bixûrîxênin.

Civatek, ku ne xwediyê rêveberîya xwe ya cewherî a xweser bê, ew civat hatîya xistin pêvajoya ji hevdû felişendin û tûnakirinê de. Î ro jî, ya ku hatîya hanîn li serê civate kurd jî, mirov dikarê di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Gelê kurd, li hemberî pêvajoyek bi vî rengî li berxwe dide û tekoşîna xwe parastin û ya parastina hebûna xwe dide. Tekoşîna parastina hebûna civatî dide. Î ro, mirov dikarê tekoşîna civate kurd a meşrû, di vê çerçoveyê de wê salix bike û werêne ser ziman.

Civate kurd, di çerçoveya xwe afirandin û pêşxistina pêşaroja xwe de, dixwezê ku xwediyê rêveberîya xwe ya cewherî bê. Dixwezê ku ew xwe bixwe bi rêve bibe. Dixwezê ku bi zimanê xwe bi zimanê kurdî xwe perwerde bike. Dixwezê ku êdî di çerçoveya maf û azadîya xwe de statûya bidest bixe. Ji xwe, hemû komkujiyên mazin ên weke komkujiya geliyê zilanê, komkujiya dersimê, komkujiya Helebçê, komkujiya şengalê, komkujiya kobanê û hwd, û bi dehan komkujiyên din ên li başûr, bakûr, rojhilat û rojavayê kurdistanê ku hatina serê civate kurd, mirov dikarê weke ancama hebûna pirsgirêka kurd ku rejimên herêmê afirandina jî werêne ser ziman. Ji vê demê û pê de jî, heta ku pirsgirêka kurd newê çareserkirin, wê pêşîya komkujiyên din ên nû newê girtin.

Î ro jî, hêrîşên rayadarên tirk li kurdên bakûrê kurdistanê di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman. Her wusa, bi hêrîş û şerê roja me ku bi kurdan re dikin, dixwezin ku pêşîya pêşketina kurdan bigrin. Dixwezin ku wê hewldana kurdan a avakirina rêveberîya xwe ya xweser kriminalize bikin. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov van hêrîşan di serî de fahm bike. Lê li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku ku kurd di yekbûnekê de bin, êdî wê ti kesek pêşîya wan negrê. Çendî ku hêrîşî wan bikin û komkujiyan bênina serê wan û bajarên kevil bikin û hwd jî, wê pêşîya wê serkevtina wan negrin. Her wusa, minaqe ku rojavayê kurdistanê bi gelek êşan da nîşandin li berçav a. Kurdên bakûrî, gelek fêrên ku ji wê derxin hena. Her wusa, di serî de her kurd divê ku têgîna civatî ya civate kurd di mejiyê xwe de zelal bike û piştre bo wê di nava tekoşînê de bê. Hingî, wê ti kesek, nikaribê pêşîya wan bigrê. Denezendina xweserîyên kurdistanîyan li bakûrê kurdistanê di çerçoveya têgîna xweserîya demokratik a civate kurd

de ne xelat a. Lê divê ku bi zanebûneka baş û pêşketî were pêşxistin. Pêşaroj, ya civate kurd a li kurdistanê. ...

Li cihanê, minaqên têgînên xweserî û federalî hena. Li îspaniya, Ingilistan û gelek welatên din hena. Di çerçoveya projeya ´ewropa´ bixwe de jî, hin bi hin bi ber pêvajoyek bi vî rengî de çûyin dibê. Her wusa, li herêmê i rojhilat, xalkên dîrokî ên herêmê wê karibin habûna xwe ji nû ve bidina şînkirin. Her wusa, li vir, mantiqê, pêşî ew a ku têgîna bi hevdû re ya jîyanê divê ku were herê kirin. Azadîya mirov, ew a ku mirov bi nirxên civatî û serdeme xwe êdî xwe adilandibê ya.

.

**Xwerêvebirin, boykota dibistanên tirkî û serdegirtinên sazîyên çapameniya kurd jî wê dewama wê de werina pêşxistin.**

Hikimeta AKP´ê li hemberî kurdan, piştî hilbijartinên 7´ê hezîrene 2015´an û pêde, konsepte şer kir dewrê de di her qadê de şerekî mazin bi kurdan re da destpêkirin. Hemû sazîyên kurdan, kirina ber hêrîşan de. Wê çawa dengê kurdan bibirrin, di wê çerçoveyê de hêrîşî kurdan dikin. Her wusa li hemû bajarên kurdan, ji her aliyê ve dorpêçkirinek hatîya pêşxistin. Hema bêja her roj balafirên şer ên tirk çîyayên kurdistanê bombobaran dikin. Her roj, nûçeyên kuştina ciwaên kurd ên ji aliyê polîsên tirk ve tê. Li hemberî vê jî hemû dûnya û cihan ker û lala dileyizê.

Konsepta şer a rejima tirk a li hemberî kurdan, di wê çerçoveyê de ya ku wê çawa pêşketina kurdan bi şûn ve bidinê de. Li ser wê re jî, wê çawa vê pêvajoya şer û înkara civate kurd bidina domandin, bo vê yekê van dikin. Gotinên T. Ardogan ên ku berê digot ku "emê vegerihina sêrî", divê ku mirov di vê çerçoveyê de wan bibîr bixe. Hinekî jî, ev oparasyonên bejehî, hewayî û sîyesî ku li qada sîyeseta kurd dihên kirin, wê di vê çerçoveyê de oparasyonna ´vegerîna sêrî´ bin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku civate kurd, tekoşîna maf û azadiyê dide. Her wusa, hemû nirxên ku hebûna civate kurd li ser lingan digirin ên weke zimanê kurdî û hwd, hatina qadaxa kirin. Çanda kurd, dihê bişavtin û tûna kirin. Her wusa, nirxên ku civata kurd bihevdû re digrin, wê çawa wan tûna bikin, hêrîşî wan bikin. Di vê çerçoveyê de hêrîşên rejima tirk li kurdan dibin. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku civate kurd, ji her aliyê di bin hêrîşan de ya.

Her civat, xwediyê xosletên xwe yên teybet in. Her wusa, dike ku li gorî rastîya xwe rêyeka rêveberîyê pêş bixe. Her wusa civata kurd jî, dike ku li gorî rastîya xwe rêveberîyek xwe ya cewherî ava bike. Di vê çerçoveyê de rêveberîya xweser a demokratik li bajarên kurdistanê denezend. Dema ku rêveberîyên xweser ji aliyê kurdistanîyan ve hatina denezendin, piştre rejima

tirk bidest hêrîşkirina li wan rêveberîyên xweser kir. Heta roja me, bajarek û herêmek kurdistanîyan nemana ku rastî hêrîşê ne hatina. Hemû deverên kurdistanê ku rêveberîya xwe ya xweser denezendîya rastî hêrîşê hatina. Î ro jî, di roja ku kurdistanîyan bo ku bertekên xwe li hemeberî bişavtina zaroyên xwe ku bidina nîşandin ku dibistanên tirkî ´boykot´ kirina, di wê rojê de serdegirtinên saziyên civate kurd ên çapameniya kurd dibin. Di heman rojê de sazîyên weke ´ azadiya welat´, ´ DIHA`, ´kurdî-der´ û hwd, rastî serdegirtinan tên bi dehen kurdistanîyên ku wan bi rêve dibin tên binçavkirin.

LI vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku bi konsepta şer dihizirin ku bi vî rengî derbeyê li kurdan bixin. Rejima tirk, hertimî, bi vî rengî çûya bi ser kurdan de. BI heman rengî, divê ku mirov hêrîşên li partîya kurd HDPê jî bi wê re werênina ser ziman. HDP´ê di hilbijartinên 7´ê hezîrene 2015´an de benda ji sadî 10 derbas kir û ser 80 wekilî re derxist û çû meclîsê. Her wusa, di vê çerçoveyê de hemû hêrîşên ku li wê dibin, divê ku mirov van herîşên ku li sazîyên kurdan dibin, bi hevdû re şîrove bike û werêne ser ziman. Bi teybetî, hemû nirxên civatî ên civate kurd ku hena, di armanca wan hêrîşên rejimê de na.

Rayadarên rejima tirk, ji ber ku dixwezin ku vê pêvajoya şer a bi kurdan re bidina domandin û bi wê re kurdan bişikênin. Yanî, hertimî rewşê di nava şer de bihêlin û bi wê re derbeyê li kurdan bixin. Bo vê yekê ya, ku dixwezin ku partîya kurd bin benda hilbijartinê ku danîna bihêlin û li ser wê re êdî pêvajoya înkare kurd û şerê bi civate kurd re bi wê re bidina domandin.

Li vir, em vê yekê jî bibêjin ku ew zihniyeta ku çareserîyê di şikandina kurdan û di bin bendê ji sadî 10 e hiiştina partîya kurd de dibînin, tenê zihniyeteka şer a. Di salên ku bûhûrîn de partîyên kurd di bin bendê de bûn, gelo wê rewşê çareserî bi xwe re hanî? Yên ku tenê li vê rewşê jî binerin, wê fahm bikin, ev ne rast a. Ev zihniyeteka ku dixwezê ku civate kurd ji dîrokê bibê ya. Zihniyeteka jenosîde ya.

Zihniyeta ku konsepta şer li hemberî kurdan dayî destpêkirin, zimanê kurdî qadaxakirî û nahêle ku kurd bi zimanê xwe yê dayikê xwe perwerde bikin û li ser sazîyên civatî ên kurdan de digirê û hwd, divê ku mirov weke zihniyeta jenosîdê werêne ser ziman. Ev zihniyeteka ku weke zihniyeta nemrûd, firewûn û hîtler, wê hertimî were şermazarkirin û bi ´îbret´ ji wê were bahskirin.

Li vir, divê ku mirov hinekî li ser boykota dibistanên tirkî jî bisekinê. Ji aliyê civate kurd ve boykotkirina dibistanên meşrû ya. Her wusa, mirov dikarê di çerçoveya mafê mirovan û parastina mafên bingihînî ên civatîya civate kurd de jî werêne ser ziman. Bêgûman, mafê perwerde dîtinê, weke

mafekî pîroz ê herkesekî werêne ser ziman. Lê tevî ku ev maf herkesekî heya, tenê bo kurdekî tûna ya ku bi zimanê xwe yê civatî wê hilde.

Pêvajoya şer ku piştî 7´ê hezîrene 2015´an û pê de rejima tirk li hemberê daya destpêkirin, divê ku mirov weke pêvajoyaka şerê jenosîdkirina civate kurd jî werêne ser ziman. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman.

Di destpêka pêvajoya çareserîyê de tevnek bi pêvajoyên hêrîşkirina bi çeteyên weke yên DAÎŞ´ê û hwd li hemberî kurdan bi rêxistin kirin. Hêvîkiribûn ku wê bi wê ancamê bidest bixin. Her wusa pirr bi êminî bawer dikirin ku wê DAÎŞ, wê derbeya ku wan dixwest wê li kurdan bixe. Lê dema ku ditin ku ew nebû, piştre rejimê bi xwe êdî pêvajoya şer bi konsepta şer li hemberî kurdan dana destpêkirin.

Li vir, em binxat bikin û bibêjin ku divê ku em ´DAÎŞ´ê weke ´rêxistinek´ ku li ser olê re hatî pêşxistin şîrove nekê. Dibêt ku komên weke selefîyan û hwd di wê hatibibina bikarhanîn. Lê DAÎŞ, pêvajoyeka şer ya li hemberî civate kurd a. Divê ku mirov DAÎŞ´ê, weke konsept û pêvajoyeka şer ya giştî a li hemberî civate kurd şîrove bike û werêne ser ziman. Heta ku pirsgirêka kurd, wê davî li konsept û pêvajoya şer ku navê DAÎŞ´a a li hemberî civate kurd hatî dayîn destpêkirin jî, wê newê. Her wusa, konseşta şer ku rejima tirk li bakûrê kurdistanê li hemberî civate kurd dayî destpêkirin jî, divê ku mirov di vê çerçoveyê de didewama wê de werêne ser ziman.

Ev pêvajoya şer û ankû konsepta şer a navê wê DAÎŞ, weke pêvajoyek şer li hemberî pêşketina civate kurd, hêza xwe rêvebirina wê û birêxistinbûyîna wê ya civatî ya. Di vê çerçoveyê de armanc ew a ku civate kurd ji hevdû bifelişênin. Ku ev bi komkujiyên weke ku li Şengelê û kobanê û ankû weke bi goçberkirina ku bi plankirî ji herêmê bi destê rejima tirk û in alikarên wê ku ji kurdistanê dana destpêkirin bê. Her wusa, li vir, bi gotinekê jî bê, divê ku mirov bibêje ku hemû goçberkirin û goçkirin, di vê çerçoveyê de divê ku mirov weke pêvajoya domandina komkujiya şengalê û kobanê a li ser serê kurdan jî werêne ser ziman.

Dema ku mirov zihniyeta di temenê komkujiya helepçê, komkujiya şengalê û kobanê de fahm nekê, mirov wê zihniyeta ku vê goçberîyê pêş dixe jî baş fahm nekê. Her wusa, dema ku mirov wê fahm nekê, mirov wê zihniyeta ku î ro konsepte şer li bakûrê kurdistanê li hemberî kurdan daya destpêkirin jî bi başî fahm nekê. Ev hemû bi hevdû ve ji navikê girêdayî na. Her wusa hemû hêrîşên li hemberî bajarên kurdistanê, bi hemû hêrîş û serdegirtinên bi armanca tafisandinê ên ku li kurdistanê li ser serê kurdan dibin, divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman.

.

**Ku weke ´warê berxwedanê´ dihat nasîn û bi navkirin Cizîra bota, di nava wê berxwedana li bakûrê kurdistanê a bo rêveberîyên kurdistanî ên xwweser derket li pêş û bo weke dager(´sembol´)a hemû berxwedanên li bakûrê kurdistanê ên bo rêveberîyên xwe rêvebirinê ku kurdistanîyan denezendina.**

Cizira bota, hertimî navê wê bi berxwedanê hatîya bîrhanîn. Dema ku mirov li dîroka cizira bota binerê jî, hertimî, ev herêm bi navê ´herêma botanê´ boya navenda berxwedanê. Hêrîşên herî Xadar, hem di dema komare tirk de û hem jî berî wê di dema osmanîyan li Cizîra botanê bûna. Lê Cizira botanê, hertimî jî, li berxwedaya. Navê Cizira botan bi berxwedanê bûya malê dîrokê. Rejima tirk jî, bo vê rewşa cizira bota ji berçav dûr bike, hertimî xwestîya li Cizire bota û dora, Cerdewaniyê pêş bixe. Hizbil-kontra, herî zêde bidest û alîkarîya dewletê li van herêmên botanê bicih bûya. Ev jî, weke politikeyaka teybet ya dewletê ya ku li ber herêma botanê.

Cizîra bota, piştî ku dewleta tirk di 20´ê temûza 2015´an de konsepte şer li hemberî hemû bakûrê kurdistanê da destpêkirin, Cizîra botanê jî, rêveberîya xwe ya kurdistanî a xweser denezend. Piştî ku Li cizira botanê kurdistanîyan rêveberîya xwe ya xweser denezend û pê de êdî rayadarên tirk bi polîs û leşkerên tirk, cizira bota û hewirdorên wê dorpêç kir û bi dest hêrîşê i Cizîrîyan kir. Ev bi armanca şikandina vîna cizirîyan bû. Cizira bota, biqasî ku bo kurdan giring û biw wateya, wusa bo dewletê jî giring a. Berxwedana li Cizira bota ku li ser navê parastina rêveberîya xweser a kurdistaniyan li cizirê ku biparêzê, li ser navê hemû kurdistanê ya. Dewlet jî, di wê bawerîyê de ku dema ku di cizira bota de derbeyê li vîna kurdan bixe, wê ew derbe bibe derbeyek mazin li hemû kurdistanîyan. Bo vê yekê bi hemû hêza xwe diçê biser Cizira bota de. BI dehan mirovên kurd, li Cizira bota ji aliyê hêzên dewleta tirk ve hatina qatil kirin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, bibêje ku Cizîra bota, î ro jî, bûya nav û navenda berxwedanê li kurdistanê û herêmê. Di sale 2014´an de di vê heyva êlûnê de kurd hemû bi berxwedana kobanê re li ser lingan bin. Di wê demê de navê berxwedanê kobanê û serhildanê jî bakûrê kurdistanê û hemû Kurdistan bû. Î ro jî, navê berxwedanê Cizira bota û serhildanê jî bakûrê kurdistanê û hemû Kurdistan a.

Cizira bota, hertimî weke navendeka ku di wê de çand û bîrewerîya kurd û kurdistanî hatîya parastin. Bo vê yekê jî, hertimî, ev herêm rastî politikayên teybet ên rejimê hatina. Hertimî, navê wê herêmê bi berxwedanê û komkujiyên rejima tirk li wê kirina re hatîya rojevê. Î ro jî, wusa ya. Li Cizire botanê berxwedana. Lê bi wê re jî, bi dehan kurdistanî li wir, hatina

qatil kirin. Bi deh hezaran hêzên dewleta tirk bi polis û leşkerên wê re bi tank û topan re ketina herêmê de û hêrîşî xalkê sivîl ê Cizîra bota dikin. Lê rayadarên tirk, ên hikimeta AKP´ê bo ku ser van hêrîşên xwe yên li sivîlan bigrin û binûxûmênin, dibêjin ku li wir "PKK´ê heya." Lê ev derew a. Dewleta tirk, vê gotinê bo ku komkujiyên xwe yên li wir, meşrû bide nîşandin, bikardihêne. Her wusa, Wezîrê karê hundûr ê tirk, derdikeve tv´yan û dibêje ku " li wir, me gelek çek û 800 kîlo taqamenî girtîya. Ev kûlîyen derew in. Ti têkilîya van gotinan bi rastîyê re tûna na. Ev gotin, bo kriminalize kirina rastîyan û komkujiyên ku kirina, wan meşrû bidina nîşandin, van gotinan bikardihênin.

Weke ku çawa ku dema ku Ceylan onkul ji aliyê polîsên tirk ve hat qatil kirin û piştre polîsên çekek danîn li rex û xwestin ´rengê şerkirinê bidina berçapameniyê´, nûha jî, heman politika dihê meşandin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku ne tenê li Cizîra bota, li her deverî serî li van derewên bi vî rengî dixin. Li ser çapameniya dewletê a fermî re bi gotinên bi vî rengî, hem şerê ku bi kurdan re dikin, dikin ku meşrû bidina nîşandin û hem jî dixwezin ku temenê şerê rejimê ê piştre ku bi kurdan re bike biafirênin. Di vê çerçoveyê de bo ku mijarê weke mijaraka terorê bidina nîşandin, Hertimî dikin ku di nava tevgerê de na. Hin mirovên ku xwe weke ´rewşenbîr´ jî bi nav dikin, li şûna ku bangê li dewletê dikin ku şidet û terora li ser serê civate kurd ku dawî lê werêne. Hertimî ji xwe re kirina adet ku bangê li kurdan bikin û bibêjin "dawî li şidetê werêna." Yên ku li vê gotinê dinerê jî, fahm dikin ku weke ku yê ku wê şidetê dike kurd û tevgerên kurd in. Lê ya ku wê şidetê dike, dewlet a. Ev gotinên bi vî rengî ên bi bangî jî, dema ku berê wan li kurdan bin û weke bangê li kurdan bin, wê çavê, dibina weke sernûxûmandina şideta dewletê a li ser serê kurdan. Ji xwe heta roja me jî, rastî ji vê cudatir nebûya.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku ew dordorên ku car bi car li hevdû dicivin, bangê li kurdan û tevgerên kurdan dikin ku ´dawî li şidetê werêne´, li hemberî şideta dewletê bêdeng û ti dengî dernaxin. Li Cizira bota, bidehan kurdistanî, jin û zarok hatina qatil kirin. Lê deng ji van dordoran dernakevê. Bêdeng in. Tenê, ev bêdengîya wan jî, ji aliyekî va ji aliyê wijdanî û cidiyetê ve dike ku mirov wan bike berlêpirsînê de. Li vir, divê ku mirov di serî de vê yekê bibêje ku kurdan, hertimî hewldana xwe li hemberî hêrîşên dewletê hebûna xwe biparêzên. Tank, top û balafirên şer ên kurdan nîn in ku herin bombardimanê li ser serê tirkan bikin. Lê yên rejima tirk hena ku hertimî jî li ser serê kurdan bombardimanê bi wan pêktêne. Li hemberî van bombardimanê, ev dordor, bêdeng in. Ti carî li hemberî wan bombardimanê deng dernaxin. Ev jî, rewşeka ku mirov dikarê bi bêwijdanî,

bêcidiyet û bi nîyetên wan ên vêşarî ku li ser navê dewletê û nîjadperestîtîya tirkiya di bin rengna din de didina nîşandin, dihêne li berçav.

Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku li hemberî, hêrîşên dewletê ên li Cizirê, gever. Farqînê, Agirî, Dîyandînê. Silwanê, Sûra Amedê û hwd bi gelek deverên din re ku dibin hêrîşên polîs û leşkerên tirk de na, li ber wê bêdeng in. Mirovekî bi wijdan û bi ahlaq, ku dema ku banga sekinandina ´şidetê´ bike, divê ku di serî de li hemberî van pêvajoyên şer ên dewletê jî bisekinê.

Politikayên dewletê ên şidetê, ji destpêka komarê ve li hemberî kurdan hatina dayîn domandin. Î ro jî, bi gelek rengan ew li ser serê kurdan didom in. Her wusa, rayadarên tirk, bo şidetê li ser serê kurdan, serî li her rê û rêbazê dixin. Berê, li zilanê û Dersimê komkujî dikirin. Î ro, li Cizira bota, Silwan, Farqîn, Gever, kobanê, Şengalê û cardin li herêmên din ên dersimê komkujiyê dikin. T tişt ne gûharî na.

Li kurdistanê, li her deverên wê, her roj, nûçeyên komkujiyên tên. Yên ku van komkujiyan dikin jî, polîs û leşkerên tirkin. Her wusa, rayadarên tirk in. Pêvajoyên komkujiyê ku bi teybetî hikimetê AKP´ê li hemberî kurdan bi rêxistin dike. Î ro, dema ku mirov li Cizira botanê binerê, mirov wê vê rastiyê pirr zêde baş bibînê. Rayadarên tirk, hertimî di nava wê hewldanê de na ku wê çawa kurdan çawa dibin metingerîyê de bihêlin. Di vê çerçoveyê de sîyesetê dikin. BI zihniyeteka serdest û metinger, nêzîkî kurdan dibin. Ji ber kurdan dibêjin, ´emê we bikujin, lê winê dengê xwe dernexin.´ Bi hemû çekên giran hêrîşî kurdan dikin. Kurd, hertimî rastîya ´bêbaxtîya´ rejimê hatina. Î ro jî, biheman rengî rastî wê bêbaxtiyê tên. Kurdan vala ne gotîya ´baxtê romê nîn a.´

Berxwedana Cizîrê, berxwedana hemû kurdistanê ya. Êdî Cizira bota, Kurdistan bixwe ya. Di serî de divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman. Î ro, li Cizira bota berxwedana ku heya, li hemberî hemû çekên dewleta tirk ên bi teknika pêşketî, tenê berxwedana gel heya. Gel, bi hêza xwe û girsebûna xwe berxwedide. Î ro, yekê ku herê Cizîra bota, wê bibînê ku di hundûrê vê hefteya ku bûhûrî a a hefteya pêşî û ya dûyemin a êlûna 2015´an de, wê bibînin ku tenê malake kurdan tûnaya ku rastî hêrîş û bombardimanên leşkerê tirk û polîsên tirk nîn a. Hemû dever, rastî bombardimana wan hatîya. Li Cizîra bota, jin, zarok û ciwanên kurd tên qatil kirin. BI wan re pîr û kal tên qatil kirin. Artişa dewletekê ku bi hemû teknîka xwe ya pêşketî a di dest de hêrîşê bibe ser xalkê sivîl, ma ji namerdîyekê û pê de, çi ya? Ne ti tiştekî din a. Tenê namerdî ya. Kurd, bi canê xwe û kevirê di destê xwe de li hemberê teknika şer a di destê artişa tirk de tekoşîn û berxwedana mayîn û nemanê a hebûna xwe dide.

Cizira botanê, bi teybetî herêma botanê, bidîroka xwe ya barxwedanê, weke singekê ya di singa dijminê xwe de. Ji ber ku hertimî hêrîşên mazin li herêma botanê û bi teybetî li Cizira botanê bûna, êdî berxwedana wê jî bi vî rengî bi gûrr û mazin bûya û bi navê wê re bûya malê dîrokê. Ku ewder Kurdistan bê, li devera ku hêrîş hebe, wê li wê derê jî berxwedan hebe. Li Cizira bota, hêrşên xadar û bi armmanca komkujiyê li Cizira bota hena, bo vê yekê, berxwedana wê jî li gorî wê mazin û dîrokî ya. Bi teybetî ji roja 6´ êlûnê ve hêrîşên bixadarî û şitt li ser Cizîra bota hene. Cizira bota jî, xakê wê, bi derfetên xwe berxwedide û dike ku jîyane xwe ji hêrîşên rayadarên dewletê polîs û leşkerên wê biparêzê.

Hêrîşên ku di vê hefteya bûhûrî de ku li Cizira bota li kurdan dibin, êdî cih jî ji gotinê re ne hiştina. Êdî mirov çi gotinê bibêje jî, cihê wê ne namaya. Li devereka ku her roj, mirov werina qatilkirin û mirovên din li ber wê bêdeng bin, li wir êdî mirov nikarê bahse mirovatiyê bike. Cizira bota, rastîya mirovatiyê û wijdanê mirov a rast a. Berxwedana li Cizira bota, berxwedana mirovatiyê ya. Li Cizîra bota, dewletê xwest ku kurdistanê dil bigrê. Lê Li wir, berxwedana kurdistanê Cizîrîyan pêşxistîya. Ev berxwedana hemû kurdistanê ya. Bi vê re divê ku mirov bi tîpên stûr binxat bike û bibêje ku Cizira bota êdî Kurdistan bixwe ya. Berxwedana li Cizira botanê, divê ku mirov wele navê serhildana hemû kurdistanê a î ro werêne ser ziman.

.

**Li her qadê kurdistanîyan diqîrîn û digotin ”Ji kobanê heta Cizîra bota; ´berxwedan jîyan a!`”**

Di dema ku Çeteyên DAÎŞ´ê bi alikarîya tirkiya hêrîşî kobanê kirin, berxwedanaka ku ti kesekî hêvî ne dikir hat dayîn destpêkirin. Piştre berxwedan mazin bû û li giştîya kurdistanê bû agirê serhildanê. Di 7 û ê êlûna di 2014´an de hemû bakûrê kurdistanê rabû serpîyan. Bi wê re, berxwedana kobanê, li bakûrê kurdistanê bi serhildanê hatibû pêşwazî kirin û silev kirin. KObanê bi serket, Çeteyên DAÎŞ´ê ji kobanê ûû herêmên ên rojavayê kurdistanê hatina paqij kirin. Piştî ku bi vî rengî çeteyên DAÎŞê hatina paqij kirin, weke ku hêvîya rayadarên tirk şikeştibû. Rayadarên tirk, hêvî dikirin ku wê DAÎŞ derbeyek mazin li kurdan bixe. T. Ardogan, di rojên berxwedana kobanê de derdiket ber çapameniyê û digot ku "koban ket, dikeve." Lê kobanê ne ket. Bi serde jî, i bakûrê kurdistanê di hilbijartinên 7´ê hezîrana 2015´an de kurdistaniyan serkevtinek mazin bi dest xistin. Kurdan vîna xwe kir yek bû ku pirsgirêka kurd, di pêvajoya çarsserîyê ku birêz Ocalan dabûbû destpêkirin de werê çareser kirin.

Ji destpêka ppêvajoya çareseriyê ji 2013´an û heta 7´ê hezîrana di

2015´an gelek komkuji hanîna serê kurdan. Hikimeta AKP´ê A tirk, hertimî, xwestibû ku pêvajoyê di çerçoveyeka ku bi wê derbeyê li kurdan bixe de xwestibû bi karbêne. Di hilbijartinên 7´ê hezirene 2015´an de dixwestin ku pêşîya kurdan bigrin ku herina meclisê. Ber ku, di xwestin ku di pêvajoyê de weke ku di hilbijartinan de T Ardogan dixwest ku di hilbijartinan de biserkevin û piştre bi ser wê re bibêjin ku ´meyîzênin, va herkesekî min hilbijart´ bi wê re zorê li tevgera kurd bike ku çekê dêne. Bi wê re jî, êdî di vê çerçoveyê de li ser bêstatû hiştina kurdan de pêvajoyê bi dawî bikin.

Ya ku hikimetên AKP´ê li hemberî kurdan kir, ji ya hikimetên berê wê ne cudatir bû. Wan jî, xwestibû ku vîna kurdan bişikênin. Lê çi kirin, ew ne kiribûn. Hikimetên AKP´ê û T. Ardogan, her rê û rêbaz bikarhanî ku derbeyê li kurdan bixe. Ji maxdûrîyetê bigra heta u digihijê olê her nirxên civatî û êşên wan îstîsmar kir.

Dema ku ditin ku wê nikaribin ku derbeyê li kurdan bixin, piştre konsepta şer kirina dewrê de. Her wusa, dema ku rayadarên tirk, bi hemû hêza xwe ve çûna bi kurdan de, kurdan jî, bo ku hebûna xwe biparêzên rêveberîya xwe ya xweser denezend. Bo ku ji komkujiyan xilas bibin, kurdan ev rê bijartibûbû. Heta vê demê, kurd, hertimî rastî komkujiyên dewletê hatibûn.

Hikimeta AKP´ê û T. Ardogan, li ser tûna hasibandina vîna kurdan û hebûna kurdan, stretejiya xwe ya dewletê pêşxistin û di wê çerçovey de bidest hêrîşî kurdan kirin. Wê çawa kriminalize bikin, li rê û rêbazên wê gerîyan. Li bajarên tirkiya, rayadarên hikimeta tirk, kontrayên xwe kirina dewrê de ku hêrîşî kurdan malên wan bikin. Li bakûrê kurdistanê jî, dewletê bi leşkerî konsepta şer da destpêkirin û bi dest hêrîşî kurdan bike. Weke ku di dema komkujiya dersimê de dibû ku balafirên tirk tişî bomba dikirin û dibirin û li ser serê kurdan vala dikirin, wê heman tirk di vê demê de bi fermana T. Ardogan û Dawutoglu wê were kirin. Ev jî, weke ku li gorî wan ne bes bê, li bajaran, bi polîs û tank û topan bi dest hêrîşî bajarên kurdistanê kirin. Li Geverê, Farqîn, Silwan, Sûra Amedê, û Cizira bota bi Silopîya re wê bina deverên sereke ku di bina armanca hêrîşên hêzên dewleta tirk. Herî dawî, bo ku vîna kurdan bişikênin, çûna bi ser kurdan de.

Kurdan jî, weke ku li Cizira bota kir, bo ku hebûna xwe biparêzên, hendek tax bi tax dikolan bo ku karibin xwe ji hêrîşên rayadarên tirk biparêzên. Di vê rewşê de weke her demê cizira bota bi navê xwe re derket li pêş. Li Cizira bota, Dewleta tirk, bi hezaran polîs û leşker û tank û top li wir bikardihanîn û bi wan hêrîşî kurdan dikir bo kurdan bişikêne. Lê kurdên sivîl ku ti çek di destê wan de tûnabûn, wê bikin ku xwe bi hendekên ku kolana û bi berxwedana ciwanên kurd ê cizira bota xwe biparêzên. Di vê navberê de

dewletê bo xwe weke armancê dît ku cizira bota û kurdên wê bişikêne. JI her aliyê ve hêzên dewleta cizira bota, weke ku çeteyên DAÎŞ´ê li kobanê kiribû dorpêç kir. Çendî ku hêzên dewleta tirk, cizira bota dorpêç kir jî, dîsa berxwedana kurdên cizira bota nekarî ku bişikêne. Her wusa, di 8 û 9ê êlûnê de hem hêrîşên aşîştên tirk li bîroyên partîya kurd Zêde bûn. Her wusa, kurdan jî, bo piştgirtîya bo Cizira bota rabûna serxwe û ´meşa bi hezaran a bi ber bi cizira botanê´ de dana destpêkirin. Çi rasthatina ku pêla hêrîşên faşîştên tirk ên li sr navendên partîya kurd HDP´ê û her wusa zêdebûna hêrîşên li kurdistanîyan zêdebûna rastî 8´ê êlûna 2015´an tê. Ev salwegera ku di sala bûhûrî de ku kurdistanîyên bakûr, bo kobanê û berxwedanê rabûbûna serhildanê.

Di vê demê de kurdistanî, hemû rabûna serpîyan, rejima tirk, hêrîşî hebûna kurdan dike. Kurd jî, bo hebûna xwe li berxwe didin. Bi gotinaka din, kurdistanî, bo hebûna xwe tekoşîna mayîn û nemanê didin. Li Cizîra bota, berxwedana ku bû, weke ya kobanê, bû malê hemû kurdistanîyan û bakûrê kurdistanê rabû serpîyan hêrîkîna ber bi cizira botanê de. Hêzên dewleta tirk bi leşker û polîsên wê re, hemû rê digirtin bo k u ti kesek nikaribê xwe bigihêne li Cizira bota. Lê dema ku arabayên kurdistanîyan sekinandin, kurdan bi lingan ketin rêya çûyina cizira botanê de. Weke ku di 8´êlûna 2014´ê de navê berxwedan û serhildanê kobanê bû, vêca jî bi heman rengî di 8´ê êlûna 2015´an de navê berxwedan û serhildanê cizira bota bû.

Dewleta tirk, li ser cizirîyan av û kehrebe birrî. Her wusa, yên ku di nava bajêr de diçûn ku herina firinê ku nanekî bo xwarinê bikirin, wê rastî hêrîşa sekvanên polîsên tirk werin û werina qatil kirin. Bi vî rengî, bi dehan kurdîstanî li cizîra bota hatina qatil kirin. Hêzên dewleta tirk, bi her awayê hêrîş birina bi ser kurdan de. LI bajarên rojava ên tirkiya de jî faşîştên hov, didana hêrîşkirin li ser kurdan de. Kurdan li Cizirabota, li navenda berxwedanê, digotin û diqêrîn ´berxwedan jîyan a!` û berxwe didan. Cizira bota li ser nav hemû kurdistanîyan, li ser navê 40 milyon kurdî berxwe dida. Bo vîn û rûmeta gelê kurd cizira bota li berxwe dida. ..
.

**Li Cizira bota, rewşa keça kurd Cemile ku di ´bozdolabê´ laşê wê ragirtin, wê wêneyekî rast ê berxwedanê li ber hêrîşên hêzên rejima tirk bi xwe re bide nîşandin.**

**Berî wê pêşî ez divê ku balê bikişênima li ser rewşa Ekin Wan û ankû "kewser elturk" ku di 10´ê tabaxa 2015´an de bi awayekî hatibû qatil kirin. Li Warto´ya Muşê weke keçaka kurd ku li berxwe dide wê bibîrîndarî bikeve destê hêzên rejima tirk de. Wê piştre ev keça kurd bi êşkenceyên giran ku li wê tên kirin wê bê qatilkirin. Piştre jî, rayadarên**

**tirk, wê fermanê bidina hêzên tirk ku wê rût bikin û wêneyên wê bo ´teşîrkirinê´ bikişênin û di çapameniya civaknasî de belav bikin. Wusa jî dikin. Piştre, wê ev keça kurd a bi rûmet, wê bê weke sembola berxwedana jinên kurd. Ew jineka kurd bû. Piştre li hemû bajar û deverên kurdistanê jinên kurd bo vê keç û jina kurd xwepêşandinê li dardixin û wê êşkenceya ku li laşê wê bi mirî dikin jî şermazar dikin. Jinên kurd bi ´dirişma, Ekin Wan rûmeta me ya rût a´ wê xwepêşandinan li her deverên kurdistanê li hemberî rejima tirk li darbixin. Piştre jî, bi awayekî plankirî, wê rewşên bi vî rengî li ser laşên kurdên ku hatina qatilkirin, ji aliyê rayadarên tirk û hêzên wê ve bên domandin. Li aliyê din ê berxwedanê jî, ji ber ku destûr ne didan ku kurd miriyên xwe biveşêrên, weke ku li Cizira bota bi keça kurd Cemile re hat dîtin di bozdolana de laşê wan dihat ragirtin.**

Bi rojan, li Cizira bota berxwedana kurdistanîyan li hemberî komkujiyên hêzên dewleta tirk didomê. Ji her herêmên kurdistanê, mirovên ku bi girseyî dikin ku xwe bigihênina Cizira botanê jî rastî astengîya dewleta tirk tên. Nahêlin ku ti kesek xwe bigihêne li Cizira bota. Arnaca vê jî, ew a ku kurdistaniyê cizira bota bitenê bihêlin. Ji xwe ji ser wan ava kehrebe birrîna. Her wusa, nahêlin u ti tiştek derbasî wir bibe. Bi gotinaka din, bi vî rengî, dixwezin ku vîna wan bişikênin. Kurdên ku ku derdikevina derve rastî hêrîşên çekdarî ên hêzên tirk tên. Heta nûha li Cizra bota bi dehan kurdistanî hatina qatil kirin.

Kurdistanîyên ku derdikevina derve ku herin û zad û ankû nan ji xwe r eji firinên nan bênin rastî gûla baran leşker û polîsên tirk tên. Carna kurdistanî, di malên xwe de rastî hêrîşên polîs û leşkerên tirk tên. Li cizîra bota keça kurd Cemile (Çagirga) keça 10 salî ya. Zaroyeka kurd a. Ew jî, rastî gûlabarana polîs û leşkerên tirk hatibû. Ev keça kurd 10 salî ji aliyê hêzên dewleta tirk ve hatibû qatil kirin.

Piştî ku keça kurd hat qatil kirin, derfet ji malbate wê re ne hatîya hiştin ku ew were bicihkirin. Bo dayikekê, êşa herî mazin a ku bi vî rengî zaroya wê, bibînê û bigrê ya. Ev çend roj in ku ev dayika kurd, keça xwe cemîle di mal de digirê. Her wusa, bo ku laşê wê xira nebê jî, bi bozdolabê(şarinç) de digirê.

Li ser vê rewşê re mirov bo ku deng bide, hewce nakê ku mirov kurd bê. Tenê ku hinekî wijdanê mirov hebe, ew bes a. Di aslê xwe de rewşa keça kurd cemile, rastîya gelê kurd a bi êş a. Rewşa keça kurd cemile, dide nîşandin ku gelê kurd di rengekî çawa êş hêrîşên bêwijdan û bêahlaq de ya. Dewleta tirk, hertimî hemû nirxên mirovatiyê binpêkirina.

Yên ku dikarin rewşek bi vî rengî bidina kirin, tenê yên ku nesibê xwe ji mirovatiyê ne girtina na. Carna bo rayadarên tirk, dema ku kurd xwepêşandinan li dar dixin, di wan xwepêşandinan de gotinê bo wan dihênina ser ziman. Ew gotin jî, ew a ku "dibê ku bibin dewlet, lê nebûna mirov û ne gihiştina ahlaqê mirovatiyê." Piştre bi serkeve dikin û dibêjin "bûna hertişt, lê nebûna mirov." Ev gotin, di aslê xwe de weke gotinaka civatî ya civate kurd a. Î ro jî, di vê rewşê de dihê hanîn li ser ziman.

Her wusa divê ku mirov bibêje ku gelek rewşên bi vî rengî hatina serê mirovê gelê kurd, salek du sal berê, bavekî kurd ji herêma hakarîya ku zaroya wî pirr nexweş a, ti kesek alikariyê ji wî re naşêne, ew bixwe zaroyê li pişta dike û dikeve rê de di wan rojên ber pirr zêde li ardê heya û tê de. Navê wî zarokî Muammer bû. Piştre, ew di nîvê rê de jîyane xwe ji dest dide. Ew zaroya kurd a sê û ankû çar salî, bi wê rewşa ku di çûval de û li pişta bavê xwe hatibû rojevê. ..

Î ro rewşa ku tê serê civate kurd ya keça kurd cemile ji wê ne cudatira. Keça kurd cemile û rewşa wê, rewşa li ser serê hemû kurdan û rastîya hêrîşên li ser serê civate kurd bi asta wê re dihêne ser ziman. Her wusa, di serî de divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman. Ew mirovên ku bahse wijdan, ol û zanebûnê dikin, xwe weke mirov didina nîşandin, li hemberî rewşa cemile çima bêdeng bin. Wijdanê wan û ahlaqê wan li kû ya?

Ew mirovên ku li hemberî vê rewşa bêdeng in ku rewşenbîr bin, oldarin û ankû yekî ji rêzê ji nava civatê bin ku kurd bin û ankû ne kurd bin, wê çawa bahse mirovatiyê bi navê xwe re bikin? Yên ku li hemberê vê zilm û pîsîtîya rejimê a li ser serê civate kurd bêdeng in, çendî mirov in, têgîna mirovatiyê bi wan re heya û dikarê bahse mirovatiyê û nirxên wê bikin.? Rewşa keça kurd cemile, rewşa keça kurd Ekin wan a li Wanê, hwd, bi sedan rewşên bi vî rengî ên ku rayadarên rejimê bi polîs û leşkerên xwe re hanîna serê civate kurd, rewşên ku bidawîbûna mirovatiyê, wijdan û ahlaqê na. Rewşa keça kurd cemile, ast rewşa hêrîş û wehşeta dewletê jî dide nîşandin. Rewşa keça kurd cemila ku ´bozdolabê´ de tê girtin, divê ku hemû kurdistanîyan û mirovên ku ji xwe re dibêjin ez mirov im rakê ser pîyan. ...

Li Cizira bota keça kurd cemile, li Wanê Ekin wan û hwd, wijdanê mirovatiyê na. Wijdanê, yê ku dibêjê ´ez mirov im´ a. Rewşa keça kurd cemile li Cizira bota, li hemberî bêwijdanîya dewletê, zihniyeta wê û rayadarên wê bi polîs û leşkerên wê re, dibê dengê wijdan, ahlaq û mirovatiyê. Herkesekê ku dibêjê ez mirov im, ji wî re dibê berpirsîyara mirovî ku li wê wijdanê xwe keça kurd cemile xwedî derkeve û dengê xwe bo wê bilind bike. Li cizîra bota rewşa keça kurd cemîle, rastîya kurd û kurdistanê ya. Herkesek, bi vê rastiyê divê dengê xwe bilind bike. Bêdengî,

bêrûmetî ya li hemberê wê rewşê. ... . Hikimeta AKP´ê bi farmana T. Ardogan û şûreqaya wî, Kurdistan kirina gola xwûnê. Her roj, herêmeka ku ji wê nûçeya komkujiyekê newê nîn a. Tenê di van rojên dawî pê de, pêşî ji Farqînê nûçeya komkujiyên polîs û leşkerên tirk ku hanîna serê kurdan hat. Piştre nûçeya komkujîyê ji Sîlwanê hat. Piştre jî, Nûçeya komkiujiya ji Hakarîya hat. Î ro jî nûçeya komkujiyên ku polîs û leşkerên tirk dihênina serê civate kurd ji Gever û Cizîra botanê tê. Bi teybetî, herêmên kurdistanê, di demên hikimetên AKP´ê û T. Ardogan de pirr zêde komkuji li wan bûna. Her wusa, ji salên 1990´î zêdetir jî bûya. Carna di nûçeyan de tê nivîsandin ku "weke salên 1990´î, serî li rê û rêbazên komkujiyan dihê dayîn.". Lê divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku komkujiyên ku di dema hikimetên AKP´ê û T. Ardogan de ji ya salên 1990´î derbas kirîya.

Rejima tirk, pêvajoyeka şer bi gelemperî li hemberî kurdan daya destpêkirin. Her wusa, rojavayê kurdistanê û başûrê kurdistanê jî kirîya çerçoveya wê konsepta xwe ya şerê xwe yê bi civate kurd re. Hêrîşên li ser qandil û hwd, dihên kirin. Gundên qandilê dihên bombabarandin. Komkujiya li gundê Qandilê ê Zergelê ku di wê de ser 10 kurdên sivîl ve hat qatilkirin jî, di vê çerçoveyê de hat kirin. Her wusa, wusa xûya dike ku ev konseptek şer a giştîya ku li hemberî kurdan dana destpêkirin û wê di demên pêşde li herêmên rojavayê kurdistanê ên weke ezaz û cerablus´ê jî komkujiyan werênina serê kurdên rojavayî.

Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku komkujiyên ku rayadarên tirk li bakûrê kurdistanê dike, di çerçoveya şerê jenosîdkirina kurdan de ya. Divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Ji şerê cihanê ê yekemîn ve komkujiyên rejima tirk li kurdistanê li ser serê civate kurd û xalkên din ên ku li kurdistanê dijîn dibin.

Êdî asta hêrîşên li kurdistanîyên bakûrê kurdistanê gihiştîya wê astê ku rayadarên tirk, balafirên şer, tank û topan bikardihênin. Di komkujiyên polîs û leşkerên tirk ên li Farqîn û Sîlwanê de tank û top ajotibûbûna bi ser kurdên van herêman de. Di ber wê re de jî, daristanên van herêman dişawitandin. Her wusa, weke ku çawa ku tank û top di ajotina bi ser kurdên van herêman de, di ber wê re jî halîkoptêrên şer jî cih bi cih herêm bombabaran dikirin. Bi heman rengî di komkujiyên li Gever û Cizîra bota de jî, wusa ya. Nûçeyên ku herêmê tên, ew in ku ji dervî bajêr ji deverên weke Silîwana, top tên avêtin li navenda Geverê bixwe jî. Her wusa, weke ku çawa ku di bombabarandina balafirên şer de, bi koordînatan ev dihên kirin, di vê çerçoveyê de, navendên bajarên kurd armanc tên girtin û tên topbaran kirin.

Hêrîşên li Bajarên kurdistanê, her wusa, konsepta şer a ku bi wê hem

dixwezin ku bakûrê kurdistanê li bakûrê kurdistanê şikandinakê bi kurdan bidina jîyane kirin û hem jî li rojavayê kurdistanê wusa bikin. Weke armancaka vê konsepta şer a rejima tirk jî, ew a ku komên çete ku hatina komkirin ku li herêmên herêmên rojavayê kurdistanê ên weke Ezaz û cerabulus´ bicih bikin.

Li vir, em bi awayekî bi êmin dikarin bibêjin ku konsepta şer a rejima tirk, mirov dikarê di dewama şerê DAÎŞ´ê ê bi kurdan re de werêne ser ziman. Her wusa, hevdû di çerçoveyekê temem dikin. Armanca wan yek a. Ew jî kurd in.

Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman herêmên weke Gever û Cizîra bota, bi teybetî dihên armanc girtin. Ji ber ku ev herêmên kurdistanê, navên wan bi berxwedanê re derketîya li pêş. Bo vê yekê, di çerçoveya politikayek teybet de van herîşan li wan herêman dikin.

Komkujiyên ku di vê demê de li kurdistanê dibin, divê ku mirov weke komkujiyên di dewama komkujiya Zilanê, komkujiya Dersimê, Komkujiya roboskî û hwd de werêne ser ziman in. Her wusa, di vê çerçoveyê de bi vê zihniyetê ev komkujî dihên kirin. Her wusa berê jî, komkujiyên ku li geverê bûna hena. Di 5 û 6´ê Kanûna 2013´an de jî komkujiyek mazin polîsên tirk bi qatilkirina çend ciwanên kurd re li Geverê kiribûn. Piştre jî, komkujî li wê herêmê bûna.

Her wusa bi heman rengî, mirov dikarê bo Cizîra botanê jî bibêje. Berî vê dema ku di wê de rayadarên tirk li Cizîra botanê komkujiyê dikin de, li vê herêmê, berê jî komkujiyên ku kiribûn hena. Dema mirov dikarê kronolojîya komkujiyên ku li van herêman ku rayadarên tirk kirina derxe.

Aliyekî din ê van herêman, rejima tirk li ser ´hizbil-kontra´yan re li van herêman, pergaleka komkujiyê jî avakirîya. Bidestê van qatilên ku ol weke kirasekî li xwe kirina, gelek komkujiyên ku hatina kirin hena. Di van demên ku kurdan rêveberîyên xwe yên xweserî denezendina, ne tenê hêzên dewletê hêrîşî kurdan dikin. Her wusa, ev dordor jî dihên dayîn hêrîşkirin li ser kurdan.

Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku ji Komkujiya Zergelê, komkujiya Farqînê, komkujiya Sîlwanê bigra û heta ku digihijê, komkujiya hakarîya û ankû komkujiya çolemergê, komkujiya Geverê û komkujiya Silopîya, Komkujiya Dîyadînê, komkujiya Şîrnaxê, Komkujiya Cizîra botanê û hwd, ev komkujî û komkujiyên din ên ku di van rojên dawî ên ku bûhûrî de ku hatina hanîn li serê civate kurd, armanca wan, bi tememî tafisandin û şikandina civate kurd a.

Her wusa li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku aliyekî din ê van komkujiyan jî heya ku ew derûnîya serkevtinê ya ku kurdan di

berdêlên mazin de bi serkevtina li rojava û kobanê û hwd de ku bi dest xistina, dixwezin ku wê jî di bin derûnîya komkujiyan de bihêlin. Di serî de divê ku mirov vê yekê jî di çerçoveya kirina van komkujiyan de werêne ser ziman. Yanê, em nikarin, komkujiyên ku di vê demê de di çerçoveya konsepta şer a rejima tirk ku piştî hilbijartinên 7´ê hezîrena 2015´an ku daya destpêkirin de ku kirina, tenê weke komkujiyên ku ancama vê konsepta şer werêne ser ziman. Ji wê zêdetirî, weke armancekê di temenê kirina van komkujiyan de heya.

Di serî de ev pêvajoya ku di wê de dibûhûrin, dihê xwestin ku rengê wê yê pêşketinê di bin komkujiyan de bihêlin. Her wusa li ser wê re jî, xwe bikina desthilatdar. Têkilîya van komkujiyên ku weke ji Komkujiya Zergelê, komkujiya Farqînê, komkujiya Sîlwanê bigra û heta ku digihijê, komkujiya hakarîya û ankû komkujiya çolemergê, komkujiya Geverê û komkujiya Silopîya, Komkujiya Dîyadînê, komkujiya Şîrnaxê, Komkujiya Cizîra botanê û hwd, biqasî ku zihniyeta rejima tirk ku li dijî statûya kurdan a li herêmê ku pêş dikeve ve girêdayî ya, bi heman rengî mirov dikarê bi şerê wê yê bi kurdan re ve jî girêdayî werêne ser ziman.

Di pêvajoya çareserîyê de xwestin ku kurdan di bin pêvajoyê de bihêlin û pêvajoyê li gorî xwe û xwestekên xwe û zihniyeta xwe bi ancam bikin. Dema ku ditin ku nikarin vê yekê bikin, êdî bi vî rengî xwestin ku heman armancê bi komkujiyan bikin. Ev jî, di çerçoveya sîyeseta giştî a rejimê a dij-kurd de dihê kirin. Ew dîzaynkirina ku dixwestin ku bi çeteyên DAÎŞ´ê bikin, ku nekarin ku bikin, nûha jî dikin ku bi komkujiyên ku bikin wê bikin.

Nûha, em pêvajoyaka wusa dijîn ku rejima tirk, hemû rê û rêbazê bêserûber bikardihêne û bi wê şer bi kurdan re dike. Li her deverê, şer bi kurdan re dike. Wê çawa derbeyê li kurdan bixe, di wê çerçoveyê de şer bi kurdan re dike. Ev komkuji, komkujiyên zihniyeta rejimê na, ku têne serê kurdan.

Li rojhilat giştî, kî çi bêje û bila bibêje û werêne ser ziman bila werêne ser ziman, lê divê ku mirov werêne ser ziman ku kurdan li rojhilat giştî bi hebûna xwe de şoreşa rojhilat kirîya. Nûha jî, li hemberî vê rastiyê şer bi kurdan re dihê kirin. Her wusa, wê çawa bi wê kurdan bişikênin, di wê çerçoveyê de diçina bi ser kurdan de. Li rojhilat, bi tekoşîna azadiya kurdistanê re hemû kevir ji cihê xwe leyîstin. Êdî ti tişt ne weke berê ya. ..

Her wusa, aliyekî din ê vê konsepta şer a rejima tirk, ew a ku hemû herêmên bakûrê kurdistanê bike qada şer ku bi wê rewşa ku heyî bi wê ji holê rabike û piştre li ser wê re herê hilbijartinan. Bi wê rengê, êdî kurdan weke berê di bin bendê de bihêle. T. Ardogan, dibêje ku "wê hilbijartinê pêşwaxt, wê keviran li şûna wan rûnênê." Yanî, wê li gorî xwe, dihizirin ku

wê hertiştî werênina sêyra berê. Çawa ku "mirov nikaribê ku xwe du caran di heman çemê bişoyê", wê ev hilbijartin jî, keviran nevegerêne li şûna wan. Bi gotina "wê keviran vegerêne li şûna wan", dixwezin ku bibêjin ku wê pergalê dîsa weke berê ku çawa kurd dervî wê hiştina wê bikin. Li gorî, mantiqê T. Ardogan û rejima tirk, ew a ku dema ku HDP´ê di bin benda ji sadî 10 de bihêlin, wê dîsa ew bina ´yek´ desthilatdar û wê her tişt werê sêraberê. Lê li vir, divê ku em vê yekê jî bibêjin ku partîya kurd a HDP´ê, bi zorê di bin benda ji sadî 10 de bihêlin û ew neçê meclisê jî, wê ev bandûraka mazin li kurdan nekê. Ya ku wê kurd, piştî wê re bikin jî, wê ew bê ku li şûna Anqara li Amedê parlamane kurdistanê were pêşxistin û kurd nimînêrên xwe bişênina li wir. Artartnatifa neçûyîna Anqara bo kurdan Amed a.

Li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku HDP´ê, dervî meclisê jî bihêlin, wê ev ti carî nebê çareserî. Vajî wê, wê bê sedema domandina şerê bi kurdan re. Armanca rejima tirk a T. Ardogan ku bi wê dixwezin ku HDP´ê bin benda ji sadî 10 de bihêlin, ew a ku dixwezin ku di çerçoveya înkara kurdan de ku karibin, pêvajoyên jenosîda li ser serê civate kurd bi rêbazên bişavtinê û hwd, li ser pergale perwerde û hwd re bibina sêrî heya. Hemû komkujiyên ku î ro dihênina serê kurdan, hinekî jî, ev armanc di temenê wan de heya. Hemû komkujiyên ku li bajar û her deverên kurdistanê ku rayadarên tirk dikin, bo vê armancê û di vê çerçoveyê de dihên kirin.

Ji Komkujiya Zergelê, komkujiya Farqînê, komkujiya Sîlwanê bigra û heta ku digihijê, komkujiya hakarîya û ankû komkujiya çolemergê, komkujiya Geverê û komkujiya Silopîya, Komkujiya Dîyadînê, komkujiya Şîrnaxê, Komkujiya Cizîra botanê û hwd, bi hemû komkujiyên din re komkujiyên ku hatina kirin û hanîna serê civate kurd, ev armanca ku di serê rayadarên tirk de ya di temenê wan û kirina wan de ya.

Li hemû deverên bakûrê kurdistanê ku kurdistanîyan li wan rêveberîyên xwe yên xweser ên cewherî ku denezendin, ew komkuji li wan dihên hanîn li serê civate kurd. Kurdistanîyan, bo ku pêşîya komkujiyên rayadarên tirk ku hertimî dihênina li serê wan bigrin, rêveberîyên xwe yên xweser ên cewherî denezendin. Her wusa, armanca hêrîşan, yek jî, ew a ku wê xwesteka civate kurd a ´xwe bixwe rêvebirinê ku dixwezin, dixwezin ku bi van hêrîşên ku dikin, kriminalize jî bikin. Aliyekî van hêrîşan jî ev a.

Her wusa, komkujiyên ku rayadarên tirk li bajarên kurdan dike, hêrîşên şikandina vîna kurdan û tûna hasibandina wê ya. Mirov dikarê hilbiartinên pêşwaxt ên ku tên gotin ku wê 1´ê mijdarê de werê kirin jî, mirov dikarê weke lingekî din ê vê konsepta rejima tirk a şer bihasibêne û werêne ser ziman. Yanî, teybetîya vê hilbijartina 1´ê hezîrenê, wê ji ya hilbijartinekê

zêdetirî teybetîyên konsepteka şikandina vîna civatekê û bi wê domandina komkujiyan a li ser serê wê jî werêne ser ziman. Piştî ku ji Komkujiya Zergelê, komkujiya Farqînê, komkujiya Sîlwanê bigra û heta ku digihijê, komkujiya hakarîya û ankû komkujiya çolemergê, komkujiya Geverê û komkujiya Silopîya, Komkujiya Dîyadînê, komkujiya Şîrnaxê, Komkujiya Cizîra botanê û hwd, ku gelek komkuji hanîna serê civate kurd û bi wê ku şikandinek bi kurdan re dana çêkirin, dixwezin ku li ser wê re hilbijartinên pêşwax ên 1´ê mijdarê bikin. Mirov dikarê, van hilbijartinên 1´ê mijdara 2015´an ku tê gotin wê bên kirin, mirov dikarê bişibêne rewşa piştî ya komkujiya Dersimê jî. Piştî ku rayadarên tirk li Dersimê komkujiyên mazin dikin û herêmê bi komkujiyan bêmirov dikin û mirovên ku mana jî bêdeng dikin, êdî li ser wan re pergale xwe di çerçoveya domandina pêvajoyên bişavtinê ên li ser wan re dide domandin. Kurdên ku ji komkujiya Dersimê mana, rayadarên tirk weke "bermehî" bi nav dikirin.

Piştî ku bi komkujiyan Dersim û herêmên din di sale 1937´an de bêdeng kirin û pê de, êdî xwe serdest kirina. Nûha jî, biheman rengî û zihniyetê dixwezin ku bi komkujiyên weke ji Komkujiya Zergelê, komkujiya Farqînê, komkujiya Sîlwanê bigra û heta ku digihijê, komkujiya hakarîya û ankû komkujiya çolemergê, komkujiya Geverê û komkujiya Silopîya, Komkujiya Dîyadînê, komkujiya Şîrnaxê, Komkujiya Cizîra botanê û hwd, dikin û dixwezin ku kurdan li kurdistanê bi awayekî ´şikandî´ bêdeng bikin û li ser wê re hilbijartineka ´formalîte´ bikin û piştre bibêjin ku em serkevtî na. Ya ku nûha dixwezin bikin ev a. Pêvajoya ku piştî hilbijartinên 7´ê hezîrene 2015´an ku bi konsepta şer a rejima tirk û hikimeta wê ya AKP´ê ku dihê jînkirin, di şibihê pêvajoya salên komkujiya dersimê a 1937´an. Her wusa, weke ku em pêvajoyeka nûya sale 1937an, di sale 2015´an de ku li gorî vê sale 2015´an ku hatî formulekirin dijîn. Weke ku çawa ku piştî komkujiya dersimê ku serdestîya xwe li herêmê kirin, dixwezin ku bi heman rengî, piştî vê pêvajoya şer û komkujiyan a piştî hilbijartinên 7´ê hezîrene 2015´an ku dana destpêkirin, dixwezin ku bi hilbijartinên pêşwaxt ên ku dibêjin wê di 1´ê mijdare 2015´an de bikin, heman serdestîyê çê bikin li ser serê kurdan. KOmkujiyên Dersimê piştî peymane Lozanê û mohrkirina wê bûbûn. Destpêka vê pêvajoya komkuji û şer a bi konsepta şer a rejima tirk re jî, di roja salwegera vê peymana LOzanê de dana destpêkirin.

Lê li vir, divê ku em vê yekê bibêjin ku ne kurd kurdên wê demê na û ne jî dûnya ew dûnyaya wê demê ya. Ev konsepta şer a rejima tirk ku em dikarin weke pêvajoya komkujiya dersimê a sale 1937´an şîrove bikin û werênina ser ziman, pêvajoyeka bi heman rengî ji bo kurdan biafirêne û ne jî

ji rejima tirk re werêne. Ya ku di serî de ku divê ku mirov werêne ser ziman jî, ev a. Tenê di van herdû hefteyên bûhûrî de ji Komkujiya Zergelê, komkujiya Farqînê, komkujiya Sîlwanê bigra û heta ku digihijê, komkujiya hakarîya û ankû komkujiya çolemergê, komkujiya Geverê û komkujiya Silopîya, Komkujiya Dîyadînê, komkujiya Şîrnaxê, Komkujiya Cizîra botanê û hwd, gelek komkujî di çend rojan de hanîna serê civate kurd. Her wusa, bi van komkujiyan re gelek komkujiyên din jî ên ku di vê demê de hanîna serê civate kurd hena. ..

Ev komkujiyên ku me navê wan dan, ber ku navê wan pirr zêde di çapameniyê de hatina ser ziman, me bi serekeyî ew bi kurtasî hanîn ser ziman. Lê ev pêvajoya komkujiyan ku rejima tirk li ser serê civate kurd dimeşêne, di wê de bi sadana komkujî cih bi cih hanîna serê civate kurd. Bi armanca jenosîdkirina civate kurd, van komkujiyan dihênina serê civate kurd. Bo vê yekê, mirov divê ku werêne ser ziman ku ev şûcekî mirovatiyê ya. Li gorî dade navnetewî jî şûcekî mirovahiyê ya. Lê dada navnetewî, ti carî ew mirovatî li hemberî kurdan nedaya nîşandin ku şûcên ku li hemberî civate kurd ku hatina kirin, hilde rojava xwe û wan biike berlêpirsînê de û mahkûm bike. Ji xwe, ji ber ku ev nekirîya, êdî hertimî ev kirina komkujiyan li ser serê civate kurd dihên domandin. ...

… **Weke lingekî vê konsepta şer a rejima tirk ku li bakûrê kurdistanê li hemberî civate kurd daya destpêkirin, nîqaşên di çapameniya başûrê kurdistanê de bi wan ku tê gotin ku "divê ku PKK ji qandilê derkeve." ..**

Rayadarên tirk, hertimî xwestina ku kurdan bi kurdan bidina kuştin. Li Bakûrê kurdistanê, bi deh hezaran cerdewan û ankû bi navê ku dewlet li wan dike "korucu" ji kurdan derxistina li holê û bi çek kirina û birakujiyê bikin. Her wusa, ev politikaya kurdan bi kurdan bidina kuştin, di salên 1993´an de li başûrê kurdistanê jî, hat ceribandin. Şer û pevçûnên di nava PDK´ê û YEKÎTÎ de jî, destna bi vî rengî hebûn. Piştre jî, ajotina peşmegên PDK´ê li ser PKK´ê jî bû û bi dehan ciwanên kurd, bi destê kurdan hatina qatil kirin.

Ti dewletên herêmê, nekarîna kurdan. Heta ku kurd li hemberî kurdan bikarnehanîna, derbe li kurdan nexistina. Di serhildana Bedirxaniyan de jî ev wusa bû. Li hemberê Bedirxaniyan û serhildana wan, ji mala Bedirxaniyan ´Yazdan şêr´ hat derxistin ku bi wî derbeyê li kurdan bixin. Di dema şêx Ûbeydulleh de jî, hin aşîrên kurd bikarhanîn. Di dema Serhildana şêx Seîd de jî, heman rewş kirin. Bi destê kurdan, derbe li Şêx Seîd xistin. Hevlingê Şêx Seîd ku tê gotin ku navê wî Qasim´a şêx Seîd îhbar dike û dide girtin. Her wusa, di komkujiyên li Dersimê de jî, li hemberî Alişêr û Zarîfeyan, xîyaneta rêberan, bûya malê dîrokê.

Di dema serhildana kurdan a hemdem ku tevgera azadîya kurd da destpêkirin de jî, ev 40 sal a ku rejima tirk, serî li her rêyê da lê nekarîya ku derbeyê li tevgera azadîya kurd bixe. Ji nava kurdan cerdewan û gelek nezan û çirûkên kurd ku bi dewletê re di çerçoveya kardikin hena. Lê tevî wê jî, nekarîna ku derbeyê li tevgera azadîya kurd bixin. Her wusa, li rojavayê kurdistanê, temenê wê şerê birakujiyê li hemberî kurdên rojava bidestê ENKS´ê xwestin ku biafirênin û hê jî, gelek xêrnexwez di vê çerçoveyê de kar û xabetê dikin. Li başûrê kurdistanê jî, PDK´ya ku dewleta tirk bi gelek soz û peymanên niftê û hwd ku bi xwe ve ji navikê ve daya girêdan, dixwezê ku wê şerê birakujiyê di nava kurdan de bide derxistin. Piştî ku di 24´ê temûza 2015´an de bombardimanên hewayî ên balafirên şer ên tirk li hemberî qandilê hatina kirin û pê de, rayadarên tirk jî, di cih de dikin ku ji nava kurdan bikin ku derbeyê li kurdan bixin.

Di nava çapameniya civakî de jî, gelek gotinên ku tên gotin ew in ku di heyeta rayadarên tirk a ku di serkêşîya Ferîdûn Sînirlioglu de piştî ku bombardimanê li qandilê destpêkir û ku bi rayadarên kurd ên başûrî ên PDK´yî re hevdîtin kir de, di wê de ji Birêz Berzanî û rayadarên başûrî xwestina ku Peşmegeyan bidina ajotin li ser qandilê û şerekî birakujî di nava kurdan de derxin. Di hevdîtina heyeta tirk a di bin serkêşîya Ferîdûn Sînirlioglu de rayadarên başûrî ji hat xwestin ku pêşmergeyan bide hêrîşkirin li ser qandilê. Her wusa, piştî ku KCK´ê jî, bi denezenekê hanî ser ziman ku ´hin xwestekên bi vî rengî ji başûr bûna ku şerê birakujî´ di nava kurdan de derxin, êdî asta van gotinan bi awayekî vekirî hat ditin. Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku di seatên ku heyeta tirk di serkêşîya Ferîdûn Sînirlioglu de bi rayadarên başûrî re hevdîtin dikir de, weke ku bi awayekî hatî plankirî balafirên şer ên tirk, komkujiya sivîl a li gundê Zergelê dikin.

Rayadarên tirk, ti planên wan ên bo çareserîya pirsgirêka kurd di serê wan de heta roja me nebûya. Hertimî, pirsgirêk, weke pirsgirêka "çek" û ankû "çekberdanê" kirina ku werênina ser ziman. Lê yekî ku hinekî jî aqilî wî hebe, dema ku li rewşê binerê, wê fahm bike ku pirsgirêk, ne pirsgirêka ´çekê´ ya. Pirsgirêk, pirsgirêka maf û azadîya hebûna gelê kurd û civate kurd a.

Pirsgirêka kurd, pirsgirêka maf û azadîya civate kurd a. Her wusa, em nikarin, wê qadaxaya ku rejima tirk bi destûrî danîya ser zimanê kurdî û nahêle ku kurd bi zimanê xwe bixwênin, xwe werênina ser ziman û xwe bi zimanê xwe perwerde bikin ji bombardimanên rejima tirk yên li ser qandilê cûda werênina ser ziman. Hemû qadaxa, komkujiyên weke li gundê Zergelê, bombardimanên li qandilê, girtinên di oparasyonên qirkirina sîyesî de,

alikarîya rayadarên tirk a ji çeteyên DAÎŞ´ê û çeteyên cebetil-nasr´ re û hwd, bi hemû kirinên wê ên din re divê ku mirov di çerçoveya pirsgirêka kurd a rejimê afirandîya re werênina ser ziman.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku rayadarên tirk, bi gotin û tevgerên wan ên li ser PDK´ê re wusa tê dîtin ku zorê didinê de ku şerekî birakujî di nava kurdan de derxin. Her wusa, ji gotin, şîrove û kirinên ku tên danîn nîşandin, mirov fahm dike ku heyeta tirk a ku di serkêşîya Ferîdûn Sînirlioglu de ku piştî bombardimana li Qandilê ku li başûrê kurdistanê bi rayadarên başûrî re hevdîtin kirina, ji hin partîyên kurd ên weke PDK´ê xwestina ku peşmergeyan biajona bi ser qandilê ku bi tevgera azadîya kurd a bakûr re şer bike. Wusa tê dîtin û fahm kirin, komkujiyên weke ´komkujiya li gundê Zergelê, ji aliyê balafirên şer ên tirk ve bi zanebûn û plan û program hatîya kirin. Di çerçoveya hevdîtinên heyeta tirk a di serkêşîya Ferîdûn Sînirlioglu a li başûrê kurdistanê de komkujiya li gundê Zergelê hatîya kirin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku rayadarên tirk, dike û dixwezê ku şerê birakuji di nava kurdan de derxê. Her wusa, di nava kurdan de, ew bêtifaqîya ku heya, dixwezin ku ji wê sûd bigrin û li ser wê re fitnê û fesedê di nava kurdan de bikin, dijminatiyê pêş bixin û piştre li ser wê re jî ku karibin kurdan bi destê kurdan bidina kuştin. Kurd, di vê dema dîrokî ku ew di wê de di buhûrûn û ku evqas hêrîşên çeteyên DAÎŞ´ê ku bi alikarîya tirkiya li wan tên kirin de, dixwezin ku wê şikeştina ku bi hêrîşên DAÎŞ´ê ku bi kurdan nedana jînkirin, dixwezin ku bi şerekî birakujî ku di nava kurdan derxin de wê şikeştinê bi kurdan bidina jînkirin û derbeyê li civate kurd bixin.

Ya ku di vê dema dîrokî de ku kurd divê ku pirr di derbarê wê de bi hey û heyîder bin, ew a ku nekevina xelatîyeka dîrokî ya bi vî rengî de. Di vê demê de, êdî divê ku aqilê xwe hildina serê xwe de û pirsgirêkên di nava xwe de çareser bikin. Divê ku kurd, di vê demê de ji her demê zêdetirî têkiliya wan bi hevdû re hebe û di nava wan de tifaq hebe. Parastina başûrê kurdistanê jî, rojavayê kurdistanê çareserkirina pirsgirêka rojhilat û bakûrê kurdistanê jî, wê bi vê bibe. Di dema dîrokî de rejima tirk ew derbeye ku wê xwestîya li kurdan bixe û nexistîya, dixwezê ku bidestê kurdan bixe.

Ji xwe, ku ew nakokîyên di nava kurdan de ku li ser partîyên kurd re ku hatî çêkirin ku nebûba, wê pirsgirêka kurd jî, heta roja me xwe nedaba domandin. Wê hê di salên bûhûrî ên ên berî salên 2000´an de biheta çareser kirin. Lê ji ber ku ji nava kurdan hem li bakûr hikimetên tirk weke AKP´ê û hwd, hertimî kurdên xwe çêkirina û li ser wan re derbe li kurdan xistina. Di dema hikimetên berê ên tirkiya de jî heman politika hatîya pêşxistin. Minaq,

dema ku tu li rewşa partîyên tirk dinerê. CHP´ê di rabê dibêje ´ kurdên min". T. Ardogan û AKP´, di rabê di bêje ´kurdên min.´ Berê, Tansu Çiller û partîya wê DYP´ê jî digot ´kurdên min.´ Mirovên weke Melik firat, ên partîya çiller bûn. Mirovên weke Metiner û hwd, yên partîya AKP´ê bûn. Mirovên weke Tanrikulu ên partîya CHP´ê bûn. Hemû jî bi rengekî li ser navê rejima tirk li hemberî civate kurd bi civate kurd re têdikoşîn. Di vê çerçoveyê de bi kurdan û destê kurdan derbe li kurdan û li civate kurd xistina. Yanî, hertimî bi vî rengî kurdên ku bûna ´kûrmê darê´ hertimî ji nava kurdan derxistina. Vala pêşîyên kurdan negotîna "ku kûrmê darê ne ji darê wê qaland(zewela)ina darê nebê."

Lê li hemberî tevgera kurd a azadîyê a vê demê a hemdem, ev plana rejimê a kurdan li hemberî kurdan bikarbênê jî hat vala derxistin. Her wusa, şerê birakujî jî, di nava kurdan de hat pêşxistin. Di salên 1993´an de şerê di nava PDK´ê û YEKÎTÎ, di dema ku oparasyona artişa tirk a dervî sînor bû û PDKê bi wê re hêrîşî tevgera kurd û gerillayên wê kir, weke bûyarên şerê birakujî ên rejima tirk li pişt wan a. Derxistina şerê di nava PDK´ê û YEKÎTÎ de jî, bi plan û programa tirkiya hatibû derxistin. Tirkiya hingî xwestibû ku li başûrê kurdistanê li herêmên weke kanîmasî û hwd, leşker bicih bike. Lê divîyabû ku hêncetekê çê bike. Hingî, şer di nava PDK´ê û YEKÎTÎ´yê de derxist û ew kira hênceta şandina leşker li başûrê kurdistanê. Qaşo, "wê leşkerên tirk, pêşîya şerê van herdû partîyên kurd ên bi hevdû re bigrê", bi vê gotinê û hêncetê ew leşker li wir bicih kirin. Hê jî, tevî ku bi ser ve zêdetirî 20´ salan bûhûrtina, hê jî ew leşkerên tirk li başûrê kurdistanê na. Tevî ku parlamana başûrê kurdistanê, biryar girtin û xwestin ku "divê ku rejima tirk leşkerên xwe ji başûrê kurdistanê bikişêne" jî, lê ne kişand.

Nûha jî, nûçeyên ku ji herêmê tên, di wê çerçoveyê de na ku rayadarên tirk, dikevina bin aqilê rayadarên PDK´ê de ku hertimî di rojevê de bihêlin û bixwezin ku divê kuu tevgera ku ji qandilê derkeve. Rejima tirk, politikaya xwe ya ku tenê li ser esasê bêçekkirina tevgera kurd avakirîya, di vê çerçoveyê de li başûrê kurdistanê dixwezê ku li ser hin partîyna kurd re bide meşandin. Yanî, kurdan li dijî kurdan bikarbêne. Kurd, divê ku van rastîyan bibînin ku newina van leyistikan. Leyistikên ku wê bi xwe re di nava kurdan de şerê birakuji werênin û têna wê wateyê, divê ku ti carî nekevina nava wan de. Heta kengî, wê kurd bi vî rengî xizmetê ji metingerê xwe re bikin.? Di serî de divê ku vê rastiyê bibînin û fahm bikin. Ya herî zêde ku di nava partîyên kurd de weke pirensibekê ku hebê, divê ku di çerçoveya tifaqek netewî de ku civate kurd û kurdistanê biparêzên bê.

Heyetên ji hikimeta tirk weke ku di bin serkêşîya Ferîdûn sînirligolu de ku diçin hevdîtinê bi kurdan re dikin û ji wan re dibêjin û dixwezin ku "herin

peşmergeyan biajona bi ser qadilê de û PKK´ê ji qandilê derxin" jî, rengekî din ê dana zorê ku şerê birakuji di nava kurdan de derxin bin. Kurd û Kurdistan yek in. Çi rojhilat bê, çi başûr bê, çi bakûr bê û çi rojava bê. Partîn kurd, di temenê mantiq û felsefeya tifaqa civate kurd de, di vê çerçoveyê de bihevdû re têkiliyê dênin. Divê ku destûrê nedin, ti bêtifaqiyên din û şerê birakuji ê navxweyî. Kurd, weke pirensibeke civatî, divê ku bipejirênin û di nava xwe de bicih bikin û heta ku di bernemayên xwe yên rêxistinî û sazîyî de jî bicih bikin ku ti carî şerê birakuji di nava wan de çênebê. Weke ku çawa ku dema ku hêrîşên DAÎŞ´ê li rojava û başûrê kurdistanê bûn, peşmerga û gerilla bi hevdû re parastin kir, divê ku di vê çerçoveyê de nêzîkatî û sîyeseta kurd û kurdistanê werê kirin. Hertimî, bi şerê birakuji, derbe li kurdan hatîya xistin. Divê ku rayadarên başûrê kurdistanê jî û ên ti partîyên din jî, newina leyistika rejima tirk a bi armanca derxistina şerê birakuji di nava kurdan de. Di şerê birakuji de, wê tenê û tenê kurd winda bikin. Wê rejimên metinger ku Kurdistan di nava wan de hatîya qatkirin, wê qizinc bikin.

Di hevdîtina heyeta tirk a di bin serkêşîya Ferîdûn Sînirlioglu de rayadarên ji hat xwestin ku pêşmergeyan bide hêrîşkirin li ser qandilê. Her wusa, hê jî, hevdîtinên ku nûha hikimeta AKP´ê bi rayadarên başûrî re dike, wusa tê dîtin û fahm kirin ku vê ji kurdan dixwezê. Her wusa, li vir, em em vê yekê jî, bibêjin ku dema ku qandil û çiyayên wê werina valakirin ji aliyê tevgera kurd ve, wê di cih de rayadarên tirk, çeteyên DAÎŞ´ê û hwd biajona bi ser qandilê û van çiyayan de. Wê di serî de rewşa bi vî rengî derbeyeka dîrokî li başûrê kurdistanê bixe. Di serî de divê ku mirov vê yekê bibêje. Wusa hasab kin ku di vê dema ku DAÎŞ´ê hêrîşî başûrê kurdistanê kir de ku qandil û herêmên weke maxmûrê ne di bin kontrola wê de ba, wê derbeyeka mazin li rêveberîya başûrê kurdistanê a kurd jî bixistan. Di serî de divê ku kurd dubare vê rastiyê fahm bikin ku DAÎŞ´, ne rêxistineka ku wê werê têkbirin û ji holê rakirin a. DAÎŞ, nav û hebûna pêvajoyeka şer a rejimên herêmê ên weke rejima tirk ku li hemberî pêşketina civate kurd hatî birêxistinkirin û hatî dayîn destpêkirin a.

. Kurd, di vê demê de di pêvajoyak dîrokî de di bûhûrin. Herî zêde divê demê de divê ku nêzîkî hevdû bibin û tifaqak civatî di nava xwe de çê bikin. Di dema nîqaşên bi li darxistina kongira netewî a kurd de hêvîyek mazin bi kurdan re çêbû. Lê rayadarên tirk û îranî û û hwd, ketin nava hewldanan de ku pêşîya wê bigrin. Di rojên ku nîqaşên kongira netewî a kurd dihatin kirin de, T. Ardogan, kurd ´tehdîd´ kiribûn û gotibû, ´wê ancamên wê bibînin." Yanî, ji rayadarên başûrî re ev gotin digot. Piştî van gotinan bi du-rojan

piştre Nêçîrwan berzanî çi Anqara û piştre ku ew vegerîya başûrê kurdistanê kongira netewî a kurd hat taloqkirin li demek ne dîyar.

**Kurd, î ro, di demek dîrokî dide dibûhûrin. Çendî ku yekbin û tifaq di nava wan de hebe, wê mazin qizinc bikin. Wê statûya xwe ya herêmî bidest bixin. Lê piştî ku kongira netewî a kurd, hat taloqkirin li demek nedîyar û pê de, rayadarên tirk jî, bî sîyesî, leşkerî û hwd, hêrîşî wê temenê li ser wê êdî wê kongira netewî a kurd bihata li darxistin kirin. Gotinên serokwezirê tirk Dawutoglu ên di dema ku di 24´ê temûza 2015´an de ku bombabaran li qandilê didina destpêkirin û bi wê re dibêjin ku "PDK´yî alikariyê û piştgiriyê didin me" jî, weke gotinna ku sîyesî ku hêrîşî vê temenê dikin in. Di serî de divê ku mirov vê çerçoveyê de van gotinan fahm bike. Ti gotina gotinên T. Ardogan ên di dema nîqaşên li darxistina kongira netewî a kurd ku digot "ew, wê ancama wê bibînin. Soz dana me", ji yên dawî ên di dema oparasyonên bombabaran li qandilê ên Dawutoglu ku digot "PDK´yî, alikariyê didina me" û "me bi maf dibînin di bombabaranê de" tûna na. Gotin, bi heman zihniyetê hatina gotin. Wê çawa temenê yekîtî û yekbûna kurdan, tûna bikin, di vê çerçoveyê de ev gotin bombabaran û her wusa sîyeset hatina kirin. Her wusa di seatên ku heyeta hikimeta tirk di serkêşîya Ferîdûn Sînîrlioglu de ku bi rayadarên PDK´yî de hevdîtin dikir de û piştî wê hevdîtinê bi çend seatan kirina ´komkujiya li gundê Zergelê" û piştre li ser wê komkujiyê re dayîna destpêkirina nîqaşên bi rengê "divê ku PKK´ê ji qandilê derkeve" jî, divê ku mirov di vê çerçoveyê de fahm bike**. .. Bi vê sîyesetê û rengê sîyesetê, dikin û dixwezin ku pêşîya kurdan bigrin ku nêzî hevdû bibin û hevdû re ku civate kurd biparêzên û pêşbixin.

. Kurd bi pêşketinên li Sûrî û rojavayê kurdistanê re firsendên dîrokî bidest xistin. Her wusa, di vê demê de firsendek dîrokî ketibû destê wan de ku azadîya xwe bidest bixin. Ku kurd bi hevdû re tevgerîyaban, wê hem azadîya xwe bidest bixin û hem jî, wê dîroka xwe ya xirab bigûharênin. Lê firsende dîrokî ku bi demê re derket ber kurdan, ku kurd yekban û yekîtîyek di nava xwe de çêkiriban, wê karîban ku wê firsendê bikarbênin. Di vê dema dîrokî de windahîya pêşî ya kurdan, bi taloqkirina li darxistina kongire netewî a kurdistanê re bû. Piştre jî, rejima tirk, li ser PDK´ê re hewlda ku wê bêtifaqiya di nava kurdan de kûr bike. Her timî tirkiya, li ser PDK´ê re li nava kurdan leyist. Î ro jî, dileyizê.

PDK´ê, bû Harpagos´ê roja me. Harpagos, di dema Medîya de, weke mirovê kurd ku desthilatdarîya kurdan ku ji destê kurdan girt û da Farisan. Her wusa, di roja me de PDK´ê jî, wê desthilatdarîyê ji kurdan digrê û dide

tirkan. Sîyeseta ku di roja me de dikin jî, wê çawa roja xwe xilas bikin a. Di nava sîyeseta rayadarên kurd ên başûrî de, stretejîya kurdî tûna ya. Çendî ku pirr zêde gotinên kurdî û ´kurdewarî´ tênin ser ziman û bahse ´kurd´ û ´Kurdistan´ê dikin jî, lê ew bixwe jî, bi sîyeseta ku dikin, kurdistanê ji dest didin. Pişta xwe didina Tirkiya. Tirkiya jî, dijminatîya kurdan dike. Tirkiya hertimî stretejiya wê, ew a ku wê çawa pêşîya pêşketina statûya kurd li herêmê bigirê ya. Li ser vê dixabitê.

Partîyeka ku bahse kurd û kurdistanê bike û sîyeseta ku dike ku bi sîyeseta rejima tirk ku li ser esasê bêstatû hiştina kurdan re ku diahengekê de bê, wê çaxê, ev dibe sedem ku hemû kurd rabin pirr bihizirin û tefkîr bikin. Î ro, rayaderên tirk jî û ên Îranî jî, "PDK´ê, weke partîya ku wê çawa bi wê pêşîya yekbûna kurdan bigirin" lê dinerin û bikardihênin. Her wusa, di vê çerçoveyê de jî, li hemberî kurdan bikardihênin.

Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî bibêjin ku ev ser 25 salan re ya ku li başûrê kurdistanê, bi hemû kêmesîyên wê re rêveberîyek ku bi destê kurdan hatîya avakirin heya. Bi wê re vê rêveberîya kurd, gelek firsendên dîrokî ku bi wan karibê di xizmeta civate kurd bikarbêne, bidest xistin. Hemû, yek jî ji wan firsendan di xizmeta civate kurd de bikarnehanî. Vajî wê, weke ku çawa ku li bakûrê Wietnamê bû, rêveberîya başûrê kurdistanê li hemberî tekoşîna azadîya beşên din ên kurdistanê hat hanîn bikarhanîn. Li Sûrî, li hemberî, pêşketin û statûya kurdan hat bikarhanîn. Li bakûrê kurdistanê ji aliyê rayadarên tirk ve li hemberî pêşketina kurdên bakûrê kurdistanê dihê bikarhanîn. ..

Di vê çerçoveyê de firsendên dîrokî ku kurdan di tepsîya zêrîn de bi tekoşîna xwe ya ku wê bi gelek êşên giran re dan, ew firsend bidest xistin. Lê Yekîtîya civate kurd û yekbûna navxweyî, hat xistin korbanê sîyeseta partîyan. Hemû civate kurd, hat xistin xizmeta partîyan. Ne hiştin ku yekbûna civate kurd were çêkirin. Rayadarên PDK´yî, bi pêşîya çêkirina yekbûna kurd bi taloqkirina kongira netewî a kurd re girtin. Piştre jî, ew helwestên xwe li hemberî kurdan dana domandin. Ev qatbûna ku di nava civate kurd de li ser partîyan re hatîya çêkirin, bû weke derbeya mazin a sedsala 21´ê a li civate kurd giştî. ..

Wusa hasab bikin ku li bakûrê kurdistanê rêxistinek kurd derdikeve û tekoşînê bi rejima tirk re dide bo bidest xistina statûya kurd, lê partîyeka kurd ji başûrê kurdistanê li hemberî wê bi rejima tirk û rayadarên tirk re tevdigerihê. Bi vî rengî, bi kurdan dikin ku pişta kurdan bişikênin. Ne pêşîyên me kurdan gotina, ´"ku kûrmê darê ne ji darê bê, wê zawala darê nebê." ...

Yekî ku hinekî dîrokê bizanibê, wê ti carî rastî wê rewşê newê ku rejimek

û ankû dewletek li ser esasê bêstatû hiştina civatekê şer û tekoşînê bi wê re bike û ji nava wê civate, hin mirov û ankû partîyên ji wê civatê herin û bi wê re tevbigerihin. Ji vê bêrûmettir bo wan ti tişt tûna ya. Ya ku di vê sedsale 21´ê de pişta civate kurd şikandina, ev bêbaxtîya ji nava kurdan a li kurdan a.

PDK`ê, li şûna ku wê bangê li tevgera kurd bike ku ji qandilê derkeve, divîyabû ku bang li hêzên tirk ên weke li herêa Kanîmasî´ û hwd ku ji sala 1996´an ve li wir in ku başûrê kurdistanê biterikêne. Li şûna ku PDK´ê wê, wê bi kurdên bakûrî ên li maxmûrê re mijul bibe, divîyabû ku bo rizgarkirina keç û jinên kurd ên êzîdî ku ji destê DAÎŞ´ê rizgar bike. Li şûna ku wê dijberiyê li rojavayê kurdistanê bide nîşandin, bang li hemû hêzên kurd bikira ku HPG û YPG jî di nav de ku bi hevdû re ûû bi pêşmergeyan re ku Musilê ji destê DAÎŞ´ê rizgar bikin. DAÎŞ´ê, ne rêxistineka ku tê bi wê re şer bike û wê têk bibê ya. DAÎŞ´ê, pêvajoyaka şer ya ku rejimên herêmê ên weke tirkiya bi alikariya hin hêzna din ku pêşxistiya û diajona bi ser kurdan de ya. Bo vê yekê, ji vê demê û pê de, divê ku mirov bibêje ku heta ku pirsgirêka kurd newê çareserkirin, wê ´tehdîda DAÎŞ´ê hem li ser başûrê kurdistanê û hem jî li ser rojavayê kurdistanê dawî li wê newê. Ya ku li vir, divê ku mirov, di serî de fahm bike ev a.

Rejima tirk û hikimeta AKP û T. Ardogan, di vê demê de hewl didin ku nakokîyên di nava kurdan de kûrtir bikin. Heta ku karibin, di nava kurdan de şerekî birakujî jî bikin ku di nava kurdan de bidina destpêkirin. Di destpêka oparasyonên bombabaranê ên bi balafirên şer ên tirk de Gotinên Serokwezirê tirk DAwutoglu, vê rastîyê pirr zêde piştrast dikin. Bi teybetî, gotinên ku wê çawa di mejiyê kurdan de bimênin, bandûrê li derûnîya kurdan bikin û wê çawa nakokîyê di nava partiyên kurd de kûrtir bikin û her wusa ku karibin li ser wan nakokîyan re ku karibin di nava kurdan de sîyesetê bikin, di wê çerçoveyê de gotin bikarhanîn. Rayaderên tirk, hertimî li ser wê dixabitin ku wê çawa karibin, nakokîyên di nava kurdan de kûrtir bikin ku êdî nikaribin werina cem hevdû. Her wusa, tiştên ku li başûrê kurdistanê, ku rayadarên tirk weke politikayekê bi partiya kurd PDK´ê didina kirin û gotin jî, di vê çerçoveyê de divê ku mirov balê bikişêne li ser wê. Minaq, girtina deriyê sêmalka, ne hiştina bûhûrîna alikariyê ji başûrê kurdistanê li rojava, Her wusa, gotinên ku bi rayadarên PDK´yî yan didin gotin ên weke "divê ku PKK´ê ji qandilê derkeve" û hwd, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman. Her wusa, gotinên weke ´li ser esasê dijberîyê re ku tên gotin ên weke ´divê ku PKK´ê ji qandilê derkeve´ pirr bi hêsanî dikarin, hêstên kurdan li hemberî hevdû bide şikandin. Bo vê yekê,

mirov nikarê li van gotina, tenê li ser sîyesetê re lê binerê. Ji aliyê civatî, derûnî, civaknasî û hwd ve jî, divê ku mirov ji aliyê civate kurd ve lê binerê.

Rayadarên tirk û hêzên din ku sîyesetê li ser pirsgirêka kurd re dikin, bo ku di vê dema dîrokî de di nava kurdan de yekîtîyek çênebê û kurd newina cem hevdû, pirr li ser wê dixabitin. Her wusa, dîsa bi hewldana van dordorên xêrnexwez kongira netewî a kurd, hatibû ´taloqkirin li demek ne dîyar.´ Her wusa, di bombabaran balafirên şer ên tirk de gotinên weke Dawutoglu ên weke ´me têkilî bi PDK´ê re danîya û agahî daya wan" jî, çend ku weke gotinna wan dihildina cidiyetê ku di asta pêşî de werina dîtin jî bin, lê di aslê xwe de bi armanca kûrkirina nakokiyê di nava kurdan de jî hatîya gotin. Gotinên weke "PDK´ê piştgiriyê dide bombabarana li ser qandilê a balafirên şer ên tirk" jî, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman. Çawa dibê ku bombabardimana rejima tirk ku li beşeka kurdan û kurdistanê tê kirin, beşeka din ya kurdan piştgiriyê bidina wê.? Ji xwe tenê, hanîna ser ziman a vê argûmanê jî, mirov nikarê tenê bi alikarîyeka PDK´ê a ji rejima tirk re werêne ser ziman. Di serî de bi armanca çêkirina nakokiyên di nava kurdan de ev tê gotin. Ji xwe, bi gotinên bi vî rengî, rayadarên tirk li nava kurdan dileyizin. Ya ku hemû kurd û partiyên kurd jî, ku divê ku fahm bikin jî, divê ku ev bê.

. Li başûrê kurdistanê, ev demeka ku ku navende wê PDK´ê ya, nîqaşa ´derketina PKK´ê ji qandilê" hatîya dayîn destpêkirin. Gelek mirovên ku i ser vê mijarê aqil dimeşênin, dibêjin ku "PDK´ê, tekoşîna desthilatdarîyê dide bo vê yekê, PKK´ê li wir naxwezê." Gelo rastî ev a? Mirovekî ku hinekî jî aqil bi wî re hebe û karibê pêşketin û sîyeseta li rojhilat û bi teybetî ya li dewletên metinger a li kurdistanê bi awayekî rast bixwêne, wê di cih de fahm bike ku ev nîqaş, navenda wan ne Başûr in. Her wusa, PDK`ê, dibêt ku ji nezanîya xwe ji van nîqaşên bi vî rengî re dike bingeh. Lê mirovekî bi aqil ku bihizirê û pêvajoya hêrîşên DAÎŞ´ê fahm bike, wê bibînê ku hebûna tevgera kurd a li qandilê, bo başûrê kurdistanê jî dibe weke parastinekê. Kî çi bêje bila bibêje, lê em divê ku vê yekê bi awayekî bi êmin bibêjin ku yên ku dixwezin ku tevgera ku ji qandilê derkeve, dixwezin ku başûrê kurdistanê jî bêparastin bimêne. Ji ber ku hat ditin ku heta ku tevgera PKK´ê li qandilê bê, çendî ku hêrîşî werina ser başûrê kurdistanê jî, wê bêancam bimênin.

Pêvajoya hêrîşên DAÎŞ´ê ji vê rastîyê re pirr watedar a. Î ro, ku kî ji kîjan aliyê ve propaganda bike bila bike, lê divê ku dîsa em vê yekê bibêjin ku dema ku PKK´ê dema hêrîşên DAÎŞ´ên li ser başûrê kurdistanê şengalê ku ne li qandilê bê ba, wê başûrê kurdistanê derbeyek dîrokî bixwara. Yên ku hêrîşên DAÎŞ´ê şopandina, dîtina ku dema ku hêrîş kirin, çawa ji herêmên stretejikî ên weke ´maxmûrê´, celewla, kerkûkê û hwd re destpê kir. Dema

ku ji van herêman destpêkir, tevgera kurd a li qandilê jî, xwe weke bendekê li pêşîya hêrîşan rast kir. Nehişt ku di nava başûrê kurdistanê de pêde herin û weke ku li rojavayê kurdistanê kirin, komkujiyên mazin li başûrê kurdistanê kirin. Em tenê ku li vê pêvajoyê binerîn, emê vê yekê bi awayekî vekirî bibînin. Hebûna PKK´ê li qandilê, hem pêşîya hêrîşên Îranê ên ji wê aliyê ve li başûrê kurdistanê digrê û hem jî pêşîya pêvajoyên komkujiyê ên ku rejima tirk wan bi destê DAÎŞ´ê û hwd bi rêxistin dike jî digrê. Ya ku van hêzan aciz dike ku PKK´ê li qandilê jî ya, ev a.

Ez li vir, bi awayekî bi êmin bibêjim ku siba, tevgera ku PKK´ê ji qandilê derkeve, tirkiya, wê di cih de çeteyên weke DAÎŞ´ê ava bike û li wir biciih bike. Îran, wê hêzên weke hizbillah û hwd, biherikêne li wir. Wê bi wê re hem başûrê kurdistanê bi herêmî û stretejikî dorppêç bikin û hem jî wê li herêmê politikayên xwe bibina sêrî. Yanî, li vir, şernekirina PKK´ê û hebûna wê ya li qandilê jî, bo îran û tirkiya dibê sedema destpêkirina pêvajoyên şer û hêrîşan li wir. Ji ber ku heta ku tevgera ku li vê herêmê bê, wê weke bendekê li pêşîya wan bê.

Rejimên herêmê ên alikariya tirkiya, politikayên xwe yên ku li ser DAÎŞ´ê re çêkiribûn, weke ku çawa ku bi wê xwestibûn ku derbe li rojavayê kurdistanê bikeve, xwestibûn ku li başûrê kurdistanê jî derbe were xistin. Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê bibêje ku çeteyên DAÎŞ´ê, dema ku li başûrê kurdistanê hêrîşî şengalê kirin, pêşî ji herêmên weke Musil û hwd, kurdên şebek û hwd paqij kirin. Piştre herêmên weke maxmûrê û hwd, kirina armanc ji xwe re. Hizirkiribûn ku ji şengalê bidest komkujiyê bikin û bi ber maxmûrê ve herin û ji maxmûrê destpê bikin û bi ber şengalê û herêmên din ên başûr ve herin. Yanî, wusa hasab kiribûn ku derbeyeka mazin li başûrê kurdistanê jî bixin. Li başûrê kurdistanê hêzên parastinê ku Pêşmerge bin, hêzên HPG´ê bin, YPG û hwd bin, bi hevdû re bersiv dana hêrîşan.

Îran jî, dixwezê ku qandil were valakirin ji destê tevgera kurd. Tirkiya jî, vê yek dixwezê. Bêgûman, wê bi wê re başûrê kurdistanê jî, bêparastin bimêne. Roja ku qandil, were valakirin, wê çetetên weke DAÎŞ´ê û komên tundrew li wir werina bicihkirin. Di nava civatê de bi destê cemaetan û hwd, wê hewl bidin ku rengê civate kurd bigûherênin. Her wusa, rewşa ku bi taliban û hwd, hanîna serê afganan dixwezin ku bi vî rengî êdî werênina serê kurdan. Ya ku ne sîyesetmederên başûrî û ne jî nûserên wê dibînin ev a. Vê rastiyê nabînin. Li ser partîyan re, destpêkirina nîqaşên bi vî rengî di nava rûpelên rojnemeyan de, dibê ku hin mirovên ku van nîqaşan dimeênin, weke ku aligirtiyekê dikin bin. Lê ew, ne di farqê de na, ku ev nîqaşên piçûk ên weke ku "sîyesî", xizmetî politikayên rejima îranê û tirkiya ên bi armanca

bêparastin hiştina kurdistanê dikin. Ev nîqaş xizmetî kurdan û civate kurd û parastina wê nakin. Her wusa, ji gelek aliyan ve civate kurd, ji van nîqaşên bi vî rengî zirerê dibînê. Pêşî, ji aliyê hêstîyarî ve zirerê dibînê. Qatbûnê di nava civate kurd de çê dike. Ev nîqaş, di asta pêşî de xizmetî vê dikin. Di asta dûyemin de jî, xizmetî stretejiyeka kurdistanî ya civate kurd nakin.

Her wusa, rewşa qandilê, rêveberîya başûrê kurdistanê, li herêmê li ber îranê û tirkiya dike, weke hêzek. Ya ku dîsa îran û tirkiya û bi teybetî hêzên ku li ser înkare kurd sîyesete dikin aciz dike jî, ev a. Bo vê yekê, dixwezin ku vê rewşê ji holê ra bikin. Ji ber ku sîyeseta ku li başûrê kurdistanê jî were kirin, bixwezayî ji asta qatbûna kurdistanê derdikeve. Li giştîya kurdistanê, dibê sîyeseta giştî. Ya ku dîsa, van hêzan aciz dike, ev a. Her wusa, yên ku bahse parastina başûrê Kurdistan dikin, ku piçekî jî aqilê stretejikî li ser navê civate kurd bi wan re hebe, wê bizanibê û bibînê ku ev nîqaş pirr xelat û şaş in.

.

**.Komkujiya li gundê Zergelê, li gorî plana rejima tirk a bi wê konsepta şer ku bi wê dixwest temenê wan nîqaşên bi rengê ´divê ku PKK ji qandilê derkeve´ ku çêbike hatibû kirin.**

Zergelê, gundekî li başûrê kurdistanê ku dikeve herêma qandilê de ya. Gund, li hewîrdora wê çîya û zewî hena. Ev gund jî, di bombardimana balefirên şer ên artişa tirk de hat bombabaran kirin. Di vê bombabarakirina di 1´ê tabaxa 2015 de ku di seat 4´ê sibehê de hatibû kirin de ser 10 sivîlan re hatibû qatilkirin û biqasî ku tê gotin ku ser 15´an re jî mirov giran birîndar bûna. Lê hijmara mirî û birindaran, bi nûçeyên ku ji herêmê tê, her kêlîkê dikarê bigûherê.

Her wusa, dema ku komkujiya li gundê Zergelê hat gûhê min, komkujîya ku dîsa di bombabarana balefirên artişa tirk de ku dîsa li gundê qandilê ê bi navê kortekê ku bûyî de hanî bîra min. Dîsa di vê komkujiyê de jî, ser 8 mirovan ji heman malbatê hatibû qatilkirin. Dîsa jinek ciwan a ku di vê komkujiyê de hatibû qatilkirin bi heml bû. Bi wê re jî, zaroyek bi navê Solîn 2 salî jî hatibû qatilkirin. Ev zaroka bi navê Solîn, bû weke nav û sembola wê komkujiya ku di wê de ew û hemû malbata wê hatibû qatilkirin jî.

Î ro jî, yanî di yekê tabaxa 2015an de komkujiyek bi heman rengî ji aliyê balefirên şer ên tirk de hat kirin. Dîmenên ku ji herêmê ji gundê ku hatî bombabarankirin tên, wusa didina nîşandin ku gund bigiştî hatîya armanc girtin. Her wusa, gund, hemû hatîya xûrixandin bi bombabaranê. Di nava wan kevilên xûrîxî de li gorî nûçeyên ku tên jî, ew in ku heya ku gelek mirinên din jî hebin.

Ev komkujiya gundê Zergelê, di ancama bombabaran balefirên şer ên

tirk de bû. Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman, rayadarên tirk, pêvajoyeke giştî ya şer bi gelê kurd re dana destpêkirin. Di ancama vê pêvajoya şer a giştî de komkujiyên bi vî rengî dihên hanîn li serê civate kurd.

Rayadarên tirk, wê çawa tevgera azadîya kurd bişikênin û wê civate kurd ji dîrokê bibin, di wê çerçoveyê de bi kurdan re şer dikin. Şerê ku rejima tirk bi kurdan re dide, şerê jenosîdkirina civate kurd a. Her wusa, bi vê armancê jî, rayadarên tirk, çeteyên weke DAÎŞ´ê û cebetil-nasr´ dane hêrîşkirin bi ser kurdan de. Wê çawa pêşîya kurdan û pêşketina kurdan bigrin, hêrîşên xwe di vê çerçoveyê de dikin.

Gundê Zergelê, weke gundekî herî mazin ê herêma Qandilê ya. Hewirdorên gund,, çîya, çem û zewî na. Herêma ku gundê Zergelê dikeviyê de, weke herêmmek dîrokî ya herêmê jî, mirov dikarê werêne ser ziman. Li vê herêmê, di demên bûhûrî de jî jîyana şariştanî pêşketîya. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku gundê zergelê, weke gûndekî herêmê ê giring jî mirov dikarê werêne ser ziman. Ji xwe, ji ber van teybetîyên wê yên li herêmê, gund hatîya armanc girtin.

Komkujîya gundê Zergelê, weke politikayaka bi bombabaranê ya bi armanca ji mirovan valakirina herêmê jî mirov dikarê werêne ser ziman. Her wusa, di vê çerçoveyê de bi zanebûnî, ev komkujî ji aliyê balefirên şer ên tirk ve hatîya kirin. Komkujiya Zergelê, di seatên ku rayadarên tirk, di bin serkêşîya ferîdûn Sinîrlîoglu de ku bi rayadarên Başûrî ên PDK´yî û hwd re ku hevdîtin dikirin de hat kirin. Her wusa, di wan seatên ku ew hevdîtin dihatina kirin de, ev komkujî dihê kirin. Bi vê komkujiya Zergelê re weke ku dixwezin ku tirsekê bi xalk û sîyesetmederên başûrê kurdistanê re jî bidina çêkirin.

Bi derûnîya komkujiyan re tafisandina civatê û dengê civatê, li bakûrê kurdistanê, hertimî weke rêbazeka ku rayadarên tirk serî lê daya. Li vir, di aslê xwe de, di hevdîtinên heyeta tirk a di bin serkêşîya Ferîdûn Sinirlîoglu ya bi rayadarên başûrê kurdistanê re çi hatîya axiftin ku were ragihandin, wê hinek rastiyên di temenê komkujiya gundê zergelê û bombabarana wê ya li herêmên qandilê de jî were fahmkirin. Di seatên ku vê heyeta hikimeta tirk di bin serkêşîya Ferîdûn Sînirlioglu de bi rrayadarên başûrî û partîyên wê re hevdîtin dikir de ev komkujî dihê kirin. Bêgûman, di wan hevdîtinan de, li ser hêrîşên li başûrê kurdistanê hatîya axiftin. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku bi teybetî partîya PDK´ê bi çi awayê di vê pêvajoyê de bi rayadarên tirk re tevdigerihê, politikayên wê bûya sedema vê komkujiyê jî.

Li vir, wusa xûya dike ku ev komkuji, weke ku heya rayadarên PDK´ê jê

hebe hatîya kirin. Dema ku mirov li gotinên ku rayadarên PDK´ê û hwd tênin ser ziman ku mirov li wan dinerê, ev întîba di mejiyê mirov de çê dibe. Berî komkujiyê, di çerçoveyek bi hevkarîya bi tirkiye re de rayadarên PDK´ê digotin ku divê ku hêzên PKK´ê ji qandilê derkevin. Yanî, nîqaşek bi vî rengî ji aliyê xwe ve dabûbûn destpêkirin. Piştre jî, ev komkuji bi balefirên şer ên tirk dibê û piştre re gotina pêşî a rayadarên PDK´ê ew a ku dibêjin ku "divê ku PKKê ji herêmê sivîl derkeve" ya. Yanî li vir, ku ev întîba rast bê, ev komkuji bi heya PDK´ê pêk hatîya û li ser wê re dixwezin ku nîqaşna bi wê ku dixwezin bidina destpêkirin ku PKK´ê ji herêmê were derxistin. Yanî, ev komkujiya li gundê Zergelê bi vê armancê jî heya ku hatibê kirin. Bêgûman, piştî vê komkujiyê re gotinên ku werina ser ziman, ya wê vê întibayê piştrast bikin û yan jî, wê rastiyna din ên di temenê kirina vê komkujiyê ku hatîya kirin de derxê li holê.

Ti farqê vê komkujiya li gundê Zergelê ji komkujiya li kortekê, ji komkujiya roboskî, û hwd tûna ya. Her wusa, di van komkujiyên demên bûhûrî de jî, dîsa hikimeta AKP´ê û rayadarên wê fermana bombabardimê dabûbûn. Di sale 2011´an de komkujiya kortekê hatibû kirin. Kortek, herêmeke ku li Başûrê Kurdistanê li herêma Qendîlê dimênê ye. Balafirên artêşa tirk di 21'ê tebaxê de devera Kortekê a di navbera Qendîl û Ranyayê de bombebaran kir, di encamê de 4 jê zarok, jinek ducanî û bi giştî 7 kesên sivîl jiyana xwe ji dest dan. Pişte cenaze di 22'ê tebaxê de ji nexweşxaneya navçeya Ranya ya Silêmanî hate girtin û ji aliyê bi hezaran kes ve li gundê Golê hatin definkirin.

Li vir, divê ku mirov komkujiya li gundê Zergelê, hinekî din kûr lê bikolê. Her wusa, divê ku mirov rastîya vê komkujiya li gundê Zergelê, di çerçoveya politikayên hikimeta AKP´ê a di vê demê de bi wan hem pêvajoya çareserîyê bi dawî lê hanîya û hem jî konsepte şer a giştî kiriya dewrê de fahm bike. Komkujiya li gundê Zergelê di êvara 1ê tabaxa 2015´an de seat li dora 4´an pêk tê. Lê di roja 1´ê tabaxê de roj dibûhûrê, lê ti çapameniya tirk, cih nadê vê komkujiya ku balefirên şer ên tirk kiriya ya. Weke ku di komkujiya roboskî de tê kirin û weke ku çawa ku di komkujiya li gundê kortekê de ku balefirên şer ên tirk kirî tê kirin de bû, di vê komkujiya li gundê zergelê de ku balefirên şer ên tirk kirî de jî çapameniya tirk cih neda wê û ne hanî ser ziman.

Komkujiya li gundê Zergelê, di çerçoveya politikayên şer ên hikimeta AKP´ê a li hemberî kurdan de hatîya kirin. Di serî de dijminatîya rayadarên tirk, di vê komkujiyê de divê ku mirov bibînê. Politikayên jenosîdkirina civate kurd, dimeşênin. Şerê wê bi civate kurd re dikin. Her wusa, rakirina bi sedan balefirên şer li ser serê civate kurd, ma mirov dervî vê bi çi zihniyetê

dikarê werêne ser ziman. Gotinên weke "terorê" û "şerê bi terorê" û hwd, tenê gotinna maske ên sernûxûmandinê na. Her wusa, bi navê DAÎŞ´a ku hêrîşî civate kurd dike û şerê jenosîdê bi kurdan re dike re navê tevgera kurd bi wê re hildan jî, bi vê zihniyeta bi armmanca jenosîdkirina civate kurd, mirov dikarê werêne ser ziman.

..

**Li ser terore dewletê û hertimî hewldana meşrûkirina wê ya bi pergale dadê.**

Li kurdistanê ya ku li ser serê civate kurd tê meşandin, terore dewletê bixwe ya. Her roj, bi dehan sazî, mal û kargehên kurdan rastî serdegirtinên polis û leşkerên tirk tên. Her roj, bi dehan ciwanên kurd, tên girtin û di bin çavan de rast, zor û êşkence tên. Her wusa, li her bajar, bajarok, navçe, gundên kurd û hwd, rastî hêrîşên bi fizîkî ên bi gûleyên rast û gûleyên gazê tên. Her roj, li ser her herêmên kurdistanê ku li wê jîyan heya, dûyê hêrîşên leşkerên tirk ên bi bi bombayê gazê û şawatên wê bilind dibin.

Li kurdistanê, polis û leşkerên dewletê komkujîyan dikin, ´înfaz´an dikkin û her wusa êşkenceyê dikin. Tenê dûhû li dîyadînê, polîsên tirk du zarokên kurd Orhan Aslan´ê û Mihemed Aydemir qatilkirin. Piştre jî, walî çend gotin weşand û got ku ´ew terorîst in´. Lê ev ne rast bû. Ew çend zarokên kurd bûn. Mihemed Aydemir zaroyekî kurd ku 15 salî bû. Orhan Aslan jî zaroyekî kurd ku 16 salî bû.

Gotinên weke ´tekoşîna bi terorê´ û ankû ´ew terorîst in´ jî, weke gotinna kriminalize kirinê na. Gotina ´terorê´, weke gotinaka ku rayadarê tirk, wê pirr zêde bikardihênin. Pirr zêde bikarhanîna wê jî, biarmanca ku vê gotinê weke maske´yê ji sûcên ku dikin re bikarbênin a. Gotina, terorê, bûya navê oparasyonên têgihê ku sûcên rayadarên dewletê ên ku li ser serê civate kurd dikin ku ´meşrû´ bidina nîşandin û wan bi civate tirk bidina herê kirin jî. Gelek mirovên tirk jî, dema ku tê gûhê wan ku ´ew terorîst in´ û ´çatişma´yê de hatina kuştin´ êdî weke ku ew kuştin rast bê, herê dikin û wusa herê dikin.

Di vê çerçoveyê de terore dewletê a li kurdistanê, bi gotinên weke ´terorê´ û bi rêya pergale dadê a tirk dihê meşrû kirin. Heta roja me, tenê ku mirov tenê ji salên 1980´î ve hilde li vir û bi vir ve werê, mirov wê bibînê ku bi hezaran sûcên dewletê bûna û pergale dadê ser wan nûxûmandîya. Pergale dadê a tirk, bûya navê meşrûkirina şerê rejima tirk a li ser serê civate kurd û sûcên ku ew li kurdistanê dike. Minaq, di komkujiya roboskî de balafirên şer ên tirk 34 ciwanên kurd qatil kirin, Lê dadgeha tirk, dikarê biryara ´neşopandinê´ di derbarê vê komkujiya ku hatî serê civate kurd de bide. ..

Dema ku mirov li rêyên ku rayadarên tirk bo ku bi wan ser sûcên xwe biweşêrên ku dinerê, mirov dibînê ku çapameni û pergale mediya di vê çerçoveyê de mirov dibînê ku pirr zêde hatîya bikarhanîn. Her wusa, pergala dadê, çawa li hemberî kurdan dihê bikarhanîn û çawa bo ku sernûxûmandinê dihê bikarhanîn, mirov dikarê ji wê fahm bike ku pergale dade tirk di ti sûcên rayadarên tirk ên li hemberî civate kurd de biryarên mahkûmkirinê nedana. Di hemû dozên rayadarên pergale tirk di wan de tên darizandin, pêşî bo ku bidina jibîrkirin wê hinekî demê bi ser bidina bûhûrandin û piştre jî, yan biryara ´neşopandinê´ di derbarê de bidin û yan jî, wê bi tememî ´beraata´ wan bidin. Di vê çerçoveyê de jî çapamenî jî, wê nîqaşên ser nûxûmandinê bidê meşandin.

Me li jor got ku em ´tenê ji sale 1980´î ve hildina li dest´ emê bibînin ku rayadarên tirk sûcên mazin li hemberî civate kurd kirina. Lê demên berî vê demê jî, demên ku di wan de rayadarên tirk biryar dana û komkujiyên mazin ên weke ´komkujiya zilanê´ û ´komkujiya dersimê´ ku hanîna serê civate kurd in. Pergale rejimê li kurdistanê, hertimî, wê çawa rayadarên tirk ên ku li kurdistanê kar dikin û ankû li hemberî civate kurd şer dikin û mirovên kurd dikujin ku wê çawa wan paqij derxê û bide nîşandin, di wê çerçoveyê de kar û xabatê dike.

Dema ku mirov li dozên rayadarên tirk ên ku li kurdistanê hatina vekirin û bi ancambûna wan binerê, mirov wê vê rastiyê bi awayekî pirr vekirî bibînê. Her wusa, sûcên rayadarên dewletê hertimî bi pergale dadê ser wan hatîya girtin û nûxûmandin. Doza li Dersimê ku heft leşkerên tirk dest diavêjina keçeka kurd a 16 salî, Her wusa doza li dibistana şevborînê a li Sêrtê ku çend rayadarên tirk, dest diavêjina çend keçên kurd ên zarok, doza dîsa destavêtinê a li batmanê ku ser 27 rayadarên tirk ku di nav wan de ên paya bilind jî hebûn ku dest diavêjina keçeka kurd û hwd, hemû jî dozên ku bi bi ´biryarên neşopandinê´ ku bi ancam bûna. Her wusa, di hemû dozên ku di wan de raayadarên pergalê ên tirk ku li hemberî civate kurd, ketina nava destavêtinê de û her wusa ku komkuji kirina de, dozên wan bi ´biryarên neşopandinê´ bi ancam bûna. Her wusa, di vê çerçoveyê de ew qatilên dewletê, paqij hatina dayîn nîşandin. Ji ber vê yekê ya ku mirov di dîroka komare tirk de di derbarê ti sûcên ku li hemberî civate kurd kirina rastî ti dozên ku bi mahkûmîyetê bi ancambûna nayê. Hemû doz jî, bûna dozên sernûxûmandinê. ..

Bi wê re jî, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku pergale dadê li kurdistanê li ser serê civate kurd, ne ji bo dadê bicihhanînê tê bikarhanîn. Bo ser sûcên rayadarên pergalê ku li hemberî civate kurd kirina binûxûmêne dihê bikarhanîn. Di vê çerçoveyê de pergale dadê, li kurdistanê kar kirîya.

Em ku dîroka komare tirk hildina li dest jî, em dikarin bibêjin ku em di hundûrê wê dîrokê hemûyî de jî nabînin ku tenê dozek jî bi mahkûmkirina rayadarên dewletê ên ku sûc li hemberî civatê kirina bi ancam bûya. Di vê çerçoveyê de pergale dadê, bo ser sûc û komkujiyên ku li hemberî civate kurd dihên kirin ku li ser wan binûxûmêne dihê bikarhanîn. Gotinên weke ´terorê´ jî, di vê heman mantiqê de li ser çapameniyê re bi rengê oparasyonên têgihê re dihê bikarhanîn. Hertimî, weke ´terorê´ dayîna nîşandin û hewldana hertimî hiştina wê întîbaya bi gotina terorê li ser serê civate kurd û mirovê kurd, hem bo tafisandin û bêdengkirinê û hem jî bo ser sûcên ku dikin binûxûmênin a.

Ji xwe, gotina ´terorê´, bi wê întîbaya wê ya ku dihê parastin li ser civatê re, gelek mirovên nezan ku rewşê fahm nakin, êdî biwê derûnîyê dikevina wê rewşê de ku bibirhan bikin û ankû hewl didin ku bidina nîşandin ku ew ´ne terorîst in.´ Vê jî, di çerçoveya xwe ji civate dûûrkirinê de dike. Carna, dema ku di nava malbate xwe de jî ku bi zimanê kurdî diaxifê jî, ji zaroyên xwe dibêje ku bi ´hêdîka biaxifin, wê dengê wê bibîhîzîn.´ Bi wê întîbaya ku dema ku ew hat ditin û girtin ku bi zimanê kurdî diaxifê, wê weke ku bibê ´terorîst´, dikeve derûnîyekê de. Di vê çerçoveyê de ev mirovê kurd, di bin giranîya wê întîbaya gotina terorê´ de dijî.

Dema ku mirovê bi nerîn û çavê dewletê binerê, ya ku mirov wê bêxiyê de wê ev bê. Her wûsa ev derûnîya ku mirov bikeviyê de wê ev bê. Derûnîya ku mirov bikeviyê de, wê weke ku dewlet dibêje ku dema ku nêzî wê bê, bi zimanê tirkî biaxifê û her wusa ku weke wê bijî, wê ne terorîst bê. Lê dema ku weke xwe jîya û ku bi zimanê civate xwe bi kurdî axift û her wusa ku jîyane wê red kir, ew hingî dibê terorîst. Di serî de, em divê ku vê derûnîyê baş fahm bikin. Ev derûnîya ku mirov ji rastîya mirov dûr dike jî ev a. Her wusa, li vir, mirov dikarê vê jî bibînê û fahm bike ku piştî konsepta şer a rejima tirk a li hemberî civate kurd ku li hin herêmên kurdistanê ´rêveberîya xwe ya cewherî´ ku denezend, zimanê ku bi wê didenezêne jî zimanê tirkî ya. Di aslê xwe de ev jî ast û radaya wê derûnîyê ku bi mirov re ji xwe ne bi bawerbûnê dide çêkirin dide li berçav.

Li ser pergale dadê re sûcên ku dewletê û rayadarên wê kirina, ser wan hatîya nûxûmandin. Her wusa, dad bûya rêya meşrûkirin û ankû meşrû dayîna wê sûdeta dewletê û komkujiyên ku wê kirina. Li ser dadê re bi navkirin û weke ´terorê´ dayîna nîşandin jî, her wusa rengekî din ê bikarhanîna wê pergale dadê ya di vê çerçoveyê de ya. Pergale dadê, li kurdistanê li ser serê civate kurd weke rêyeka şerê dewletê ê bi kurdan re ya. Li ser pergale dadê re dewletê şerê xwe yê bi civate kurd re meşandîya. An

jî, car bi car, ew şerê ku bi kurdan re meşandîya û di ancama wê de gelek komkujiyên mazin ên weke komkujiya roboskî û hwd ku hanîna serê civate kurd, bi pergale dadê ser wan hewl hatîya dayîn binûxûmêne. Biryara ´ne şopandinê´ a di derbarê komujiya roboskî de nîşanak, minaq û birhana vê rastiyê ya. Di nava civatê de, weke lingekî şerê dewletê ê bi civatê re ku bi armanca tafisandina civate kurd rêxistina polîsan a. Li ser wê re jî, pergale dadê ya.

Pergale dadê, weke pergelaka sûckirina dewletê û meşrû dayîn nîşandina wê ya. Di vê çerçoveyê de li ser navê dewletê kar û xabatê dike. Di tenê vî şerê dewletê ê bi civate kurd ê 40 salên dawî re de bi hezaran sûcên ku rayadarên dewletê li hemberî civate kurd kirina hena. Her wusa, komkujiyên ku kirina û hanîna serê civate kurd hena. Lê win tenê biryarekê nabînîn ku hatîya dayîn ku di derbarê sûcekî de jî dabûbê. Her wusa, dema ku em li dîroka komarê jî bibînin jî em dibînin ku pergale dadê di derbarê ti sûcên dewletê ên li ser serê civate kurd de ku kirina, biryar ne dane. Lê vajî wê, pergale dadê, di nava hemû dîroka komarê de, hertimî kar û xabat kirîya ku li ser sûcên ku dewletê û rayadarên wê li hemberî civate kurd û civatên din kirina ku binûxûmêne. Her wusa, di hûndûrê vê 40 salê dawî de bo tafisandina vîna civate kurd û bêdeng kirina wê, girtina rêxistin, malgeh, sazî û rêxistinên kurdan jî, di vê çerçoveyê de mirov dikarê bahse wê bike. ..

Ji DEP´ê heta HADEP û DTP û hwd jî, mirov dikarê vê rewşê werêne ser ziman. Di van rojên dawî nîqaşên girtina HDP´ê ku di çapameniya tirk de tên kirin jî, di vê çerçoveyê de mirov dikarê werêne ser ziman. Wê çawa civate kurd, vîna wê bişikênin û dengê wê bitafisênin, di vê çerçoveyê de şer û tekoşîna ku dewlet bi civate kurd re dike, wê çawa "**qewlikekî dadî**" lê bike, di vê çerçoveyê de pergale dadê kar û xabat kirîya. Bi deh hezaran mirov hatina girtin û di bin çavan de êşkence li wan hatîya kirin. Dîsa bi dehan hezaran mirov hatina girtin û rayadarên dewletê ew qatilkirina û winda kirina. ´Dayikên şemiyê´, dayikên van mirovên ku dewletê girtina binçav û piştre qatilkirina û winda kirina na. Ew dayik û malbat, ev bi dehan salana ku her rojên şemiyê li hevdû dicivin û doza dadê dikin. Lê ti carî pergale dadê, bo wan dad ne hanîya li cih. Bo wan dad nebûya.

Dad û pergale dadê, hertimî bûya weke perdeyekê ku ser sûcên dewletê ên li ser civatê dinûxûmêne. Ev, di aslê xwe de xirab bikarhanîna pergale dadê û îstismarkirina wê hêsta dadê ya gerdûnî jî ya. Dema ku mirov bahse dadê bike, ya ku tê berbîra me, ew a ku di çerçoveya maf û azadiyê de ku mirov û jîyane mirov bê parastin a. Lê li tirkiya û welatên din ên rojhilat, dema ku bahse dadê û pergale dadê tê kirin, ya ku tê berbîra mirov, ew a ku çawa ku pergale dadê hatîya kirin, weke perdeyekê ku sûcên dewletê û

rayadarên wê ên li hemberê civatê ku diveşêrê û ser dinûxûmêne ya. ... . Mijara statûya kurd û pêvajoya çareserîyê, du mijarên ku di çerçoveya ´pirsgirêka kurd´ de ku bi hevdû ve girêdayî na. Her wusa, hebûna civate kurd ku rejima tirk înkar dike, hêvî dihat kirin ku bi pêvajoya çareserîyê re pirsgirêka kurd were çareserkirin û nas bike. Lê ji ber ku rejima tirk û hikimetên wê, heta roja me, hertimî di înkare civate kurd de isrer kirina û politikayên xwe li ser wê bi temen kirina, êdî her pêvajo jî, weke pêvajoya çareserîyê tê û li wê zihniyetî û înkarê dialiqê û diqalibê.

Rayaderên tirk, bo ku pêvajoya çareserîyê ji holê ra bikin, konsepta şer li hemberî kurdan dana destpêkirin. Konsepta şer a ku rejima tirk û hikimeta wê ya AKP´ê li hemberî kurdan pêşxist, gelek armancên bi wê ve girêdayî ku hatina kirin hena. Her wusa, ev konsepta şer a rejima tirk, em nikarin tenê, bi çerçoveya sînorê rejima tirk û bakûrê kurdistanê ve bi sînor werênina ser ziman. Mijara herî giring ku weke armancaka rejima tirk di hundurê vê konsepta şer de jî, di bin navê ´herêmek ewla´ de herêmên ezaz û cerablus´ê hêzê bicih bike. Bi wê re jî, ku karibê derbeyekê li kurdên rojava bixe. Bi gotinaka din, şoreşa rojava ku karibê bi tafisêne.

Her wusa ji aliyê bakûrê kurdistanê ve jî, konsepte şer, bûya weke konseptek şer ku piştî hilbijartinên 7´ê hezîrene 2015´an ku ew vîna gelê kurd ku di vê hilbijartinê de derket li holê ku wê nasnekin û ku wê ji holê rabikin. Bo vê yekê, mirov dikarê vê konsepte şer, di vê çerçoveyê de weke weke konsepteka hêrîşê a li vîna kurd jî, werêne ser ziman. Yanî, bi gotinaka din, bi vê konsepte şer, ku karibin, wê vîna gelê kurd, bişikênin. Di vê çerçoveyê de, hêrîşên xwe li bakûrê kurdistanê li civate kurd dikin.

Her wusa, komkujiya Zergelê, Komkujiya Silopîya, Komkujiya Dîyadînê ku di wê de du jê zarok sê mirov hatibûbûna qatilkirin û hwd, weke nêzîkatîya vê konsepta şer a rejima tirk radixe li berçav. Her wusa, gelê kurd, li bakûrê Kurdistan, êdî hatîya wê astê ku ti ewlakarîya wê nema ya. Hebûna polîs û leşkerên tirk û rayadarên tirk ên li kurdistanê, bo hemû kurdistanîyan dibê weke ´tehdîdekê´. Ya ku wan ji hemû kurdan re dike weke tehdîdekê jî, politikayên rejima tirk ên di çerçoveya dijberî û înkare hebûna civate kurd de na.

Di vê rojevê de, nûçeyên ku ji herêmê tên, ew in ku rayadarên tirk, di hemû hevdîtinên xwe yên bi rayadarên emerikî re ji wan dixwezin ku di nava axa rojavayê kurdistanê de ku bi wê dixwezê ku têkiliyên herêm û kantona Afrînê ya herêmên ên rojavayê ên weke qamişlo, kobanê û hemû herêmên qût bike herêmek ewla li herêma ezaz û cerablus´ê çê bike. Bi vê, armanc dike ku pêşîya pêşketina statûya kurdan bigrê. Di vê çerçoveyê de ji

xwe raydarên tirk, dawî li pêvajoya çareserîyê hanîn û pêvajoyek şer li hemberî bakûrê kurdistanê û giştîya civate kurd dane destpêkirin.

Politikayên tirkiya ên di çerçoveya înkare statûya civate kurd de, li herêmê wê ti carî ji wan pêşaroj tûne bê. Tenê, heta ku di meriyetê de bin, wê temenê şer û pevçûnên li herêmê ên ku bi kurdan re bikin bê. Rastî ev a.

Gelek mijarên ku mirov divê ku wan yek bi yek û bi hevdû ve girêdayî werêne ser ziman hena. Her wusa, pêvajoya çareserîyê, ´konsepta rejima tirk a şer a li hemberî kurdan. ´hebûna DAÎŞ´ê û rewşa herêmê, rewşa Sûrî û kurdan, amedekarîya hilbijartinek zû a mihtemel li tirkiya û bakûrê kurdstanê, Statûya kurdan a li herêmê û hwd, tenê çend ji wan mijar û serekan in ku mirov dikarê wan werêne ser ziman in.

Di dîroka tirkiya de, ev care yekem a ku kurdan, bi di hilbijartinan de bi vîna xwe bi vî rengî çûna meclisê. Lê ev hilbijartina ku di wê de kurd bi serketina bo ku ´tûna were hasibandin´ jî, dixwezin ku herina hilbijartinaka pêşwaxt. Armanca çûyin tirkiya a çûyina hilbijartinan ev a. Hemû hikimetên tirk, hertimî, bûna weke hikimetên ku bi tengezerî´yan ku civatî bi rê ve dibin in. Bo vê yekê, têgihiştin û zanîna di rewşek aram de bi rêvebirina welêt bi wan re tûna ya. Di rewşek aram û aşîtîyê de hikimetên tirk, bi politikayên xwe re dikevina rewşek valahîyê de. Dest û lingên wan tên girêdan. Her wusa, Hikimeta AKP´ê jî, wusa lê hat. Ji ber vê yekê jî, di cih de pêvajoyek şer ya bi kurdan re dane destpêkirin. Di demên xwe yên bûhûrandin de rejim û hikimetên tirk, hemû pirsgirêk, di nava politikayên şer de yan hatina tafisandin û yan jî tûna kirin. Bi vî rengî pirsgirêk hatina ji holê rakirin. Di dîroka tirkiya de, mirov rastî wê nayê ku ti pirsgirêkên civatî bi rêyên çareserîyên aşîtîyana û di nava aramiyê de ku hatina çareser kirin. Ku ev pêvajoya çareseriyê, gihiştiba armancê, wê ev bûba pirsgirêka pêşî a civatî ku bi rêyek aşîtîyana û di nava aramiyê de hatî çareserkirin. Lê mixabin, ev jî bi serneket.

Hertimî çavê xalkê tirsandina. Bi zilm û zordariyê xwestina ku bigihijina armanca xwe. Hemû dengên ku di hilbijartinên bûhûrî de ku partîyên tirk ên weke AKP´ê ku ji kurdan distandin, di ancama politikayên tirsandinê de bûn. Di vê pêvajoyê de xwestina, di nava pêvajoyek şer û gengêşîyê de çûyina hilbijartinek pêşwaxt jî, ji vê yekê tê. Dihizirin ku bi politikayên şer herina bi ser kurdan de û li ser çapameniyê û hêzên xwe re çavtirsandinê pêş bixin, wê dîsa weke demên bûhûrî ancamê bidest bixin. Bo vê yekê, li hilbijartinek pêşwaxt dihizirin.

Di vê hilbijartina 7´ê hezirenê de ev nêzî sê salan bû, ku li bakûrê kurdistanê şer sekinî bû. Çend ku dîsa weke ku li rojava û kobanê û li başûr û şengalê dîsa ji ser serê kurdan şer kêm nebû jî, lê dîsa rewşa ku afirî,

bawerîyek afirand. Her wusa, pêvajoya çareserîyê jî, temenê wê bawerrîyê afirand. Di vê çerçoveyê de piştî demeka ku gotinên ´aşîtiyê´ li ser pêvajoya çareserîyê re ku dihatin ser ziman re çûyina hilbijartinan bû. Di vê çerçoveyê de gel jî, mêla xwe ji aliyê politikayên şer ve nekir. Bo vê yekê, partiyên rejimê ên weke AKP´ê ku ev ser 13 salan re ku bi politika û gotinên şer li ser desthilatdarîyê bûn, têkçûn. Gel, tercîha xwe ji aşîtîyê ve kir. Bo vê yekê bû ku rejiim û rayadarên tirk, pêvajoyeka şer dana destpêkirin ku weke ku çawa ku berê dikirin, di nava pêvajoyek şer û çavtirsandinê de herina hilbijartinan.

Hemû dengên ku partiyên rejimê li kurdistanê ji kurdan digirtin, bi bandûra şer û çavtirsandinê distandin. Bo vê yekê, mirov dikarê bibêje ku hemû dengên ku di hilbijartinên bûhûrî de distandin, yek jî ji wan ne meşrû bûn. Nûha, dîsa piştî konseptek şer û pêşxistina tehdîdê bi kuştinê û çavtirsandinê herina hilbijartinan û biserkevin. Bo vê yekê, êdî hikimeta tirk a AKP´ê û T. Ardogan ji aliyê ve dawî li pêvajoya çareserîyê hanîn û pêvajoyek şer li hemberî civate kurd giştî dana destpêkirin. Bawerî dikin ku wê bi pêvajoyek şer, dîsa hemû civat çavtisandî bibe û wê dîsa dengê xwe weke demên berê ên bûhûrî wê bidina partîyên rejimê ên weke AKP´ê. Pêvajoya şer, bo vê armancê hatîya destpêkirin. Dema ku mirov ji aliyê bakûrê kurdistanê, zihniyeta rejima tirk û hilbijartinan ve binerê, ya ku tê dîtin ev a. Lê dema ku mirov ji aliyê rojavayê kurdistanê û destkevtiyên civate kurd ên li vir ve jî binerê, her wusa, divê ku mirov bibêje ku weke pêvajoyeka şer a li hemberî wê jî ya ku rejima tirk û hikimeta wê li hemberî kurdan **daya** destpêkirin a.

Dijminatîya li kurdan, bûya rengê politikayên rejima tirk. Her wusa, car bi car jî di vê politikaya xwe dijminatiyê a li kurdan de hinek kurdên ku hatina xistin jî hatina bikarhanîn. Her wusa, kurdên ku di nava AKP´ê de minaqe vê na. Her wusa di hikimetên bûhûrî de jî, ev wusa bûya. Yanî, rengê hêrîşên li kurdan, ji aliyekî ve jî, di vê çerçoveyê de weke di wê de hinek kurd jî hatina bikarhanîn. Minaqa, ´pergela cerdewaniyê´ a li bakûrê kurdistanê û di çerçoveya konsepta şer a piştî hilbijartên 7´ê hezirene 2015an de ku hanî rojevê û got ku ´wê 5 hezar cerdewanên din hildin´, di vê çerçoveyê de mirov dikarê werêne ser ziman. Berî wê di dema osmaniyan de jî, rêveberîya osmanîyan, aşîrên kurd ku hildana cem xwe, li hemberî aşîrên din bikardihanî. Ev weke politikayekê bû. Di roja me de jî, bi rengna nû û cuda vê politikayê dîsa pêş dixin.

Politikayên dijminatiyê ku li hemberî kurdan dimeşêne, di temenê konsepta şer a rejima tirk a roja me de jî ya. Komkujiyên ku di van herdû hefteyên dawî de ku rejima tirk li ser serê kurdan kirin, ên weke komkujiya

li Zergelê, komkujiya li Silopî, komkujiya li Dîyadînê û her wusa di nava şerê ku bi kurdan re dimeşêne de bi dehan ciwanên kurd ku hatina qatilkirin û bi sedan ciwanên kurd ku ji ber ku kurd in ku hatina girtin û avêtina zindanan, divê ku mirov li vir werêne ser ziman. Rejima tirk, di vê çerçoveyê de dema ku mirov li dîroka wê dinerê, mirov dibînê ku dîroka wê bûya dîroka şer a bi civate kurd re. .

Li vir, di dewama wê de divê ku mirov balê bikişêne li ser rewşa hêrîşên li ser nirxên kurdan. Her civat, wê xwediyê nirxên xwe yên jîyanî, rewîstî û têgînî ku bi wêtevdigerihê. Minaq, dema ku miriyek mir jî, wê çawa were vêşartin û ankû bi ´defn´kirin, wê li gorî wan nirxan bê. Li vir, di vê çerçoveyê de ku çawa hêrîşî van nirxên civatî kurdan dikirin, divê ku mirov hinekî li ser wê re werêne ser ziman. Fahmkirina, ragirtina naaşên ciwanên kurd ku li rojava jîyane xwe ji dest dana, wê piştre were dîtin ku weke politikayakê ya. Ji ber ku piştre, wê bi fermana rayadarên tirk ên T. Ardogan ´»fermana hêrîşkirina li goristanên kurdan» dan.

**Hovitîya li deriyê Xabûrê, ku bi ragirtina naaşên ciwanên kurd ku hat kirin, divê ku mirov li ser wê bisekinê.** Ser 20 rojan re naaşên ciwanên kurd ku li rojava pekrawan kirina li deriyê Xabûrê hatin ragirtin. Her wusa li deriyê ´mûrşîtpinar´ê jî ser 16 naaşên ciwanên kurd hatin ragirtin. Sîyeseta jenosîd û komkujiyê, vêca li ser naaşên ciwanên kurd re hat meşandin. Bi fermana civîna wezeretan a hikimeta AKP´ê, destûrê nayê dayîn ku bên derbas kirin. Bi gotinaka din, em dikarin bibêjin ku ev êşkence ya ku li naaşan tê kirin a.

Bi vî rengî muameleya li naaşan, cihê wê di ti bawerî û ahlaqê mirovatiyê de tûna ya. Tenê yên ku nesibê xwe ji mirovatiyê negirtina, bi zihniyeta xwe re dikarin bi vî rengî zilmê li naaşên ciwanan bikin.

Ew ciwanên kurd ku naaşê wan li deriyê Xabûrê û mûrşîtpinarê hatin ragirtin, ew li rojava li hemberî zilm û hovîtîya DAÎŞ´ê tekoşîna mirovatiyê didan bûn. Wan, hebûna civatan ji tûnabûnê xilas kirina.

Rayadarên tirk, ser 20 rojan rej wan naaşên ciwanên kurd li deriyê Xabûrê dide ragirtin. Ji hefteya dawî a temûza 2015´an û pê de, ew ragirtin dest pêkiribû û piştre di meha tabaxê de doma. Her wusa 16 naaşên ciwanên kurd jî li deriyê mûrşîtpinarê hatin ragirtin. Weke ku çawa ku bi bombabaran çîyayên kurdistanê bombabaran dikin û komkujiyan dikin, her wusa, dixwezin ku bi vî rengî, li ser naaşan re êşna din di mejiyê mirovan de çê bikin.

Bi vî rengî, ragirtina naaşan, minaqa wê li ti deverê û dîrokê de tûna ya. Pêşî, rayadarên PDK´yî jî rojekê du-rojan di deriyê sêmalka de astengî derxistin û ragirtibûbûn. Piştî ku ji wir derbas bûn, li deriyê Xabûrê, vêca

rayadarên tirk, bo ku zilma xwe ya li ser serê civate kurd bide nîşandin, wan dide ragirtin.

Ku mirov, bawerîya wî, çi bila bê, bi vî rengî tevgerîn ne ahlaqî û mirovî ya. Ev rayadarên Hikimeta tirk a AKP´ê ku bezirganiya olê dikin, dibêjin ´em misilman in." Ez li vir, li ser misilmanetiyê de bibêjim. Di dema di ber hz. Mihemed bixwe de jî cenezeyek derbas dibe, ew li ber wê bûhûrîna ceneze di rabê serpîyan. Yekî li cem wî dibêje ku ´ew cenezeyê yekî cihû ya" Ew jî, bersivê dide û dibêje ku "ew mirov a."

D aslê xwe de, zilma li naaşên ciwanên kurd a li deriyê Xabûrê û mûrşîtpinarê ku rayadarên tirk dikin, mirov dikarê ji wê ast û radaya zilma ku di demên bûhûrî de û di roja me de ku li kurdan dikin jî fahm bike. Di ti dadên şer de jî, meşrûtîya vê rewşê tûna ya. Ji xwe, di ti dadên mirovatiyê de cihê wê tûna ya.

Her wusa, zihniyeta ku çîyayên kurdistanê bombabaran dike, ev zihniyeta dijmirov û hov a. T. Ardogan, her ku devê xwe divekê ku du gotinan bike, wê gotinan ji wan herdû gotinan ji olê bê. Bi vî rengî zêde kirpandina li ser olê re, hinekî jî, nîşanaka kiryarên wan ên qirêt a. Li deverekê, ku zêde kirpandina olê bi gotinî hebe, mirov, divê ku ji îstismara olê zêdetirî bahse hewldana bi wê kirpandina olê bike. Yanî, bêwijdanîya xwe, di bin maskeya olê de dikin ku vêşêrên.

Komkujiya gundê Zergelê ku di ancama bombardimana balafirên şer ên tirk de bû, her wusa mirov dikarê ji vê komkujiya bi zihniyetê ya bi ragirtina naaşên ciwanên kurd li deriyê Xabûrê cûda werêne ser ziman. Ragirtina naaşên ciwanên kurd li deriyê Xabûrê, mirov dikarê weke komkujiya zihniyetê jî werêne ser ziman. Yanî, bi gotinaka din, li ser qatilkirina wan ciwanan re, bi ragirtina wan li devê deriyê Xabûrê, di mejiyan de wê komkujiyê bi zihniyetê ku dûbare bikin. Hinekî jî, zêde kirpandina gotinan ji olê ji aliyê T. Ardogan û rayadarên din ên AKP´yî ve, hinekî jî, biarmanca ser vê rewşê nûxûmandinê jî mirov dikarê werêne ser ziman.

Ragirtina naaşên ciwanên kurd li deriyê Xabûrê, weke aliyekî wê yê derûnî heya. Ew jî, ew a ku li ser wan naaşên ciwanên kurd re ku li mejiyê civate kurd ku êşkence bikin. Her wusa, komkujiyê bi zihniyetî li ser serê civate kurd dike. Mirov, dikarê ragirtina naaşên ciwanên kurd, weke rengekî din ê êşkencekirina li ser serê civate kurd jî werêne ser ziman. Ev jî, rêbazekî nû yê zihniyeta kujar a.

Heta roja me, gelek ciwanên kurd ji aliyê rejima tirk ve hatina qatilkirin. Her wusa, li bakûrê kurdistanê ku bi destê rayadarên tirk û artişa wê hatina pêşxistin, gorên tomarî ku her gorek di wan de bi dehan naaşên ciwanên

kurd di wan de hatina bicihkirina bûna. Heta roja me, bi dehan û sadan gorên tomarî hatina kifşkirin û vekirin. Lê di derbarê yeke tenê de jî doza lêkolînê ne hatîya kirin.

Ragirtina naaşên ciwanên kurd li deriyê Xabûrê û deriyê mûrşîtpinarê, dijmirovîya zihniyeta rejima tirk jî radixe li berçav. Her wusa, ragirtina naaşên ciwanên kurd li deriyê Xabûrê û derîyê mûrşîtpinarê, mirov dikarê weke rengekî din ê hêrîşa rejima tirk a li ser serê civate kurd jî werêne ser ziman.

Di dewama wê de wê piştre hêrîşan bibina li ser pekrewangehên kurdistanîyan. Li çîyayê cuda, warto, Gerzanê, Amedê û Licê, Gever û çolemergê û hwd, li kûderê pekrewangeh hebûn, wê bi awayekî plankirî wê rastî hêrîşên artişa tirk werin. Ev rewşên ku em di dewama hevdû de divê ku werêne ser ziman, wê wele lingekî vê konsepta şer a rejima tirk a li ser ser civatê kurd bê.

.

**Politîkayên tecrîd, şer û jenosîdê li serê civate kurd didom in.**

Piştî 5´ê avrêla 2015ê û pêde, hevdîtinên bi birêz Ocalan re hatina astengkirin. Ev ser çar heyvan re ya ku bi wî re hevdîtin nabin. Bi ser vê tecrîdê re jî politikayên şer dihên pêşxistin. Hikimetên rejima tirk, hertimî, bi politikayên şer dîzayn dana sîyeset û civatê. Bi politikayên aloziyê re civat bi rê ve birina. Mirov, dikarê hikimetên rejima tirk hemûyan jî, weke hikimetên bi vî rengî ku politika pêşxistina û bi wê civat bi rê ve birina jî werêne ser ziman. Bo ku şer bikin û temenê wê çê bikin jî, nîjaddperestî hertimî, weke rengê politikayê bijartina.

Ji destpêka komarê ve hertimî bi vî rengî politika hatina pêşxistin. Komkujiyên weke komkujiya geliyê zila, komkujiya dersimê, komkujiya botanê, komkujiya, agirî, komkujiya roboskî û hwd, tenê çend ji wan komkujiyên ku di ancama vê sîyeseta rejima tirk de ku hatina hanîn li ser civatê kurd in.

Qadaxaya li ser zimanê kurdî jî, li vir, divêê ku mirov bibîr bike. Nihiştina ku kurd bi zimanê civatê xwe êdî xwe perwerde bikin û xwe biafirênin, divê ku mirov, weke politikaya jenosîdê ya esas ku di temenê wê de tecrîd û şer dihê pêşxistin werêne ser ziman. Politikayên jenosîê, heta roja me, li ser serê civate kurd hatîya pêşxitin. Hemû komkujiyên ku hatina hanîn li serê civate kurd, divê ku mirov di çerçoveya politikaya jenosîdê a rejimên herêmê de werêne ser ziman. Komkujiya Helebçê, komkujiya şengal û başûrê kurdistanê, komkujiyên li kobanê û rojavayêê kurdistanê, divê ku mirov weke komkujiyên vê zihniyeta kujar a ku bi wê jenosîd li ser serê civate kurd dihê pêşxistin, werêne ser ziman.

Komkujiya ku di 25´ê hezîrenê de ku li devê derîyê mirşîtpinar´ê ku bi alikarîya tirkiya û bi destê DAÎŞ´ê hat kirin, divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Ev komkuji, her wusa, weke komkujiyeka ku mirov divê ku bi zihniyeta ku î ro pêvajoya çareserîyê xitimandîya û politikaya tecrîdê pêş dixe ve girêdayî divê ku mirov werêne ser ziman. Ev zihniyeta ku bahse ketina Sûrî û şer bi kurdan re dike. Hemû politikayên ku di vê çerçoveyê de hatina pêşxistin, di çerçoveya înkare statûya civate kurd de ya. Bi wê re jî, bi wan politikayan dikin û dixwezin ku civate kurd, bi rêbazên hemdem ên jenosîdê ên weke ´bişavtinê´ û hwd, ji dîrokê bibin. Rejima tirk, rejima îranê û hwd, politikayên wan di vê çerçoveyê de na.

Xitimandina pêvajoya çareserîyê û pêşxistina tecrîdê, bi armanca pêşxistina pêvejoyek şer ya nû ya. Heta roja me, bi politikayên şer, van rejimên bi vî rengî ên weke rejima tirk û hwd, xwe domandin a. Dema ku şer nebê û alozî, nebê, wê nikaribin, politikayên aloziyê jî pêş bixin. Wê çaxê, sedema hebûna wan ji holê dirabê. Politikayên bi armanca xwe serdestkirinê ên bi desthilatdarî, di vê çerçoveyê de weke politikayên ku rojhilat, heta roja me kirina gola xwûnê. Politikayên DAÎŞ´ û rêxistinên din ên kujar ên weke pêşxistina ev zihniyet û politika na.

Divê ku mirov vê yekê jî ser ziman ku politikaya tecrîdê a li ser birêz Ocalan ku hatî pêşxistin, bi armanca şerekî ku bi çerçoveya domandina wê jenosîda li kurdistanê de ya. Divê ku mirov di vê çerçoveyê de fahm bike. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman, tecrîd û politikaya şer ku rejima tirk î ro li hemberê rojavayê kurdistanê bi rê ve dibe, divê ku mirov weke politikayên wê zihniyetê ên bi armanca jenosîdê werêne ser ziman. Li kurdistanê, heta roja me, bi hezaran kurdistanî qatil kirina. Bi komkujiyan, kirina ku tirsandinê pêş bixin.

Rejima tirk, ti carî, ti politikayên wê ên çareserîyê nebûna. Di demên dawiyê de bikarhanîna gotina ´pêvajoyê´ jî ne bi armanca çareserîyekê ya. BI armanca xapandinekê ya. Her wusa, weke ku çawa ku T. Ardogan, di hilbijartinê de kuran dikira destê xwe de û di mitingên AKP´ê de derdikeve dike û kuran bi vî rengî îstîsmar dikir, mirov dikarê bi karhanîna gotina pêvajoyê jî bi heman politikaya îstîsmarkirinê werêne ser ziman. Vê zihniyetê, hertimî, politikaya dijminatiyê li hemberê civate kurd meşandîya. Lê li rex wê jî, hertimî, dijminatîya xwe li kurdan kiriya. Li cihekî gotina ´pêvajoyê´ bikar dihêne û wê îstîsmar dike. Li rex wê jî, di çerçoveya politikayên dijminatîya kurdan de jî, oparasyonên qirkirina sîyesî li ser serê kurdan dimeşêne. BI deh hezaran kurdistanî, î ro ji ber ku kurd in bi rûmeta xwe di zindanên rejima tirk de na.

Politikaya tecrîdê, ku di van rojan de rejima tirk pêşxistiya û hikimet

nivîskarên tirk, bi gotinên weke ´politikaya aloziyê´ û hwd re ku dixwezin ku werênina ser ziman, di aslê xwe de, weke nîqaşên sernûxûmandinê û ji berçavan dûrkirinê a rastîyan jî, mirov dikarê van nîqaşan werêne ser ziman. Politikaya tecrîdê, ti kesek nikarê bi ti tiştekî ve girêbide. Tenê, mirov dikarê bi tenê tiştekî re werêne ser ziman. Ew jî, ew a ku politikayên çareserîyê û nîyetên ên çareserkirina pirsgirêka kurd ên ji dil ên rayadarên rejima tirk tûna na. Lê vê ne jidilbûn û nebûna politikayên xwe ên çareserîyê jî, dixwezin ku bi nîqaşên ku di nava rûpelên rojnemeyan de di meşênin, bi wê ser binûxûmênin.

Politikayên rêgeşî(`gerilim´)yê ku dihên meşandin, rayadarên tirk, wan pêş dixin. Her wusa, bi alikariya wan ya ji DAÎŞ´ê û bi wê meşandina şer bi kurdan re bê û ankû bi alikariya wê, weke ku li kobanê komkuji ku dihên kirin, mirov dikarê werêne ser ziman. Ji vê zêdetirî û wirdetirî, mirov nikarê politikayên rejima tirk ên tecrîd û şer bi tiştekî din re werêne ser ziman.

Hin nivîskarên tirk, dixwezin ku bi rêgesîya di nava HDP´ê û AKP´ê re jî, wê tecrîdê werêne ser ziman. Her wusa nivîsandina, "gotinên weke ´em te nakin serokkomar´" ku di vê çerçoveyê de weke ´hêncetna´ dihênina ser ziman, tenê nîqaşên ser nûxûmandinê na. Ji ber ku rayadarên tirk, bi zihniyeta xwe, heta roja me, di wê çerçoveyê de ya ku înkare kurdan dike. Em î ro, di sale 2015´an de dijîn, Lê hê zimanê kurdî qadaxa ya. Kurd, nikarin, bi zimanê xwe perwerde bibînin. Hin, bêaqilên ku dibêjin ku ´weşanên bi kurdî destpêkirina´ ku vê weke ´artartnatifeka´ perwerdeya bi zimanê dayikê dibînin jî, di aslê xwe de zihniyeta rejimê a di çerçoveya înkare kurd de ku ev 90 sal e, hatî meşandn radixin li berçav. Zihnyeta ku Sêz Riza, şêx Seîd û seîdî kurdî bi dervekir û heta roja cihê ku ew di wê de hatina bicihkirin jî vêşarî hiştina, î ro xwe bi politikayên înkar, tecrîd û şer li hemberê kurdan xwe dide dîyarkirin.

Wê çawa, li tirkiya, civate kurd, di nava tirkitiyê de bi halênin, li rê, hîle û xapaandinên wê digerihin. Politikaya ´entegresyonê´ ku di di mantiqê wê de nêzîkî pêvajoyê dibin, nîşanak û birhana wê rastiyê ya.

Tecrîd û şer, rastîya politikaya dewletê ya vê demê ya. Her wusa, zihniyeta wê jî ev a. Lê tişta nû ev a ku politikaya tecrîdê, bi bêahlaqî, bi tehdîdên şer re weke politikayên ´şantajê´ ku li hemberê kurdan dihê meşandin a. Ya ku di vê demê de ku xwe nû dide nîşandin ev a. Ev jî, weke politikaya rejimê a di çerçoveya gotina pêvajoyê de ya. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku ya ku bi wateya gotina ´pêvajoyê´ ku di serê kurdan de, ew a ku kurd, maf û azadîya xwe bi statûya xwe bidest bixin a. Ya ku di serê rayadarên rejimê de jî, ew a ku bi wê, çawa wê di vê pêvajoyê

de politikayên xapandinê pêş bixiin û şerê xwe yê li herêmê ê bi kurdan re bidina domandin a.

Hikimetên AKP´ê, gotinên ´pêvajoyê´ bikarhanîn. Lê bo ku bi wê kurdan bixapênin, bikarhanîn. Her wusa, nêzîkatîya wan ya di çerçoveya ku AKP´ê têkçû, wê çaxê pêvajo jî têkçû, vê rastiyê radixina li berçav. Yanî, li gorî rayadarên tirk, divê ku di vê pêvajoyê de kurd weke vînekê nebin. Dema ku bibina vîn û îrede, wê çaxê, wê tecrîdê dênina ser birêz Ocalan û wê komkujiyan weke ku li kobanê bi DAÎŞ´ê re bikin û wê tehdîdên şer ên ketina rojava de bikin. Ev politikayên rayadarên tirk in.

Pirsgirêka kurd, pirsgirêka maf û azadîya civatekê ya. Pirsgirêka kurd, pirsgirêka maf û azadîya civate kurd a. Bi şerlatanî, ku rayadarên tirk, weke ´pirsgirêka terorê´ ku dihênina ser ziman, di aslê xwe de, ev bi armanca ser vê rastiyê nûxûmandin a. Her wusa, tirsandina mirovan a. Di serî de divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku dema ku gelê kurd dibêjin ku bi gelê tirk re bi biratî ku bi hevdû bijîn, nabêjin ku di bin wan de bi koletî bijîn. Lê rayadarên tirk, bi zihniyeta koletîyê nêzîkî kurdan dibin. Ya ku bi zihniyeta xwe layiqi kurdan dibînin ew bêstatûtî û ji dîrokê birina. Vê jî, ku di nava civatîtîya tirkiyatiyê de bihalinênin, dixwezin ku bikin. Her wusa, di vê çerçoveyê de nêzîkî kurdan dibin. Ya rastî, ew a ku divê ku rayadarên tirk fahm bikin ku kurd, wê ji vê kêlîkê û pê de, koletîya ti kesekî herê nekin. Wê bi maf û azadîya xwe bijîn. Ya ku divê ku herkesek wê fahm bike jî ev a.

. Di newroza sale 2013´an dema ku bi namaya birêz Ocalan ´pêvajoya çareserîyê´, gelekan hêvî dikir ku pirsgirêka kurd were çareser kirin. Lê yên ku rejima tirk û zihniyeta wê ya dij-kurd ku dizanîn, digotin ku wê pêvajo bi tekoşîna gel wê bi serkeve. Rast jî bû. Ji wê rojê û heta vê rojê, bi ser ev nêzî 3 sal bûhûrtin. Ne rejima tirk ti gavavêt û ne jî pirsgirêka kurd hat çareser kirin. Vajî wê, rejima tirk ku amedekarîyên wê berî hilbijartinên 7´ê hezîrene 2015´an de dabûbû destpêkirin û piştî hilbijartinên 7´ê hezirene 2015´an, ku kira dewrê de konsepta şer pêşxist. Di destpøka pêvajoyê de bidest çêkirina ´qarakol´, bendevên û herikandina hêzên leşkerî zêdetirî li herêmên Kurdistan. Weke ku kurdistanê û herêmên wê ji nûve dagir bike, pêvajoyek da destpêkirin. Di aslê xwe de di pêvajoyê de ti carî şerê rejimê bi kurdan re dawî lê ne hat. DAÎŞ pêşxistin û ajotin bi ser kurdan de. Bi wê xwestibûn ku derbeyek dîrokî li kurdan bixin. Lê Dema ku DAÎŞ li hemberî kurdan têkçû, êdî wê çi bikin, nema zanîn. Rejima tirk û rejimên ku pirsgirêkên wan a pirsgirêka kurd heya, hemû hasabên xwe li ser derbeyek mihtemel ku DAÎŞ li kurdan xistiba çêkiribûn. Lê dema ku DAÎŞ

bi serneket, êdî ew hasabên wan jî, di destê wan de man. Bi gotinaka din, weke ku ´hasabê malê li yê li sûkê ne hat´ li wan hat.

Piştre cardin, serî li politikaya şer a ku hertimî li hemberî kurdan serî lê didan dan. Konseptên şer kirina dewrê de. Her wusa, di her qada jîyanê de pêvajoyek şer bi kurdan re dana destpêkirin. Bi dest hêrîşî nirxên kurdan kirin. Di ti ahlaqê de cihê wêê tûna ya ku hêrîşî goristanan were kirin. Lê hêzên rejima tirk, bidest hêrîşî goristanên kurdan jî kir. Her wusa, kurdên ku qatil dikirin, ew êşkence li laşê wan dikirin. Ev, weke politikayakê hatibû pêşxistin.

Her wusa di van demên ku em şahidîyê ji hêrşên giştî ên hêzên rejima tirk ên li ser civate kurd re dikin, em dibînin ku dixwezin ku hêrîşna din jî bibina biser kurdan de. Her wusa, weke politikaya kurdan bi destê kurdan dana qatilkirinê a ´cerdewaniyê´ dixwezin ku bi hin rengna nû ên demî pêşbixin. Gotinên wezirê karê dervê ê hikimeta tirk ên bi rengê ´emê 5 hezar cerdewanên din hildin." vê rastiyê didina dîyarkirin. Ev hemû kiryar bi gelek kiryarên din re, rayadarên tirk li hemberê civate kurd pêşxistin. Pêşî gotin ´gotin ´muzakare tuna ya´, ´masa tuna ya´ û ´pirsgirêka kurd, tûna ya´. Piştre jî, di dewama wê de konsepta şer kirina dewrê de. Balafirên artişa tirk, çîya û zevîyên Kurdistan bombabaran dikir. Artişa tirk, oparasyon li ser oparasyonê li bejehîya kurdistanê li hemberî kurdan dikir. Di qada sîyesî de rojek ne dima ku kurdên ku sîyeset dikirin, dihatina girtin. Sazîyên zimanê kurdî ên weke ´kurdî-der´, rojnemayên kurdî weke ´azadîya welat´, malperên nûçegihana kurdî ên weke ´DIHA´ û ankû ´ANF´ dihatina girtin. Dibistanên ku kurdan bo zarokên xwe bi derfetên pirr kêm vekiribûn, rastî hêrîşên hêzên dewletê dihatin û dihatina tarûmarkirin. Bi wê re jî, her roj nûçeyên qatilkirina ciwanên kurd dihat ku polîs û leşkerên tirk ew qatil dikirin.

Pêvajoyek bi vî rengî, rejima tirk piştî pêvajoya çareserîyê ku ser sê salan re doma bû rayadarên li hemberê civate kurd dabû bû destpêkirin. Bi vî rengî, xwestibû ku bi pêvajoyek şer, pêvajoya çareserîyê û ancamên wê yên ku derketibûbûna li holê bi rayagiştî re ji holê rabike. Li ser wê re jî êdî pêvajoya di çerçoveya înkara civate kurd de bidina domandin. Ji xwe, di vê çerçoveyê de ancamên hilbijartinên 7´ê hezîrene 2015´an herê nekirin. Xwestin ku di nava şert û mercên şer de cardin hilbijartin di 1´ê mijarê de werina nûkirin û bi wê re her rê û rêbazê bikarbênin ku partîya kurd bin bendê de bihêlin, dakû karibin, pêvajoyê bi vî rengî li gorî xwe li ser serê kurdan bidina domandin.

Li vir, bi gotinakê jî bê, di dewama vê de mirov divê ku vê yekê bipirsê. Gelo ku di binde ji sadî 10 de hiiştina partîya kurd û ne hiştina çûyina wê ya

li meclîsê, wê çareserîyek ba? Bêgûman, ku yek kurd jî, neçê meclisê, wê ne çareserîba. Wê tenê temenekî şer ku rejima tirk li ser wê re şerê xwe li dijî kurdan dida domandin, pêşbixe. Ev jî, ev 90 sal a, ji destpêka komarê ve ya ku rejima tirk pêşxistiya bû. Weke ku çawa heta nûha nebûya çareserî, wê î ro jî nebûba çareserî. Di serdemeka ku aqil û zanîn û ragihandin prr zêde pêşketîya, ev ti carî ne çareserîya.

Ev konsepta şer ku rejima tirk li hemberî kurdên bakûrê kurdistanê pêşxist, lingekî wê yê başûr û rojava jî heya. Lingê wê yê başûr, ew a ku hertimî rewşa başûrê kurdistanê bi sîyesî di nava pirsgirêk û tengezerîyê de werê hiştin. Ji xwe, tengezerîya ´sarokatîyê´ li başûrê kurdistanê ku hatî pêşxistin, weke aliyekî vê konsepta şer a li hemberî kurdan bikardihênin. Di vê çerçoveyê de başûr di rewşek wusa dihêlin ku nikaribê pirsgirêkên xwe yên navxweyî çareser bike, pirsgirêkên xwe yên rêveberîya navendî a baxdadê re çareser bike û her wusa ku nikaribê politikayê pêşbixe ku di vê dema ku hemû civate kurd di bin hêrîşê de ya ku politika bike. Di vê dema ku DAÎŞ hatî pêşxistin û dihê ajotin bi ser kurdan de, dihê xwestin ku kurd di rewşek aloz, tengezerî û lawaz de werina hiştin. Di vê çerçoveyê de derbeye ku bi DAÎŞ´ê niikarîn li kurdan bixin, li ser sîyesetê re li kurdan bixin. Nexwe, ku başûr hilbijartinekê di nava xwe de bo serokatîyê çê bike, wê vê pirsgirêkê jî derbas bike.

Lingê din ê konsepta şer a rejima tirk ku bi rojava jî girêdayî, ew a ku ne hêle ku şerê bi destê çeteyên DAÎŞ´ê û hwd li wir bidawî bibe. Her wusa, hertimî, bikin ku temenê hêrîşan pêşbixin. Di vê çerçoveyê de bi hêrîşan wir bêmirov bikin û bixin. Goçberîyên ku hatina pêşxistin, hemû jî ji rojava na û bi vê politikayê na. Li vir, divê ku mirov hinekî bi politikaya goçberkirina ji kurdistanê û bi teybetî pêla goçberîyên dawî ên ji rojavayê kurdistanê ku li rojava(´ewropa´) hatina pêşxistin, di vê çerçoveyê de divê ku mirov li ser wê bisekinê. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku weke dager(´sembol´)a vê goçberîya ji kurdistanê ´Alan Kurdî´, divê ku mirov werêne ser ziman. Rewşa Alan kurdî ku bi goçberîyê re hat rojeva cihanê jî, wê aliyekî şerê rejimên herêmê ên weke rejima tirk ê bi plankirî ê li hemberî civate kurd jî bi xwe re werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov bi teybetî, vê mijarê bi rewşa wê re li ser rastîya wê re werênina li ser ziman.

.

**Alan kurdî, bûya dagara trejedî û zilma li ser serê civate kurd.**

Alan kurdî, zaroyekî kurd ku ji kobanê ya. Her wusa, mirov dikarê weke dagar(´sembol`)a xalkê kobanê jî mirov dikarê werêne ser ziman. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku dema ku rastîya di bin trejedîya Alan kurdî de ku were lêkolîn kirin, wê trejedîya civate kurd a di

dîrokê de wê bi wê re were ser ziman. Her wusa, aliyê trejedîya Alan kurdî a giring jî ew a ku di sedsale 21´ê de trejedîya civate kurd ku di wê de didomê, bi xwe re dihêne ser ziman. Bo vê yekê ya, dema ku bahse trejedîya Alan kurdî dihê kirin ku tenê bi aliyê malbata wî ya ku dixwezê ku weke ´pênaber´ ku herê rojava re dihêne ser ziman.

Aliyê giring ê trejedîya zaroyê kurd Alan kurdî ku bi xwe re dihêne ser ziman, trejedîya civate kurd a di sedsale 21´ê de ku hê dihê dayîn domandin a. Di çeyreka pêşî a sedsale 21´ê de komkujiyên mazin ên weke ´komkujiya kobanê´, ´komkujiya şengalê´ û gelek komkujiyên din ên li başûr, bakûr, rojhilat û rojavayê kurdistanê hatina serê civate kurd kurd. Her wusa, di vê çerçoveyê de mirov dikarê Alan kurdî weke dager(´Alan kurdî`)a rêza komkujiyên ku di vê çeyreka pêşî a sedsal 21´ê de ku hatina hanîn li serê civate kurd jî werêne ser ziman. Her wusa, di vê çerçoveyê de rastiya Alan kurdî, dide nîşandin û rawakirin ku civate kurd çendî di bin hêrîşên mazin ên komkujiyê de ya

Rastîya trejedîya zaroya kurd Alan kurdî, mirov dikarê weke rastiyeka kurd û civate kurd û hê didomê werêne ser ziman. Alan kurdî, di vê çerçoveyê de giringa ku mirov wê bi hemû aliyên wê re û bi teybetî bi rastîyên civate wî re werêne ser ziman. Dema ku mirov Alan kurdî, tenê weke zaroyekî ku bi malbata xwe re dema ku dikir ku bi ravê li rojava ku di ava Sipî de ku dixaniqê ku werêne ser ziman, wê ev bi serê xwe ne vegotinbar bê. Her wusa, rastîya Alan kurdî, bi rastîya civata wî re vegotinbar a.

Alan kurdî, bi xwe re rastîya hêrîşên li ser rojavayê kurdistanê a bi destê rejimên herêmê ên weke tirkiya û her wusa çeteyên DAÎŞ´ê hwd jî bi xwe re dihêne ser ziman. Alan kurdî, weke zaroyeka kurd, di çeyreka pêşî a sedsala 21´ê de bûya rastiya wijdanê mirovatiyê jî. Divê çerçoveyê de jî divê ku mirov werêne ser ziman.

Rastîya alan kurdî, rastîya hemû zaroyên kurd a. Bi hezaran rastîyên zaroyên kurd ên weke Alan kurdî ku mirov dikarê li vir werêne ser ziman hena. Rastîya li Cizîra bota a pitika bi navê Uytun, mirov dikarê werêne ser ziman. Her wusa, zaroyên kurd ên weke Ceylan Onkul, Enez Ata û hwd, ku di destpêka zarokatîya xwe de na, bi destê rejima tirk hatina qatil kirin. Alan kurdî, tenê zaroyekî kurd a ji wan bi hezaran zaroyên kurd a. Lê Alan kurdî, bi wê zarokatiya xwe bûya dengê wan zaroyên kurd ên din jî. Ya ku li vir, divê ku mirov bibînê û divê ku bi teybetî werêne ser ziman jî ev a.

Lê bi teybetî aliyekî din ê giring jî ê trejedîya Alan kurdî ku em weke rastîya civate kurd a bi deh salan ku divê ku werênina ser ziman, ji ber zilma rejimên herêmê revîna malbatên kurd li rojava li welatên ewropa û her wusa

bi wan re pêşketina ´dîyasporaya civate kurd´ a. Li vir, mirov dikarê, Alan kurdî, weke rengekî din ê dîyasporaya kurd jî werêne ser ziman. Rastîya trejîkî a dîyasporaya kurd, bi wê re dihê ser ziman. Ji salên 1980´î û pê de, bi teybetî rejima tirk û rejimên din ên ku pirsgirêka wan ya kurd heya û rejimên ku bi pirsgirêka kurd ve alaqadar in, saloxgerî(´istihbarat´)ên xwe kirina dewrê de ku bi rêyên ´kaçaxî´ ku kurdan bi malbatî bikişênina li rojava jî. Ev, weke rêbazaka ku herêmên kurdistanê ji kurdan vala bikin, hatîya pêşxistin û heta roja me jî, hatîya domandin.

Di vê çerçoveyê de bi plangerîyekê kurd, ji herêmên wan hatina dûrkirin. Bi vî rengî, piştî komkujiya dersimê, dersim ji mirovan hat vala kirin û piranîya kurdên dersimî bi rêyên kaçaxî û ankû rêyên din ku ji wan re hatina çêkirin, hatina hanîn li welatên ewropî. Piştî komkujiya helebçê jî, heman rêbaz hatîya xistin dewrê de. Her wusa piştî komkujiyên li rojava û li kobanê û li başûr û li şengalê, dîsa heman rêbaz hatîya pêşxistin. BI deh hezaran kurdên êzîdî, bi vî rengî ji şengalê hatina hanîn li welatên rojava. Her wusa, ji rojavayê kurdistanê bi vî rengî bi sedhezaran kurd hatina pênaberkirin li dervî axa wan û li welatên ewropa.

Piştî ku bi komkujiyên weke komujiya kobanê û komkujiya şengalê û hwd, ku trejedîyek mazin bi wan hat jîyan kirin û ku bi hezaran hatina qatil kirin, kurdên sax mana jî, bi vî rengî bi kirina wan ´pênaber´ re bi rengekî din ê dûyemin jî dûbare ew trejedî bi goçberî û pênaberîyê bi wan hatîya jîn kirin. Di aslê xwe de, goçberkirina kurdan ji herêmên wan, di dewama wê komkujiya şengalê û komkujiya kobanê de hatîya hanîn li serê wan. Divê ku mirov trejedîya Alan kurdî û bi hezaran kurdên din ku bi vî rengî hatina goçberkirin û her wusa ku jîyane xwe ji dest dana, divê ku mirov weke rengekî domandina van komkujiyan jî werêne ser ziman.

Em li vir, vê yekê jî, bi bêjin ku weke rastîya bi êş a dîyasporaya civate kurd trejedîya Alan kurdî, wê ne êşa ku hatî serê civate kurd a pêşî bê û ne jî wê ya dawî bê. Yên ku nûha li bakûrê kurdistanê û hêrîşên rayadarên tirk ên li ser wê binerê, wê vê rastîyê pirr baş fahm bike. Her wusa di dewama wê de em divê ku binxat bikin vê rastîyê jî bibêjin ku ev trejedî hemû jî, trejedîyên ku tên serê civate kurd ên ku di ancama rastîya ´pirsgirêka kurd´ de ku hatîya pêşxistin û afirandin in. Bo vê yekê, weke rastîyakê, divê ku mirov binxat bike ku heta pirsgirêka kurd newê çareserkirin, wê gelek trejedîyên din ên nû ên weke yên Alan kurdî wê werin û bibin. Wê werina serê civate kurd. Trejedîya Alan kurdî, ti kesek nikarê tenê weke xiniqîna wî û malbatî wî ya di avê de werêne ser ziman. Ji wê zêdetirî, ne baxt û qader a. Komkujiyeka ku bi rengekî din hatî hanîn li serê civate kurd a. Weke rêbazekî komkujiyên ku rejimên herêmê hanîna serê civate kurd a.

Alan kurdî, bûya sembola zilma li ser serê civate kurd. Alan kurdî, bûya sembola êşa civate kurd ku di bin zilmê de dijî. Trejedîya Alan kurdî, tenê rastîyek ji bi hezaran rastiyên bi vî rengî ku hatî hanîn li serê civate kurd a. Her wusa, Alan kurdî, rastîya trejedîya civate kurd, ku di çeyreka pêşî a sedsale 21´ê ya ku bi maf û azadîya mirov re tê ser ziman de ku dihê jîyîn a. Trejedîya Alan kurdî, rastîya rêza komkujiyên ku di çeyreka pêşî a sedsala 21´ê de ku tên serê civate kurd a. Bi vî rengî rastîya Alan kurdî, serdemê û rengê pêşketina wê ku weke nirx û bi maf û azadiyê re tê ser ziman bi xwe re dike berlêpirsînê de. Her wusa bi vê re jî Alan kurdî, rastîya pirsgirêka kurd, ku weke pirsgirêka maf û azadîya civate kurd a di çeyreka pêşî a sedsala 21´**ê de ya**.

Konsepta şer a rejima tirk, ku piştî têkçûna DAÎŞ´ê li kobanê, girê-sipî û li herêmên ên rojava ku li bakûrê kurdistanê hat pêşxistin, wê di vê çerçoveyê de weke konseptek şer bê. Lê bi tememî ku bakûrê kurdistanê bike qada şer bê. Bi wê re jî, weke ku rejima tirk, wî şerê li rojava ê bi destê DAÎŞ´ê li li dijî kurdan dimeşênê, barî bakûrê kurdistanê bike, armanca vê konseptê ya. Gelek dordor, dihênina ser ziman ku bo ku di hilbijartinên pêşwaxt de ku bi wê re pêşîya serkevtina kurdan bigrê, ev şer pêşxistîya. Çendî ku ev aliyê vê şerê hebe jî, mirov nikarê şerê li bakûrê kurdistanê ê rejima tirk tenê bi wê re werêne ser ziman. Hemû şer û konsepta wê ya şer bi pêşketina statûya kurd ve girêdayî ya. Di serî de divê ku mirov di vê çerçoveyê de wê werêne ser ziman. Ji ber vê yekê, di serî de ev konsept, hemû qadên sîyesî ên meşrû ên civate kurd û sîyeseta wê, ji xwe re dike armanc. Heta ku sazîyên ´mafên mirovan´ ên ku şer û binpêkirina mafan di hilde rojava xwe û dihêne rojevê jî, di armanca wê hêrîş û konsepta wê ya şer de na. Di vê çerçoveyê de çendî ku konsepta şer a rejima tirk bi bombardimanên bi balafirên şer ên wê û oparasyonên leşkerî ên bejehiyê tê rojevê jî, weke lingekî kriminalize kurdan û rewşa wan ya sîyesî bê. Hertimî bi şer û kuştinê werêne ser ziman. Di aslê xwe de hêrîşên li goristanên kurdistanîyan, wê rewşek giring ya vê konseptê bi xwe re werêne ser ziman. Hêrîşên li gorîstanên kurdan, bi bidervekirina Sêd Riza û Şêx Seîd û veşartina cihê ku ew li wê hatina veşartin û ankû vêşarî hiştina goristanên wan, rewşna ku divê ku mirov di dewama hevdû de werênê ser ziman. Hêrîşên li goristanên kurdan, mirov dikarê di çerçoveya vêşarî hiştina cihê goristana Sêd Riza û Şêx Sedî de jî werêne ser ziman. Ti farqe wan ji hevdû tûna ya û bi zihniyetekê weke hevdû hatina kirin. Di vê çerçoveyê de hêrîşên li gorîstanên kurdistanîyan û cihê gora Sêd Riza û Şêx Seîd, her wusa divê ku mirov di çerçoveyekê de bi hevdû re hilde li dest. Hêrîşên li goristanên kurdan li bajarên kurdistanê, vêşarî hiştina gora Sêd Riza û Şêx Seîd, di vê

çerçoveyê de rastîya hêrîşên li goristanan ên di roja me de bi awayekî vekirî dihênina ser ziman. BI çi zihnyetê gora Sêd Riza û Şêx Seîd, heta roja me vêşarî hatîya hiştin, bi heman rengî û zihniyetê divê ku mirov rastîya hêrîşên li gorîstanên kurdan ên weke li çîyayê Cudû. Li garzanê û li hemû herêmênd in fahm **bike**.

Gora Sêd Riza û Şêx Seîd, heta roja me nayê zanîn ku li kûderê hatîya bicihkirin. Bi heman rengî gora Bedîûzzaman û ankû seîdê kurdî jî, bi heman rengî nayê zanîn. Bo ku li ser wan re têgînaka kurdî û bawerî bi hevdû re pêşnekeve, ew hatina windakirin. Bi teybetî, piştî bidervekirina SÊd Riza, kûre wî û 7 hevalên wî, cihê ku ew lê bicihkirin, vêşarî hiştin. Sêd Riza, mazinek û alimekî kurd bû. Ji kurdên dersimê û elewî bû. Weke şêxek û pîrekî elewî jî bû. Lê kurd bû. Ji ber wê kurdbûna wî, ew hat bi dervekirin û gora li cihekê nayê zanîn bicihkirin. Heman rewşê mirov dikarê bo şêx Seîd jî werêne ser ziman. Şêx Seîd alimekî kurd bû û şêxek û pîrekî kurd bû. Dergeha wî hebû. Şêx Seîd, weke serokê serhildana kurdistanê a sale 1925´an jî tê zanîn. Ji ber kurdbûna wî, ew jî, piştî ku hat bidervekirin weke Sêd Riza ji aliyê rejima tirk ve, gora ku ew herdû jî di wê de hatina bicih kirin vêşarî hatîya hiştin. Bi heman rengî seîdê kurdî, weke mazin û alimekî kurd, xwediyêrewşekê bû. Ew jî, bi bi awayekî wê qader û ankû baxtê sêd Riza û Şêx Seîd parve bike. Pişt re ew jî, cihê ku weke gorê ew li wê hatî bicihkirin, nayê zanîn. Ev ji ber çi hatîya kirin. Ji ber ku weke mazinna kurdan, ku li dora wan ti nirxên kurdewerî pêşnekevin, ew hatîya kirin.

Î ro, di roja me de, dema ku hêzên rejima tirk, hêrîşî goristanên pekrawanên ciwanên kurd dikê, ew zihniyeta ku bi wê gorên Riza û Şêx Sed û Seîdê kurdî hatîya vêşartin, hêrîşî wan goristanên kurd dike. Ji ber ku ew ciwanên kurd bo civate kurd tekoşîna azadiyê dana û jîyane xwe ji dest dana. Bi vê yekê re jî, bîr û bawerîyek li wan, bizanebûna wê re li ser van ciwanên kurd û mirina wan re di mejiyê kurdan de diafirê. Di aslê xwe de hêrîşên li goristanên kurdan, hinekî jî ev têgih heya. Vê têgiha ku li ser mirina van ciwanên kurd re ku di mejiyê mirovê kurd de diafirê, bi wê hêrîşa li goristanan re dikina armanc. Yanî, bi gotinaka din, di vê hêrîşê û rengê wê de jî, hêrîşeka li hebûna civate kurd heya ku dihê kirin. Di serî de divê ku mirov bi wê hêrîşê re vê rastiyê bibînê û fahm bike.

Di dewama wê de divê ku mirov werêne ser ziman ku hêrîşa li goristanên ciwanên, weke rastîya windakirina gorên Sêd Riza, Şêx Seîd û Seîdê kurd û hwd, armanca wê ew a ku civate kurd bê nirx bike heya. Di vê çerçoveyê de hêrîşeka li nirxên civate kurd û nirxên wê û pêşketina wê jî ya. Bi gotinaka din, hêrîşeka ku di armanca wê de pêşketina mejiyê civate kurd ê hevbeş heya. Bo ku li dora wan tekoşarên civate kurd ên azadiyê û mirina

wan, kombûneka civatî pêşnekevê, ew hêrîş dihê kirin. Yanî, mirov nikarê vê hêrîşê, tenê weke ku di çapameniyê de dihê ser ziman ku bi armanca bertekê bidina çêkirin, bi sînîrê civate kurd re bileyizin û peyamê bide nîjadperestên tirk ku bi wê bibêje ku ew bi kurdan şer dike, tenê di vê çerçoveyê de fahm bike. Ji vê zêdetirî, weke hêrîşeka civatî divê ku mirov werêne ser ziman. Weke hêrîşeka li nirxên civate kurd werêne ser ziman. Dema ku em fahm nekin ku ka ji ber gora Sêd Riza, Şêx Seîd û bedîûzzaman û ankû seîdê kurdî ku çima heta roja vêşarî hatîya hiştin û ti kes nizanê ku li kû ya, mirov wê van hêrîşên li goristanên ciwanên kurd jî fahm nekê. Divê ku miirov van herdû rewşan bi hevdû re bi zihnîyekê fahm bike û werêne ser ziman.

Abdusamet Yigit, 2016, Cizîra bota, Kurdistan